

ZANÎNGEHA WAN YÜZÜNCÜ YILÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ



DI KURMANCIYA JORÎN û KURMANCIYA NAWERAST de  
QERTAFÊN LÊKERAN

TEZA LÎSANS A BİLİND

ABDULMENAF ABI

ŞÊWIRMEND

DOC. DR. VECİHİ SÖNMEZ

WAN- 2018

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



YUKARI KURMANCİ ve ORTA KURMANCİ'DE FİİL EKLERİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

ABDULMENAF ABI

DANIŞMAN

DOC. DR. VECİHİ SÖNMEZ

WAN- 2018



T.C.  
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ** danışmanlığında, Abdulmenaf ABI tarafından hazırlanan “**Di Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Nawerast de Qertafên Lêkeran**” adlı bu çalışma, 20/06/2018 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ**

İmza: .....

**ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ**

İmza: .....

**ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ**

İmza: .....

**ÜYE : .....**

İmza: .....

**ÜYE : .....**

İmza: .....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Murat DEMİREL  
Enstitü Müdürü

## NAWEROK

KURTE .....	XV
ÖZET .....	XVI
ABSTRACT .....	XVII
SPASÎ.....	XVIII
HÊMA û KURTKIRAWEKAN .....	XIX
PÊŞEKÎ.....	XX
DESTPÊK .....	XXI
Di Derbarê Xebatê de Zanyariyên Giştî.....	XXI
Rêbazên Xebatê.....	XXII
Dijwariyên Xebatê .....	XXII
BEŞA YEKEM .....	1
1. ZIMANEVANÎ Û BERAWIRDKARÎ.....	1
1.1. POLÎNKIRINA ZIMANAN .....	3
b. Zimanên Likaw/Pêvebestî.....	4
c. Zimanên Şikaw/Hevedudanî .....	4
d. Zimanên Têkaxinraw .....	5
e. Zimanên Navgirî.....	5
1.2. MORFÎM .....	8
1.2.1. Morfîmên Azad .....	9
1.2.2. Morfîmên Qertafî .....	10
1.3. ZAR.....	14
1.3.1. Sedemên Dirustbûna Zaravayan .....	16
a. Sedemên Ramyarî.....	17
b. Sedemên Sirûştî.....	19
c. Sedemên Dînî .....	20

BEŞA DUYEM.....	23
2. DI ZIMANÊ KURDÎ DE QERTAFÊN LÊKERAN .....	23
2.1. DI KURMANCIYA JORÎN DE QERTAFÊN LÊKERAN.....	25
2.1.1. Qertafên Deman .....	25
2.1.1.1. Demên Borî .....	26
2.1.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî .....	27
a. Lêkerên Gerguhêz .....	28
b. Lêkerên Negerguhêz .....	28
2.1.1.1.2. Dema Boriya Berdest .....	29
a. Lêkerên Gerguhêz .....	29
b. Lêkerên Negerguhêz .....	30
2.1.1.1.3. Dema Boriya Dûdar .....	31
a. Lêkerên Gerguhêz .....	31
b. Lêkerên Negerguhêz .....	32
2.1.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	32
a. Lêkerên Gerguhêz .....	33
b. Lêkerên Negerguhêz .....	34
2.1.1.1.5. Çîrokiya Dema Boriya Dûdar .....	34
a. Lêkerên Gerguhêz .....	34
b. Lêkerên Negerguhêz .....	35
2.1.1.2. Demên Ranebirdû.....	36
2.1.1.2.1. Dema Niha .....	37
a. Lêkerên Gerguhêz .....	37
b. Lêkerên Negerguhêz .....	38
2.1.1.2.2. Dema Bê.....	38
a. Lêkerên Gerguhêz .....	39

b. Lêkerên Negerguhêz .....	39
2.1.1.2.3. Dema Bê a Nêzîk .....	40
a. Lêkerên Gerguhêz .....	41
b. Lêkerên Negerguhêz .....	41
2.1.2. Qertafên Raweya Xwastekî.....	42
2.1.2.1. Raweya Xwastekî di Demên Borî de .....	42
a. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz.....	43
c. Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz.....	44
d. Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz.....	45
e. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Gerguhêz .....	46
f. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Negerguhêz.....	47
g. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz.....	48
h. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz.....	49
2.1.2.2. Raweya Xwastekî di Demên Ranebirdû de.....	49
a. Dema Bê Lêkerên Gerguhêz .....	50
b. Dema Bê Lêkerên Negerguhêz .....	50
2.1.3. Qertafên Raweya Daxwazî (Fermanî).....	51
a. Lêkerên Gerguhêz .....	52
b. Lêkerên Negerguhêz .....	52
2.1.4. Qertafên Raweya Çêbiwar .....	53
2.1.5. Qertafên Avaniyê .....	54
2.1.5.1. Lêkerên Gerguhêz .....	54
a. Lêkerên Gerguhêz ên Resen.....	55
b. Lêkerên Gerguhêz ên Naresen .....	55
2.1.5.2. Lêkerên Negerguhêz .....	56
a. Lêkerên Negerguhêz ên Xwazekî.....	57

b. Lêkerên Negerguhêz ên Rûdanê .....	57
2.1.5.3. Lêkerên Dançêker .....	59
2.1.5.4. Lêkerên Lebat.....	59
2.1.5.5. Lêkerên Tebat.....	60
2.1.6. Qertafên Nêyîniyê .....	61
2.1.6.1. Demên Borî .....	61
a. Dema Boriya Berdest .....	62
2.1.6.2. Demên Ranebirdû.....	63
a. Dema Niha.....	63
b. Dema Bê û Dema Bê a Nêzîk .....	63
2.1.6.3. Raweya Xwastekî.....	64
a. Demên Borî .....	64
b. Demên Ranebirdû.....	64
2.1.6.4. Raweya Daxwazî (Fermanî).....	65
2.1.7. Qertafên Cînavkên Pêvebestî .....	67
2.1.7.1. Raweyên Hewalî .....	68
2.1.7.1.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz .....	68
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	68
2.1.7.1.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz.....	69
a. Lêkerên Xwerû- Pêkhatî- Hevedudanî .....	69
2.1.7.1.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz .....	70
2.1.7.1.3.1. Dema niha .....	70
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	70
2.1.7.1.3.2. Dema Bê.....	70
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	70
2.1.7.1.3.3. Dema Bê a Nêzîk .....	70

a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	70
2.1.7.1.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz .....	71
2.1.7.1.4.1. Dema Niha .....	71
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	71
2.1.7.1.4.2. Dema Bê.....	71
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedûdanî .....	71
2.1.7.1.4.3. Dema Bê a Nêzîk .....	72
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedûdanî .....	72
2.1.7.2. Raweya Xwastekî.....	72
2.1.7.2.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz .....	72
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	73
2.1.7.2.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz.....	73
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	73
2.1.7.2.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz .....	74
2.1.7.2.3.1. Dema Bê.....	74
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	74
2.1.7.2.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz .....	74
2.1.7.2.4.1. Dema bê .....	75
a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî .....	75
2.1.7.3. Raweya Daxwazî (Fermanî).....	76
2.1.7.3.1. Lêkerên Gergûhêz .....	77
a. Lêkerên Xwerû – Pêkhatî – Hevedudanî.....	77
2.1.7.3.2. Lêkerên Negergûhêz .....	77
a. Lêkerên Xwerû – Pêkhatî – Hevedudanî.....	77
2.2. DI KURMANCIYA NAWERAST DE QERTAFÊN LÊKERAN.....	78
2.2.1. Qertafên Deman .....	78



2.2.1.1. Demên Borî .....	78
2.2.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî .....	78
a. Lêkerên Gerguhêz .....	79
b. Lêkerên Negerguhêz .....	80
2.2.1.1.2. Dema Boriya Berdest .....	80
a. Lêkerên Gerguhêz .....	80
b. Lêkerên Negerguhêz .....	81
2.2.1.1.3. Dema Boriya Dûdar .....	82
a. Lêkerên Gerguhêz .....	82
b. Lêkerên Negerguhêz .....	83
2.2.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	83
a. Lêkerên Gerguhêz .....	83
b. Lêkerên Negerguhêz .....	84
2.2.1.2. Demên Ranebirdû.....	85
2.2.1.2.1. Dema Niha .....	85
a. Lêkerên Gerguhêz .....	86
b. Lêkerên Negerguhêz .....	86
2.2.1.2.2. Dema Bê.....	87
2.2.2. Qertafên Raweya Xwastekî.....	88
2.2.2.1. Raweya Xwastekî di Demên Borî de .....	88
a. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz.....	89
b. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz.....	90
c. Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz.....	90
d. Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz.....	91
e. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Gerguhêz .....	92
f. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Negerguhêz.....	92

g. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz.....	93
h. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz.....	95
2.2.2.2. Di Raweya Xwastekî Demên Ranêbirdû De .....	96
a. Dema Bê Lêkerên Gerguhêz .....	96
b. Dema Bê Lêkerên Negerguhêz .....	97
2.2.3. Qertafên Raweya Daxwazî (Fermanî).....	97
a. Lêkerên Gerguhêz .....	98
b. Lêkerên Negerguhêz .....	98
2.2.4. Qertafên Raweya Çêbiwar .....	99
2.2.5. Qertafên Avaniyê .....	100
2.2.5.1. Lêkerên Gerguhêz .....	100
a. Lêkerên Gerguhêz ên Resen.....	100
b. Lêkerên Gerguhêz ên Naresen .....	101
2.2.5.2. Lêkerên Negerguhêz .....	102
a. Lêkerên Negerguhêz ên Xwazekî.....	102
b. Lêkerên Negerguhêz ên Rûdanê .....	102
2.2.5.3. Lêkerên Dançêker .....	105
2.2.5.4. Lêkerên Lebat.....	106
2.2.5.5. Lêkerên Tebat.....	106
2.2.6. Qertafên Nêyîniyê .....	108
2.2.6.1. Demên Borî .....	109
a. Dema Boriya Berdest .....	109
2.2.6.2. Demên Ranêbirdû.....	110
a. Dema Niha.....	110
2.2.6.3. Raweyên Xwastekî.....	111
a. Demên Borî .....	111

b. Demên Ranebirdû.....	112
2.2.6.4. Raweya Daxwazî (Fermanî).....	112
2.2.7. Cînavkên Pêvebestî .....	114
2.2.7.1. Raweyên Hewalî .....	115
2.2.7.1.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz .....	116
2.2.7.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî .....	116
a. Lêkerên Xwerû .....	116
b. Lêkerên Pêkhatî.....	117
c. Lêkerên Hevedudanî.....	117
2.2.7.1.1.2. Dema Boriya Berdest .....	117
a. Lêkerên Xwerû .....	118
b. Lêkerên Pêkhatî.....	118
c. Lêkerên Hevedudanî.....	118
2.2.7.1.1.3. Dema Boriya Dûdar .....	119
a. Lêkerên Xwerû .....	119
b. Lêkerên Pêkhatî.....	119
c. Lêkerên Hevedudanî.....	120
2.2.7.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	120
a. Lêkerên Xwerû .....	121
b. Lêkerên Pêkhatî.....	121
c. Lêkerên Hevedudanî.....	121
2.2.7.1.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz.....	122
2.2.7.1.2.1. Dema Boriya Têdeyî .....	122
a. Lêkerên Xwerû .....	122
b. Lêkerên Pêkhatî.....	122
c. Lêkerên Hevedudanî.....	123

2.2.7.1.2.2. Dema Boriya Berdest .....	123
a. Lêkerên Xwerû .....	123
b. Lêkerên Pêkhatî.....	124
c. Lêkerên Hevedudanî.....	124
2.2.7.1.2.3. Dema Boriya Dûdar .....	124
a. Lêkerên Xwerû .....	125
b. Lêkerên Pêkhatî.....	125
c. Lêkerên Hevedudanî.....	125
2.2.7.1.2.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	126
a. Lêkerên Xwerû .....	126
b. Lêkerên Pêkhatî.....	126
c. Lêkerên Hevedudanî.....	127
2.2.7.1.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz .....	127
2.2.7.1.3.1. Dema Niha .....	127
a. Lêkerên Xwerû .....	127
b. Lêkerên Pêkhatî.....	128
c. Lêkerên Hevedudanî.....	128
2.2.7.1.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz .....	128
2.2.7.1.4.1. Dema Niha .....	129
a. Lêkerên Xwerû .....	129
b. Lêkerên Pêkhatî.....	129
c. Lêkerên Hevedudanî.....	129
2.2.7.2. Raweyên Xwastekî.....	130
2.2.7.2.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz .....	130
2.2.7.2.1.1. Dema Boriya Têdeyî .....	130
a. Lêkerên Xwerû .....	131

b. Lêkerên Pêkhatî.....	131
c. Lêkerên Hevedudanî.....	131
2.2.7.2.1.2. Dema Boriya Berdest .....	132
a. Lêkerên Xwerû .....	132
b. Lêkerên Pêkhatî.....	132
c. Lêkerên Hevedudanî.....	133
2.2.7.2.1.3. Dema Boriya Dûdar .....	133
a. Lêkerên Xwerû .....	133
b. Lêkerên Pêkhatî.....	134
c. Lêkerên Hevedudanî.....	134
2.2.7.2.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	134
a. Lêkerên Xwerû .....	135
b. Lêkerên Pêkhatî.....	135
c. Lêkerên Hevedudanî.....	135
2.2.7.2.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz.....	136
2.2.7.2.2.1. Dema Boriya Têdeyî .....	136
a. Lêkerên Xwerû .....	136
b. Lêkerên Pêkhatî.....	137
c. Lêkerên Hevedudanî.....	137
2.2.7.2.2.2. Dema Boriya Berdest .....	137
a. Lêkerên Xwerû .....	137
b. Lêkerên Pêkhatî.....	138
c. Lêkerên Hevedudanî.....	138
2.2.7.2.2.3. Dema Boriya Dûdar .....	139
a. Lêkerên Xwerû .....	139
b. Lêkerên Pêkhatî.....	139

c. Lêkerên Hevedudanî.....	139
2.2.7.2.2.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	140
a. Lêkerên Xwerû .....	140
b. Lêkerên Pêkhatî.....	140
c. Lêkerên Hevedudanî.....	141
2.2.7.2.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz .....	141
2.2.7.2.3.1. Dema Bê.....	141
a. Lêkerên Xwerû .....	141
b. Lêkerên Pêkhatî.....	142
c. Lêkerên Hevedudanî.....	142
2.2.7.2.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz .....	142
2.2.7.2.4.1. Dema Bê.....	143
a. Lêkerên Xwerû .....	143
b. Lêkerên Pêkhatî.....	143
c. Lêkerên Hevedudanî.....	144
2.2.7.3. Raweya Daxwazî (Fermanî).....	144
BEŞA SÊYEM.....	146
3. DI K. JORÎN Î NAWERAST DE BERAWIRDKIRINA QERTAFÊN LÊKERAN .....	146
3.1. QERTAFÊN DEMAN .....	146
3.1.1. Qertafên Demên Borî .....	147
3.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî .....	148
a. Lêkerên Gerguhêz .....	148
b. Lêkerên Negerguhêz .....	149
3.1.1.2. Dema Boriya Berdest .....	149
a. Lêkerên Gerguhêz .....	150

b. Lêkerên Negerguhêz .....	150
3.1.1.3. Dema Boriya Dûdar .....	151
a. Lêkerên Gerguhêz .....	151
b. Lêkerên Negerguhêz .....	152
3.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	153
a. Lêkerên Gerguhêz .....	153
b. Lêkerên Negerguhêz .....	154
3.1.2. Demên Ranebirdû.....	156
3.1.2.1. Dema Niha .....	156
a. Lêkerên Gerguhêz .....	157
b. Lêkerên Negerguhêz .....	158
3.1.2.2. Dema Bê.....	158
a. Lêkerên Gerguhêz .....	158
b. Lêkerên Negerguhêz .....	159
3.2. QERTAFÊN RAWEYA XWASTEKÎ .....	161
3.2.1. Di Raweya Xwastekî Demên Borî de .....	161
a. Di Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz de .....	162
b. Di Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz de .....	162
c. Di Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz de .....	164
d. Di Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz de .....	165
e. Di Dema Boriya Dûdar Lêkerên Gerguhêz de .....	167
f. Di Dema Boriya Dûdar Lêkerên Negerguhêz de .....	168
g. Di Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz de .....	169
h. Di Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz de .....	173
3.2.2. Raweya Xwastekî Demên Ranebirdû.....	175
a. Dema Bê Lêkerên Gerguhêz .....	175

b. Dema Bê Lêkerên Negerguhêz .....	176
3.3. QERTAFÊN RAWEYA DAXWAZÎ (FERMANÎ) .....	177
a. Lêkerên Gerguhêz .....	177
b. Lêkerên Negerguhêz .....	177
3.5. QERTAFÊN AVANIYÊ.....	181
3.5.1. Lêkerên Gerguhêz û Negerguhêz.....	181
3.5.2. Lêkerên Dançêker .....	184
3.5.3. Qertafên Lêkerên Lebat û Tebat .....	185
3.6. QERTAFÊN NEYÎNIYÊ.....	188
3.6.1. Demên Borî .....	188
3.6.1.1. Qertafa (ne-).....	188
a. Dema Boriya Berdest .....	190
3.6.1.2. Qertafa (nî-).....	191
3.6.2. Demên Ranebirdû.....	192
3.6.2.1. Qertafa (-na-).....	192
a. Dema Niha.....	192
3.6.2.2. Qertafa (ni-).....	194
a. Dema Niha.....	194
3.6.2.3. Qertafa (nî-).....	194
a. Dema Niha.....	194
3.6.2.4. Qertafa (ne-) .....	194
a. Dema Bê .....	194
3.6.3. Raweya Xwastekî.....	195
3.6.3.1. Demên Borî .....	195
3.6.3.2. Demên Ranebirdû.....	196
a. Dema Bê .....	196



b. Dema Niha û Dema Bê a Nêzîk .....	197
3.6.4. Raweya Daxwazî (Fermanî) .....	197
3.7. CÎNAVKÊN PÊVEBESTÎ .....	199
3.7.1. Raweyên Hewalî .....	199
3.7.1.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz .....	200
3.7.1.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz .....	202
3.7.1.3. Demên Ranebirdû .....	203
a. Dema Niha Lêkerên Gerguhêz .....	203
b. Dema Niha Lêkerên Negerguhêz .....	204
3.7.2. Raweyên Xwastekî .....	206
3.7.2.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz .....	206
3.7.2.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz .....	207
a. Dema Boriya Têdeyî .....	207
b. Dema Boriya Berdest .....	207
c. Dema Boriya Dûdar .....	208
d. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî .....	208
3.7.2.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz û Negerguhêz .....	209
a. Dema Niha .....	209
b. Dema Bê .....	209
3.7.3. Raweya Daxwazî (Fermanî) .....	210
3.7.4. Raweya Çêbiwar .....	211
ENCAM .....	213
ÇAVKANÎ .....	217
JİYANNAME .....	222

**KURTE**

Çend saleke li tirkîyê, di warê zimanê kurdî de hewl û koşîşek heye û bi riya komelek dem û dezga û saziyên medenî tên cêbecêkirin û bi rêvebirin. Bi taybet ew xebatene zêdetir di warê rêzimana zimanê kurdî de ne. Lê belê ta niha li tirkîyê xebatên berawirdkirin û dahûrandina zaravayên kurdî li gel yektir ji bilî xebata zimanewanê kurd Malmisaniy a ku zaravayê zazakî û kurmanciya jorîn dide ber hev nîn in, an jî pir kêr in.

Her wiha her çend e di warê zaravayên zimanê kurdî de, bi zarava û zimanên din xebatên vî awayî hatibin kirin jî; bo nimûne zana û zimanewanê kurd Qanadê Kurdê bi zimanê rûsî, zaravayê kurmanciya jorîn û kurmanciya nawerast (sorani) berawird kirine, zimanewanê kurd Evrehmanî Hacî Marif bi zaravayê kurmanciya nawerast (sorani), kurmanciya jorîn û kurmanjiya nawerast berawird kirine, zimanewanek din ê kurd, Mihemed Emîn Hewramanî, zaravayê hewramî, soranî berawird kirine. Bes ji wan berhem û xebatan sûdwegirtin pir kêr e, çunke ji bilî berhema Qanadê Kurdo a bi zimanê rûsî nivîsiye, ên din bi kurmanciya jorîn nehatine wergerandin.

Ji ber vê hindê, ji aliyê lêkoler û aktîvîstên zimanê kurdî ên tirkîyê ve peyvendî, lêkçûn û cîyawaziyên di navbera zaravayên zimanê kurdî de kêr tên zanîn. Tabî ev yeke jî ji bo sedemên wek, nebûna qewareyek siyasî a kurdan, nebûna peyvendiyan di navbera kurdan de, nebûna alfabeyek standart, qedexebûna perwerdeya zimanê kurdî... hwd. wedigere.

Ji ber vê sedemê, di vê xebatê de hatiye hewldan di astek rêjeyî de her du zaravayên kurmanciya jorîn û kurmanciya nawerast di warê qertafên rêzimanî ên lêkeran de bîr berawirdkirin û peyvendî, lêkçûn û cîyawaziyên di navbera wan de, di çêweyek zanistî û akadêmîk de bîr roşinkirin.

**Bêjeyên Sereke:** zarava, kurmanciya jorîn, kurmanciya nawerast, berawirdkarî, qertafên rêzimanî ên lêkeran

## ÖZET

Bir kaç yıldır Türkiye’de bazı sivil kurum ve kuruluşlar aracılığıyla Kürtçe ile ilgili çeşitli çalışmalar ve araştırmalar yapılmaktadır. Bu çalışmalar özellikle daha fazla Kürt dili üzerinedir. Ancak şimdiye kadar Türkiye’de Kürtçe’nin lehçelerini birbirleriyle karşılaştırma ve analiz etme çalışmaları Kürt dilbilimcisi olan Malmısanij’in Zazaca lehçesi ve Kuzey Kurmanci lehçesini birbiriyle karşılaştırması dışında her hangi bir çalışma ya yoktur yada çok azdır.

Her ne kadar Kürtçe’nin lehçeleri üzerine Kürtçe’nin başka lehçeleriyle ve başka dillerle böyle çalışmalar yapılmışsa da; örneğin Kürt aydın ve dilbilimcisi olan Qanadê Kurdo, Rusça Kuzey Kurmancisi ve Orta Kurmanci(Soranice)’yi karşılaştırmış; Kürt dili araştırmacısı olan Evrehmani Hacı Marîf ise Orta Kurmanci lehçesiyle Kuzey Kurmancisini karşılaştırmış; yine başka bir Kürt dili araştırmacısı olan Mihemed Emin Hewramani de, Hewrami lehçesi ve Soranice lehçesini karşılaştırmıştır. Ancak bu çalışma ve araştırmalardan faydalanmak çok azdır, çünkü Qanadê Kurdo’nun Rusça yazdığı çalışmanın dışında, diğerleri Kuzey Kurmanci lehçesine çevirilmemiştir.

Onun için Türkiye’deki Kürt dil araştırmacıları ve aktivistleri Kürtçe’nin lehçeleri arasındaki ilişkileri, benzerlik ve farklılıkları az biliyorlar. Tabii bu da, Kürtler’in siyasi bir oluşuma sahip olamamaları, Kürtler arası ilişkilerin olmaması, standart bir alfabenin olmaması, Kürtçeyle eğitim görmenin yasak olması... vs. nedenlerden dolayıdır.

Onun için bu çalışmada yapılmak istenen sınırlı bir çerçevede de olsa Kürtçe’nin her iki lehçesi olan Kuzey Kurmanci lehçesi ve Orta Kurmanci lehçesini, fiillerin çekim ekleri konusunda karşılaştırmak ve aralarındaki ilişki, benzerlik ve farklılıkları bilimsel ve akademik bir çerçevede ortaya koymaktır.

**Bêjeyên Sereke:** Lehçe, Kuzey Kurmancisi, Orta Kurmanci, karşılaştırma, fiil çekim ekleri

**ABSTRACT**

Some various researches and studies about kurdish language have been realized in Turkey for a few years by means of some diferrent civil boardings and foundations. However there are hardly works and anlyses about the comparison of the kurdish dialects until now excluding kurdish linguist Malmisanij's one which is about the dialects of Zazaish and Northern Kurdmanji.

Although there are some studies about the comparison of kurdish dialects and with other languages, such as kurdish wise and linguist Qanatê Kurdo's work about Nortern Kurdmanji and Russian and Soranî, Evrehmanî Hacî Marif 's work about the comparison of Northern Kurdmanji and the Middle Kurdmanji and also the comparison work of the dialects of Hewramî and Soranî by Mihemmed Emîn Hewramanî, these productions have had got very little use for the interested ones. Because no one has been translated to Northern Kurmanji but Qanatê Kurdo's one in Russian.

That's why kurdish language researchers and activists have so little knowledge about the realitions, differences and similarities between the dialects of kurdish in Turkey. Surely this results from some reasons such as that there is no political togethership, no common and active connection among kurds, no standardized alphabet, no education in kurdish language etc.

By the means this work I aim to demonstrate the relations between the two common kurdish languages which are Northern Kurdmanji and Middle Kurdmanji in a scientific way by especially suffixes and prefixes for using verbs and about other grammatical usegas.

**Key Words:** Dialect, Nothern Kurdmanji, Middle Kurdmanji, Comparison, Using Verbs

**SPASÎ**

Piştî hewl û koşîşek pir dûr û dirêj, gihiştim dawiya yek ji wan awatên xwe ên serekî, ew jî xwandin û encamdana lîsansa bilind bû li ser zimanê xwe ê zikmakî. Di vê rêya dûr û dirêj de, li ser sifreya gelek mirovên birêz rûniştim, bûm mêvanê gelek zana û kesên şikomend û min tûrikê gelek lêkoler û berhemhênerên dildarên zimanê kurdî têk dan û ji hemûyan tam û çêjên cuda wergirtin û hewl da ji wan tam û çêjên ji hev cihê çêjek nû biafirînim û pêşkeşî xoşewîstên vî zimanî bikim.

Di dema vê lêkolîn û koşîşê de pêrgî gelek kend û kospan hatim û ji min re rêgirbûn, boye wek pêwîst dizanim, di van demên sext de spasî li şewirmendê xwe birêz Alk. Doç. Dr. Vecîhî SÖNMEZ bikim ku li gel min bû û bo min di vê xebatê de her tim rêxweşker bû.

Her wiha ez wek erkek serekî dizanim ku dibe bi giştî spasî li hemû mamosteyên Beşa Wêjeya Zimanê Kurdî ên Zanîngeha Silêmaniyê, bi taybetî Alk. Doç. Dr. Ebûbekir Umer Qadir û Prof. Alk. Hogir Mehmûd Ferec bikim, dîsa spasî li birêz Doç. Dr. Seyyîd Battal UĞURLU (Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl Beşa Wêjeya Zimanê Turkî) jî bikim, ku di vê xebatê de hemûyan alîkariyên pir mezin dane min û ez di vî warîd de pêş de birim.

Sererayê hemû van gotinane ez spasiya malbata xwe jî dikim, ku demek dirêj e li hember van hewl û koşîşên min sebrek pir mezin nîşan didin. Boye ez vê xebatê pêşkeşî wan û ronahiya xwe a ku hêj di rê de ye, dikim. Hêvîdar im, ev xebate dê ji hemû kesekî/ê re sûdmend be.

## HÊMA û KURTKIRAWEKAN

*	narêzimanî
/	yan
/ /	morfîm
/ -..../	pêşgir
/.... - /	paşgir
[ ]	nîşaneyê watayî
→	dibe bi
amd.	amadekar
ç.	çîrok
d.b.	dema borî
g.	gorîn
h.	hêz
h.ç.	heman çavkanî
k. jorîn	kurmanciya jorîn
m.	morfîm
ø	morfîma betal
q.	qertaf
r.	rawe
wer.	werger

## PÊŞEKÎ

Ziman peymanek yan lihevkirinek civakî ye û her di destpêka jiyana mirov de heta roja dawiyê, li gel mirov e. Di vê xebatê de jî dê li ser yek ji wan peymanane, zimanê kurdî, lêkolîn bête kirin.

Wek tê zanîn, ji aliyê neyar û nahezên kurd û kurdî ve ta niha gelek gotinên li der zaniyê û wî, di wî warî de hatine kirin û hatiye gotin neteweyek bi navê kurd nîn e, zimanek bi navê zimanê kurdî nîn e, bi wî zimanî zaniyê kirin, zimanek berbilav e, ji komelek zarava û devokan, ku pir in ji peyvên zimanên devrûber, pêk tê. Tenanet hin boçûn hen, dibêjin ew zaravayên hen, wek zimanên serbixwe ne, axêverên van zaravayane ji hev têngihînin û tu peyvendî di navbera van zaravayane de nîn in.

Bîrokeya vê xebatê di encama van bîr û rayane de destpêkir û hat xwastin di çêweyek akadêmîk de, di wî warî de lêkolînek bête kirin û bête selmandin, neteweyek bi navê kurd heye û xwediyê zimanek serbixwe û dewlemen de û her wiha wek hemû zimanên din ên cîhanê di wî zimanî de jî komelek zarava û devok hene û axêverên van zarava û devokane bi asanî ji hev têngihînin û dikarin bi asanî li gel yek peyvendiyan jî dirust bikin.

Ji bo selmandina vê yekê, di vê xebatê de her du zaravayên zimanê kurdî, kurmanciya jorîn û kurmnaciya nawerast, dê di çêweya qertafên rêzimanî ên lêkeran, wate qertafên deman, qertafên xwastekî/dananî, qertafên daxwazî, qertafên avanî/hêz; qertafên neyîniyê, qertafên cînavkên pêvebestî/likaw, de bîr berawirdkirin û peyvendî, ciyawazî û lihevçûnên wan ên wek erk û rol, dê di asta morfolojiyê de bîr berceste kirin.

## DESTPÊK

Ziman wek hêma an amûrek aloz a serekî, di jiyana mirov de xwediyê cihekî şikomend û baladest e. Ziman li gel vê aloziya xwe di heman demê de xwedî rêsa û yasa ye û bi rêsa û yasayan kar dike, wate bi sîstem e. Nabe bi hîç şeweyekê kêmasî û kelênî bikevin vê sîstemê. Ger ştek wisa berpa bibe dê têgiştin û peyvendî dirust nebe. Boye ziman sîstemek wisa ye bi hîç şeweyekê rê nade di vê sîstemê de boşayî û kelênî dirust bibin. Tenanet ev sîsteme ye, wisa dike mirov dikare daneyên watadar derbibre an bi dest bixe, ku ji vê yekê re rêziman jî tê gotin. Wate her zimanek li gor taybetmendiyên xwe xwediyê rêzimanekê ye û daneyên wê li gor rêzimana wê li gel yektir peywendiyên dirust dikin, li gel yektir rêz dibin û daneyên watadar derdixin holê.

Zimanê kurdî jî wek hemû zimanên din xwediyê sîstemekê ye û xwediyê rêzimanekê ye û daneyên wê jî li gor vê rêzimanê devr dibînin û dane an pêkhateyên watadar ên biçûk û mezin didin dest. Lê belê ji ber hin sedemên siyasî, sirûştî û dînî zimanê kurdî pêrgî hin astengiyên hatiye û wek gelek zimanên din zêde derfeta pêşdeçûn û geşepêdanê ji xwe ve neditiye. Boye komelek zarava jê dirust bûne û dê di wir de du zaravayên vî zimanî di astek zanistiyane û akademîk de li gor metodek zanistî bîn berawirdkirin û peyvendiyan wan dê bîn arastekirin.

### Di Derbarê Xebatê de Zanyariyên Giştî

Di vê xebatê de wek bûnewerek serekî a jiyana mirov dê qala ziman bête kirin, destpêka ziman, ji aliyê pêkhate û pol ve ziman, sedemên dirustbûna zaravayan di zimanê kurdî de û her wiha qertafên rêzimanî yên her du zaravayên kurdî, kurmanciya nawerast û kurmanciya jorîn, ên diçin ser lêkeran dê bîne berawirdkirin û ciyawazî û liyekçûnên di navbera wan de dê bîn diyarkirin û her wiha dê bête selmandin ev her du zaravane ji hev cuda nîn in û ser bi yek ziman in û tenanet eger bête xwastin, dê bi asanî ev her du zaravane bîn yeklayîkirin û zimanê kurdî dê ber bi standardbûnê ve bê birin.



### **Rêbazên Xebatê**

Di vê xebatê de, li gor rêbaza berawirdkirinê, dê zaraveyê kurmançiya nawerast û zaravayê kurmançiya jorîn bên berawirdkirin û dê di van her du zaravayane de qertafên rêzimanî ên diçin ser lêkeran bên berawirdkirin û liyekçûn û ciyawaziyên wan dê bên diyarkirin.

### **Dijwariyên Xebatê**

Ji ber sedemên siyasî, corafyayî û dînî kurdan nekarî ji xwe re qewareyekê dirust bikin, her tim li gel yek de di nav peyvendiyan de bin û bibin xwediyê ziman, kelepuê û bîrokeyek hevpar û standard. Çünke kurd û xaka wan ji hev hatin dabeşkirin û li ser çar welatên ku xwediyê ziman, keltur û alfabejên ciya ciya ne hatin bilavkirin. Tenanet kurd ji aliyê van dewletane ve ji hev hatin qedexekirin.

Di encama van kiryarane de herî zêde zimanê kurdî zerer û ziyar dît û nekarî wek hemû zimanên din bi şeweyek siruştî bi asanî ber bi standarbûnê ve biçê û di nav hemû kurdan de wek yek bête bikaranîn û bilêvkirin. Her wiha bikaranîna elifbêjên cur bicur jî bû sedema ji hev durketina zaravayên zimanê kurdî û tenanet ev kar, xebat û lêkolînên li ser van zaravayane hatine kirin û tên kirin, çünke bi elifbêjên cuda cuda hatine nivîsîn, dibin rêgir ji aktîvîst û lêkolînerên zimanê kurdî re.

Her wiha kêmbûna berhem, lêkolîn û xebatên akademîk di warê berawirdkirina zaravayên zimanê kurdî de jî, dîsa wek astengiyek, an kelênîyekê rêgir bû ji bo lêkolînek vî awayî.

## BEŞA YEKEM

### 1. ZIMANEVANÎ Û BERAWIRDKARÎ

Ziman û berawirdkirina zimanan, ji bo peydakirina dan û standina mirovan a li gel hev û li gel xwezayê û dewr û ber pir girîng e, ji ber wê hindê gelek zimanewan û zanayan hewl daye bi riya zimanan peywendî, hevbeşî, ciyawazî û sedemên wan hevbeşî û ciyawaziyên di navbera mirovan û sirûştê de hene, berceste bikin û xwe bigihînin destpêka zimanî. Lê belê ji ber ku ta niha di vî warî de gelek bîr û boçûnên cihê cihê hatine îdfakirin û arastekirin û hîç yek ji wan jî nebûye xwediyê bingehek gewî û zanistî û tenha di asta bîrokeyek şexşî de maye û di vî warî de gelek gengeşî û alozî dirust kirine; “Saziya Zimanewanî a Parîsê” jî di sala 1886’an de biryarek girt û ji naçarî ragihand, dê di warê destpêka ziman de hîç belgeyekê nepejirîne.”<sup>1</sup>

Her wiha li gor Özcân BAŞKAN jî: “Di warê destpêka zimanê mirov de arastekirina her cure şîmaneyekê bê bingehek e; çünke hîç belgeyek nivîsî li ber dest nîn e. Belgeya here kevn heta 4000 sal li pêş zayîne diçe. Lê belê destpêka zimanê mirov dibe dehezaran sal paş de bête birin. Ji ber vê hindê her gotinek di vî warî de bête kirin, dê mentiqen her di serî de bête redkirin.”<sup>2</sup>

Di encama wan îdfâ û lêkolîn û xebat û gengeşiyane de dibe em bizanin heta destpêka mirovayetiye neyê zelalkirin destpêka ziman zelal nabe, boye her gotin û îdfayek di vî warî de dê bê bingehek û pûç be.

Her wiha ji ber, ziman pêkhate an alavek civakî ye û lêkçûn û ji hev cihêbûnên kelepûrî ên di navbera mirov, grub û civakê de hene diyar dike, dikare di heman demê de hem bibe nîşaneyê hevbeşiyê û hem jî bibe nîşaneyê ciyawaziyê.

Boye V. Doğan GÜNAY jî dibêje “Ziman, diyardeyekî civakî ye û ev civakîbûne jî ji bo grubek diyarîkirî ye, çünke civakek ku bi şêweyek narastewxî ji grubên ciya ciya dirust bibe, nabe xwediyê zimanek hevbeş. Wate di vir de zimanê siruştî nabe. Lê belê dikare di demek kurt de zimanek hevbeş bê dirustkirin. Ji bo ku

<sup>1</sup> BAŞKAN, Özcân, *Dilbilim – Linguistik Metodu (Zimanewanî – Mîtoda Lînguîstîkî)*, Stenbol, 2003, 66.

<sup>2</sup> h.ç.

zimanek hevbeş an siruştî ê vê civaka ku ji grubên ciya ciya pêk hatiye, dirust bibe. Pêwîst e ev civake ji bo demekê bi hev re bijî li gel yektir di peywendiyê de be.”<sup>1</sup>

Di cihek din de jî di warê ziman de tê gotin: “Ziman hem navçîn û hem heybera gotinê ye.”<sup>2</sup> û zanistek serbixwe ye û bi têgeha Linguistik tê binavkirin. Lê li hember vê têgehê ji zimanekê bo zimanek din komelek têgehên ciya ciya bi kar tên, bo nimûne “Li bal kurdan, li hember vê têgehê têgehên *Zimanevanî* û *Zanista Ziman* bikar tên û wek zanist jî, ji hemû astên ziman ên wek; dengsazî, bêjesazî, hevoksazî, watasazî, derûnî, ciwakî, ferhengî û karekî vedikole.”<sup>3</sup>

Ev diyardeya civakî a xwediyê pergalekê ye, di heman demê de wek hemû qadên din ên jiyane ew jî xudiyê kêşe û arîşeyan e. Û her wiha ji ber ku ew nikare xwe li hember demê bigre û guhertin di ser de tên, wek Schleicher jî dibêje: “Mêjû dijminê ziman e. Wate dem, an zeman dibe sedema têkçûna zimanan.”<sup>4</sup> an guhertina zimanan. Boye ji bo çareserkirina kêşe û arîşeyan, “Zanista nivîstekê derkete holê û bi taybetî ji aliyê Friedrich August Wolf ve di sala 1777’an de hat destpêkirin. Babeta zanista nivîstekê tenha ziman nebû. Ew zaniste li pêşiya hemû tiştêkê dixwaze nivîstekan destnîşan bike, şîrove bike û vebêje û bi riya vê lêkolînê ve jî, ber bi vekolîna dîroka nivîs, kelepûr û saziyan... hwd biçe. Zanista nivîstekê li her çiyekê, metodek taybet a xwedî xwe a rexnekirinê bi kar tîne. Û her wiha ev zaniste kêşeyên zimanî, bi taybet jî ji bo berawirdkirina nivîstekan, serdemên ciya ciya, ji bo diyarkirina zimanê nivîskar ê taybet bi xwe, an ji bo dahurandin û vegotina nivîsên ku aîdî zimanekî kevn in û têgihîştina wan bi zehmet e, hewl dide.”<sup>5</sup>

Di encama van xebat, lêkolîn û berawirdkirinane de, “Hat zanîn dê bikaribin zimanan jî berawird bikin. Bi vî awayî zanista nivîstekan a berawirdkar, an rêzimana berawirdkar peyda bû.”<sup>6</sup>

Bo yekem car, berawirdkirina zimanan ji aliyê Fort William Jones ve hatiye kirin û W. Jones: “Di sala 1786’an de di saziya zanistê a Ingilîzan de axaftinekê dike

<sup>1</sup> GÜNAY, V. Doğan, *Dil ve İletişim (Ziman û Peywendî)*, Stenbol, 2004, 14.

<sup>2</sup> SAUSSURE, Ferdinand, *Genel Dilbilim Dersleri (Waneyên Giştî ên Zimanevanîyê)*, (Wer.: Berke Vardar), Stenbol, 2001, 49.

<sup>3</sup> Yusif Şerîf Seîd, *Zimanevanî*, Hewlêr, 2011, 6.-7.

<sup>4</sup> BAŞKAN, *Linguistik Metodu (Mîtoda Lînguîstîkî)*, 59.

<sup>5</sup> SAUSSURE, 27.-28.

<sup>6</sup> h.ç., 28.

û îdîayekê tîne ziman û dibêje: Zimanê Hîndiyan «ji yunanî şakartir, ji latînî dewlementir e» ê pîroz ê kevn, Sanskrîtî, li gel van her du zimanane hem di warê rîşeyên lêkeran de, hem di warê pêkhateyên rêzimanî de xizmayetiyek ew qas nêzîk heye, ku nikarî vê yekê wek tesadûfekê bihesibîn. Û axaftina xwe wiha didomîne: Xizmayetiya di navbera van zimanan de ewqas nêzîk e, hîç filologek piştî dahurandîna van her sê zimanan, nikare xwe ji baweriya, ev zimanene levane ye ji yek çavkaniya hevpar a ku êdî nemaye, bin, xilas bike.”<sup>1</sup>

Piştî W. Jones, “Di sala 1816’yan de Franz Bopp bi pirtûka bi navê, (Di Zimanê Sanskrîtî de Qertafên Gerdankirinê ên Lêkeran), peywendiyên Sanskrîtî ên li gel zimanên germe, yûnanî û latînî vekolî.”<sup>2</sup> û bi vî awayî qonaxa berawirdkirina zimanan dest pê kir. Ji ber vê hinde, “Her di destpêkê de tê dîtin, ji bilî Bopp hinek zimanewanan bijarde peyda dibin. Bo nimûne, damezrênerê lêkolînê germenî Jakob Grimm, Rêzimana Elmanî (1822-1836) weşandiye. Pott, bi lêkolînê etîmolojîk gelek melzeme pêşkeşî zimanewanan kir. Her wiha Kuhn, ku hem li ser zimanewani, hem li ser vegotinê xebatên berawirdkirinê kirin û zanayên wek Benfey, Aufrech, Max Muller, G. Curtîus û Aug. Schleicher... hwd.”<sup>3</sup> li ser berawirdkirina zimanan xebitî û “Dixwastin bi riya berawirdkirina van zimanan bigihin taybetmendiyên wî zimanê binçîne ê ku li gor W. Jones li nav çûye.”<sup>4</sup>

Ji bilî diyarkirina polînek veçeyî, kesên berawirdkar polînek din jî derxistine holê, ku jê re Topolojî tê gotin. Wate polînkirina zimanan li gor cureyên morfîmên bêjeyan ên ku pêkhateyên hevokan in, hatin kirin.

### 1.1. POLÎNKIRINA ZIMANAN

Piştî zimanewanan li gor morfîm û pêkhateyên bêjeyan, dest bi polînkirina zimanan kir, bo yekem car ziman wek sê cur ji hev hatin cihêkirin û ew jî pêktên ji ‘zimanên dabiraw / yekkîteyî, zimanên likaw / pêvebestî û zimanên lêkdiraw /

<sup>1</sup> PORZIG, Wolter, *Dil Denen Mucize (Ziman Wek Mûcîze)*, II, (Wer.: Vural Ülkü), Ankara, 1986, 126.-127.

<sup>2</sup> SAUSSURE, 28.

<sup>3</sup> h.ç., 29.

<sup>4</sup> Ebûbekir Umer Qadir, *Berawirdêkî Morfosîntaksî le Zimanê Kurdî û Farisî (Berawirdêkî Qertafên Rêzimanî Di Zimanê Kurdî û Farisî de)*, (Teza Doktorayê a Zanîngeha Silêmaniyê, Nehatiya Weşandin), Silêmanî, 2003, 4.

hevedudanî.’ Paşan her bi riya reftara morfîman ve, ev polîna topolojik hat firekirin û çar cur ziman jê hatin diyarkirin. Dabiraw/Yekkîteyî, Lêkdiraw/Hevedudanî, Likaw/Pêvebestî û Axinraw-Têkelaw. Ji bo polînkirina zimanên cîhanê, zimanewanan berdewamî da lêkolînên xwe û di nivê duyem ê sed sala bîstan de, ev polîne ji bo pênc gruban firekirin û ev jî; Zimanên Şikiraw, Zimanên Likaw, Zimanên Şikaw/Lêkdiraw, Zimanên Axinraw û Zimanên Navgir.”<sup>1</sup>

#### **a. Zimanên Şikiraw/Yek Kîteyî**

“Di zimanên şikiraw de, her bêjeyek ji yek kîteyê pêk tê. Doxê bêjeyan ê gerdankirinê nîn e. Hevok, ji rêzbendiya bêjeyên negerdankirî û yekkîteyî pêk tê. Ew wataya ku hevok radigihîne bi pêy şewazê rêzbûna bêjeyan tê zanîn. Ji ber ku bêje yekkîteyî ne, ji aliyê rûxsar ve gelek li hev diçin, ji bo ji hev bîn cihêkirin, sîstemek pir dewlemend a kirpandinê heye. Zimanên çînî û tîbetî di vê grubê de ne.”<sup>2</sup>

#### **b. Zimanên Likaw/Pêvebestî**

“Di zimanên likaw de, pêkhateyên qertaf wek pêşgir, paşgir û tenanet wek navgir jî bi bêjeyê ve tîn nivîsîn û bi vî şeweyî watayên nû ên cihê cihê tîn bidestxistin. Zimanê tirkî yek ji wan zimanane ye.”<sup>3</sup>

#### **c. Zimanên Şikaw/Hevedudanî**

“Di van zimanan de, bêje ji çend morfîmekan pêk tê, lê belê bi degmen morf û morfîm li hember hev radiwestin. Lê berewajî vê yekê, morfek di yek demê de dibe nûnerê çendîn morfîman. Boye hemberyekkirin bê sûd û neşîyav e. Zimanê yunanî û sanskrîtî di vê grubê de ne.”<sup>4</sup>

<sup>1</sup> Umer Qadir, 5.

<sup>2</sup> ERGÎN, Muharem, *Türk Dil Bilgisi (Rêzimana Zimanê Tirkî)*, Stenbol, 1999, 8.

<sup>3</sup> BAŞKAN, Özcan, *Bildirişim, İnsan – Dili ve Ötesi (Parvekirin, Mirov – Zimanê Wî û Wêdetir)*, Stenbol, 2003, 174.

<sup>4</sup> Umer Qadir, 6.

#### d. Zimanên Têkaxinraw

“Di vî zimanî de, bêjeyek di heman demê de dikare hem taybetmendiyên kirdar û hem jî ên bireserê verbigre. Di vî zimanî de, peywendiyên di navbera bêjesazî û hevoksaziyê de lêl û nediyar in. Zimanê Eskîmoya Grolandê û zimanê kurdî di nav vê grubê de ne.”<sup>1</sup>

#### e. Zimanên Navgirî

“Di van zimanan de, pêkhatiyên bêjeyan dengên dengdar in û dengdêr dikevina navbera dengdaran de. Zimanê erebî û îbrî jî vê grubê ne.”<sup>2</sup> Her wiha ziman çawa ji aliyê ronan ve hatiye dabeşkirin, bi heman şêwe ji aliyê peywendiyên ve jî hatiye dabeşkirin û zimanewanê tirk Muharrem Ergîn dibêje: “Zimanên ser zeviyê, ji aliyê nêzîkbûn û lihevçûn ve di du xalan de tên destnîşankirin: Xizmayetî û Ronan.”<sup>3</sup> Lê belê zimanewanê kurd Ebûbekir Umer Qadir di nameya xwe a doktorayê de qala sê peywendiyên dike û dibêje: “Zanayên ziman, zimanên cihanê li gor peywendiyên di navbera zimanan de, ziman polîn kirine û ji bo vê mebestê çend peywendiyek destnîşan kirine, wek; Peywendiyên Xizmayetî, Peywendiyên Çandî/Kelepûrî, Peywendiyên Formsazdanê.”<sup>4</sup>

“Di warê peywendiyên xizmayetî de, zimanewanan dît di navbera zimanê inglîzî û elmanî de pir peywendî hene û ev peywendiyene vedigerin bo bingehek hevbeş, ji vê hindê jî van zimanan re gotin; zimanên germenî. Li gor vê têrwanîne zimanê kurdî û farisî jî wek zimanên êranî tên binavkirin û xizm in. Xizmayetî jî komelek peywendiyên di asta xêzanî de ne, radigihîne. Wek peywendiya di navbera dayk û kiçê û xwîşk bo xwîşkê. Ev jî vê watayê nade, zimanek ji zimanekî ketibe, an dirust bibe.”<sup>5</sup>

“Peywendiyên rewşenbîrî an çandî, bi şêweyek rastewxo di encama peywendiyên civakî de peyda dibin. Bo nimûne zimanê erebî û zimanê kurdî peywendiyek çandî heye û tişt jî hev werdigerin. Bo nimûne bêje û têgehên erebî

<sup>1</sup> h.ç.

<sup>2</sup> h.ç.

<sup>3</sup> ERGÎN, 6.

<sup>4</sup> Umer Qadir, 7.

<sup>5</sup> h.ç.

hatine nav zimanê kurdî û ji kurdî jî çûne nav zimanê erebî. Wek bêjeyên xelk, heq, meslehet, seqafet...hwd. Serera jî di asta ziman de hîç peywendiyek di navbera wan de nîn e û li ser du malbatên cihê (kurdî ser bi malbata hîndo-ewrûpî, erebî ser bi malbata samî ye.) ên ziman in.”<sup>1</sup> Ji kurdî jî peyvên wek edebiyat, defter, dîn, kes, hîç...hwd. derbazî nav zimanê erebî bûne. “Peyva ‘edeb’ê di binyata xwe de ji peyva ‘dep’ê tê. Lêwre pêşiya vedîtina kaxizê, kurdan li ser darên tenik ku jê re bi kurdî ‘dep’ê gotin, nivîsar nivîsandine. Wekî ku tê zanîn di alfabeya erebî de tîpa ‘p’yê nîn e. Erebi li cihê vê tîpê, tîpa ‘b’yê bi kar tînin. Li cihê peyva ‘dep’ê ‘deb’ gotine. Piştî tîpa ‘e’yê di serî de zêde kirine û bûye ‘edeb’. Her wiha peyva ‘defter’ê jî peyveke kurdî ye û ji peyva ‘dep – ter’ê hatiye çêkirin. Dep-terê wataya depê ter, ango depê tê tewandin. Tîpa ‘p’yê bi tîpa ‘f’yê guhertine û peyv bûye defter.”<sup>2</sup>

Her wiha, “Peyva dînî, ji hêla ramanwerên kurdan ve hatiye bikaranîn. Lewre ev peyv di kurdiya pehlewî de, ku jê re kurdiya kevn jî tê gotin, hatiye bikaranîn. Kurdên Medî di pirtûkên xwe de, li şûna peyva dînî, peyva ‘dên’ê bi kar anîne. Lê bi borîna demê re guherînê de çêbûye li şûna tîpa ‘ê’yê, tîpa ‘î’yê hatiye bikaranîn. Peyva ‘dên’ê jî ji peyva ‘dêhn’ê tê, ku ew jî wataya nêrîn û hişyariyê dide.”<sup>3</sup>

“Peywendiyên formsazdan an dariştina bêje û dirustkirina wan di zimanan de, dikare bêyî ku di navbera zimanan de peywendiyên xizmayetî û çandî hebin, hebe. Bo nimûne zimanevanan tiştên gelek girîng û bi hêz di navbera zimanê ingilîzî û çînî de destnîşan kirine, ji bo peyrevkirina rêyek hevbeş di dirustkirina bêjeyan de.”<sup>4</sup>

Her wiha “Di dema berawirdkirinê de, dibe pişt bi binemayên rêzimanî ve bê girêdan, çunke lêkçûna bêjeyan baweriyek tewaw nade ji bo nîjadek hevbeş, an xizmayetiya zimanan, çunke dibe ev lêkçûne bi riya alugorkirina bêjeyan dirust bibe, ku di heman demê de şêwazê bêjesazî û rêbazên wergirtinê ji zimanekê ji bo zimanek din degmen e, pir kêmtir e. Boye riya here baş ji bo berawirdkirinê; regên lêkeran û lêkçûna dengên di nav regan de ye.”<sup>5</sup>

Li gor van pênase û dabeşkirinên xizmayetî, çandî, formsazî, reg, deng û malbatên zimanî; ziman ji hev hatine cihêkirin. Zimanê kurdî jî wek zimanek

<sup>1</sup> h.ç.


<sup>2</sup> Ocek, Nezîr, *Edebiyata Kurdî*, Enqere, 2016, 19.

<sup>3</sup> h.ç., 51.

<sup>4</sup> Umer Qadir, 7.

<sup>5</sup> h.ç.

serbixwe, ser bi malbata Hîndo-Ewrûpî û beşa Hîndo-Êranî ye. Eger bê û bi hêlkarî bê nîşandan, wiha ye:



Eger hat û lêkolîn li ser ziman hat kirin, dibe bê zanîn, ziman ji komelek pêkhate, an komelek ji hevokan pêk tê. Wate “Syntaxis/hevoksazî, ew lêkolîne ye, bêje çawa di pêkhateya firêz û hevokê de bên rêzkirin.”<sup>1</sup> Zimanevana kurd, Kurdistan Mukiryani jî dibêje: “Hevok, di zimanekê de wek pêkhateyên bingehîn û serbixwe tên pejirandin.”<sup>2</sup> û jê vê pêkhateyê re; “Syntaxis/hevoksazî tê gotin, bêjeyek

<sup>1</sup> Umer Qadir, 14.

<sup>2</sup> BAŞKAN, *Linguistik Metodu (Mîtoda Lînguîstîkî)*, 115.



yunanî ye, tê wataya rêkkevîtin, rêkxistin û danandinê û her wiha cureyê rêkkevîtin, rêkxistin û yekgirtina bêjeyê di nav hevokê de vedikole.”<sup>1</sup>

Her di vî warî de lêkolerek din ê zimanê kurdî, dibêje: “Hevok, mezintirîn pêkhatiya rêzimana ziman e û di her zimanekê de jî, ji çend beşên bincî/bingehîn pêk tê. Her pêkhatiyek rêzimanî, eger bikare rolek girîng ê beşek bingehîn ê hevokê bigêre, wate firêzekê pêk tîne. Û hevoka here xwerû jî, ji du firêzan pêk tê. Firêza Navî û Firêza Lêkerî.”<sup>2</sup>

Wek hat rawekirin, ziman zanistek serbixwe ye, ji çend astan pêk tê. Ev astene jî; “Bi pê lêhûrbûn û şîrowekirina ziman, ji keresteyên serekî ta digehe qewareya guftûgokirinê, ji sê keresteyên serekî pêk tînin; ew jî, fonîm (phoneme), morfîm (morpheme) û hevoksazî (syntakx)”<sup>3</sup> ye.

Ew xebate taybete bi wan qertafên rêzimanî an pêkhatiyên morfosîntaksî ên wek morfîm di nav asta morfolojîyê de cî digirin û di nav asta hevoksazîyê de jî dibin xwedî erk û rol. Wate; “Di bêjeyê de, lêkolîna bihevrehatin an bihevrebûna form û watayên cur bi cur, di çêweyêk sîstematîk de.”<sup>4</sup> û her wiha niwandin an pîşandana erk û rola van formane di çêweya asta hevoksazîyê de. Boye, dê di vir de daneyên asta morfolojîyê (morfîm) ên di asta hevoksazîyê de dibin xwedî erk û rol bîhînsengandin û berawirdkirin.

## 1.2. MORFÎM

Morfîm, di nav ziman de pêkhatiyek serekî ye û xwediyê rolek serekî ye jî, boye vê yekê bala gelek zana û zimanewanan kêşaye û wan jî di vî warî de komelek bîr û boçûn derbirîne, wek; “Morfîm biçûktirîn pêkhatiya ziman e û wataya wê heye.”<sup>5</sup> an “Zanayên zanista morfolojîyê, navnîşanên curbicur bo morfîman peyda kirine û her yek ji wan jî, bi cureyekê rû û rûxsarê morfîman derdixin. Wek;

<sup>1</sup> Kurdistan Mukiryani, *Sîntaksî Ristey Sade le Zimanê Kurdî de (Hevoksaziya Hevoka Sade di Zimanê Kurdî de)*, Bexda, 1989, 5.

<sup>2</sup> Umêd Berzan Birzo, *Ristesazî – Dirustey Firêz û Riste le Zimanê Kurdî da (Hevoksazî – Pêkhatiya Firêz û Hevokê di Zimanê Kurdî de)*, Silêmanî, 2011, 12.

<sup>3</sup> Mihemed Emîn Hewramanî, *Seretayek le Fîlolojîy Zimanê Kurdî (Destpêkek di Fîlolojîya Zimanê Kurdî de)*, Bexda, 1973, 18.

<sup>4</sup> Mihemedî Mehwî, *Morfolojî û be Yekdaçûnê Pêkhatikanî Morfolojîy Kurdî (Morfolojî û bi Yekdaçûna Pêkhatiyên Zimanê Kurdî)*, Silêmanî, 2010, 1.

<sup>5</sup> Mihemed Merûf Fetah, *Zimanewanî*, Hewlêr, 1990, 81.

Blomfeld: ‘Morfîm, biçûktirîn parçeyê ziman ê watadar e.’, Norman Stêgberg: ‘Morfîm, kevintirîn parçeyê watadar ê ziman e...hwd.’<sup>1</sup>

Dîsa di vî warî de, “Zimanevan Katamba jî dibêje: Morfîm, biçûktirîn ciyawazî ye di formê bêjeyê de û di encama alugorbûna peywendiyek here biçûk de, di bêjeyê de, di wataya hevokê an pêkhatyek rêzimanî de, ciyawazî berpa dibe. Bi watayek din; veguhestina watayek cuda, erkek cuda û çemka(wata) rêzimanî, ji morfîmê re hatiye spartin.”<sup>2</sup> Her wiha di warê polînkirina cureyên morfîman de jî boçûnên ji hev cihê hene, lê wek Mihemed Emîn Hewramanî, dibêje: “Lê belê ew hemû li ser wataya morfîmê, li hev dikin.”<sup>3</sup>

Boye morfîm ji aliyê form, erk û rol ve, li gor zimanevanê kurd, Evrehmanê Hacî Marif, “Morfîmên Rîşeyî (Root Morpheme), Morfîm/Qertafên Wuşedarêj/Bêjesaz (Derivational Morpheme) û Morfîm/Qertafên Wuşegor/Rêzimanî (Inflexional Morpheme)”<sup>4</sup> sê cur in û li gor Şêrko Heme Emîn Qadir jî, “Li gor watayê: Serberst (free), Bend/Qertaf (bound); Li gor cih: Binaxe (base), Efêks/Qertaf (affixes): pêşgir (prefixes), navgir (infixes), paşgir (suffixes)”<sup>5</sup> du cur in. Lê di vir de tişta ku derdikeve hole ev e; morfîm yan azad e û xwediyê watayê ye, yan qertafî ye.

### 1.2.1. Morfîmên Azad

“Di ronana bêjeyê de ew pêkhatyên morfolojîk ên têne dîtin û bi tenya serê xwe wataya wan heye, jê re reg (morfîma azad) tê gotin.”<sup>6</sup> Zimanevanê kurd, Mihemed Emîn Hewramanî jî dibêje: “Morfîma Sere (root), ew morfîme ye, serbixwe wataya wê heye, wek; ciwan, şar, jîr...hwd.”<sup>7</sup>

<sup>1</sup>Mihemed Emîn Hewramanî, *Zarî Zimanî Kurdî le Terazûy Berawird de (Zaravayê Zimanê Kurdî di Terazûya Berawirdkariyê de)*, Bexda, 1981, 171.

<sup>2</sup> Fereydûn Ebdûl Berzencî - Ebûbekir Umer Qadir, “Kerese Morfosîntaksiyekan le Kurmanciy Nawerast û Kurmanciy Jorîn da (Qertafên Rêzimanî Di Kurmanciya Nawerast û Kurmanciya Jorîn de)”, (*Kovara Zanîngeha Silêmaniyê*), Silêmanî, 2010, 125.

<sup>3</sup> Hewramanî, *Zarî Zimanî Kurdî (Zaravayê Zimanê Kurdî)*, 171.

<sup>4</sup> Evrehmanê Hacî Marif, *Wuşe Ronan le Zimanî Kurdî da (Pêkhateya Bêjeyê di Zimanê Kurdî de)*, Hewlêr, 1987, 30.-31.-32.

<sup>5</sup> Şêrko Heme Emîn Qadir, *Morfîme Bende Lêksîkî û Rêzimanîyekan û Erkyan le Diyalektî Goran da (Morfîmên Bend ên Ferhengî û Rêzimanî û Peywira Wan di Zaravayên Goran de)*, (Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Silêmaniyê, Nehatiye Weşandin), Silêmanî, 2002, 18.-19.

<sup>6</sup> ERGÎN, 105.

<sup>7</sup> Hewramanî, *Fîlolojiy Zimanî Kurdî (Fîlolojiya Zimanê Kurdî)*, 111.

Her heman zimanewanê kurd dîsa dibêje: “Morffim, du cur in û curê yekemîn morffîma ‘sere’ ye ku di ingilîzî de jê re dibêjin, (root) û ew jî her wek me got serbixwe ye û di ferhengê de wataya wê heye û bi hîç şeweyekê nayê biçûktirkin.”<sup>1</sup>

Tiştê ku li vir bedî dibe û zimanewan li ser rêk dikevin ev e, morffîma azad, morffîmek tenha û serbixwe ye, wataya wê heye, di nav ferhengê de cih digre, nayê biçûktirkin, di hevokê de derdikeve û rol dibîne.

### 1.2.2. Morffîmên Qertafî

Morffîmên bend/qertafî, wek ji navê wan jî diyar e, bi pêkhatayek din ve tên nivîsîn û bi tenha serê xwe hîç erk û watayek wan nîn e û piştî ku di gel reg û binaxeyan de bi kar hatin, dibin xwediyê wata û erk û bo xwe nîrx û bihayekê bi dest dixin. Boye qertaf, ji aliyê zimanewanan ve li gor erk, wata û cih, bi ser çend polekan de hatine dabeşkirin; ji bo vê yekê zimanewan Mihemed Emîn Hewramanî dibêje: “Morffîma qertafî an (affixes), tenha bê wata ye, wek; (-tir), (-an), (-t),...hwd û em dikarin morffîmên bend ên zimanê kurdî bi vî şeweyî dabeş bikin: pêşbend, paşbend, navgir.”<sup>2</sup>

Her dîsa Mihemed Emîn Hewramanî di berhemek xwe a din de dibêje: “Morffîmên bend an efêks (affixes), ne ji aliyê rûxsar ve, ne jî ji aliyê mezin û dirêjbûnê ve nikarin watayek serbixwe bidin dest, lê belê gava li gel morffîmên ku di destpêka pêkhatayek watadar in de tên, watayek wan a rêzimanî heye û bi pê rûxsarê bêjeyan, yek ji wan serper e û dawiya bêjeyê dadixe û nahêle bêje qertafek din werbigire, di zanista ziman de ji vê yekê re (Inflectional) tê gotin û a din jî qertafek wisa ye, nikare dawiya bêjeyê dayêxe û qertafek an çend qertafên din jî dikarin li pey hev bêne dawiya bêjeyê û ji vê yekê re jî (Derivational) tê gotin.”<sup>3</sup>

Sebarek bi heman mijarê zimanewanê tirk Muharrem Ergîn jî morffîmên qertafî dike du beş û dibêje: “Morffîmên qertafî, du peywirên wan hene; yekem ên bi riya

<sup>1</sup> Hewramanî, *Zarî Zimanê Kurdî (Zaravayê Zimanê Kurdî)*, 172.-173.

<sup>2</sup> Hewramanî, *Fîlolojîy Zimanê Kurdî (Fîlolojîya Zimanê Kurdî)*, 111.

<sup>3</sup> Hewramanî, *Zarî Zimanê Kurdî (Zaravayê Zimanê Kurdî)*, 172.-173.-175.- 176.

reg/kokê binaxeyekê dadirêjin û ji wan re qertafên darêjraw/bêjesaz tê gotin; duyem, ên reg û binaxeyê çalak dikin û ji wan re jî qertafên wuşegor/rêzimanî, tê gotin.”<sup>1</sup>

Li gor van zanyariyane, morfîmên qertafî du cor in: Cureyek wan ew e; diçe ser morfîmek watar, wate morfîma azad/serbixwe û ji vê morfîmê bêjeyek nû, bi watayek nû dirust dike. Bi mercekê, peywendiya bêjeya nû ji aliyê watayê ve li gel reg/binaxe an binçîneya bêjeya pêştir de bimîne. Her wiha di heman demê de, ji ber guherîna wataya bêjeyê, dikare pola bêjeyê jî ji polekê bo polek din biguhere an diguhere.

Bo nimûne bêjeya (asin) di nav pola nav de cih digire, dema qertafa bêjesaz a |-ger| wergirt, dibe (asinger) û di encama dariştinê de tê dîtîn, pola wê her pola nav e; lê belê bêjeya (ciwan) ku li ser pola rengdêran e, dema qertafa darêjraw |-î| wergirt, dibe (ciwanî) û di heman demê de pola wê diguhere û diçe di nav pola nav de.

Her wiha tê dîtîn di encama dariştinê de ev bêjeyene ji aliyê wata û rûxsarê ve bi tewawî ji regên xwe nepiçyane û peywendiya wan berdewam e.

Zanayên ziman morfîmên bend; wek “morfîmên wişedarêj/bêjesaz (derivational) û morfîmên wuşegor/rêzimanî (inflectional) dabeş dikin.”<sup>2</sup> Her wiha li gor Muharrem Ergîn jî; “Qertaf, ev yeke ye di nav pêkhatiya bêjeyê de cî digre û bi tenya serê xwe bê wata ye û nayê bikaranîn. Bi mercekê , eger bi bêjeyan ve bîn nivîsîn, di warê watayê de dibin xwediyê erk û rolê.”<sup>3</sup> û her wiha ev morfîmene ku ji morfîmên bêjesaz û morfîmên rêzimanî pêk tînin, xwediyê hinek taybetmendiyên hevpar in, ew jî bi giştî ev in:

“- Hîç demekê yek, an çend qertafek nikarin bi hev re peyvekê dirust bikin.

- Hemû ev qertafene morfîm in û di dema polînkirinê de, ku eger li gor darêjrawiyê be, nabe bîn piştguhkirin.

- Li hember qertafan di mêjîyê mirov de wêneyek nîn e, wate li hember heyberekê ranawestî, li derweyî ziman in û ji ber erk û rolên xwe tînin zanîn û bi tenha serê xwe tu watayek wan nîn e.

---

<sup>1</sup> ERGÎN, 122.

<sup>2</sup> Umer Qadir, 21.

<sup>3</sup> ERGÎN, 114.

- Qertaf, bi wê yekê tèn cudakirin, ku serbixwe nîn in, morffimên bend in û ji ber wê hindê jî ji bo hevokên pirsyarê, nabin bersiv.

- Qertaf, bi giştî peywira darijtinê dibînin, li du astên rêzimanî yên ciyawaz de.

- Qertaf, bi giştî diçine nav polên daxistî yên ziman de û sînorê wan hatiye diyarkirin û êdî hejmara wan nayê zêdekirin.

- Qertaf, peyvên serbixwe bûn û di encama guhertina jîyan û pêşkevtina ziman de, guherîn û ev formê niha wergirtin. Boye dema diçine ser peyvan, wataya xwe ya pêşiyê didinê.”<sup>1</sup>

Her çend e di vir de taybetmendiyên qertafên bêjesaz ên bêjeyên nû dirust dikin û ên rêzimanî bi hev re hatibine nivîsîn jî, dê qala pol, erk û taybetmendiyên qertafên bêjesaz, neyê kirin, ji ber, mijara di vê xebatê de mebest e, qertafên rêzimanî ên lêkeran in. Ew qertafene wek pêkheteyên morfolojîk ên hevoksaziyê, ruxsarê bêjeyan bedî dikin, bi mebesta diyarkirina aliyê wan ê rêzimanî, bêyî ku wata an pola wan biguherin.

#### **a. Qertafên Rêzimanî**

Pêkhatyên rêzimanî, ku wek “Qertafên rêzimanî tèn binavkirin, peyvîrên peywendiyên rêzimanî nîşan didin. Wate aliyê rêzimanî ê wek mêjer, dem, dox...hwd.” Her wiha “Diyardeyên morfolojîk ên hevoksaziyê ne û bi mebesta diyarkirina barê rêzimanî, amaje bi şêwey bêjeyê dikin û wata an pola bêjeyê naguherin.”

Di vê xebatê de her çend e qertafên rêzimanî ên diçin ser lêkeran tèn rawekirin, çunke qertafên rêzimanî di nav xwe de wek qertafên rêzimanî ên diçin ser navan û ên diçin ser lêkeran, dabeş dibin; dibe bê zanîn taybetmendiyên wan hevbeş in, tenha erk û rolên wan ji hev cihê ne û ew jî xwediyê komelek taybetmendiyên in, wek;

---

<sup>1</sup> Şêrko Heme Emîn, 23.

“- Ew qertafên rêzimanî ên diçin ser kok û binaxeyên nav û lêkeran bi hemû avayekê ji hev cihê ne û erk û rolên wan jî bi hîç şêweyekê li hev naçin. Çunke kategoriyên wan ên gramatîkî ji hev cihê ne.” Bo nimûne di zimanê kurdî de kategoriyên gramatîkî ên navan, veqetandek, mêjer, guherbarî, tewang û zayend e; a lêkeran jî, rawe yanî dem, espêkt, kes û mêjer e.

“-Bêje, di hevokê de dibe xwediyê peywendiyên diyar û aşkera û her wiha taybetmendiyan wê yên rêzimanî derdikevin holê. Taybetmendiyan rêzimanî ên bêjeyê jî, peywendî bi formên ciyawaz ên heman bêjeyê ve hene.

-Bi hîç şêweyekê pola bêjeyê naguherin, wate tenha formê bêjeyê diguherin, ji bo bikare di nav hevokê de cih bigre. Boye binaxe di kîjan polê de be, her di heman pola xwe de dimîne.”

Ji ber ku qertafên rêzimanî/wuşegor nikarin polên bêjeyan biguherin, di vî warî de jî ji qertafên wuşedarêj/bêjesaz cihê dibin, çunke qertafên bêjesaz dikarin polên bêjeyan biguherin.

“- Formê heman bêjeyê ê qertaf wergirtî û ê qertaf wernegirtî, nikare di dirusteyekê de, di heman astê de cihê hev bigre, çunke her qertafekê nirx û bihayê xwe ê rêzimanî heye û ew ji hev cuda ne.

- Taybetmendiyeke din a qertafên sîntaksî, li berewajî qertafên bêjesaz ev e; dikarin paş û pêşiya bêjeyê dayêxin, bi taybetî di bêjeyek aloz de, ku her du cure qertafên (bêjesaz-rêzimanî) werbigire.

- Qertafên rêzimanî, di çêweya firez û hevokê de, pêkhatiyên çalakirina peywendiyên bêjeyan ên diyar û aşkera ne, ji vê hindê ye rojane di dema axaftinê de, li gor qertafên bêjesaz zêdetir dubare dibin, wate bi kar tên.

- Qertafên rêzimanî, li gor kurt û dirêjbûna firêzên navî cih diguherin, di vî warî de berewajî qertafên bêjesaz in, çunke qertafên bêjesaz ji binaxeyên xwe dûr nakevin.”

Her wiha qertafên rêzimanî/wuşegor ji aliyê zimanevanan ve tên polînkirin, wek; “Bêjeyên tewandî ji aliyê tewandinê ve dibin du beş:

- Nîşaneyên wergirtinê, nîşaneyên hilgirtinê, bêjeyên tewandî (declinable words),

- Bêjeyên gerdankirî (conjugated words)”

Di vê tiwêjîneweyê de, çunke dê du zarava, nek du zimanên ciya di asta morfîmên rêzimanî ên lêkaran de bèn berawirdkirin, boye dibe pêş berawirdkirina wan bizanin têgeha zarava an diyalekt çî ye, sedemên dirustbûna wan, lêkçûn û ciyawaziyên wan, bîr û rayên zanayan di vî warî de çî ne, her wiha lêkoler û zanayên zimanê kurdî ji bo zaravayên kurdî ta niha çî gotine û zaravayên kurdî çawa polînkirine, bèn zanîn.

### 1.3. ZAR

Wek Ferdinand SAUSSURE jî dibêje: “Ziman peyman e, li hevkirin e.”<sup>1</sup> Her dîsa heman zana dibêje: “Ziman hebûna xwe deyndarê peymanekê ye, ku di navbera endamên girseyê de hatiye kirin.”<sup>2</sup>

Lê belê gelek caran ev peyman an li hevkirinene, li ber hin sedemên derekî û navekî di astek rêjeyî de ji yektir cihê dibin û ji wan re; zar, zarava, dialect an lehçe tê gotin. “Zanista ziman wek zanistek giştîgîr, ji bilî astên pêkhateyên ziman; dengsazî, bêjesazî, hevoksazî, ristesazî û watasazî, bi ser çend ast û polên din de jî hatiye dabeşkirin. Wek; derûnnasî, civaknasî, cografyayî...hwd û her yek ji van polan jî wek zanistek serbixwe tê pesendkirin. Zanista zimanê derûnnasî, zanista zimanê civaknasî, zanista zimanê cografyayî. Di zanista zimanê cografyayî de, ji bilî diyarîkirina sînorên zimanê bikar tê, her gel û neteweyekê aliyek din jî ê ziman, bi navê diyalektolojî, girîngî pê daye û wek zanista zaravayan, an zarnasî bi nav kiriye.”<sup>3</sup>

“Têgeha diyalekt, di bingeha xwe de, têgehek latînî ye û mebest ji diyalektê jî, ew cudahiyên di nav yek cur ziman de hene ye. Wek cudahiyên rêzimanî, aliyê dirustbûna peyvên û şêwazê derbirîna wan.”<sup>4</sup>

Boçûnek din jî heye di warê ziman û zaravayan de û dibêje: “Bi riya metoda paşda-vegerînê, di hin zimanên cur bi cur de dubare avakirina kok-şêwe’yan, tenha

<sup>1</sup> SAUSSURE, 39.

<sup>2</sup> h.ç., 44.

<sup>3</sup> Berzencî - Umer Qadir, 123.

<sup>4</sup> Selam Nawxoş, – Nerîman Xoşnaw, *Zimanewanî, IV, V, VI, VII*, Hewlêr, 2010, 171.

bi wergirtina aliyên wan ên hevbeş hatine bidestxistin. Lê belê ev şêweyene hîç demekê vê yekê naselmênin, zimanê rîşeyî an bingehîn her tim ji şêweyên resen pêk tê. Berewajî vê yekê zimanê hînd-ewrûpî ê ku wek zimanê bingehîn tê pejirandin, dibe ji zaravayên ji hev nêzîk pêk hatibe û ev yeke jî tiştek mentiqî ye. Bi rastî jî dema ku bi riya metoda dubare avakirinê, şêweyên zimanê rîşeyî tînen bidestxistin, gelek kêmasî ser hildidin. Ev yeke jî her di serî de nîşan dide, zimanê rîşeyî wisa zimanek hin pak û bê zarava nîn e, tenanet amaje bi vê dike, ji zaravayan ava bibe. Ew yeke jî nîşan dide cihêbûn û dirustbûna zaravayan her di dema zimanê rîşeyî de jî hebûye.”<sup>1</sup>

Wek yekem car û kes li ser zaravayan zanayê Îtalî, Dante kar kiriye û “Di sala 1303’yan de di vî warî de pirtûkek nivîsiye û li hember hişkiya zimanê latînî ê klasîk, zîndeberiya zimanê îtalî û zaravayên wê parastîye. Dante bi şêweyek narastewxo amaje bi hin xalên girîng ên lînguîstîkî jî daye. Dante, nêzîkî 14 zaravayên îtalî bi nimûneyan bi şêweyek balkêş ji hev cihê kirine. Her wiha diyarkiriye, kîjan zarava di kîjan grubê de cî digre, bi vî awayî eger pêngavek biçûk be jî, di warê zimanê berawirkarî de xebatek serkevtî cêbecê kiriye.”<sup>2</sup>

Her wiha, li gor zimanewanê bi nav û deng, Ferdînan SAUSSURE jî; “Di warê zaravayan de boçûnek giştgîr heye û li gor vê boçûnê zarava ji hemû aliyan ve sînoren wan hatine xêzkirin û di nexşeyê de li ber teniştayektir in, lê belê di qadên ji hev cuda de cih digirin. Her wiha wisa tê sêwirîn, sedased wek cureyên zimanên (a, b, c, d, hwd) serbixwe ne. Lê belê veguherîna siruştî a zaravayan encamek pir cihê dide dest. Boye zaravayê siruştî nîn e, tenha taybetmendiyên siruştî ên zaravayî hene, an çend şiwên hen e hind jî zarava hen e. Wate sînoren siruştî ên zaravayan nîn in.”<sup>3</sup>

Her wiha “zimanê kurdî jî wek gelek zimanên din ên cîhanê, xwediyê çend zarava(diyalekt)yekê ye. Peydabûna van zaravayane jî ji bo çend sedemên taybet vedigere, ku bûne bingeha serhildan û peydabûna zaravayên ciya ciya di zimanê

<sup>1</sup> BAŞKAN, *Linguistik Metodu (Metoda Lînguîstîkî)*, 69.-70.

<sup>2</sup> h.ç., 33.

<sup>3</sup> SAUSSURE, 284.-285.



kurdî de.”<sup>1</sup> Her wiha dibe bê zanîn, sedemên dirustbûna zaravayan, ji zimanekê bo zimanek din, ji hev cihê dibin.

### 1.3.1. Sedemên Dirustbûna Zaravayan

Wek li serê jî hatiye arastekirin, hemû ziman xwediyê zarava an zaravayan in û sedemên dirustbûna zaravayan ji zimanekê bo zimanek din ji hev cihê ne û ev sedemene jî ji aliyê zimanevanan ve bi gelemperî wiha hatine destnîşankirin: “Taybetiya Kesî, Taybetiya Fonetîkî, Taybetiya Cografyayî, Taybetiya Abûrî, Taybetiya Ramyarî, Taybetiya Mêjûyî, Taybetiya Rewşenbîrî û her wiha ew guhertinên sirûştî ên di ziman de rû didin.”<sup>2</sup>

Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanan e, ku xwediyê çend zaravayekê ye, boye gelek lêkoler, zana, zimanevan, dîrokna, civakna, wêjenas û erdnîgarînasên biyanî û xwemalî li ser zimanê kurdî û zaravayên wî xebitîne û hewl dane wî zimanî û zaravayên wî, ji aliyê rêziman ve rawe bikin û sedemên dirustbûna zaravayan di wî zimanî de, diyar bikin.

Bo yekem car “Rêzimana Kurdî di sala 1787’an de ji aliyê zimanevanê îtalî P. Maurizio Garzon ve hatiye nivîsîn.”<sup>3</sup> Paşan hin lêkoler û zimanevanên din ên biyanî jî li ser kurdî xebitîne, wek; “Di salên (1836-1837)’an de G. Gîwrînlî, çend gotarek di derbarê kurd û diyalektên kurdî de bilav kirin. Lêkolerê rûsî Chodzko li ser kurdiya Silêmaniyê rêzimanek kurt nivîsî û bilav kir. Di salên (1857-1858)’an de Lerch li ser rêzimana kurdî sê pirtûk derxistin. F. Müller li ser zaravayê zazakî (1855) û li ser zaravayê kurmançî (1864) du berhem nivîsîne. Aleksandr Jaba li ser zimanê kurdî ferhengê amade kiriye (1879). Ferdînannd Jusît, di sala 1880’yan de berhema bi navê ‘Rêzimana Kurdî’ derxist. Her wiha S.A. Rcha (1880), Socin (1898), Hugo Makas (1900), Maksimilyan Bittner (1913), Oskarman, Karl Hadank, Majarson, Soane, L. O. Fossum, Luhon Mackenzie ... hwd û kesên xwemalî ên wek; Tewfîq Wehbî, Eladîn Secadî, Celadet Elî Bedirxan, Kurdojev (Qanatê Kurdo),

<sup>1</sup> Kamîl Hesên Besîr – Kurdistan Mukiryanî – Sadiq Bihaeddin Amêdî – Heme Emîn Hewramî, *Zare Kurdiyekan (Zaravayên Kurdî)*, Weşanên Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr, 1987, 4.

<sup>2</sup> Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî, *Zare Kurdiyekan (Zaravayên Kurdî)*, Hewlêr, 2011, 19.-18.

<sup>3</sup> K. K. Kurdojev, *Rêzimanê Kurdî be Kerestey Diyalêktî Kirmançî û Soranî (Rêzimana Kurdî bi Pêkhateyên Zaravayên Kurmançî û Soranî)*, (Wer.: Kurdistan Mukiryanî), Hewlêr, 1982, 8.

Bakoyev, Nûrfî Elî Emîn, Cegerxwîn... hwd.”<sup>1</sup> Li ser zimanê kurdî lêkolîn kirine û di vî warî de pirtûk, gotar û berhem bilav kirine.

Di encama van gotin, amajepêdan û destnîşankirinane de, bo me derdikeve ku asayî ye zimanê kurdî jî wek her zimanek din xwediyê çend zaravayekî ciyawaz be. Berpabûn û dirustbûna zaravayan di nav ziman de, li gor şert û mercên wî zimanî vedigere bo çend sedemên ciyawaz. Tiştê di vir de bo me girîng e ev e, em bizanin ka ew şert û mercên ku di zimanê kurdî de bûne sedema dirustbûna zar û zaravayan, çi ne?

Gelek ji zimanevan, rewşenbîr, lêkoler, dîroknas, erdnîgarînas û wêjenasên zimanê kurdî, her du sedemên siyasî, cografî wek du sedemên bingehîn pesend dikin û dibêjin: “Du sedemên serekî hen bo dirustbûna zaravayan di zimanê kurdî de, ew jî pêk tên ji; sedemên cografî û siyasî.”<sup>2</sup>

#### **a. Sedemên Ramyarî**

Dîroknasê kurd Eladîn Secadî, dibêje: “Pêştir, ji alîgirên her olekê re digotin; millet, wek milletê îslam, milletê gavûr, milletê cihû. Ev milletêne eger xwediyê ziman û rewîştên cuda jî ban ji ber, alîgirên heman olê bûn, wek yek millet dihatin pejirandin. Paşan zanayên ewrûpî ketnê ser wê baweriyê, ku millet ew e; xwediyê ziman, xwîn an nîjadekî serbixwe be. Ji bo heman watayê bêjeya (Nation-Nasyon) danan cihê bêjeya (milet)î. Di vê dawiyê de hinektir pêş de çûn û gotin; ji bo heman watayê tenha ziman, xwîn an nîjad têrê nake û dibe rewîşt, edet, şadî, şîwen(şîn), xem û xefet, xweşî, karûbarên civakî û binemaleyî jî di gel de bin. Ê ji bo vê watayê jî, bêjeya (qewm) danan.”<sup>3</sup> Her di berdewamiya axaftina xwe de Eladîn Secadî dibêje: “Ku wisa lêhat, her komek mirovan, ku ji aliyê rewîşt, regez û ziman ve têkelfî yektir bûn, evne ji xwe re dibin qewmek û ji komên din ên mirovan cihê dibin. Li vir de bêyî ku em li pey belgeyan bigerin, bi aşkira em dizanin qewmek heye û navê wî Kurd e. Ji bo vê yekê jî, baştirîn wêne ev e; bi yek ziman diaxivin, di destpêka jiyane

<sup>1</sup> Hewramanî, *Zarî Zimanî Kurdî (Zaravayê Zimanê Kurdî)*, 52. - 67.

<sup>2</sup> Dizeyî, 19.

<sup>3</sup> Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî (Dîroka Wêjeya Kurdî)*, Çapa 2., Bexda, 1971, 15.

ta niha hevbeş û şîrk in; di şadî, sirûd, lavahîkirin, şîn, şer, hûnandina helbestên civakî, geryan, rabûn û rûniştin, dan û standinên civakî de.”<sup>1</sup>

Lê belê li gel van gotin û zanyariyan jî, dîsa li gor neyarên gelê kurd neteweyek bi navê kurd nîn e, zimanek bi navê zimanê kurdî nîn e û tenanet cihek bi navê Kurdistan jî nîn e û ji bo vê yekê jî komelek teoriyên berela, pûç û li der zanist û eql tînin meydanê û dibêjin: “Di devera rûbarê Yenîsey hinek nivîsên bi lîmet ên aîdî tirkan ketine dest û hatine xwandin. Di vê herêmê de mîrnişînek kurd hebû, ji reçelesa ‘Îskît-Saka’yan bû û li gel ‘Altı-Oğuz’ an cîran bû. Cihê vê mînişînê dikeve aliyê çepê ê rubarê Elegeşê ê ku tîkelfî çemê Ulu-Kemê ye û ser bi rûbarê Yenîseyê ye. Li vir nivîstekek heye bi navê Nivîsteka Elegeş. Kurd, ku ji bakûr ve li gel Gok-Tirkan cîran bûn, zimanê wan tirkiya resen bû û nivîsa wan jî nivîsa Yenîseyî a ji ya Gok-Tirkan kevintir bû.”<sup>2</sup>

Her dîsa Nazmî Sevgen, di cihek din de jî di warê zimanê kurdî de, dibêje: “Kurdan, ji ber sedemên devrûber ên bi zorê, ji farisî û erebî gotin anîne nav zimanê xwe ê tirkî de û zimanê xwe ê zikmakî winda kirine. Zimanê kurdî zimanek resen nîn e. Zimanek e, ji komêk bêjeyên tîkel û tevlihev pêk tê.”<sup>3</sup>

Di warê van gotin û tîoriyên pûç ên neyarên kurdan de, zimanewanê kurd Hogir Mehmûd Ferec dibêje: “Dewletên dagîrker ên Kurdistanê, dirêjahiya dîroka bi dagîrkirina kurdan hewl dane, kesê kurd piştguh bixin, di warê neteweya wî, şîyana yekîtibûn, yekzimanî û şîyana dewletbûnê de li bal wî gumanê dirust bikin. Tenanet hewl dane peyvendîkirin û danûstandinên mirovê kurd li gel kesên din wek kirdeyek naasayî pişan bidin û serera jî li ser hebûna reçekek û bingeha kurdan gumanê dirust bikin.”<sup>4</sup>

Lê belê ji ber ku; “Kurdistanê bi dirêjahiya mêjûyê yekgirtinek siyasî bi xwe ve nedîtiye ku hemû deverên Kurdistanê li xwe bigre, vê rewşê jî wisa kiriye ku zimanê kurdî nebe zimanek yekgirtî û ber bi firezarî ve biçê. Ew dewlet û mînişînên ku damezran jî nekarîn dest li ser hemû Kurdistanê de bikêşin û boye her yekê

<sup>1</sup> h.ç., 15.-16.

<sup>2</sup> SEVGEN, Nazmî, *Doğu'da Kürt Sorunu (Di Rojhelat de Pirsgirêka Kurd)*, (Amd:Mesut Özcan), Enqere, 2003, 12.

<sup>3</sup> h.ç., 21.

<sup>4</sup> Hogir Mehmûd Ferec, *Netewey Kurd û Hêle Terîbekanî Ziman û Hikumet*, Kovara Zanîngeha Raperîn, Çapxaneya Bînayî, Silêmanî, 2014, 5.

zimanê devera xwe kir zimanê fermî û ji ber vê yekê jî zimanek yekgirtî dirust nebû.”<sup>1</sup> Her wiha; “Dabeşkirina Kurdistanê û hebûna çend zaravayekê, ewlehî û pergala neteweya zimanê kurdî pêrgî çendeha kêşe û girîftên stratejîk kiriye.”<sup>2</sup> û di encama vê yekê de, di çêweya siyasî de ji bo kurdan zimanek standart dirust nebûye û tenanet zar û zaravayên zimanê kurdî zêdetir bûne û zeqtir û qewîtir bûne.

Her wiha; “Bêgûman vê parçe parçebûnê jî nehêlaye kelepûrek wêjeyî a hevbeş biruxse. Her çend e hindêk dewlet û mîrnişînên serbixwe û nîv-serbixwe bi taybetî di sedsalên îslamê de di Kurdistanê de peyda bûn, dîsa jî zimanekî yekgirtî ê kurdî berpa nekirin û tenanet zêdetir diyalekt dirust kirin û ji hev cihê kirin. Çünke ew mîrnişînên li vê deverê û li wê deverê dirust dibûn her yekê girîngî dida bi zaravayê herêma xwe. Lê belê dîsa jî sînorekî wisa zaravayên kurdî bi temamî ji hev cihê bike, dirust nebû.”<sup>3</sup>

### **b. Sedemên Sirûştî**

Sedemek din jî erdnîgariya Kurdistanê ye, ku rêxweşker e ji bo dirustbûna zaravayan di zimanê kurdî de, boye Zimanevanê kurd Fuad Heme Xurşîd dibêje: “Xaka Kurdistanê xwediyê şert û mercên asteng, hezaran çiya û dolên bê rê û ban, hevraz û lêjiyên bê hejmar, çem û rûbarên coş û xuroş, zivistanên pir bi sir û seqem e, ji wê hindê, gelek ji xelk û êlên wê ji hev dûr ketine û peywendiyên hozên wê kêm bûne. Boye di encama jihevdaşîrîn û têkelînekirina li gel yektir de, hêdî hêdî bandor li ser şeweyê axaftina wan kiriye û bûye sedema dirustbûna şewazê axaftinên ji hev cihê cihê.”<sup>4</sup>

Fuad Heme Xurşîd, her di berdewamiya nivîsa xwe de dîsa dibêje: “Her çende cografyaya Kurdistanê bû sedema dirustbûna firezarî di zimanê kurdî de, lê di heman demê de bû perjanek jî li hember bêje û gotinên zimanên biyanî û nehişt bandorê li kurdî bikin û zimanê kurdî têkî biden û kurdî parast.”<sup>5</sup>

<sup>1</sup> Dizeyî, 19.

<sup>2</sup> Selam Nawxoş-Nerîman Xoşnaw, *Zimanevanî*, VIII, Hewlêr, 2011, 146.

<sup>3</sup> Fuad Heme Xurşîd, *Zimanî Kurdî û Diyalektanî – Şikirdineweyek Cogrfayayî (Zimanê Kurdî û Zaravayên Wê – Dahûrandîna Erdnîgarî)*, Silêmanî, 2008, 43.-44.

<sup>4</sup> h.ç., 42.

<sup>5</sup> h.ç.

### c. Sedemên Dînî

Dîn an ol; “Wek beşekî girîng a kelepûrî, kiltûrî di kêşeyên henûkeyî de rolek, dewrek girîng dibîne, çunke gelek ji wan zimanên ku ol pê peya bûne, rolek girîng ditine di pêşveçûn, geşekirin û yekîtiya neteweyan de. Bo nimûne; bi riya ola Îslamê, zimanê erebî şîya bibe zimanek yekgirtî. Her wiha ji ber ku Quran bi şêwazê axaftina Qureyşî peyabû, her ew şêwaze axaftine jî bû zimanê standard ê erebî.”<sup>1</sup>

Lêkoler û wêjenasek din ê kurd, Feqî Huseyn Sağniç, di warê pert û belavbûn û dirûstbûna fire zarî di zimanê kurdî de, dibêje: “Kurdan bi navê ‘zimanê pehlewî’ zimanek sazandibûn, ku ji hezar salan jor bibû zimanê dûgelan. Heta di navekê re bû zimanê Dûgela Emewiyî jî. Bi vî avayî û bêzarava, kurdan di nav xwe de yekîtiya zimên û çandê jî pêk anîbûn. Vê rewşa pîroz heta derkevtina îslamiyetê domand. Piştî derkevtina îslamiyetê û damezrandina dûgelan, ji bilî kurdên rojhilatê Kurdistanê, yê din ji ber zordarî û dagîrkeriya ereban ji naçarî ji gund û bajarên xwe derketin, şehrezaya xwe a kevnare terikandin û ketine gelî û çiyayên asê. Ji ber van sedeman, ji nû ve koçerî, şivanî û eşîretî dest pê kir. Bi vî tenê jî ranewestiya, yekîtiya zimanê kurdî herifand û di hûndirê wê de kire çar parçe.”<sup>2</sup>

Di encama van hokarane de, ku bûn sedema let letbûn û dirustbûna fire zarî di zimanê kurdî de, vî carê jî li cem mêjûnûs, zimanewan û lêkolerên zimanê kurdî, di warê şêwazê polînkirina zaravayên zimanê kurdî de çendîn bîr û boçûnên cuda peyda bûn û bo cara yekem Şerefxanê Bedlîsî, ku mîrê bajarê Bedlîs e û mêjûnûsekî mezin ê kurd e, di pirtûka xwe ya bi navê (Şerefname-1596) a ku di derheqê dîroka gele kurd de ye, nivîsiye û dibêje: “Ciwat û eşîretên kurdan, ji aliyê ziman, kevneşopî û rewşa civakî ve di ser çar beşên mezin de dabeş dibin:

Beşa yekem, kurmanc;

Beşa duyem, lor;

Beşa sêyem, kelhûr;

Beşa çarem, goran.”<sup>3</sup>

<sup>1</sup> Mihabad Kamîl Ebdula, ..... (carê nehatiye bilakirin), 23.

<sup>2</sup> SAĞNİÇ, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, 2002, 34.-35.

<sup>3</sup> Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname – Kürt Tarihi (Şerefname – Dîroka Kurdan)*, (Wer.: Mehmet Emin Bozarslan), Çapa 3., Stenbol, 2006, 19.

Lêkolerê ziman û kelepûra kurdî Mackenzie dibêje: “Kurdan nivî kurmancî li seranserê Kurdistanê bilav kirine, pêdawîstiya civakî û zimannasî bûye sedema vê bilav bûnê. Çünke şeweyê kurmancî ji hemû şeweyên din berbilavtir bûye û dabeş dibe ser du beşan: Kirmanciya Bakûrî (Beyazîdî, Hekarî, Botanî, Aştî...); Kirmanciya Başûrî (Sorani, Mukrî, Suleymanî, Sineyî...); Kirmaşanî (Kelhûrî, Lûrî, Piştkuhî...)”<sup>1</sup>

Her wiha zimanevanê kurd Mîr Celadet Bedir-Xan jî di wî warî de çar zaravayan destnîşan dike, wek; “Zarê kurmancî, ku wek zaraveyê bakûr tê zanîn, zarê baba kurdî, ku wek zaravayê soranî tê zanîn, zaraveyê dumilî/zaza, ku li devera Dêrsîm û Sîweregê bi vî zaravayî tê axaftin û zarê goranî, ku ji aliyê ehlê heq ve pê tê axaftin.”<sup>2</sup>

Lêkoler û zimanevanê kurd, Fuad Heme Xurşîd jî, zaravayên zimanê kurdî bi wî awayî dabeş dike: “Diyalekta kurmaciya bakûr, diyalekta kurmanciya nawerast (Sorani-Mukiryani), diyalekta kurmanciya başûr(Lûrî), diyalekta goran (Hewramî, Zazakî).”<sup>3</sup>

Her wiha “Tewfîq Wehbî jî di pirtûka xwe a bi navê Eşkewtekey Gonok û kovara Peyam de diyalektên zimanê kurdî wiha dabeş dike:

#### 1. Kirmancî

- Kirmanciya Bakûrî : (Bazîdî, Botanî, Aştayî, Hekar, Badînanî)

- Kirmanciya Başûrî: (Mukrî, Soranî, Suleymanî, Sineyî)

#### 2. Lurî : (Bextiayrî, Lekî, Feylî, Kelhûrî, Mamesanî)

#### 3. Goran: (Bacelanî, Kakeyî, Zengene, Hewramî)

#### 4. Zaza.”<sup>4</sup>

Em dikarin di warê heman mijarê de çendeha bîr û boçûnên din jî destnîşan bikin û binivîsin, ku ji aliyê şarezayên zimanê kurdî ve hatine gotin û nivîsîn. Ev

<sup>1</sup> MACKENZIE, Luhon, *Bineçekey Kurdan û Binçîney Zimanî Kurdî (Bingeha Kurdan û Bingeha Zimanê Kurdî)*, (Amd.: Tewfîq Wehbî – W.:Taha Feyzî Zade), ?, 20.

<sup>2</sup> BEDIR-XAN, Mîr Celadet – LESCOT, Roger, *Kürtçe Dilbilgisi-Kurmancî (Rêzimana Kurdî-Kurmancî)*, Çapa 3., 1991, 9.

<sup>3</sup> Xurşîd, 51.-54.- 55.- 65.

<sup>4</sup> Selam Nawxoş - Xoşnaw, *Zimanevanî*, IV, V, VI, VII, 176.

rewşe jî vê yekê bedî dike, sebareet bi şêwazê polînkirina zaravayên kurdî jî, di navbera lêkoler û zimanewanên zimanê kurdî de lihevkiyên an yekîtiyên nîn e. Bi rastî hebûna hinde polînkirinên cuda cuda û bîr û rayên ciyawaz, bûye sedema alozî, serşêwandin û serqalkirina gelê kurd û ta ku kêşeyê çareser bike, mezintir û aloztir kiriye. Boye, nebûna zimanek standard û dirustbûna zaravayan, di encama sedemên li serê hatine nivîsîn de, li pey xwe jihev cudabûn û ciyawazîbûn anî, ku di çêweya form û pêkhatiyên astên ziman (dengsazî, wuşesazî/bêjesazî, ristesazî/hevoksazî) de berpa bibe.

Lê belê li gel van kêmasî û bîr û boçûnên cihê cihê jî dibe bê zanîn: “Rastî yek e û tenha tê pejirandin an lasayîkirin.”<sup>1</sup> Boye ew kesên her ji xwe ve di warê gelê kurd de dipeyivin, dibe bizanin neteweya kurd bi ziman û xak û kelepûra xwe rastiyeke e û wînda nabe û nayê windakirin û dibe wek rastiyeke bê pejirandin. Bi înkarkirin û ladanê kêşe çareser nabin. Rastî, ji holê ranabin û ji aliyê ruxsar ve jî bi darê zorê yekneteweyî dirust nabe. Her wek Johann Gotfried Heyder jî dibêje: “Hûn nikarin ji kêmeteweyên biçûk û mezin, yek netewe dirust bikin. Pêwîst e hemû kes xwe vebêje. Pergala dewletê nek li ser wekhevî û wek yekbûnek ideal, dibe li ser ciyawaziyan dabimezre.”<sup>2</sup>

---

<sup>1</sup> AKKUM, Musa, “Etnik Kûmeler Kûreselleşmeden Nasıl Etkilenecekler? (Goganîbûn dê Çawa Bandorê li Grubên Etnîkî Bike?)”, *Modernleşme ve Çok Kültürlülük (Modernîte û Pirçandî)*, Stenbol, 2001, 39.

<sup>2</sup> h.ç.

## BEŞA DUYEM

### 2. DI ZIMANÊ KURDÎ DE QERTAFÊN LÊKERAN

Zimanevanê kurd Mihemed Merûf Fetah dibêje: “Eger ziman wek pêrewekî zanistî, sedema ji yektir têgiheştinê be, wê demê derdikeve her gelekê ji bo xwe pêrewekî taybet heye û ev yeke jî wî ji gel û neteweyên din cuda dike. Ji ber vê hindê, di vir de jî derdikeve; ziman di civakek diyarkirî de kar dike.”<sup>1</sup>

Li gor vê pênase û boçûnê eve bedî dibe, zimanê kurdî jî xwediyê pêrewekî zanistî ye û her wiha xwediyê pêrewekî taybet e jî. Ev pêrewa taybet bi zimanê kurdî wî di civakek diyarkirî de ji zimanên din cihê û serbixwe dike.

Di ziman de pêkhatiya here mezin a serbixwe hevok e û “Hevok jî wek formek azad ji du beşên serekî pêk tê û ew jî ‘Firêza Navî û Firêza Lêkerî’ ye. Qertafên rêzimanî yên ku diçine ser firêza navî, wek pêkhatiyek rêzimanî, bêjeya ferhengî a serbixwe ji aliyê diyar-nasrawî, nediyar-nenasrawî, veqetandek-xistinepal, bangkirin-angêştîkirdinê ve, di çeweya hevoksaziyê de diyar dikin.

Firêza navî, dikare tenha navnîşanek be, yan pêkhatiyek serbixwe be û di nav hevokê de bête bikaranîn. Firêzên navî, dikarin taybet an giştî bin, navên giştî dikarin binavkirî yan nebinavkirî bin, yekjimar/tak yan pirjimar/ko bin, ev erkene wek peywir ji qertaf/morfosîntaksan re hatine şipartin.”<sup>2</sup>

Her wiha “Firêza navî, ew yeke ye, ji navekê pêk tê û ev nave dibe serê firêzê, wate serê firêza navî pêk tîne. Her wiha serê firêz dikare bi çend pêkhatiyên lavaz bête berfirehkirin û ev pêkhatene jî li pêş an li paş serê firêz tînin nivîsîn.”<sup>3</sup>

Ji ber ku di vê xabatê de mijara lêkolînê, firêza lêkerî û pêkhatiyên wê ne, dê bi şeweyek berfireh qala mijara firêza navî neyê kirin û di vir de jî dê babet dawî bibe.

Firêza Lêkerî, ew yeke ye; “Lêker di cihê here xwerû de bi yek lêkerê pêk tê. Ev beşa serekî a hevokê, pêwîst e wek ronankî çespaw a di nav hevokê de bête pejirandin. Firêza lêkerî jî, wek dirusteyek din a rastewxo a hevokê ye û di sazdana

<sup>1</sup> Merûf Fetah, 5.

<sup>2</sup> Berzencî - Umer Qadir, 123.-150.

<sup>3</sup> Birzo, 19.



hevokê de xwediyê rolek mezin û berbiçav e û ji cureyên firêzên din (navî, rengdêrî... hwd) girîngtir e, çünke bingehîn e û nayê ladan.”<sup>1</sup>

Ji ber, dê di her du zaravayan de qertafên rêzimanî ên diçine ser lêkeran bèn berawirdkirin, dibe bê zanîn di hemû zimanan de pola lêkeran wek polek serekî a bêjeyan xwediyê nirx û bihayekî bêhempa ye. Ji ber vê yekê, di warê vê polê de gelek lêkolîn hatine kirin û gelek bîr û boçûn hatine arastekirin, pêşkeşkirin.

Zimanê kurdî jî, yek ji wan zimanan e ku lêkolerên wê girîngî bi pola lêkeran daye û komelek lêkolîn li ser kirine û dibêjin: “Lêker, ew cure peyv e ku li gorî pîvanekê û bi avayekî rêzimanî kar, bizav, rewş û bûyînekê di demeke destnîşankirî de nîşan dide û di gel kirdeyê de di nava têkiliyê ahengî de ye û bi têkiliya kirdeyê re li gorî dem, rawe, avanî û rewşê tê gerdankirin (kişandin).”<sup>2</sup> û her wiha “Lêker xwedî wata ne, tewger û bûyeran li gor dem, kes û rêje(kîp)yan rawe dikin.”<sup>3</sup>, bi watayak din “Lêker, ev bêjeye ye bûyer û dem têdaye.”<sup>4</sup> û “Amaje bi bûyere, rewşek an proseyekê dide.”<sup>5</sup>

Her wiha ji bo bêjeya lêkerê di zimanê kurdî de, ji aliyê zimanevan û lêkolerên zimanê kurdî ve navên cur bi cur bikar hatine, wek; “Tewfîq Wehbî û Seyîd Sidqî: Fî’l, Şêx Mihemedî Xal û Merdux: Kirdar, Nûrî Elî Emîn: Ferman, Kurdoyêf: Fiêl, Reşîd Kurd: Pişk, Cegerxwên: Kirin, Celadet Bedirxan: Kirdêr.”<sup>6</sup> Lê belê niha êdî gelemperi du nav, an têgeh bikar tên. Di kurmanciya jorîn de (Lêker), di kurmanciya nawerast de, (Kirdar).

Wek di pênaseyên serî de jî derdikeve; lêker bêjeyek e ku bûyer, dem û kesan li xwe digire û her wiha xwedî watayekî ferhengî ye. Eger lêker bi morfîma sifir (Ø) jî dawî bibe, di heman demê de dikarê di wataya dilniyayîbûn an du dilî an fermanî de, rola hevokê bibîne. Di zimanê kurdî de qertafên rêzimanî ên lêkeran pêk tên ji; qertafên deman, qertafên xwastekî (dananî), qertafên daxwazî (fermanî), qertafên avaniyê; wate qertafên gerguhêz, negerguhêz, tebat û lêbatê û qertafên

<sup>1</sup> h.ç., 63.

<sup>2</sup> OCEK, Nezîr, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Stenbol, 2014, 208.

<sup>3</sup> YILDIRIM, Kadîr, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi Kurmancî Lehçesi (Bi Hîndarên Bingehîn û Nivîsaran Rêzimana Kurdî Kurmanciya Jorîn)*, Çapa 3., Stenbol, 2013., 39.

<sup>4</sup> Be Pêy Lêkolînewey Lîjney Ziman û Zanistekani le Korî Zanyariy Kurd, *Rêzimanî Axawtinî Kurdî (Rêzimana Axawtinê a Kurdî)*, Çapa 2., Hewlêr, 2011, 81.

<sup>5</sup> Xazî Elî Xurşîd, *Rêzimana Fermî*, Silêmanî, 2013, 76.

<sup>6</sup> Korî Zanyariy Kurd, 80.

çêbiwar, qertafên neyîniyê û qertafên cînavkên pêvebestî. Her wiha “lêker” tenê ji pola lêkerê pêk tê û wek nav dabeş nabe bo ser çend polek din.

## 2.1. DI KURMANCIYA JORÎN DE QERTAFÊN LÊKERAN

Di zimanê kurdî de, lêker wek polek serbixwe û serekî xwediyê cihekî girîng e. Boye dê di vir de, di asta morfolojîyê de qertafên rêzimanî ên diçin ser lêkeran dê bên vekolîn û dahûrandin. Ev qertafene jî pêk tên ji; qertafên deman, qertafên raweya xwastekî, qertafên raweya daxwazî/fermanî, qertafên avaniyê, qertafên neyîniyê û qertafên cînavkên pêvebestî.

### 2.1.1. Qertafên Deman

Di zimanê kurdî de, dem bi giştî bo ser du polan tên dabeşkirin; demên rabirdû/borî û demên ranebirdû. Di vir de, mebest jî demên borî û ranebirdû ev e: Eger hat û bûyer di pêş axaftinê de rû da be, eve dema borî ye, eger bûyer di dema axaftinê de an li piştî axaftin rû bide, ew jî dema ranebirdû ye.

Demên borî di zaravayê kurmanciya jorîn de bi alîkariya qertafên (-a, -d, -t, -û, -î) dirust dibin. Tiştê di vir de balkêş e, di zaravayê kurmanciya jorîn de qertafa (-d) jî holê rabûye. Lê di kurmanciya nawerast de her maye.

Qertafên deman wek pêkhateyên rêzimanî gava diçin ser lêkeran, dema bûyerê a rûdan û rûnedanê aşkîra dikin. Wek tê gotin: “Çemkê demê pitir bi qertafên bend ên kurt tên bilêvkirin.”<sup>1</sup> û “Li gor locîkê, dem dabeş dibin bi ser dema borî, dema niha û dema bê de, lê belê di gelek zimanan de dem di formê pêweberê de bi pê çemk û watayê dabeş dibe ser dema borî û dema niha, wate bo dema bê formeke taybet nîn e.”<sup>2</sup>

Her wiha li gor lêkolerek din ê zimanê kurdî; “Di kurdî de du cure rayên lêkeran hene; raya dema borî û raya dema niha.”<sup>3</sup> Her dîsa di warê heman babetê de lêkolêrên zimanê kurdî, Mikaîl Bilbil û Bahoz Baran, dibêjin di zimanê kurdî de;

<sup>1</sup> Ebdûla Hisên, *Morfîme Rêzimanîyekanî Kar (Qertafên Rêzimanî ên Lêkeran)*, (Teza Doktorayê a Zanîngeha Silêmaniyê, Nehatiya Weşandin), Hewlêr, 1990, 96.

<sup>2</sup> Berzencî - Umer Qadir, 123.-150.

<sup>3</sup> TAN, Samî, *Rêziman û Rastnivîsa Zaraveyê Kurmancî*, Stenbol, 2005, 221.

“Du raweyên lêkeran hene: Raweyên demî û raweyên xwastekî. Raweyên demî wataya demê didin lêkeran. Di deman de du kokên lêkeran hene; ji bo dema niha û bê kokek, ji bo demên borî jî kokeke cuda tê bikaranîn.”<sup>1</sup>

Her wiha di zimanê kurdî de ev rawe û demene bi komelek nîşane an pêkhateyên rêzimanî berpa dibin, boye; “Ji bo lêkerên demên borî ên lebat, qertafên (-a,-d,-t,-û,-î) bikar tên û ji bo lêkerên demên ranebirdû (Demên niha û bê) ên lebat qertafên deman nîn in, wate demên ranebirdû bi hêmaya sifir (Ø) tên nîşandan.”<sup>2</sup> Lê belê zimanevanê kurd K.K. Kurdoyêv di vî warî de, dibêje: “Ji bo dema niha, di zaravayê soranî de pêşgirên (de-, e-) û di kurmanciya jorîn de jî pêşgira (di-) bikar tê.”<sup>3</sup> Bes zimanevanê kurd Wirya Umer Emîn, pêşgira (de-) wek “amrazê hemîşeyî.”<sup>4</sup> dibîne, wate vê wek qertafa dem nabîne.

Her dîsa K.K.Kurdoyêv dibêje: “Di zaravayê soranî de ji bo dema bê hîç nîşaneyek nîn e, lê di kurmanciya jorîn de çend nîşaneyek hatine diyarkirin ku ew jî ev in: ê, wê, dê”<sup>5</sup> Her wiha “Di zimanê kurdî ê îroyîn de, ji aliyê bêjesaziyê ve dikarin sê rêjeyan ji hev cihê bikin: 1- Îxbarî/Hewalî; 2- Înşai/Xwastekî; 3- Daxwazî/Fermanî.”<sup>6</sup>

#### 2.1.1.1. Demên Borî

Wek di serî de jî hatiye pêşkeşkirin, di zaravayê kurmanciya jorîn de, ji bo demên borî qertafên (-a, -t, -û, -î) bi kar tên û her wiha yek ji wan qertafên demên borî (-d), di kurmanciya jorîn de her çende ketiye û wek morfîma sifir (Ø) tê pejirandin jî, lê dîsa di hin lêkeran de derdikeve. Wek di lêkerên **Çand**, **razand**, **ragihand**...hwd. de derdikeve. Di vir de morfîma (-d), morfîma dema borî ye, morfîma (-an), morfîma gerguhêzkirina lêkerên negerguhêz e.

<sup>1</sup> BILBIL, Mîkaîl - BARAN, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol, 2008, 73.

<sup>2</sup> Wirya Umer Emîn, *Asoyekî tirî Zimanewanî (Asoyek din a Zimanevanîyê)*, I, Çapa 2., Hewlêr, 2009, 123.-127.

<sup>3</sup> Kurdoyêv, 222.

<sup>4</sup> Umer Emîn, 122.

<sup>5</sup> Kurdoyêv, 225.

<sup>6</sup> Ewrehmanî Hacî Marîf, *Rêzimanî Kurdî – Kirdar (Rêzimana Kurdî – Lêker)*, Silêmanî, 2000, 175.

Di warê penaseya dema borî de tê gotin: “Lêkera dema borî ew lêkere ye, ku prosesa bûyerê pêş axaftinê bikeve.”<sup>1</sup> Di kurmanciya jorîn de, di warê hejmara demên borî de, rêknekevtinek heye, bo nimûne zimanevanê kurd K.K. Kurdiyêv demên borî dabeş dike ser “dema boriya sade, dema boriya nêzîk, dema boriya berdest û dema boriya dûr.”<sup>2</sup> û mamostayên zaravayê kurmançî ên wek Samî Tan, Mikaîl Bilbil, Bahoz Baran û Çetîn Taş dibêjin 5, Nezîr Ocek dibêje: 7, Birahîm Xelîl Taş jî dibêje: 4 cure demên borî hen e. Lê belê dê di vir de 5 cureyên demên borî bîn rawekirin. Her wiha di zimanê kurdî de, lêkerên gerguhêz ên ser bi raweya demên borî ne û bi qertafa demên borî (-û) têne gerdankirin nîn in.

### 2.1.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî

Dema boriya têdeyî, “Nîşaneyê rûdana bûyereke ye ku di demeke borî a nêzîk de rûdaye.”<sup>3</sup> û “Pêkhatayên bineretî ên formê dema boriya nêzîk; qedê lêkerê û cînavkên kesandinê ne.”<sup>4</sup> Her wiha her çend e hin zimanevanên kurd ji bo vê demê bêjeya “nêzîk” bikar bînin jî ev yeke guncav nîn e. Çünke eger mebest dema çalakiyê be, dikare dem nêzîk nebe, wek;

#### Mînak:

“Xweda erd û esman dirust kirin.”

“Em 20 sal pêş niha ji gund hatin bajarî.”

Di van her du mînakane de tê dîtin dem nêzîk nîn e, tenanet gelek dûr e.

Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + kes Ø)			
Lêker	reg	dem	Kes
(min) kirî	kir	î	Ø

<sup>1</sup> h.ç., 200.

<sup>2</sup> Kurdoyêv, 218.

<sup>3</sup> Nûrî Elî Emîn, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, Silêmanî, 1960, 202

<sup>4</sup> Hacî Marîf, 200.

\*Di zimanê kurdî de, gava lêkerên (*xwar, bir, kir, şikest, rûnişt, xist*) ji demên borî vediguhezîn ji bo demên ranebirdû, qertafên (*-ar, -ir, -es, -is, -iş*) ji holê radibin û wek morfîmên betal tîn binavkirin.

\*Di lêkera (*dirû*) de morfîma dema borî (-û-) wek sifir Ø hatiye nîşandan, çünke ev lêkere bi dengê /-û/ dawî bûye, boye morfîma demê wek sifir hatiye diyarkirin.

(me) kêla	kêl	a	Ø
(te) xwar*	xwar	ø	Ø
(we) firot	firo	t	Ø
(wî/ê) dirû*	dirû	ø	Ø
(wan) dirû	dirû	ø	Ø

### a. Lêkerên Gerguhêz

Di kurmanciya jorîn, dema boriya têdeyî de, morfîmên deman wek paşgir diçin dawîya lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî.

#### Mînak:

(me) hilkêşa: hil + kêş + **a** (pêkhatî - gerguhêz)

(we) kelijand: kel + ij + an + **d** (pêkhatî - gerguhêz)

(wan) dûr xist: dûr xis + **t** (hevedudanî – gerguhêz)

1

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + kes)</b>			
<b>Lêker</b>	<b>reg</b>	<b>Dem</b>	<b>Kes</b>
kenîm	ken	î	m
mirin	mir	Ø	in
kefî	ke(v)	t	î
çûn	ç	û	n
rija*	rij	a	Ø
rijan	rij	a	n

### b. Lêkerên Negerguhêz

<sup>1</sup> \*Di zimanê kurdî de, gava lêkerên (*xwar, bir, kir, şikest, rûnişt, xist*) ji demên borî vediguhezî ji bo demên ranebirdû, qertafên (*-ar, -ir, -es, -is, -iş*) ji holê radibin û wek morfîmên betal tên binavkirin.

\*Di lêkera (*dirû*) de morfîma dema borî (-û-) wek sifir Ø hatiye nîşandan, çunke ev lêkere bi dengê /-û/ dawî bûye, boye morfîma demê wek sifir hatiye diyarkirin.

Di kurmanciya jorîn, dema boriya têdeyî de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkeran û cînavkên pêvebestî de. Di dema boriya têdeyî de, di kesê sêyem ê yekjimar de qertafa demê wek axîr qertaf derdikeve, çunke cînavka pêvebestî sifir e.

### Mînak:

raperîm: ra + per + î + m (pêkhatî - negerguhêz)

kelijiyî: kel + ij + î + (y)î (pêkhatî - negerguhêz)

(em) t êk çûn: t êk ç + û + n (hevedudanî – negerguhêz)

#### 2.1.1.1.2.Dema Boriya Berdest

Dema boriya berdest, “Amaje bi çalakiyekê dike, ku di dema borî de didome.”<sup>1</sup>

<b>Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + dem + kesØ)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>Kes</b>
(min) dikirî	di	kir	î	Ø
(me) dikêla	di	kêl	a	Ø
(te) dixwar	di	xwar	Ø	Ø
(we) difiro	di	firo	t	Ø
(wî/ê) didirû	di	dirû	Ø	Ø
(wan) didirû	di	dirû	Ø	Ø

#### a. Lêkerên Gerguhêz

Di kurmanciya jorîn, dema boriya berdest de, morfîmên deman wek paşgir diçin dawiya lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî.

\*Di zimanê kurdî de lêkera (rijîn), ji aliyê avaniyê ve du alî ye. Wate hem gerguhêz e, hem negerguhêz e û gerguhêzî û negerguhêziya wê di nav hevokê de derdikeve. Di vir de wek lêkera negerguhêz hatiye bikaranîn.

<sup>1</sup> Elî Emîn, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, 223.

**Mînak:**

(min) hildikêşa: hil + di + kêş + a (pêkhatî - gerguhêz)

(me) dikelijand: di + kel + ij + an + d (pêkhatî - gerguhêz)

(wî/ê) dûr dixist: dûr di + xis + t (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + dem + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>Kes</b>
dikenîm	di	ken	î	m
(em) dimirin	di	mir	ø	(i)n
ketî	di	ke(v)	t	î
(hûn) diçûn	di	ç	û	n
dirija	di	rij	a	ø
dirijan	di	rij	a	n

**b. Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya jorîn, dema boriya berdest de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkeran û cînavkên pêvebestî de. Bo kesê sêyem ê yekjimar cînavka pêvebestî nîn e, boye qertafa demê wek axîr qertaf derdikeve.

**Mînak:**

rûdiniştî: rû + di + niş + t + î (pêkhatî - negerguhêz)

dikelijîm: di + kel + ij + î + m (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têk diçû: têk di + ç + û + Ø (hevedudanî – negerguhêz )

### 2.1.1.1.3. Dema Boriya Dûdar

Dema boriya dûdar “Amaje bi çalakiyekê dike, ku ne di demek gelek dûr de ne jî di demek gelek nêzîk de rûda be.”<sup>1</sup>

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + (y/n) + kes + espêkt)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>	<b>espêkt</b>
(min) kiriye/ne	kir	î	∅	(y)e/(n)e
(me) kêlaye/ne	kêl	a	∅	(y)e/(n)e
(te)xwariye/ne	xwar	∅	∅	(y)e/(n)e
(we)firotiye/ne	firo	t	∅	(y)e/(n)e
(wî/ê)dirûye/ne	dirû	∅	∅	(y)e/(n)e
(wan)dirûye/ne	dirû	∅	∅	(y)e/(n)e

#### a. Lêkerên Gerguhêz

Di kurmanciya jorîn, dema boriya dûdar de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim di dawîya reg an qedên lêkeran de derdikevin.

#### Mînak:

(me) hilkêşaye/ne: hil + kêş + **a** + ye/ne (pêkhatî - gerguhêz)

(we) kelijandiyê/ne: kel + ij + an + **d** + (i)ye/ne (pêkhatî - gerguhêz)

(wan) dûr xistiye/ne: dûr xis + **t** + ye/ne (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + kes + espêkt)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>	<b>Espêkt</b>
kenîme	ken	î	m	e
(em) mirine	mir	∅	(i)n	e

<sup>1</sup> Nûrî Elî Emîn, *Qewadî Zimanî Kurdî le (Serf û Nihû) da*, Bexda, 1956, 17.



ketî	ke	t	î	Ø
(hûn) çûne	ç	û	n	e
rijaye	rij	a	Ø(y)	e
(ew) rijane	rij	a	n	e

### b. Lêkerên Negerguhêz

Di kurmanciya jorîn, dema boriya dûdar de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera kok a qedên lêkeran û cînavkên pêvebestî de.

#### Mînak:

kelijime: kel + ij + î + m + e (pêkhatî - negerguhêz)

(hûn) rûniştine: rû + niş + t + î + n + e (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têk çûne: têk ç + û + n + e (hevedudanî – negerguhêz )

Xalek din a girîng di vir de ev e; eger lêker negerguhêz be, çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî be, ji bo kesê duyem ê yekjimar morfîma espêktê sifir (Ø) e.

#### Mînak:

ke(v)tî : ke(v) + t + î + ø (xwerû - negerguhêz)

raperî: ra + per + î + ø (pêkhatî - negerguhêz)

kelijî: kel + ij + î + ø (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûyî: têk ç + û + y + î + ø (hevedudanî - negerguhêz)

#### 2.1.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Çîrokiya dema boriya têdeyî, “Amaje bi bûyerekê dike, ku di demeke dûr û dirêj de rûdabe.”<sup>1</sup>

<sup>1</sup> Elî Emîn, *Rêzimanî Kurdî*, 116.

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + bû + kes Ø)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>
(min) kirîbû	kir	î	bû	Ø
(me) kêlabû	kêl	a	bû	Ø
(te) xwaribû	xwar	Ø	(i)bû	Ø
(we) firotibû	firo	t	(i)bû	Ø
(wî/ê) dirûbû	dirû	Ø	bû	Ø
(wan) dirûbû	dirû	Ø	bû	Ø

#### **a. Lêkerên Gerguhêz**

Di kurmanciya jorîn, çîrokiya dema boriya têdeyî de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkerên bingehîn û lêkera alîkar (bûn) de.

#### **Mînak:**

(min) hilkêşabû: hil + kêş + **a** + bû (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

(te) kelijandibû: kel + ij + an + **d** + (i)bû (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

(wî/ê) dûr xistibû: dûr xis + **t** + (i)bû (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + bû + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>
kenîbûm	ken	î	bû	m
(em) miribûn	mir	Ø	(i)bû	n
ketibûyî	ke	t	(i)bû	(y)î
(hûn) çûbûn	ç	û	bû	n
rijabû	rij	a	bû	Ø
(ew) rijabûn	rij	a	bû	n

## b. Lêkerên Negerguhêz

Di kurmanciya jorîn, çîrokiya dema boriya têdeyî de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkerên bingehîn û lêkera alîkar (bûn) de.

### Mînak:

kelijîbûm: kel + ij + î + bû + m (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

rûniştibûyî: rû + niş + t + i + bû + (y)î (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

têk çûbû: têk ç + û + bû + Ø (hevedudanî – negerguhêz )

### 2.1.1.1.5. Çîrokiya Dema Boriya Dûdar

Di zaravayê kurmanciya jorîn de ji bilî wan demên borî/rabirdû, demeke din jî heye, jêre çîroka dema boriya dûdar tê gotin ku di zaravayê kurmanciya nawerast de nîn e. Sebaret bi çemk û wataya vê demê tê gotin: “Qala rûdan an rûnedana bûyerekê dike, ku em ji kesek din dibihîsin.”<sup>1</sup>, wate em nabînin û an ji bo kesên din nagêrin.

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + bû + kes + espêkt)</b>					
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>	<b>espêkt</b>
(min) kirîbûye	ki	î	bû*	ø	(y)e/(n)e
(me) kêlabûye	kêl	a	bû	ø	(y)e/(n)e
(te) xwarîbûye	xwar	ø	(i)bû	ø	(y)e/(n)e
(we) firotibûye	firo	t	(i)bû	ø	(y)e/(n)e
(wî/ê) dirûbûye	dirû	ø	bû	ø	(y)e/(n)e
(wan) dirûbûye	dirû	ø	bû	ø	(y)e/(n)e

### a. Lêkerên Gerguhêz

<sup>1</sup> TAŞ, Çetîn, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Stenbol, 2013, 181.

\* Di zimanê kurdî de, lêkerên alîkar ên wek (**bû**, **çû**) ji reg û qertafa dema borî pêk tên. Wate; **reg + q. d. borî: bû: b + û, çû: ç + û**

Di kurmanciya jorîn, çîrokiya dema boriya dûdar de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkerên bingehîn û lêkera alîkar (bûn) de.

**Mînak:**

hilkêşabûye/ne: hil + kêş + **a** + bû +y/n + e (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

kelijandibûye/ne: kel + ij + an + **d** + (i)bû + y/n + e (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

dûr xistibûye/ne: dûr xis + **t** + (i)bû +y/n + e (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + bû + kes + espêkt)</b>					
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>	<b>espêkt</b>
kenîbûme	ken	î	bû	m	e
(em) miribûne	mir	ø	(i)bû	n	e
ketibûyî	ke	t	(i)bû	(y)î	ø
(hûn) çûbûne	ç	û	(i)bû	n	e
rijabûye	rij	a	bû	ø	(y)e
(ew) rijabûne	rij	a	bû	n	e

**b. Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya jorîn, çîrokiya dema boriya dûdar de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkerên bingehîn û lêkera alîkar (bûn) de.

**Mînak:**

kelijîbûye/ne: kel + ij + **î** + bû + ye/ne (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

rûniştîbûye/ne: rû + niş + **t** + i + bû +y/n + e (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

raperîbûye/ne: ra + per + **î** + bû +y/n + e (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

têk çûbûye/ne: têk ç + **û** + bû +y/n + e (hevedudanî – negerguhêz )

Di zimanê kurdî, çîrokiya dema boriya dûdar de, ji bilî morfîmên deman, lêkera alîkar (bûn) û qertafa espêktê (-e) jî tê bikaranîn û bi vî awayî formê çîrokiya dema boriya dûdar berpa dibe. Lêkera (bûn), li pey qertafên deman bikar tê û piştî lêkera (bûn) cînavkên pêvebestî û paşan jî wek axîr qertaf, espêkta (-e) tê nivîsîn. Lê belê di vir de, di lêkerên negerguhêz ên di formê kesê sêyem ê yekjimar de ne, espêkt dernakeve, yanî sifir (Ø) e.

Her wiha eger lêker bi morfîmên dengdêr (-a, -î, -û) yê dawî bibe, di navbera qertafên demê û lêkera alîkar (bûn) de hîç morfîmek din nayê. Lê belê eger bi dengdaran dawî bibe lêker, wê gavê di navbera morfîmên demê û lêkera alîkar (bûn) de wek dengdêr morfîma betal (-i-) dirust dibe.

### 2.1.1.2. Demên Ranebirdû

Di zimanê kurdî de ji bilî demên borî demên ranebirdû jî hen û pêk tên ji; dema niha, dema bê û dema a nêzîk. Di van demane de lêkera ranebirdû; “Ew lêker e, ku prosesa rûdana bûyerê an di dema axaftinê de nîşan dide, an jî li piştî axaftinê.”<sup>1</sup> Di derbarê morfîmên demên ranebirdû de hin boçûnên ciya ciya hen. Bo nimûne li gor zimanevan Wirya Umer Emîn; “Ji bo dema ranebirdû reg hîç nîşaneyekê wernagire û boye di vê demê de morfîma dema ranebirdû wek sifir (Ø) tê pejirandin.”<sup>2</sup> Her dîsa di heman warî de tê gotin: “Di zimanê kurdî de, morfîmên demên ranebirdû sifir (Ø) in.”<sup>3</sup>

Lê belê hin zimanevanên kurd û kurdî berevajî van boçûnane ne û dibêjin: “Ji bo dema niha, di zaravayê kurmançiya jorîn de pêşgira (di-) bikar tê.”<sup>4</sup> Ji bo dema bê jî dibêje: “Di kurmançiya xarû de ji bo dema bê hîç nîşaneyek morfolojîk nîn e, lê di kurmançiya jorîn de berevajî vê yekê nîşaneyên wek; (-ê, vê, dê) bikar tên.”<sup>5</sup>

Dîsa di vî warî de Ewrehmanî Hacî Marif jî dibêje: “Di kurdî de lêker çî gerguhêz be, çî negerguhêz be, çî xwerû be, çî pêkhatî be, çî hevedudanî be ji bo

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 191.

<sup>2</sup> Umer Emîn, 123.

<sup>3</sup> Berzencî - Umer Qadir, 136.

<sup>4</sup> Kurdoyêv, 222.

<sup>5</sup> h.ç., 225.

pêkanîna forma dema ranebirdû qertafa (de-, e-) dikeve pêşiya rega lêkera dema ranebirdû û dawîya rega lêkerê jî, qertafên cînavkên kesandinê ên bêhêz têne ser.”<sup>1</sup>

Her di berdewamiya axaftina xwe de, Ewrehmanî Hacî Marif dîsa dibêje: “Di zaravayê kurmanciya nawerast de, ji aliyê form ve di navbera dema niha û dema bê de tu cêwazî nîn in û her du deman her yek qalib heye. Cudakirina wan an di hevokê de bi alîkariya barê dewrûber diyar dibe, an jî bi alîkariya bikaranîna bêjeyên taybet diyar dibe. Di zaravayê kurmanciya jorîn de jî, formê dema niha û dema bê bi asanî ji hev tèn cudakirin, çunke ji bo yektir cudakirinê nîşaneyên morfolojîk jî hene.”<sup>2</sup>

Li gor van pênase û amajepêdanan, di kurmanciya jorîn de demên ranebirdû dibin sê beş, ew jî; Dema niha, Dema Bê û Dema Bê a Nêzîk e.

#### 2.1.1.2.1. Dema Niha

Di vê demê de; “Bûyer, di dema axaftinê de wate di niha de rû dide.”<sup>3</sup> û nîşaneya vê jî, morfîma (di-) ye.

<b>Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + demØ + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dikirim	di	kir	Ø	(i)m
(em) dikêlin	di	kêl	Ø	(i)n
dixweyî	di	xwe	Ø	(y)î
(hûn) difiroşin	di	firoş	Ø	(i)n
didirû	di	dirû	Ø	Ø
(ew) didirûn	di	dirû	Ø	n

#### **a. Lêkerên Gerguhêz**

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 191.

<sup>2</sup> h.ç., 196.-197.

<sup>3</sup> Nerîman Ebdula Xoşnaw, *Rêzimanî Kurdî-Kurmanciy Serû (Rêzimana Kurdî – Kurmanciya Jorîn)*, Hewlêr, 2015, 98.

<b>Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + demØ + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dikenim	di	ken	ø	(i)m
(em) dimirin	di	mir	ø	(i)n
dikevî	di	kev	ø	î
(hûn) diçin	di	ç	ø	(i)n
diriye	di	rij	ø	e
(ew) dirijin	di	rij	ø	(i)n

### **b. Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya jorîn, dema niha de, morfîma demê (di-), ku hin zanayên zimanê kurdî wê wek espêkt dihesibînin, wek pêşgir diçe destpêka koka lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû û ên bi paşgiran hatine darijtin; di lêkerên bi pêşgiran hatine darijtin de jî diçe ser destpêka koka lêkerê û dikeve di navbera qertafa darêjer û lêkerê de. Eger lêker hevedudanî be, di wir de jî diçe ser destpêka koka lêkerê û dikeve di navbera bêjeya yekem a watadar û koka lêkerê de.

#### **Mînak:**

dadixim: da + **di** + x + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

dikelijîne: **di** + kel + ij + î + e (pêkhatî - gerguhêz)

(hûn) dûr dixin: dûr **di** + x + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

rûdinin: rû + **di** + n + (i)n (pêkhatî - negerguhêz)

dikelijî: **di** + kel + ij + î (pêkhatî - negerguhêz)

têk diçe: têk **di** + ç + e (hevedudanî – negerguhêz )

#### **2.1.1.2.2. Dema Bê**

Di zimanê kurdî, zaravayê kurmanciya jorîn de, wek dema ranebirdû ji bilî dema niha, dema bê/ dahatû jî heye û xwedî form û morfîmên serbixwe ye.

Li gor zimanevan û zanayanên zimanê kurdî dema bê; “Ji bo karekî ku hîn pêk nehate, tê bikaranîn.”<sup>1</sup>, an “Ji bo bûyerên ku wê di pêşerojê de pêk bên, tê bikaranîn; wate vegotin heye lê bûyer hêj neqewimiye.”<sup>2</sup>

Wek di serî de jî hatiye amajekirin form û morfîmên vê demê di kurmanciya jorîn de hene û ew jî nîşaneyên (ê, dê, vê) û qertafa (bi-) ye.

<b>Kurmanciya Jorîn: (nîşaneyê dê/ê + bi + reg + demØ + kes)</b>					
<b>lêker</b>	<b>dê/ê</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dê/ê bikirim	dê/ê	bi	kir	Ø	(i)m
(em)dê/ê bikêlin	dê/ê	bi	kêl	Ø	(i)n
dê/ê bixweyî	dê/ê	bi	xwar	Ø	(y)î
(hûn)dê/ê bifiroşin	dê/ê	bi	firo	Ø	(i)n
dê/ê bidirû	dê/ê	bi	dirû	Ø	Ø
(ew)dê/ê bidirûn	dê/ê	bi	dirû	Ø	n

#### **a. Lêkerên Gerguhêz**

<b>Kurmanciya Jorîn: (nîşaneyê dê/ê/wê + qertafa bi + reg + demØ + kes)</b>					
<b>lêker</b>	<b>dê/ê</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dê/ê bikenim	dê/ê	bi	ken	Ø	(i)m
(em)dê/ê bimirin	dê/ê	bi	mir	Ø	(i)n
dê/ê bikevî	dê/ê	bi	kev	Ø	î
(hûn) dê/ê biçin	dê/ê	bi	ç	Ø	(i)n
dê/ê birije	dê/ê	bi	rij	Ø	e
(ew) dê/ê birijin	dê/ê	bi	rij	Ø	(i)n

#### **b. Lêkerên Negerguhêz**

<sup>1</sup> TAN, 237.

<sup>2</sup> BILBIL – BARAN, 76.



Di kurmanciya jorîn, dema bê de ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû û erênî, nîşaneyên (ê, dê, vê) wek nîşane di detpêka lêkerê de tên, lê belê wek pêşgir bi koka lêkerê ve nayên nivîsîn û cudan e. Lê qertafa (bi-) wek pêşgir diçe ser destpêka koka lêkerê û bi lêkerê ve tê nivîsîn.

Her wiha, eger hat û di dema bê de, lêker pêkhatî û hevedudanî bin, nîşaneyên (dê, ê, wê) di destpêka forma nû a lêkerê de tên û bes ji lêkerê cuda tên nivîsîn. Lêbelê qertafa (bi-), eger lêker pêkhatî be nayê nivîsîn û wate qertafa (bi-) dikeve, bi watayek din eger lêker bi pêşgiran hatibe darijtin qertafa (-bi-) dikeve; lê eger bi paşgiran hatibe darijtin qertafa (-bi-) di destpêka lêkeran de derdikeve. Her wiha eger lêker hevedudanî be wek pêşgir di destpêka lêkera bingeîn de tê nivîsîn. Wek di mînakên xarê de jî berceste dibe.

#### Mînak:

dê/ê/wê dayêxim: **dê/ê/wê** da +  $\emptyset$  + y + êx + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

dê/ê/wê bikelijîne: **dê/ê/wê bi** + kel + ij + î + e (pêkhatî - gerguhêz)

(ew) dê/ê/wê dîr bixin: **dê/ê/wê dîr bi** + x (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

(em) dê/ê/wê rûnin: **dê/ê/wê rû** +  $\emptyset$  + n + (i)n (pêkhatî - negerguhêz)

(hûn) dê/ê/wê bikelijin: **dê/ê/wê bi** + kel + ij + (i)n (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) dê/ê/wê tîk biçin: **dê/ê/wê tîk bi** + ç + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

#### 2.1.1.2.3. Dema Bê a Nêzîk

Dema bê a nêzîk; “Wek dema bê ye, lê di cihê daçeka /dê/ de, lêkera alîkar “**kirin**”<sup>1</sup> tê bikaranîn.

<b>Kurmanciya Jorîn: (espêkt + “kirin” + reg + dem + kes + bi + reg + demØ + kes)</b>								
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>

<sup>1</sup> TAN, 239.

dikim bikirim	di	k	ø	(i)m	bi	kir	ø	(i)m
(em)dikin bikêlin	di	k	ø	(i)n	bi	kêl	ø	(i)n
dikî bixweyî	di	k	ø	(y)î	bi	xwar	ø	(y)î
(hûn)dikin bifiroşin	di	k	ø	(i)n	bi	firo	ø	(i)n
dike bidirû	di	k	ø	e	bi	dirû	ø	ø
(ew) dikin bidirûn	di	k	ø	(i)n	bi	dirû	ø	n

### a. Lêkerên Gerguhêz

Kurmanciya Jorîn: (espêkt + “kirin” + reg + dem + kes + bi + reg + demØ + kes)								
lêker	espêkt	reg	dem	kes	bi	reg	dem	kes
dikim bikenim	di	k	ø	(i)m	bi	ken	ø	(i)m
(em)dikin bimirin	di	k	ø	(i)n	bi	mir	ø	(i)n
dikî bikevî	di	k	ø	î	bi	kev	ø	î
(hûn) dikin biçin	di	k	ø	(i)n	bi	ç	ø	(i)n
dike birije	di	k	ø	e	bi	rij	ø	e
(ew) dikin birijin	di	k	ø	(i)n	bi	rij	ø	(i)n

### b. Lêkerên Negerguhêz

Di dema bê a nêzîk de, ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz formê lêkeran wek yek in. Di vir de lêkera alîkar “kirin” qertafa dema niha (di-) werdigire. Qertafa (di-) wek pêşgir diçe ser destpêka koka lêkera alîkar “kirin”ê. Di vir de lêkera alîkar “kirin” nikare di formê pêkhatî û hevedudanî de derkeve. Wate her tim xwerû ye.

Di dema bê a nêzîk de, qertafa dema bê (bi-) jî wek pêşgir diçe ser destpêka lêkera bingehîn û rola xwe a demê cêbecê dike û bi vî awayî formê dema bê a nêzîk derdikeve holê. Lê belê di lêkerên pêkhatî de, eger lêker bi pêşgiran bête darijtin qertafa (-bi-) dikeve, eger bi paşgiran bête darijtin qertafa (-bi-) di destpêka lêkeran de derdikeve; lê eger lêker hevedudanî be diçe ser destpêka lêkera bingehîn.

**Mînak:**

dikim hilkêşim: hil +  $\emptyset$  + kêş + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

dikî bikelijînî: **bi** + kel + ij + î + î (pêkhatî - gerguhêz)

dike têk bide: têk **bi** + d + e (hevedudanî – gerguhêz)

(em) dikin rûnin: rû +  $\emptyset$  + n (i)n (pêkhatî - negerguhêz)

(hûn) dikin bikelijin: **bi** + kel + ij + (i)n (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) dikin têk biçin: têk **bi** + ç (i)n (hevedudanî – negerguhêz )

**2.1.2. Qertafên Raweya Xwastekî**

Di zimanê kurdî de rêje an raweya xwastekî (şert, mert, xwezge), wate; “Lêker di raweya xwastekî de di derbarê lêkerên mercî, egerî û xwezgeyî de ye.”<sup>1</sup> Her di warê heman mijarê de tê gotin: “Mebest li rawe an rûkar, xwazge, merc û dananî ye û ev her sê çemkene xwediyê yek formê ne. Wataya hez, arezû, mercê rûdana kar, dananî û çavrêkirina rûdana kar an tewgerekê radigihînin.”<sup>2</sup> Her wiha raweya dananî an xwastekî a merc, bilanî, divêtî û hekaniyê xwediyê komelek xislet û taybetmendiyên in û tenanet xwediyê hin nîşane û pêkhateyên morfolojîk in jî. Wek; morfîmên (bi-, a-, ba-). Ev morfîmene li gor cih û peywendiyên xwe ên di nav hevok û bêjeyê de raweyên daxwazî pêk tînin.

**2.1.2.1. Raweya Xwastekî di Demên Borî de**

Raweya xwastekî, "Di zimanê kurdî de lêker ji aliyê raweya xwastekî ve her wek raweya lêkerên ragihandin/hewalî dabeş dibe ser dema rabirdû/dema borî, dema ranebirdû de û qertafên (-bi-), (-ba-) û (-aye) jî her sê formên vê raweyê ne.”<sup>3</sup>

Disan di ciheke din de jî li ser vê mijarê tê ragihandin; “Raweya xwastekî, ew rawe ye; bi şêweyekî rastewxo encama wê çalakî, livîn yan tewgera ku dide pişt kesekê an tişteke, nade dest; çunke mebesta wê di asta “daxwazî, arezû, hêvî... hwd.”

<sup>1</sup> Elî Xurşîd, 73.

<sup>2</sup> Berzencî – Umer Qadir, 143.

<sup>3</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 216.

de dimîne. Wate di vê raweyê de peyvên wek; “xwazge, birya, dibe, dibû”<sup>1</sup> û peyvên “xwezî, divê, bila, ku, heke”<sup>2</sup> rol dibînin.

Di zimanê kurdî de; “Raweya xwastekî, wek raweya hewalî/îxbarî çar cureyên demên borî; dema boriya têdeyî/nêzîk, dema boriya berdest/berdewam, dema boriya dûdar/tewaw, çîrokiya dema boriya têdeyî/dûr, hene.”<sup>3</sup>

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + ba + kesØ)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>
min kirîba	kir	î	ba	Ø
me kêlaba	kêl	a	ba	Ø
te xwariba	xwar	Ø	ba	Ø
we firotiba	firoş	t	ba	Ø
wî/ê dirûba	dirû	Ø	ba	Ø
wan dirûba	dirû	Ø	ba	Ø

#### **a. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz**

Di raweya xwastekî a dema boriya têdeyî de, ji bo lêkerên gerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî, qertafa (-ba-) bikar tê û ev qertafe di dawiya reg û qedên lêkeran de derdikeve.

#### **Mînak:**

(min) daxistiba: da + xis\*<sup>4</sup> + t + (i)ba (pêkhatî - gerguhêz)

(me) kelijandiba: kel + ij + an + d + (i)ba (pêkhatî - gerguhêz)

(we) dûrxistiba: dûr + xis + t + (i)ba (hevedudanî – gerguhêz)

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + ba + kesØ)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>

<sup>1</sup> Ebdûla Xoşnaw – Nerîman Nawxoş, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, Hewlêr, 2011, 102.

<sup>2</sup> OCEK, *Rêzimana Kurmancî*, 232.

<sup>3</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 225.

\* Di zimanê kurdî de, wexta ku lêkerên (*xist*, *rûnişt*, *danişt*) ji demên borî vediguhezî ji bo demên ranebirdû, qertafên (*-is*, *-işt*) ji holê radibin û ev morfîmene wek morfîmên betal tên binavkirin.

kenîbam	ken	î	ba	m
(em) miriban	mir	ø	(i)ba	n
ketibayî	ke	t	ba	(y)î
(hûn) çûban	ç	û	ba	n
rijaba	rij	a	ba	ø
(ew) rijaban	rij	a	ba	n

### b. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz

Di raweya xwastekî a dema boriya têdeyî de, ji bo lêkerên negerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî, qertafa (-ba-) bikar tê û ev qertafe dikeve di navbera reg an qedê lêkeran û cînavkên pêvebestî de.

#### Mînak:

rûniştibam: rû + niş\* + t + (i)ba + m (pêkhatî - negerguhêz)

kelijîbayî: kel + ij + î + ba + (y)î (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûban: têk + ç + û + ba + n (hevedudanî – negerguhêz )

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + ba + aye + kesØ)</b>						
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>aye</b>	<b>kes</b>
(min) bikirîbaye	bi	kir	î	ba	<b>aye</b>	ø
(me) bikêlabaye	bi	kêl	a	ba	<b>aye</b>	ø
(te) bixwaribaye	bi	xwar	ø	(i)ba	<b>aye</b>	ø
(we) bifirotibaye	bi	firoş	t	(i)ba	<b>aye</b>	ø
(wî/ê) bidirûbaye	bi	dirû	ø	ba	<b>aye</b>	ø
(wan) bidirûbaye	bi	dirû	ø	ba	<b>aye</b>	ø

### c. Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz

Di raweya xwastekî a dema boriya berdest de ji bo lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî qertafên (bi-, -ba-, -aye) tîn bikaranîn. Di lêkerên gerguhêz ên xwarû û ên bi paşgiran tîn darijtin de qertafa (bi-) wek pêşgir diçe

destpêka lêkeran û qertafên (-ba-) û (-aye) jî li pey hev wek paşgir li dû qertafên deman de tînan û diçin dawîya lêkeran.

Di lêkerên gerguhêz ên bi pêşgiran hatine darijtin de, qertafa (bi-) dikeve, lê belê qertafên (-ba-, -aye) her wek lêkerên xwerû di heman cihê de, bi heman şêwe derdikevin. Eger lêker hevedudanî be qerfa (bi-) diçe ser lêkera bingehîn û dikeve di navbera lêker an bêjeya yekem û lêkera bingehîn de û qertafên (-ba-, -aye) jî dîsa li pey hev di dawîya lêkeran de derdikevin.

### Mînak:

(min) hilkêşabaye: hil + kêş + a + **ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

(me) bikelijandibaye: bi + kel + ij + an + d + **(i)ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

(wî/ê) dûr bixistibaye: dûr **bi** + xis + t + **(i)ba** + **aye** (hevedudanî - gerguhêz)

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + ba + kes + a)</b>						
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>a</b>
bikenîbama	bi	ken	î	ba	m	a
(em) bimiribana	bi	mir	ø	(i)ba	n	a
bikevtibayî	bi	kev	t	(i)ba	(y)î	ø
(hûn) biçûbana	bi	ç	û	ba	n	a
birijabaya	bi	rij	a	ba	ø	(y)a
(ew) birijabana	bi	rij	a	ba	n	a

### **d. Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya xwastekî a dema boriya berdest de ji bo lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî qertafên (bi-, -ba-, -a) tînan bikaranîn. Di lêkerên negerguhêz ên xwarû û ên bi paşgiran tînan darijtin de, qertafa (bi-) wek pêşgir diçe destpêka lêkeran û qertafa (-ba-) dikeve di navbera qertafên deman û cînavkên pêvebestî de û qertafa (-a) jî li piştî cînavkên pêvebestî tê û diçe dawîya lêkeran.

Di lêkerên negerguhêz ên bi pêşgiran hatine darijtin de, qertafa (bi-) dikeve, lê belê di lêkerên hevedudanî de qertafa (bi-) diçe destpêka lêkera bingehîn û dikeve

di navbera lêker an bêjeya yekem û lêkera bingehîn de. Qertafên (-ba-, -a) jî her wek di lêkerên xwerû û lêkerên bi paşgiran hatine darijtin de çawa bedî dibin; di lêkerên bi pêşgiran hatine darijtin û lêkerên hevedudanî de jî her bi heman şêwe di heman cihî de derdikevin.

**Mînak:**

rûniştibayî: rû + niş + t + (i)ba + (y)î (pêkhatî - negerguhêz)

birepisîbaya: bi + rep + is + î + ba + yØ + a (pêkhatî – negerguhêz)

(em) têkbiçûbana: têk bi + ç + û + ba + n + a (hevedudanî – negerguhêz )

Her wiha di lêkerên negerguhêz, kesê duyem ê yekjimar de qertafa (-a) ji holê radibe, çunke cînavka pêvebestî a kesê duyem ê yekjimar dengdêr e û di kurdî de jî du dengdêr li pey hev nayên. Boye an dibe tîpa kelijandinê bikeve di navbera wan de, an jî dengê bihêz dengê bêhêz an dişibîne xwe, an jî ji holê radike. Di kesê sêyem de jî, çunke cînavka pêvebestî sifir e, tîpa kelijandinê dikeve di navbera qertafên (-ba-) û (-a) de.

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + be + kesØ)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>be/ba</b>	<b>kes</b>
min kirîbe	kir	î	be	Ø
me kêlabe	kêl	a	be	Ø
te xwaribe	xwar	Ø	(i)be	Ø
we firotime	firo	t	(i)be	Ø
wî/ê dirûbe	dirû	Ø	be	Ø
wan dirûbe	dirû	Ø	be	Ø

**e. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Gerguhêz**

Di raweya xwastekî dema boriya dûdar, lêkerên gerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî de, qertafa (be-) tê bikaranîn. Qertafa xwastekî (be-), piştî qertafên deman tê û diçe dawiya lêkeran.

**Mînak:**

(min) hilkêşabe: hil + kêş + a + **be** (pêkhatî - gerguhêz)

(me) kelijandibe: kel + ij + an + d + (i)**be** (pêkhatî - gerguhêz)

(we) dûrxistibe: dûr + xis + t + (i)**be** (hevedudanî – gerguhêz)

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + bi + kesØ)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bi</b>	<b>kes</b>
kenîbi	ken	î	bi	m
(em) miribin	mir	ø	bi	n
ketibî	ke	t	b	î
(hûn) çûbin	ç	û	bi	n
rijabe	rij	a	b	e
(ew) rijabin	rij	a	bi	n

**f. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya xwastekî dema boriya dûdar, lêkerên negerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî de, qertafa (bi-) tê bikaranîn. Qertafa xwastekî (bi-), dikeve di navbera qertafên deman û cînavkên pêvebestî de.

**Mînak:**

rûniştibim: rû + niş + t + **bi** + m (pêkhatî - negerguhêz)

(hûn) kelijîbin: kel + ij + î + **bi** + n (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbî: têk + ç + û + **b** + î (hevedudanî – negerguhêz )

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + bû + a + kesØ)</b>						
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>(y/n)a</b>	<b>kesØ</b>
min bikirîbûya	bi	kir	î	bû	(y)a	ø
me bikêlabûna	bi	kêl	a	bû	(n)a	ø
te bixwaribûya	bi	xwar	ø	(i)bû	(y)a	ø



we bifirotibûna	bi	firo	t	(i)bû	(n)a	ø
wî/ê bidirûbûya	bi	dirû	ø	bû	(y)a	ø
wan bidirûbûna	bi	dirû	ø	bû	(n)a	ø

### g. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz

Di raweya xwastekî a çîrokiya dema boriya têdeyî de, ji bo lêkerên gerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî qertafên (bi-) û (-a) bikar tînin. Di lêkerên gerguhêz ên xwerû û ên bi paşgiran tînin darijtin de, qertafa (bi-) wek pêşgir diçe ser destpêka lêkeran, di lêkerên hevedudanî de dikeve di navbera bêjeya watadar û destpêka lêkera bingehîn de. Lê belê di lêkerên pêkhatî û bi paşgiran tînin darijtin de, qertafa (-bi) ji holê radibe. Her wiha qertafa (-a-) jî di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de piştî lêkera (bûn) a alîkar, di dawiya lêkeran de derdikeve, lê belê tîpên kelijandinê (n, y) dikevin di navbera wan de, çünke di kurdî de du dengdêr li pey hev nayên.

#### Mînak:

(min) hilkêşabûya: hil + kêş + a + bû + (y)a (pêkhatî – hevedudanî – gerguhêz)

(te) bikelijandibûya: kel + ij + an + d + (i)bû + (y)a (pêkhatî – hevedudanî – gerguhêz)

(me) dûr bixistibûyana: dûr + bi + xis + t + (i)bû + (y)a + n + a (hevedudanî – gerguhêz)

kurmanciya jorîn: (reg + dem + bû + a + kes + a)						
lêker	reg	dem	bû	(y)a	kes	a
kenîbûyama	ken	î	bû	(y)a	m	a
miribûyana	mir	ø	(i)bû	(y)a	n	a
ketibûyayî	kew	t	(i)bû	(y)a	(y)î	ø
(êwe) çûbûyana	ç	û	bû	(y)a	n	a
rijabûya	rij	a	bû	(y)a	ø	ø

(ewan) rijabûyana	rij	a	bû	(y)a	n	a
-------------------	-----	---	----	------	---	---

### **h. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya xwastekî a çîrokiya dema boriya têdeyî de, ji bo lêkerên negerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî jî qertafên (-a-) û (-a) bikar tên. Yek ji van qertafane di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, dikeve di navbera lêkera alîkar (bûn) û cînavkên pêvebestî de. Lê belê tîpên kelijandinê (n, y) dikevin di navbera lêkera alîkar (bûn) û qertafa (-a)yê de. Qertafa (-a) ya din jî pişt cînavkên pêvebestî tê û diçe dawiya lêkeran.

Her wiha di vir de xalektir a girîng ev e; qertafa (-a) a dawiyê di her du kesên duyemîn û sêyemîn ên yekjimar de dernakeve.

#### **Mînak:**

rûniştibûyama: rû + niş + t + bû + (y)a + m + a (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

kelijbûyayî: kel + ij + î + bû + (y)a + (y)î + Ø (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

(ew) têkçûbûya: têk + ç + û + bû + (y)a + Ø (hevedudanî – negerguhêz)

**Têbînî:** Di kurmanciya jorîn de, çîrokiya dema boriya dûdar li gor formê raweya xwastekî nayê gerdankirin.

#### **2.1.2.2. Raweya Xwastekî di Demên Ranebirdû de**

Di derbarê mijara, demên ranebirdû di raweyên xwastekî de, tê gotin: “Di kurmanciya nawerast de lêker çawan di raweya ragihandin/hewalî de çi gerguhêz be, çi negerguhêz, çi xwerû be, çi pêkhatî û hevedudanî be, nîşaneyê (de-/e-/di-) dikeve pêşiya rega lêkerê û dawiya lêkerê jî cînavkên bêhêz yê pêvebestî werdigire, di raweya xwastekî de jî li cihê qertafa (de-/e-/di-), qertafa (bi-) tê, wate di her du raweyan de cêwazî tenê di formê qertafan de ye. Di zaravayê kurmanciya jorîn de jî

qertafa (bi-) her bi heman şêwe tê dîtin.”<sup>1</sup> Dibe bê zanîn di raweya xwastekî, ji bo dema niha û dema bê a nêzîk formê lêkeran ê gerdankirî nîn e, lê ji bo dema bê heye.

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
bikirim	bi	kir	ø	(i)m
(em) bikêlin	bi	kêl	ø	(i)n
bixweyî	bi	xwe	ø	(y)î
(hûn) bifiroşin	bi	firoş	ø	(i)n
bidirû	bi	dirû	ø	ø
(ew) bidirûn	bi	dirû	ø	n

#### **a. Dema Bê Lêkerên Gerguhêz**

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
bikenim	bi	ken	ø	(i)m
(em) bimirin	bi	mir	ø	(i)n
bikevî	bi	kev	ø	î
(hûn) biçin	bi	ç	ø	(i)n
birije	bi	rij	ø	e
(ew) birijin	bi	rij	ø	(i)n

#### **b. Dema Bê Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya xwastekî a dema bê de, ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî qertafa (bi-) bikar tê. Di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû û ên bi paşgiran têne darijtin de, qertafa (bi-) wek pêşgir diçe ser destpêka lêkeran; lê belê di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên bi paşgiran têne darijtin de,

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 220.

qertafa (bi-) ji holê radibe. Her wiha di lêkerên hevedudanî de jî qertafa (bi-) diçe destpêka lêkera bingehîn û dikeve di navbera bêjeya watadar û lêkera bingehîn de.

### Mînak:

hilkêşim: hil + kêş + (i)m (pêkhatî – gerguhêz)

bikelijînî: **bi** + kel + ij + î + n + î (pêkhatî - gerguhêz)

(em) dûr bixin: dûr + **bi** + x + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

rûnim: rû + n(niştin) + (i)m (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) bikeliye: **bi** + kel + ij + e (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têkbiçin: têk + **bi** + ç + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha wek xalek girîng dibe bê zanîn; di raweya xwastekî dema bê de kesê duyem ê pirjimar nîn e, çunke ev forme di raweya lêkerên fermanî de ye. Her wiha ji bo kesê sêyem ê yekjimar û kesên yekem û sêyem ên pirjimar jî dibe her tim cînavkên serbixwe (ew, em, ew) bînan bikaranîn, eger na ew jî di formê raweya lêkerên fermanî ên kesên duyem ên yekjimar û pirjimar de derdikevin.

### 2.1.3. Qertafên Raweya Daxwazî (Fermanî)

Di vê raweyê de, “axêver, fermanekê arasteyî kesê guhdar dike ku karekê encam bide, yan helwestekê nîşan bide. Her wiha demê lêkera fermanî her tim di qalibê ranebirdû/dema bê de ye.”<sup>1</sup> Wate her tim kar, çalakî, livîn piştî fermananê tê kirin. Ji ber vê yekê lêkerên fermanî wataya dema bê radigihînin.

Her wiha “pêkhatyên vê raweyê di rega ranebirdû de qertafa (bi-) ye, wek pêşgir diçe destpêka lêkerê û wek cînavkên pêvebestî ji bo kesê duyem ê yekjimar qertafa (-e) û ji bo kesê duyem ê pirjimar jî qertafên (-n) û (-in) werdigire.”<sup>2</sup>

<b>Kurmanciya Jorîn: (qertafa (bi) + reg + kes)</b>			
<b>lêker</b>	<b>q. (bi)</b>	<b>reg</b>	<b>kes</b>

<sup>1</sup> Umer Qadir, 70.

<sup>2</sup> Hacî Marif, Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 238.

bikire	bi	kir	e
bikêlin	bi	kêl	(i)n

**a. Lêkerên Gerguhêz**

<b>Kurmanciya Jorîn: (qertaga (bi) + reg + kes)</b>			
<b>Lêker</b>	<b>q. (bi)</b>	<b>reg</b>	<b>Kes</b>
biçe	bi	ç	e
biçin	bi	ç	(i)n

**b. Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya fermanî de, qertafa (bi-) di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû û ên bi paşgiran têne darijtin de, diçe destpêka lêkeran. Lê eger di raweya fermanî de, lêker bi pêşgiran bên darijtin qertafa (bi-) ji holê radibe. Her wiha eger lêker hevedudanî bin, qertafa (bi-) diçe destpêka lêkera bingehîn û dikeve di navbera bêjeya watadar û lêkera bingehîn de.

**Mînak:**

vekêşe: ve + kêş + e (pêkhatî – gerguhêz)

bikelijîne: **bi** + kel + ij + î + e (pêkhatî - gerguhêz)

dûr bixe: dûr **bi** + x + e (hevedudanî – gerguhêz)

rakeve: ra + kev + e (pêkhatî – negerguhêz)

birepise: **bi** + rep + is + e (pêkhatî – negerguhêz)

dûr bikevin: dûr **bi** + kev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha di vê raweyê de, eger lêker bi dengê dengdêr/bizvên dawî bibe qertafa kesa/ê duyem a yekjimar dernakeve, yanî ji bo derkevtina wê, tîpên kelijandinê ên dengdar (n, y, h) devr nabînin û kesa/ê duyem ê yekjimar sifir(Ø) e.

**Mînak:**

şuştin → bişo: bi + şo + kes Ø

cûn → bicû: bi + cû + kes Ø

bidirû: bi + dirû + kes Ø

girîn → bigirî: bi + girî + kes Ø

Di raweya fermanî de dema hin lêkerên gerguhêz tên gerdankirin, formê wan diguhere.

**Mînak:**

xwandin → bixwîne: bi + xwîn + e

xwandin → bixwînin: bi + xwîn + (i)n

şuştin → bişo: bi + şo + kes ø

şuştin → bişon: bi + şo + n

xwarin → bixwin: bi + xw + (i)n

Her wiha di raweya fermanî de hin lêker hen qertafên raweya fermanî vernagirin, lê belê wataya fermananê radigihînin.

**Mînak:**

here: her + e

herin: her + (i)n

vere: ver + e

verin: ver + (i)n

**2.1.4. Qertafên Raweya Çêbiwar**

Raweya çêbiwar, rewşek encamdayî an “Karek pêkhatî, bi mirovî dide zanîn. Ev rawe li gor dem û kesan nayê kişandin, her wiha ji ber ku ev rawe di nav hevokê de çawaniya tiştekê û kesekê nîşan dide, dibe rengdêr. Raweya çêbiwar bi alikariya rayeka dema borî û qertafa (-î) yê pêk tê, lê heke lêker bi dengdêre qediyabe tîpa kelijandinê (-y-) dikeve di navbera rayeka lêkerê û qertafa (-î)yê de.”<sup>1</sup>

<sup>1</sup> OCEK, *Rêzimana Kurmancî*, 241.

**Mînak:**

kolayî: kol + a + y + î (pêkhatî – çêbiwar)

girtî: gir + t + î (pêkhatî – çêbiwar)

hilweşandî: hil + weş + an + d + î (pêkhatî – çêbiwar)

kelandî: kel + an + d + î (pêkhatî – çêbiwar)

belavbûyî: belav + b + û + y + î (hevedudanî – pêkhatî – çêbiwar)

kunkirî: kun + k + ir + î (hevedudanî – pêkhatî – çêbiwar)

çûyî: ç + û + y + î (pêkhatî – çêbiwar)

gotî: go + t + î (pêkhatî – çêbiwar)

**2.1.5. Qertafên Avaniyê**

Avanî, wate; “Avaniya lêkeran li gor kirde û bireserê tê diyarkirin. Di lêkerên lebatî de kirde diyar e, lê di lêkerên tebatî de kirde diyar nîn e. Li gor bireserê jî lêkerên gerguhêz û negerguhêz û dançêker derdikevin holê.”<sup>1</sup> Her wiha Ewrehmanî Hacî Marif jî dibêje: “Ji ber, di zimanê kurdî de nîşaneyekî morfolojîk nîn e, lêkerên gerguhêz û negerguhêz pê ji hev bîr cihêkirin, boye gelek nivîskaran li ser bingeha wataya lêkerê boçûnên xwe anîne ziman”<sup>2</sup> wate bi riya wataya bingeha lêkerê tê zanîn, ka lêkerê bireser heye û gerguhêz e, an jî bireser nîn e û negerguhêz e. Heman yasa ji bo lêkerên tebat û lebat e jî. Çunke di vir de jî diyardeyek morfolojîk nîn e.

**2.1.5.1. Lêkerên Gerguhêz**

“Lêkera gerguhêz li pêş xwe du boşahiyan pir dike, wate kirde û bireserê werdigire û wek bihêz tê dîtin.”<sup>3</sup> Her wiha lêkera gerguhêz di nav xwe de dibe du beş.

<sup>1</sup> OCEK, *Rêzimana Kurmancî*, 248.

<sup>2</sup> Hacî Marif, Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 48.

<sup>3</sup> Berzencî - Umer Qadir, 144.

### a. Lêkerên Gerguhêz ên Resen

Lêkera gerguhêz a resen, “Wan lêkeran digire xwe ku di bingeha xwe de her gerguhêz in.”<sup>1</sup> Wate bêyî ku qertaf an nîşaneyekê werbigirin gerguhêz in.

#### Mînak:

birin, kirin, kirîn, şuştin, xwarin

dîtin, anîn, zanîn, kujtin, girtin

### b. Lêkerên Gerguhêz ên Naresen

Lêkera gerguhêz a naresen, “Wan lêkerên gerguhêz li xwe digire ku di bingeha xwe de negerguhêz in, lê belê bi riya paşgira (-andin) bûne lêkerên gerguhêz.

#### Mînak:

mirin → mir + andin = mirandin

livîn → liv + andin = livandin

nivistin → niv + andin = nivandin”<sup>2</sup>

şikîn → şik + andin = şikandin

tezîn → tez + andin = tezandin

kenîn → ken + andin = kenandin

meşîn → meş + andin = meşandin....hwd.

Her wiha qertafa (-andin) jî ji van pêkhatane pêk tê: andin: an + d + (i)n

“Di vir de nîşaneya (-n) çawig e, (-d-) qertafa dema borî ye, (-an-) jî wek morfîmekê dawîya regê digire û rola gerguhêzkirina lêkera negerguhêz dibîne. Her wiha di demên ranebirdû de eger lêkera negerguhêz bibe gerguhêz, dengê /a/ diguhere û dibe /ê/. Ev yeke jî wek rewşek fonolojîk tê hesibandin.”<sup>3</sup>

<sup>1</sup> Nerîman Xoşnaw, *Kirmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 109.

<sup>2</sup> h.ç.

<sup>3</sup> Berzencî - Umer Qadir, 144.-145.



**Mînak:**

spartin → dispêrim (dema niha)

gerandin → digêrînim (dema niha)

rijandin → dê birêje (dema bê)

razandin → dê birazê (dema bê)

Bo nimûne, lêkera “xwarin” lêkerek gerguhêz e. Gerguhêziya wê ji wataya wê tê derxistin, yanî bi riya wataya wê tê zanîn ku tişte (bireser) heye ji aliyê kesek (kirde)ê ve tê xwarin. Di wir de tišta girîng ew e, her lêkerek xwedî bireser be, gerguhêz e, an her lêkerek gerguhêz be xwedî bireser e.

**Mînak:**

We fêqiyên dara me **xwarin**.

Di vê hevokê de tišta hatiye xwarin, “fêqiyên dara me” ye û bireser e. Kesê ku karê xwarine jî dike, kesê duyemîn ê pirjimar “we” ye û kirde ye. Di wir de “fêqiyên dara me” di bin bandora tewgera xwarinê de maye û ew tewgere jî ji aliyê kesê duyemîn ê pirjimar “we” ve hatiye kirin.

**2.1.5.2. Lêkerên Negerguhêz**

“Lêkera negerguhêz ew lêker e, ku fişara hêza wê ji kirdeyê derbazî ser beşek din nabe. Bi watayek din derbazî ser biresera rastewxo nabe. Ev xal e, lêkera gerguhêz ji lêkera negerguhêz ciya dike.”<sup>1</sup>

Bi watayek din di lêkera negerguhêz de kesek yan tişte ku di bin bandora kirdeyê de bimîne, nîn e. Lêker bê bireser e, tenê xwedî kirde ye. Yanî çalakiya kirdeyê, ber bi kesekê ve yan bo ser tişte nabe.

**Mînak:**

**Em** duh ji bajar hatin gund.

<sup>1</sup> Nerîman Xoşnaw, *Kirmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 113.

Di vê hevokê de tišta ku di bin bandora tewgera “hatin”ê de maye nîn e. Ev hevoke xwedî kirde (kesê yekemîn ê pirjimar em) û têrker ê, wate bireser nîn e. Her wiha lêkerên negerguhêz jî ji aliyê hêz ve dibin du beş:

#### **a. Lêkerên Negerguhêz ên Xwazekî**

“Di van cure lêkerane de rola kirdeyê aşkira û îradeyî ye. Wek:

Azad çû.

Zarok vegeriya.”<sup>1</sup>

#### **b. Lêkerên Negerguhêz ên Rûdanê**

“Di van cure lêkerane de kirde xwediyê rolek îradî nîn e, wate ew bûyera rû dide li ser daxwaza kirdeyê nîn e.

**Mînak:**

Av rijiya.

Şûşe şikest.

Serdar kevt.”<sup>2</sup>

Di zimanê kurdî de “di demên borî de wextê lêkerên negerguhêz bi riya qertafa (-andin) dibin lêkerên gerguhêz qertafên deman ên lêkeran dikevin. Tenha qertafa demên borî (-d) dimîne. Wek:

**Mînak:**

rûxa – a + and = rûxand

mird – d + and = mirand

xewt – t + and = xewand

bezî – î + and = bezand...”<sup>3</sup>

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 50.

<sup>2</sup> Nerîman Xoşnaw, *Kirmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 113.

<sup>3</sup> Umer Qadir, 79.

Her wiha sebarete bi mijara avaniya lêkeran dibe eve jî bê zanîn: “Di zimanê kurdî de, lêkerên gerguhêz nikarin bibin negerguhêz, tenha lêkerên ku di bingeha xwe de negerguhêz in, dikarin bibin lêkerên gerguhêz.”<sup>1</sup> Lê belê di vî warî de boçûnên ji hev cihê hene, wate lêkerên gerguhêz dibin negerguhêz û negerguhêz jî dibin gerguhêz, bêyî qertafek rêzimanî werbigirin.

Di kurmanciya jorîn de, lêkera (dan) a gerguhêz bê pêkhatayek morfolojîk, li gor cihê lê hatiye bikaranîn û erk û rola wê a di nav hevokê de dikare bibe negerguhêz.

**Mînak:**

Te pirtûk **da** min. → da: (gerguhêz)

Mela bang da. → bang da: (negerguhêz)

Wek di mînakan de jî bedî dibe, lêkera (bang da) ji gerguhêziyê wegeriyaye negerguhêziyê. Ev guherîn jî hem bi alîkariya hin guherînên formî û hem bi alîkariya wataya lêkerê a di nav hevokê de berceste dibe. Heman rewş ji bo lêkerên negerguhêz jî rû dide. Wate lêkerên negerguhêz jî dibin gerguhêz.

**Mînak:**

Ez dereng **ketim**. → ket: (negerguhêz)

Zarok li pey bavê xwe **ket**. → ket: (gerguhêz)

Di van hevokane de lêkera (kevt) lêkerek negerguhêz e, lê belê li gor bikaranîna wê a di nav hevokê de dikare bibe lêkerek gerguhêz.

Taybetmendiyeke din jî ev e; bi riya lêkerên yarîdeder/alîkar lêkerên negerguhêz dibin gerguhêz.

**Mînak:**

Zarok **giriya**. → giriya: (negerguhêz)

Wî kurî zarok **girî xist**. → girî xist (gerguhêz)

Di hevoka yekem de lêkera (giriya) negerguhêz e. Lê belê heman lêker di hevoka duyem de, bi riya lêkera alîkar/yarîdeder (xistin) bûye gerguhêz.

<sup>1</sup> Nerîman Xoşnaw, *Kurmanciyê Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 114.

### 2.1.5.3. Lêkerên Dançêker

Di zimanê kurdî kurmanciya jorîn de, di mijara avaniya lêkeran de bireke din jî a lêkerê, lêkera dançêker e. Mebest ji lêkera dançêker; “Dema mirov karekî bi yekî din bide kirin, divê mirov avaniya dançêker bi kar bîne. Avaniya dançêker bi alîkariya lêkera (dan) tê pê.”<sup>1</sup>

#### Mînak:

Mamoste pirtûka xwe çapkir. → gerguhêz

Mamoste pirtûka xwe **da** çapkirin. → gerguhêz - dançêker

Zarokî/ê derman xwarin. → gerguhêz

Dayîkê derman bi zarokî/ê **dan** xwarin. → gerguhêz - dançêker

Min şerm kir. → gerguhêz

Wan ez **dam** şermê. → gerguhêz - dançêker

Qertafa (-an) di kurmanciya jorîn de, li gel gerguhêzkirina lêkera negerguhêz, xwediyê taybetmendiyek din e jî. Ew jî ev e; bi alîkariya lêkera (dan) rola dubare gerguhêzkirina lêkera gerguhêz dibîne. Wate pileya gerguhêziya lêkera gerguhêz zêde dike û wê bi hêztir dike.

#### Mînak:

Min tu bi Azadî dayî nas**andin**. → gerguhêz - dançêker

Wan birîna te dan pêç**andin**. → gerguhêz - dançêker

Her wiha merc nîn e her lêkerek negerguhêz bibe gerguhêz, wek lêkerên; here, vere, heyîn, hebûn, çûn, hatin...hwd.

### 2.1.5.4. Lêkerên Lebat

“Di lêkerên lebatî de kar ji aliyê kê ve tê kirin, diyar e. Dema pirsên “kî/kê” û “çî” yê ji lêkerê tên kirin, bersiv hebe, lêker lebatî ye. Ango di lêkerên lebatî de

---

<sup>1</sup> Tan, 218.

hevok li ser kirdeyê tê avakirin. Ev lêker dibe gerguhêz jî bin û dibe negerguhêz jî bin.”<sup>1</sup> Wek;

**Mînak:**

Wî ez neparastim.	Ez hatim.
Ez ji te hez dikim.	Çûk difirin.
Ew dê pirtûkê bixwîne.	Ez dê neçim

Kes an tiştên di wir de karê “neparastin, hezkirin, xwandin, hatin, firîn û neçûnê dikin”, diyar in.

Her wiha di zimanê kurdî de ji bo lêkera lebat/bikerdiyar hîç qertafek an nîşaneyek morfosîntaksî nîn e. Di wir de kes yan tiştê ku rasterast kar dike yan çalakiyekê encam dide bi riya wataya lêkerê diyar dibe. Boye lêker lebat e.

**2.1.5.5. Lêkerên Tebat**

Di lêkerên tebat/bikernadiyar de, rewş berewajî lêkerên lebat e, çunke kes û tiştên ku kar dikin yan çalakiyekê encam didin diyar nîn in, wate: “Di destûra giştî a hemû zimanekê de guhertina hevokek lebat ji bo hevokek tebat, yanî jêbirina kirdeyê, erk û rolê dispêre bireserê (lê belê bireser heman erk û wataya xwe diparêze). Her wiha her zimanek di vî warî de xwedî taybetmendiyeke xweser e.”<sup>2</sup>

Her li ser heman mijarê Samî Tan, lêkolerê zimanê kurdî, di warê hevokên tebat de dibêje: “Kirde ne diyar e û ji cihê kirdeyê, bireser li pêş e.”<sup>3</sup> Her wiha di kurmanciya jorîn de; “avaniya tebatî bi arîkariya lêkera “hatin”ê çêdibe. Ev lêkera navborî li gor deman dirûv digire.”<sup>4</sup>

**Mînak:**

Çay **hatibû** vexwarin.

Şorbe **tê** lihevexistin.

<sup>1</sup> OCEK, Nezîr, *Rêzimana Kurmancî*, 249.

<sup>2</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 323.

<sup>3</sup> Tan, 215.

<sup>4</sup> Taş, 199.

Gund **hatibûne** valakirin.

Nan **hate** lêdan.

Çêlek **hat** dotin.

Genim dê **bê** hêrandin.

Di kurmanciya jorîn de, dema lêker tê tebatkirin, “Lêkera arîkar (hatin) tê gerdankirin û lêkera serekî, bingehîn nayê gerdankirin û wek çawig dimîne.”<sup>1</sup> û di demên ranebirdû de formê lêkera “hatin” diguhere. Ji bo dema niha dibe “tê” û ji bo dema bê dibe “bê”. Her wiha ji bo ku lêker bibe tebat dibe gerguhêz be, yanî lêkerek negerguhêz nikare bibe tebat.

### 2.1.6. Qertafên Neyîniyê

Bi giştî, “Di zimanê kurdî de ev qertafên ji bo neyîniyê tîkî bikaranîn ev in: (ne-, me-, na-, nî-, ni-). Qertafa (ne-), li gel lêkerên demên borî de bikar tê. Qertafa (me-, ne-) di raweya fermanî de bikar tê. Qertafa (ni-) di kurmanciya jorîn de tenê ji bo lêkerên (karîn) û (zanîn)ê bikar tê. Qertafa (nî-), li gel lêkera alîkar (hebûn) û (heyîn)ê bikar tê.”<sup>2</sup> Her wiha di kurmanciya jorîn de, ji bo dema bê û dema bê a nêzîk jî, her qertafa (ne-) bikar tê û di dema niha de jî, ji bilî her du lêkerên karîn û zanîn, ji bo neyînîkirina lêkerê qertafa (na-) bikar tê.

Di kurmanciya jorîn de, ji bilî dema boriya berdest, di demên borî û ranebirdû; raweyên fermanî û xwastekî de, gava lêker tîkî neyînîkirin, wate qertafên (na-, ne-) werdigirin. Lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin, qertafên neyîniyê her tim diçin ser destpêka qedê lêkera bingehîn.

#### 2.1.6.1. Demên Borî

##### Mînak:

xwar → **nexwar** (xwerû - dema boriya têdeyî)

xistiye → **nexistiye** (xwerû - dema boriya dûdar)

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 343.

<sup>2</sup> Kurdoyêv, 218.-219.

hilkêşa → hil**nekêşa** (pêkhatî - dema boriya têdeyî)

kelijandiye → **nekelijandiye** (pêkhatî – dema boriya dûdar)

kelijiye → **nekeliyiye** (pêkhatî – dema boriya dûdar)

lidarxist → li dar **nexist** (hevedudanî – dema boriya têdeyî)

jibîrkiriye → jibîr**nekiriye** (hevedudanî – dema boriya dûdar)

belavbû → belav**nebû** (hevedudanî – çirokiya dema boriya têdeyî)

kom kiribûne → kom **nekiribûne** (hevedudanî – çirokiya dema boriya dûdar)

### a. Dema Boriya Berdest

Di kurmanciya jorîn de, eger lêker di dema boriya berdest de bê neyînîkirin, wate gava qertafa (ne-) bikar tê, ev qertafe di vir de nikare wek demên tir yekser biçer ser destpêka reg an qedê lêkerê, çunke qertafa espêktê (-di-) wek yekem morfîm diçer ser destpêka reg an qedê lêkerê. Yanî morfîma (-di-) dikeve di navbera morfîma (ne-) û destpêka lêkerê de.

#### Mînak:

dixist → **ne + di + xist** (xwerû – dema boriya berdest)

hildikêşa → hil + **ne + di + kêşa** (pêkhatî - dema boriya berdest)

dikelijand → **ne + di + kel + ij + an + d** (pêkhatî - dema boriya berdest)

li dar dixist → li dar **ne + di + xist** (hevedudanî – dema boriya berdest)

ji bîr fikir → ji bîr **ne + di + kir** (hevedudanî – dema boriya berdest)

Di kurmanciya jorîn de, ji bo lêkera xwerû, pêkhatî û hevedudanî a gerguhêz û negerguhêz, “Li gel formê ranebirdû ê ragihandinê de qertafa /na-/ bikar tê.”<sup>1</sup> Her wiha di zimanê kurdî de, “Qertafa (di-) a dema ranebirdû (dema niha) di kîderê de derkeve, gava lêker tê neyînîkirin, qertafa (na-) her di heman cihê wê de derdikeve.”<sup>2</sup>

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 257.

<sup>2</sup> h.ç., 296.

### 2.1.6.2. Demên Ranebirdû

Di kurmanciya jorîn de ji bo demên ranebirdû her du qertafên (na-) û (ne-) tên bikaranîn. Di dema niha de qertafa (na-), di dema bê û dema bê a nêzîk de jî qertafa (ne-) tê bikaranîn. Di kurmanciya jorîn demên ranebirdû, lêkerên xwerû û lêkerên bi riya paşgiran hatine darijtin de, qertafên (na-) û (ne-) wek pêşgir di destpêka lêkeran de cî digirin; eger lêker bi riya pêşgiran hatibin darijtin, dikevin di navbera morfîma bêjesaz û rega lêkerê de; eger lêker hevedudanî bin, di destpêka lêkerên bingehîn de cî digirin û dikevin di navbera bêjeya watadar û lêkera bingehîn de.

#### a. Dema Niha

Di kurmanciya jorîn de, ji bo lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz, qertafa (na-) bikar tê. Her wiha di zimanê kurdî de, “Qertafa (di-) a dema niha di kuderê de derkeve, di dema neyînîyê de qertafa (na-) jî her di heman cihê de derdikeve.”<sup>1</sup> Wate qertafa (di-) dikeve û qertafa (na-) cihê wê digire.

#### Mînak:

hildibijêre → hil**n**abijêre (pêkhatî – dema niha)

dikelijîne → **n**akelijîne (pêkhatî – dema niha)

têk dide → têk **n**ade (hevedudanî – dema niha)

#### b. Dema Bê û Dema Bê a Nêzîk

Di kurmanciya jorîn de, ji bo neyînîkirina dema bê û dema bê a nêzîk, qertafa (ne-) tê bikaranîn. Wate wek dema niha, bi heman qertafê nayên neyînîkirin. Di van her du demane de jî qertafa neyînîyê her tim di cihê qertafa (bi-) de derdikeve. Her wiha di dema bê a nêzîk de lêkera alîkar (kirin) qertafa neyînîyê wernagire.

#### Mînak:

dê wergerîne → dê **w**er**n**egerîne (pêkhatî – dema bê)

dê bikelijîne → dê **n**ekelijîne (pêkhatî – dema bê)

<sup>1</sup> h.ç., 296.



dê hûr bike → dê hûr **neke** (hevedudanî – dema bê)

dike veguhere → dike **veneguhere** (pêkhatî – dema bê a nêzîk)

dike bikelijîne → dike **nekelijîne** (pêkhatî – dema bê a nêzîk)

dike amade be → dike amade **nebe** (hevedudanî – dema bê a nêzîk)

### 2.1.6.3. Raweya Xwastekî

#### a. Demên Borî

##### Mînak:

bûbam → **nebûbam** (xwerû – negerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

dakevtibayî → **danekevtibayî** (pêkhatî – negerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

kelijîbûbame → **nekelijîbûbame** (pêkhatî – negerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

kevtibûba → **nekevtibûba** (hevedudanî – negerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

me firoştibaye → me **nefiroştibaye** (xwerû – gerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

wen xwedan kiriba → we xwedan **nekiriba** (hevedudanî – gerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

#### b. Demên Ranebirdû

##### Mînak:

bikevim → **nekevim** (xwerû – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

dabikevim → **danekevim** (pêkhatî – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

bikelijim → **nekelijim** (pêkhatî – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

azadbibim → azad**ne**bim (hevedudanî – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

bigirim → **ne**girim (xwerû – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

rabigirim → **ra**negirim (pêkhatî – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

bikelijînim → **ne**kelijînim (pêkhatî – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

xwedî bikim → xwedî **ne**kim (hevedudanî – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

Her wiha di zimanê kurdî de, di dema neyînîkirina raweyên xwastekî de, “Nişaneya (bi-) a raweya xwastekî di lêkerên erênî de li ku derkeve, di dema neyînîyê de qertaf (ne-) di cihê wê de derdikeve.”<sup>1</sup> û qertafa (bi-) dikeve. Her wiha gerguhêzî û negerguhêziyê; an xwerû, pêkhatî û hevedudanîbûnê di vê rewşê de hîç bandorek nîn e.

#### 2.1.6.4. Raweya Daxwazî (Fermanî)

Di kurmanciya jorîn de, ji bo neyînîkirina raweya fermanî qertafên (me-) û (ne-) tên bikaranîn. Di raweya fermanî de, qertafa (bi-) dikeve û qertafên neyînîyê di cihê wê de derdikevin.

##### **Mînak:**

bişon → **me**şon / **ne**şon (xwerû – gerguhêz – raweya fermanî)

dabigre → **dame**gre / **dane**gre (pêkhatî – gerguhêz - raweya fermanî)

bikelijînin → **me**kelijînin / **ne**kelijînin (pêkhatî – gerguhêz - raweya fermanî)

bilind bike → bilind **me**ke / bilind **ne**ke (hevedudanî – gerguhêz - raweya fermanî)

bikene → **me**kene / **ne**kene (xwerû - negerguhêz – raweya fermanî)

bikelijin → **me**kelijin / **ne**kelijin (pêkhatî – negerguhêz - raweya fermanî)

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 300.

têk biçin → têtmeçin / têtneçin (hevedudanî – negerguhêz - raweya fermanî)

Di zimanê kurdî de, “Qertafa (nî-), li gel lêkera alîkar (hebûn) û (heyîn)ê bikar tê.”<sup>1</sup> û rola neyîniyê dibîne.

**Mînak:**

hebû → nînbû (xwerû – gerguhêz – dema borî)

heye → nîne (xwerû – negerguhêz - dema fireh)

Pêştir lêkera (hebûn) bi qertafa (nî-) dihat neyînîkirin û formê (nînbû) werdigirt, lê di nava demê de di encama guhertinek rêzimanî de qertafa (nî-) formê qertafa (ne-) vergirt. Wate dengê /î/ guheriyê ji bo dengê /e/. Ev yeke jî dîsa rûdanek fonolojîk e.

**Mînak:**

hebû → nînbû → nebû (dema borî)

Di mijara neyînîkirina lêkeran de, yek xala balkêş heye, ew jî; di dema boriya berdest de, gava lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî tîn neyînîkirin, qertafa (di-) ji holê ranabe.

**Mînak:**

dizanî → **nedizanî**: **ne** + **di** + zanî (xwerû – dema boriya berdest)

rûdinişt → **rûnedinişt**: rû + **ne** + **di** + nişt (pêkhatî – dema boriya berdest)

dişikand → **nedişikand**: **ne** + **di** + şikand (pêkhatî – dema boriya berdest)

dikelijî → **nedikelijî**: **ne** + **di** + kelijî (pêkhatî – dema boriya berdest)

têk diçû → têt **nediçû**: têt **ne** + **di** + çû (hevedudanî – dema boriya berdest)

Eger qertafa (di-), di dema boriya berdest de ji holê rabe, wê demê dê formê neyîniyê ê dema boriya têdeyî/nêzîk û dema boriya berdest/berdewam wek yek lêbên. Boye ji bo ku ciyawaziyê di navbera van her du demane de bê kirin, di dema boriya berdest de qertafa (di-) ranabe. Ev bûyere, bûyere awarte ye û her wiha nîşane û selmandina vê yekê ye, ziman sîstem e û bi sîstem kar dike. Bi watayak din ev sîsteme nahêle kelênê û boşayî di ziman de dirust bibe.

<sup>1</sup> Kurdoev, 219.

Her wiha di zaravayê kurmanciya jorîn de, qertafa (ni-), tenê ji bo lêkerên (karîn) û (zanîn)ê bikar tê.

### **Mînak:**

dizane → **nizane**

dikare → **nikare**

### **2.1.7. Qertafên Cînavkên Pêvebestî**

Di zimanê kurdî, zaravayê kurmanciya jorîn de, yek ji cureyên qertafên bend ên rêzimanî, cînavkên pêvebestî ne û ev cînavkene xwediyê erk, rol û taybetmendiyên in. Wate; “Cînavkên pêvebestî ew cînavk in, ku serbixwe nayên gotin, ta bi bêjeyek axaftin(nav, ferman, tîp)ê ve neyên nivîsîn.”<sup>1</sup>

Li gor zimannasê kurd Mihemed Emîn Hewramanî; “Cînavkên pêvebestî di zimanê kurdî de dirûvek vergirtine, ku jê re qertafên bendî tê gotin, wate ji peyvê re dizeliqin. Here zêde jî tîpên dawîya peyvên.”<sup>2</sup> û dîsa li gor lêkolerek din ê zimanê kurdî; “Qertafên cînavkên kesandinê zêdetir bi tîpa dawî a lêkerê ve tîpên bestin.”<sup>3</sup>

Wek xalek girîng dibe bê zanîn di zaravayê kurmanciya jorîn de qertafên cînavkên pêvebestî nikarin wek pêşgir bînin bikaranîn, yanî her tim di dirûvê paşgir de, di dawîya pola nav û lêkeran de cî digirin.

Di zaravayê kurmanciya jorîn de, cînavkên pêvebestî (-m/-n, -î/-n, -e,-Ø/-n) wek yek deste hatine destnîşankirin û her tim amaje bi cînavkên xwerû (ez, tu, ew, em, hûn, ew) didin. Lê belê zimanevanek din ê kurd Nerîman Ebdula Xoşnav, cînavkên pêvebestî ên raweya fermanî (-e, -n) jî wek desteyek cihê û serbixwe diyar dike û dibêje: “Ev desteye (-e, -n) li gel lêkera ferman de bi kar tê.”<sup>4</sup> Eger ev boçûne rast be, di kurmanciya jorîn de du desteyên cînavkên pêvebestî hene. Ev pêkhatene, di kurmanciya jorîn de, di dawîya hemû lêkeran de dernakevin. Wate derkevîna cînavkên pêvebestî li gor dem, gerguhêzî û negerguhêziya lêkeran e.

<sup>1</sup> Elî Emîn, *Serf û Nehû (Rêziman)* 62.

<sup>2</sup> Hewramanî, *Zarî Zimanî Kurdî*, 265.

<sup>3</sup> Elî Xurşîd, 36.

<sup>4</sup> Nerîman Ebdula Xoşnav, *Rêzimanî Kurdî*, Çapa 3., Hewlêr, 2011, 43.

### 2.1.7.1. Raweyên Hewalî

Wek di serî de jî hatiye destnîşankirin, di zaravayê kurmanciya jorîn de ji bo raweyên hewalî yek deste (-m/-n, -î/-n, -e, -Ø/-n) cînavkên pêvebestî heye. Ev desteye jî li gor gerguhêzî û negerguhêzî, li gor dema borî û dema ranebirdû wek paşgir derdikeve an dernakeve. Di kurmanciya jorîn de, di lêkerên gerguhêz ên demên borî de bi hîç şeweyekê dernakevin. Boye di vir de, ji bo diyarkirina kes û mêjera lêkerê desteya duyem a cînavkên serbixwe ên tewandî bikar tê. Lê belê eger lêker, lêkerên negerguhêz ên dema borî bin, cînavkên pêvebestî derdikevin û erk û rolê dibînin di kes û mêjera lêkeran de.

Her wiha di kurmanciya jorîn de, çunke cînavkên pêvebestî her tim diçin dawiya lêkeran, cihê wan çespîwe; wate lêker çi xwerû, çi pêkhatî û çi hevedudanî bin; ew cihê xwe naguherin û cîgir in.

#### 2.1.7.1.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz

Di zaravayê kurmanciya jorîn de, cînavkên pêvebestî di dawiya lêkerên gerguhêz ên raweya demên borî de dernakevin û di van lêkerane de wek morfîma sifir Ø tîr pejirandin û kes û mêjera lêkeran ji aliyê cînavkên serbixwe ên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan) ve tê cîbcîkirin.

Di vir de ji ber, cînavkên pêvebestî wek qertaf nîn in, wate sifir (Ø) in, lêkerên; gerguhêz çi xwerû, çi pêkhatî û çi hevedudanî bin; her wiha neyînî bin, pêwîst nîn e li gor hemû demên borî bîr gerdankirin. Boye dê ji bo her demek borî yek mînak bête dan.

#### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

##### Mînak:

min kirî: min kirî + Ø (dema boriya têdeyî- gerguhêz – xwerû)

me dadixist: me dadixist + Ø (dema boriya berdest- gerguhêz - pêkhatî)

te vexwariye: te vexwariye + Ø (dema boriya dûdar- gerguhêz - pêkhatî)

te kelijandiye: te kelijandiye + Ø (dema boriya dûdar- gerguhêz - pêkhatî)

we firotibû: we firotibû +  $\emptyset$  (çîrokiya dema boriya têdeyî- gerguhêz - hevedudanî)

wî/ê dirûbûye: wî/ê dirûbûye +  $\emptyset$  (çîrokiya d. boriya dûdar - gerguhêz - hevedudanî)

### 2.1.7.1.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz

Di zaravayê kurmanciya jorîn de, eger lêker lêkerên negerguhêz ên raweyên demên borî bin; wê gavê cînavkên pêvebestî wek qertaf derdikevin û di pêkhateya lêkerê de, dibin xwedî erk û rol; kes û mêjera lêkeran diyar dikin. Ew qertafene jî pêk tên ji; (-m/-n, -î/-n, -e,- $\emptyset$ /-n). Di vir de, kesê sêyemê yekjimar hin caran wek morfîma sifir ( $\emptyset$ ) tê nîşandan. Her wiha eger lêker xwerû, pêkhatî an hevedudanî bin; an jî bên neyînîkirin dîsa her cihê xwe naguherin û di dawiya lêkeran de derdikevin.

#### a. Lêkerên Xwerû- Pêkhatî- Hevedudanî

##### Mînak:

giriya: giriya + **m** (dema boriya têdeyî – negerguhêz - xwerû)

em radiketî: em radiket + (**i**)**n** (dema boriya berdest – negerguhêz - pêkhatî)

ew kelijîye: kelijî +  $\emptyset$  + y + e (dema boriya dûdar – negerguhêz - pêkhatî)

hûn çûbûn: hûn çûbû + **n** (çîrokiya d. dema boriya têdeyî – negerguhêz - hevedudanî)

ew çeqîbûne: çeqîbû + n + **e** (çîrokiya d. boriya dûdar – negerguhêz - hevedudanî)

### 2.1.7.1.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz

Di raweya lêkerên demên ranebirdû (dema niha, dema bê û dema bê a nêzîk) ên gerguhêz de cînavkên pêvebestî wek paşgir di dawiya lêkeran de berpa dibin.

#### 2.1.7.1.3.1. Dema niha

##### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

###### Mînak:

dixwim: dixw + (i)m (dema niha – gerguhêz - xwerû)

em dadiweşînin: em dadiweşîn + (i)n (dema niha – gerguhêz - pêkhatî)

dikelijîni: dikelijîn + î (dema niha - gerguhêz - pêkhatî)

nexweş dikeve: nexweş dikev + e (dema niha – gerguhêz - hevedudanî)

#### 2.1.7.1.3.2. Dema Bê

##### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

###### Mînak:

dê bixwim: dê bixw + (i)m (dema bê – gerguhêz - xwerû)

dê dagirî: dê dagir + î (dema bê – gerguhêz - pêkhatî)

(ew) dê bikelijîne: dê bikelijîn + e (dema bê - gerguhêz - pêkhatî)

(hûn) dê parvebikin: dê parvebik + (i)n (dema bê – gerguhêz - hevedudanî)

#### 2.1.7.1.3.3. Dema Bê a Nêzîk

##### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

###### Mînak:

dikim bixwim: dik + (i)m bixw + (i)m (dema bê a nêzîk – gerguhêz - xwerû)

(em) dikin daweşînin: dik + (i)n daweşîn + (i)n (dema bê a nêzîk – gerguhêz - pêkhatî)

dikî bikelijîn: dik + î bikelijîn + î (dema bê a nêzîk - gerguhêz - pêkhatî)

(ew) dikin yekbigirin: dik + (i)n yekbigir + (i)n (dema bê a nêzîk – gerguhêz - hevedudanî)

#### **2.1.7.1.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya lêkerên demên ranebirdû (dema niha, dema bê û dema bê a nêzîk) ên gerguhêz de cînavkên pêvebestî wek paşgir di dawiya lêkeran de berpa dibin.

##### **2.1.7.1.4.1. Dema Niha**

###### **a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî**

###### **Mînak:**

digirim: digir + (i)m (dema niha – gerguhêz - xwerû)

(em) radikevin: radikev + (i)n (dema niha – negerguhêz - pêkhatî)

(ew) dikeliye: kelij+ e (dema niha – negerguhêz - pêkhatî)

(hûn) nexweşdibin: nexweş dib + (i)n (dema niha – negerguhêz – hevedudanî)

##### **2.1.7.1.4.2. Dema Bê**

###### **a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî**

###### **Mînak:**

dê bigirim: dê bigir + (i)m (dema bê – gerguhêz - xwerû)

(em) dê rakevin: dê rakev + (i)n (dema bê – negerguhêz - pêkhatî)

(ew) dê bikeliye: dê bikeliye + e (dema bê – negerguhêz - pêkhatî)

(hûn) dê nexweşbibin: dê nexweş bib + (i)n (dema bê – negerguhêz – hevedudanî)



### 2.1.7.1.4.3. Dema Bê a Nêzîk

#### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedûdanî

##### Mînak:

dikim bigirim: dik + (i)m bigir + (i)m (dema bê a nêzîk – gerguhêz - xwerû)

(em) dikin rakevin: dik + (i)n rakev + (i)n (dema bê a nêzîk – negerguhêz - pêkhatî)

(ew) dike bikeliye: dik + e bikelij + e (dema bê a nêzîk – negerguhêz - pêkhatî)

(ew) dikin serxweş bibin: dik + (i)n serxweş bib + (i)n (dema bê a nêzîk – negerguhêz - hevedudanî)

### 2.1.7.2. Raweya Xwastekî

Di zimanê kurdî, kurmanciya jorîn, raweyên xwastekî de; lêker li gor dem û gerguhêzî û negerguhêziyê, cînavkên pêvebestî werdigirin. Di vir de jî her heman desteya cînavkên pêvebestî, di heman şert û mercanên lêkerên demên borî û demên ranebirdû de derdikevin holê û di dirusteya lêkeran de devr dibînin. Eger cînavkên pêvebestî nekarîn derkevin, vê carê jî cînavkên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan) ên serbixwe derdikevin û erk û rola cînavkên pêvebestî digêrin.

#### 2.1.7.2.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz

Di raweya xwastekî a demên borî de, ji bo lêkerên gerguhêz tu nînaşeyekî morfolojîk a wek cînavkên pêvebestî nîn e. Wate bi morfîma sifir (Ø)tên nîşandan û her wiha lêker bi alikariya cînavkên serbixwe ên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan) dibin xwediyê kes û mêjerê. Her wiha lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî û çî di formê neyînî de bin; her heman rêsa û yasa tînen cêbecêkirin.

### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

#### Mînak:

min kirîba: min kirîba +  $\emptyset$  (dema boriya têdeyî- gerguhêz – xwerû)

me daxistiba: me daxistiba +  $\emptyset$  (dema boriya berdest- gerguhêz - pêkhatî)

te kelijandiba/be: te kelijandiba/be +  $\emptyset$  (dema boriya dûdar- gerguhêz - pêkhatî)

we bifirotibûya: we bifirotibûya +  $\emptyset$  (çîrokiya dema boriya têdeyî- gerguhêz - hevedudanî)

wî/ê bidirûbûyaye: wî/ê bidirûbûyaye +  $\emptyset$  (çîrokiya d. boriya dûdar-gerguhêz - hevedudanî)

#### 2.1.7.2.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz

Di zaravayê kurmanciya jorîn de, eger lêker negerguhêz bin û di raweyên xwastekî ên demên borî de bin; wê gavê cînavkên pêvebestî wek qertaf derdikevin û di pêkhateya lêkerê de dibin xwedî erk û rol; kes û mêjera lêkeran diyar dikin. Ew qertafene jî; (-m/-n, -î/-n, -e,-Ø/-n) ne. Di vir de, kesê sêyemê yekjimar hin caran wek morfîma sifîr (Ø) tê nîşandan. Her wiha eger lêker xwerû, pêkhatî an hevedudanî jî bin; her wiha bên neyînîkirin jî dîsa her cihê xwe naguherin û di dawiya lêkeran de derdikevin.

### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

#### Mînak:

giriyaam: giriyaaba + **m** (dema boriya têdeyî – negerguhêz - xwerû)

(em) raketiban: em raketiba + **n** (dema boriya berdest – negerguhêz)

kelijîbayî: kelijîba + (y)î (dema boriya dûdar – negerguhêz - pêkhatî)

(hûn) biçûbûban: hûn biçûbûba + **n** (çîrokiya d. dema boriya têdeyî – negerguhêz - hevedudanî)

biçeçûbûbaye: biçeqûbûba + **ø(y) + e** (çîrokiya d. boriya dûdar – negerguhêz - hevedûdanî)

### **2.1.7.2.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz**

Di zaravayê kurmanciy jorîn, raweyên xwastekî ên demên ranebirdû de, di lêkerên gerguhêz de formê dema niha û dema bê a nêzîk nîn e, lê belê formê dema bê heye. Di vî formê de jî cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin ser qedê lêkeran.

#### **2.1.7.2.3.1. Dema Bê**

##### **a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî**

###### **Mînak:**

binînim: bibîn + **(i)m** (dema bê – gerguhêz – xwerû)

(em) hilkêşin: hilkêş + **(i)n** (dema bê – gerguhêz – pêkhatî)

bikelijîne: bikelijîn + **e** (dema bê – gerguhêz – pêkhatî)

(hûn) amade bikin: amade bik + **(i)n** (dema bê – gerguhêz – hevedudanî)

#### **2.1.7.2.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz**

Di zaravayê kurmanciy jorîn, raweyên xwastekî ên demên ranebirdû de, di lêkerên negerguhêz de formê dema niha û dema bê a nêzîk nîn e, tenha formê dema bê heye. Di formê dema bê de jî cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin ser qedê lêkeran.

### 2.1.7.2.4.1. Dema bê

#### a. Lêkerên Xwerû-Pêkhatî-Hevedudanî

##### Mînak:

(em) bimirin: bimir + (i)n (dema bê – negerguhêz - xwerû)

(hûn) vegerin: veger + (i)n (dema bê – negerguhêz - pêkhatî)

bikelijî: bikelij + î (dema bê – negerguhêz - pêkhatî)

(ew) amade bibin: amade bib + (i)n (dema bê – negerguhêz - hevedudanî)

Her wiha, “Qertafa raweya fermanî (bi-) di lêkerên pêkhatî de ji holê radibe.”<sup>1</sup>

**Nîşe:** Di zimanê kurdî kurmanciya jorîn de, ji ber ketina qertafa demên borî (-d), di lêkera (mirin) de lêlîyek berpa dibe. Di vir de formê lêkera negerguhêz (mirin) ji bo dema niha û dema boriya berdest her heman form e.

##### Mînak:

dimirim: dema niha

dimirî: dema niha

dimire: dema niha

(em, hûn, ew) dimirin: dema niha

dimirim: dema boriya berdest

dimirî: dema boriya berdest

dimirØ: dema boriya berdest

(em, hûn, ew) dimirin: dema boriya berdest

Tenha di kesê sêyem ê yekjimar de ji hev cihê dibin, çunke di dema niha de ji bo kesê sêyem ê yekjimar qertafa (-e) wek cînavka pêvebestî bikar tê, lê belê di dema boriya berdest de cînavka pêvebestî sifir (Ø) e.

Ji bo çareserkirina vê lêliyê eger kirpandin bikeve ser kêteya yekem (di-) dema boriya berdest e, eger bikeve ser kêteya duyem (-mir) dema niha ye. Her wiha

<sup>1</sup> OCEK, *Rêzimana Kurmancî*, 227.

ev lêliye jî tenha di dema gerdankirina lêkerê de derdikeve, wate eger lêker di nav hevokê de bête bikaranîn, bi riya sîyaq an dewr û ber tê zanîn, an dê bê zanîn ka lêker di kîjan raweyê de ye.

Her çend e hin mamostayan ji bo formê dema niha lêkera “divê” bikar anîbe jî ev lêkere dibe tenha ji bo dema bê bête bikaranîn. Her wiha ji bo raweyên xwastekî, ji bilî qertafên cînavkên pêvebestî, pêwîstî bi pêkhateyên wek; “heke, divê, ku” jî heye. Eger na di hin cihan de dê wek raweya dema bê an dema niha derkevin.

### **Mînak:**

tu dixwazî (dema niha)

heke tu dixwazî (di raweya xwastekî de dema niha)

ez ê biçim (dema bê)

divê ez biçim (di dema bê de raweya xwastekî)

Di vir de qertafek taybet nîn e, ji bo ji hevcihêkirina van raweyane, boye ev yeke bi alikariye hin bêjeyan tê cîbcîkirin. Wek di serî de jî derkevtiye.

Her wiha dibe bê zanîn di berpabûn an berpanebûna qertafên cînavkên pêvebestî de, lêkeran ji aliyê ronan (xwerû, pêkhatî, hevedudanî) ve hîç bandorek nîne.

### **2.1.7.3. Raweya Daxwazî (Fermanî)**

Di zaravayê kurmanciya jorîn de, ji bo raweya fermanî desteya duyem (-e) û (-n) a cînavkên pêvebestî tê bikaranîn. Ji vê desteyê, qertafa (-e) ji bo kesa/ê duyem a/ê yekjimar; qertafa (-n) jî, ji bo kesa/ê duyem a/ê pirjimar tê bikaranîn. Raweya fermanî her tim di raweya ranebirdû de ye, wate li gor demên borî nayê gerdankirin. Di raweya fermanî, lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz de, cînavkên pêvebestî (-e) û (-n) her tim di dawiya lêkeran de derdikevin

### 2.1.7.3.1. Lêkerên Gergûhêz

#### a. Lêkerên Xwerû – Pêkhatî – Hevedudanî

##### Mînak:

bikire: bikir + e (xwerû – gerguhêz)

dagirin: dagir + (i)n (pêkhatî – gerguhêz)

dûrbixe: dûrbix + e (hevedudanî – gerguhêz)

### 2.1.7.3.2. Lêkerên Negerguhêz

#### a. Lêkerên Xwerû – Pêkhatî – Hevedudanî

bifire: bifir + e (xwerû – negerguhêz)

bikenin: biken+ (i)n (xwerû – negerguhêz)

hilfire: hilbifir + e (pêkhatî – negerguhêz)

serbikevin: serbikev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha eger lêker bi dengê dengdêran dawî bibe qertafa kesa/ê duyem a/ê yekjimar dernakeve. Wate di van forman de kesa/ê duyem ê yekjimar sifir(Ø) e.

##### Mînak:

bişo: bi + şo + Ø

## 2.2. DI KURMANCIYA NAWERAST DE QERTAFÊN LÊKERAN

Di zimanê kurdî de, lêker wek polek serbixwe û serekî xwediyê cihekî girîng in. Boye dê di vê parê de, di çêweyek morfolojîk de qertafên rêzimanî ên diçin ser lêkeran dê bên vekolîn û dahûrandin. Her wiha ev qertafene jî pêk tên ji; qertafên deman, qertafên raweya xwastekî, qertafên raweya daxwazî/fermanî, qertafên avaniyê, qertafên neyîniyê û qertafên cînavkên pêvebestî.

### 2.2.1. Qertafên Deman

Di zaravayê kurmanciya nawerast de, dem dabeş dibin bo ser du polan, ew jî; demên rabirdû/borî û demên ranebirdû ne. Di vî zaravayî de, ji bo demên borî nîşaneyên morfolojîk ên wek; (-a, -d, -î, -t, -û) bikar tên, lê belê ji bo demên ranebirdû tu nîşaneyek morfolojîk nîn e, boye; “Ji aliyê form ve hîç ciyawaziyek di navbera dema niha û dema bê de nîn e û her duyan her yek qalib heye. Ji hev cihêkirina wan; an bi riya hevokê, an bi riya barê devr û ber, an jî bi riya bikaranîna hin bêjeyên taybet diyar dibe.”<sup>1</sup>

#### 2.2.1.1. Demên Borî

Mebest ji demên borî, ev e; “Rûdana bûyer an çalakiyê di ser de çûye û bûyerê rûdaye.”<sup>2</sup> Di kurmanciya nawerast de “Lêkera dema borî, çar cur demên vê hen e: Dema boriya têdeyî/nêzîk, dema boriya berdest/berdewam, dema boriya dûdar/tewaw, çîrokiya dema boriya têdeyî/dûr.”<sup>3</sup>

##### 2.2.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî

Di dema boriya têdeyî de “Rûdana bûyerê di pêş gotinê de dibe.”<sup>4</sup> û “Pêkhateyên bineretî ên formê dema boriya nêzîk; qedê lêkerê û cînavkên kesandinê ne.”<sup>1</sup>

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 197.

<sup>2</sup> Ebdula Xoşnaw, *Kirmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 90.

<sup>3</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 200.

<sup>4</sup> Elî Xurşîd, 53.

<b>Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + kes)</b>			
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
kirîm	kir	î	m
kêlaman	kêl	a	man
xwardit	xwar	d	(i)t
firoştan	firoş	t	tan
dirû	dirû	ø	ø
dirûyan	dirû	ø	yan

#### **a. Lêkerên Gerguhêz**

Di kurmanciya nawerast, dema boriya têdeyî/rabirdûy nêzîk de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû de dikevin di navbera reg û cînavkên pêvebestî de, di lêkerên gerguhêz ên pêkhatî û hevedudanî de jî diçin dawiya qedê lêkeran.

#### **Mînak:**

helmankêşa: hel + man + kêş + **a** (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxist: dûr + (i)t + xis + **t** (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + kes)</b>			
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
kenîm	ken	î	m
mirdîn	mir	d	în
kewtît	kew	t	ît
çûn	ç	û	n
rija	rij	a	ø
rijan	rij	a	n

<sup>1</sup> Hacî Marif, Kirdar (*Lêker*), 200.



### b. Lêkerên Negerguhêz

Di kurmanciya nawerast, dema boriya têdeyî/rabirdûy nêzîk de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg an qedê lêkeran û cînavkên pêvebestî de.

#### Mînak:

raperîm: ra + per + î + m (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûyn: têk ç + û + yn (hevedudanî – negerguhêz )

#### 2.2.1.1.2. Dema Boriya Berdest

Dema boriya berdest, “Amaje bi çalakiyekê dike, ku di dema borî de didome.”<sup>1</sup>

<b>Kurmanciya Nawerast: (espêkt + kes + reg + dem)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>kes</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>
demkirî	de	m	kir	î
demankêla	de	man	kêl	a
detxward	de	t	xwar	d
detanfiroşt	de	tan	firoş	t
deydirû	de	y	dirû	ø
deyandirû	de	yan	dirû	ø

#### a.Lêkerên Gerguhêz

Di kurmanciya nawerast, dema boriya berdest/rabirdûy berdewam de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim diçin dawiya qedê lêkeran.

#### Mînak:

helimdekêşa: hel + (i)m + de + kêş + a (pêkhatî - gerguhêz)

<sup>1</sup> Elî Emîn, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, 223.

dûritdexist: dûr + (i)t + de + xis + t (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Nawerast: (espêkt + reg + dem + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dekenîm	de	ken	î	m
demirdîn	de	mir	d	în
dekewtît	de	kew	t	ît
deçûn	de	ç	û	n
derija	de	rij	a	ø
derijan	de	rij	a	n

### **b. Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya nawerast, dema boriya berdest/rabirdûy berdewam de, morfîmên deman, di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim dikevin di navbera qedê lêkeran û cînavkên pêvebestî de.

#### **Mînak:**

dadenîştim: da + de + niş + t + (i)m (pêkhatî - negerguhêz)

têk deçûyn: têk de + ç + û + yn (hevedudanî – negerguhêz )

Di dema boriya berdest de, lêker ji bilî morfîmên deman, morfîma satevext, an amraza hemîşeyî (de-) jî wek pêşgir werdigirin. Di vir de lêker çî xwarû, çî pêkhatî û çî hevedudanî be, ev morfîme her tim di destpêka lêkerê de cî digire. Bi watayak din eger lêker pêkhati û hevedudanî jî bin ew rê nade qertafek din an bêjeyek din di pêş wê de biçe ser destpêka koka lêkera bingehîn. Tenanet eger lêker neyînî jî be.

### 2.2.1.1.3. Dema Boriya Dûdar

Dema boriya dûdar “Amaje bi çalakiyekê dike, ne di demek gelek dur de, ne jî di demek gelek nêzîk de rûda be.”<sup>1</sup>

<b>Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + q. çêbiwar (û/w) + kes + espêkt)</b>					
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>û/w</b>	<b>kes</b>	<b>espêkt</b>
kirîwme	kir	î	w	m	e
kêlawmane	kêl	a	w	man	e
xwardûte	xwar	d	û	t	e
firoştûtane	firoş	t	û	tan	e
dirûye	dirû	ø	ø	y	e
dirûwyane	dirû	ø	w	yan	e

#### a. Lêkerên Gerguhêz

Di kurmanciya nawerast, dema boriya dûdar/rabirdûy tewaw de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim dikevin di navbera reg û qertafên çêbiwar/awelnawkiraw (-û-, -w-) de.

#### Mînak:

datangirtûwe: da + tan + gir + t + û + w + e (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxistûwe: dûr + (i)t + xis + t + û + w + e (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + q. çêbiwar (û/w) + kes + espêkt)</b>					
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>û/w</b>	<b>kes</b>	<b>espêkt</b>
kenîwme	ken	î	w	m	e
mirdûyne	mir	d	û	yn	e
kewtûyte	kew	t	û	yt	e

<sup>1</sup> Elî Emîn, *Serf û Nihû (Rêziman)*, 17.

(êwe) çûne	ç	û	ø	n	e
rijawe	rij	a	ø	ø	(w)e
(ewan) rijane	rij	a	ø	n	e

### b. Lêkerên Negerguhêz

Di kurmanciya nawerast, dema boriya dûdar/rabirdûy tewaw de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim dikevin di navbera reg û qertafên çêbiwar/awelnawkiraw (-û-, -w-) de.

#### Mînak:

daniştûme: da + niş + t + û + m + e (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûne: têk ç + û + ø + n + e (hevedudanî – negerguhêz )

#### 2.2.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Çîrokiya dema boriya têdeyî, “Amaje bi bûyereke dike, ku di demeke dûr û dirêj de rûdabe.”<sup>1</sup>

<b>Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + bû + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>
kirîbûm	kir	î	bû	m
kêlabûman	kêl	a	bû	man
xwardibût	xwar	d	(i)bû	t
firoştibûtan	firoş	t	(i)bû	tan
dirûbûye	dirû	ø	bû	y(e)
dirûbûyan	dirû	ø	bû	yan

### a. Lêkerên Gerguhêz

dirûwyetî: dirû + w + y + etî (reg + q. betal + kes + q. betal)

<sup>1</sup> Elî Emîn, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, 116.

Di kurmanciya nawerast, çîrokiya dema boriya têdeyî/rabirdûy dûr de, morfîmên deman di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg û lêkera alîkar (bûn) de.

**Mînak:**

helmankêşabû: hel + man + kêş + a + bû (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxistibû: dûr + (i)t + xis + t + (i)bû (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + bû + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>
kenîbûm	ken	î	bû	m
mirdibûyn	mir	d	(i)bû	(û)yn
kewtibûyt	kew	t	(i)bû	(û)yt
(êwe) çûbûn	ç	û	bû	n
rijabû	rij	a	bû	Ø
(ewan) rijabûn	rij	a	bû	n

**b. Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya nawerast, çîrokiya dema boriya têdeyî/rabirdûy dûr de, morfîmên deman di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikevin di navbera reg û lêkera alîkar (bûn) de.

**Mînak:**

raperîbûyt: ra + per + î + bû + yt (pêkhatî - negerguhêz)

(êwe) têkçûbûn: têk ç + û + bû + n (hevedudanî – negerguhêz )

Her wiha di çîrokiya dema boriya têdeyî/rabirdûy dûr de, ji bilî qertafên deman lêkera alîkar (bûn) jî bikar tê, lê belê ev lêkere her tim piştî qertafên deman tê. Di vir de lêker xwerû, pêkhatî û hevedudanî be, an gerguhêz û negerguhêz be sebarek bi cihê derketina qertafên deman hîç bandorek wê nîn e. Her wiha di zimanê kurdî de, lêkerên gerguhêz ên qertafa dema borî (-û) werdigerin nîn in.

**Têbînî:** Di kurmanciya nawerast de, formê çîrokiya dema boriya dûdar, nîn e.

### 2.2.1.2. Demên Ranebirdû

Di zimanê kurdî kurmanciya nawerast de, ji bilî demên borî/rabirdû, demên ranebirdû jî hene ku ji “dema niha û dema bê” pêk tên. Ji van her du demane bi taybet li ser qertafa dema niha (de-, di-), hin nakokî û gengeşî hene û li gor hin zimanevanan di kurdî de ji bo dema niha hîç nîşaneyek morfolojîk nîn e. Yek ji van zimanevanan Wirya Umer Emîn e û dibêje: “Ji bo dema ranebirdû reg hîç nîşaneyekê wernagire û boye di vê demê de morfîma dema ranebirdû wek sifir (Ø) tê pejirandin.”<sup>1</sup>

Her wiha di warê pênasikirina demên ranebirdû (dema niha û dema bê) de tê gotin: “Lêkera ranebirdû ew lêkere ye, ku prosesa rûdana bûyerê, an di dema axaftinê de nîşan dide, an jî li piştî axaftinê. Di zaravayê kurmanciya nawerast de; lêker çî gerguhêz, çî negerguhêz be; çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî be, ji bo pêkanîna formê dema ranebirdû qertafa (de-, e-) dikeve pêşiya rega lêkera dema ranebirdû û dawiya rega lêkerê jî qertafên cînavkên kesandinê ên bêhêz tene ser.”<sup>2</sup>

#### 2.2.1.2.1. Dema Niha

Dema niha, wate; “Dema bûyer, kar û bizavek di dema ku em tê de ne û bi vegotinê re pêk tê, wekî dema niha tê binavkirin.”<sup>3</sup> Her wiha pêkhateya dema niha hîç daneyekî morfolojîk nîne û “Nîşaneya (de-) jî amrazê her daîmiyê ye.”<sup>4</sup> û wataya demê ranagihîne. Boye di vir de morfîma demê wek sifir (Ø) tê pejirandin.

<b>Kurmanciya Nawerast: (espêkt + reg + demØ + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dekirim	de	kir	ø	(i)m
dekêlîn	de	kêl	ø	în
dexwoyt	de	xwar	ø	yt

<sup>1</sup> Umer Emîn, 123.

<sup>2</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 191.

<sup>3</sup> OCEK, *Rêzimana Kurmancî*, 224.

<sup>4</sup> Umer Emîn, 122.

(êwe) defiroşin	de	firoş	∅	(i)n
dedirû	de	dirû	∅	∅
(ewan) dedirûn	de	dirû	∅	n

**a. Lêkerên Gerguhêz**

<b>Kurmanciya Nawerast: (espêkt + reg + dem∅ + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dekenim	de	ken	∅	(i)m
demirîn	de	mir	∅	în
dekewît	de	kew	∅	ît
(êwe) deçin	de	ç	∅	(i)n
derijêt	de	rij	∅	êt
(ewan) derijin	de	rij	∅	(i)n

**b. Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya nawerast de, çunke ji bo dema niha, morfîma demê wek sifir (∅) hatiye diyarkirin, ev erk û role bi riya komelek bêjeyên wek; “henûke/anha, êsta/niha, emro/îro, ev hefte, ev sal an ev sede...”<sup>1</sup> tê cêbecêkirin. Her wiha nîşaneyê her daîmiyê (de-) jî wek pêşgir her tim diçe destpêka rega lêkerê. Heman rewş, di lêkerên pêkhatî û hevedudanî de jî berpa dibe û di lêkerên pêkhatî de, diçe ser destpêka rega lêkerê û dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkerê de. Eger lêker hevedudanî be, dîsa diçe ser destpêka rega lêkerê û vê carê jî dikeve di navbera bêjeya yekem û lêkera bingehîn de. Her wiha ji ber nebûna qertaf an nîşaneyekê ji bo formê dema niha, mînakên lêkerên gerguhêz û negerguhêz bi hev re hatine nivîsîn.

**Mînak:**

heldekêşim: hel + de + kêş + ∅ + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

(ewan) dûr dixin: dûr de + x + ∅ + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

radeperî: ra + de + per + ∅ + î (pêkhatî - negerguhêz)

<sup>1</sup> Elî Xurşîd, 68.

têk deçêt: têk de + ç + ø + êt (hevedudanî – negerguhêz )

### 2.2.1.2.2. Dema Bê

Dema bê; “Ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye, tê bikaranîn.”<sup>1</sup>, an “Ji bo bûyerên ku wê di pêşerojê de pêk bîn, tê bikaranîn. Wate vegotin heye lê bûyer hêj neqewimiye.”<sup>2</sup>

Di zaravayê kurmanciya nawerast de, “Hîç nîşaneyekî morfolojîk ji bo dema bê nîn e.”<sup>3</sup> Boye dema bê jî bi alîkariya komelek bêjeyên wek; “sibeynê, dusibey, beyanî, dubeyanî, salêkî dî, salêkî tir, havînê, beharê, em havîne...tozêkî tir, paş maweyek...”<sup>4</sup> tê bercestekirin. Bi watayek din dikare bê gotin; dema bê, di zaravayê kurmanciya nawerast de wek demê rîzimanî (tens) nîn e, wek demê asayî (time) heye.

Mebest ji têgeha “Tens’ê, dema bûyerê ye û bi riya pêkhatayên morfolojîk di nav lêkerê de derdikeve, lê belê (time) dema asayî ye û bi riya komelek bêjeyan derdikeve.”<sup>5</sup> Wate xwediyê pêkhatayên morfolojîk nîn e û bi riya lêkerê dernakeve.

Ji ber ku dema bê xwediyê tu nîşaneyên morfolojîk nîn e, dê bi tabloyê neyê nîşandan. Lê belê bi riya bikaranîna hin bêjeyên deman di nav hevokan de, dikare bê nîşandan.

#### Mînak:

Min **beyanî** karim heye, debê birom bo zanko.

Min **havînê dahatû** deçim bo geşt.

**Tozêkî tir** xwardin amade debêt.

**Têbînî:** Di kurmanciya nawerast de, dema bê a nêzîk, bi hîç şêweyekê dernakeve. Wate ne di pêkhateya bêjeyê de, ne jî di pêkhateya hevokê de dernakeve.

<sup>1</sup> TAN, 237.

<sup>2</sup> BILBIL – BARAN, 76.

<sup>3</sup> Kurdoyêv, 225.

<sup>4</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 198.

<sup>5</sup> Umer Qadir, 60.



### 2.2.2. Qertafên Raweya Xwastekî

Di zarawayê kurmanciya nawerast de lêker ji aliyê rawe (rêjeya lêkerê), ve dabeş dibe ser Raweya Ragihandinê/Hewalî, Raweya Daxwazî/Fermanî û Raweya Xwastekî/Dananî. Ji ber ku li serê amaje bi raweya ragihandinê hatiye dan, di vir de dê qala raweya fermanî û raweya xwastekî bê kirin.

Mebest ji raweya merc, xwazge û dananî; “Bi pê wataya giştî hevok; ku ji pêkhate û nîşaneyên lêkeran bi dest dikeve, raweyên merc, xwazge û dananiyê diyar dike. Di van raweyane de, formê lêkerê li gor deman bi heman şêwe tê darijtin. Wataya hevokan li gor wataya merc, xwazge û dananî(şart)yê li hev tê cihêkirin.”<sup>1</sup> Qertafên raweyên dananî, xwazge û merc di zarawayê kurmanciya nawerast de pêk tên ji; (bi-, ba-, -aye).

Raweyên xwastekî, di zarawayê kurmanciya nawerast de jî, li gor demên borî û demên ranebirdû tên gerdankirin. Wate raweya demên borî (dema boriya têdeyî/nêzîk, dema boriya berdest/berdewam, dema boriya dûdar/tewaw, çîrokiya dema boriya têdeyî/dûr) û demên ranebirdû (dema niha/êsta û dema bê/ayînde).

#### 2.2.2.1. Raweya Xwastekî di Demên Borî de

Lêker ji aliyê raweya xwastekî ve her wek raweya lêkerên ragihandin/hewalî dabeş dibe ser dema rabirdû/dema borî, dema ranebirdû de û qertafên (-bi-), (-ba-) û (-aye) jî her sê formên vê raweyê ne.”<sup>2</sup>

Dîsan di ciheke din de jî li ser vê mijarê tê ragihandin; “Raweya xwastekî, ew rawe ye; encama wê çalakî, livîn an tewgera ku dide pişt kesekê an tiştêkê, bi şêweyekî rastewxo nade dest, çunke mebesta wê di asta “daxwazî, arezû, hêvî... hwd.” de dimîne. Wate di vê raweyê de peyvên wek; “xozga, birya, debûwaye, debû, debêt...hwd”<sup>3</sup> rol dibînin.

<sup>1</sup> Ebûbekir Umer Qadir, 69.

<sup>2</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 216.

<sup>3</sup> Ebdûla Xoşnaw, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, 102.

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + ba + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>
kirîbam	kir	î	ba	m
kêlabaman	kêl	a	ba	man
xwardibat	xwar	d	(i)ba	t
firoştibatan	firoş	t	(i)ba	tan
dirûba	dirû	ø	ba	ø
dirûbayan	dirû	ø	ba	yan

### **a. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz**

Di raweya xwastekî a dema boriya têdeyî/nêzîk de, ji bo lêkerên gerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî, qertafa (-ba-) bikar tê. Di lêkerên gerguhêz ên xwerû de qertafa (-ba-) dikeve di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de, lê belê di lêkerên gerguhêz ên pêkhatî û hevedudanî de, wek axîr paşgir di dawiya lêkeran de derdikeve, çunke cînavkên pêvebestî ên bihêz di dawiya lêkerên gerguhêz de dernakevin, cih diguherin.

#### **Mînak:**

helimkêşaba: hel + (i)m + kêş + a + **ba** (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxistiba: dûr + (i)t + xis + t + (i)**ba** (hevedudanî – gerguhêz)

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + ba + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>
kenîbam	ken	î	ba	m
mirdibayn	mir	d	ba	yn
kewtibayt	kew	t	ba	yt
(êwe) çûban	ç	û	ba	n
rijaba	rij	a	ba	ø

(ewan) rijaban	rij	a	ba	n
----------------	-----	---	----	---

### b. Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz

Di raweya xwastekî a dema boriya têdeyî/nêzîk de, ji bo lêkerên negerguhêz ên xwarû, pêkhatî û hevedudanî, qertafa (-ba-) bikar tê. Her wiha di vir de lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin qertafa (-ba-) dikeve di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de.

#### Mînak:

raperîbayn: ra + per + î + **ba** + yn (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbayt: têk + ç + û + **ba** + yt (hevedudanî – negerguhêz )

kurmanciya nawerast: (bi + kes + reg + dem + ba + aye)						
lêker	bi	kes	reg	dem	ba	aye
bimkirîbaye	bi	m	kir	î	ba	aye
bimankêlabaye	bi	man	kêl	a	ba	aye
bitxwardibaye	bi	t	xwar	d	(i)ba	aye
bitanfiroştibaye	bi	tan	firoş	t	(i)ba	aye
bidirûbaye	bi	ø	dirû	ø	ba	aye
biyandirûbaye	bi	yan	dirû	ø	ba	aye

### c. Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz

Di raweya xwastekî a dema boriya berdest/berdewam de, ji bo lêkerên gerguhêz qertafên (bi-, -ba-, -aye) tîn bikaranîn. Di vê raweyê de, di lêkerên xwerû de, qertafa (bi-) her tim wek pêşgir di destpêka qedê lêkerê de cih digire. Lê belê di lêkerên gerguhêz ên pêkhatî de, dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û destpêka lêkeran de û her wiha di lêkerên hevedudanî de jî dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û destpêka lêkerên bingehîn de.

Her wiha di raweya xwastekî a dema boriya berdest/berdewam de, di hemû lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafên (-ba-) û (-aye) li pey hev di dawiya lêkeran de derdikevin.

**Mînak:**

helimbikêşabaye: hel + (i)m + **bi** + kêş + a + **ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

dûritbixistibaye: dûr + (i)t + **bi** + xis + t + (i)**ba** + **aye** (hevedudanî – gerguhêz)

<b>kurmanciya nawerast: (bi + reg + dem + ba + kes + aye)</b>						
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>aye</b>
bikenîbamaye	bi	ken	î	ba	m	aye
bimirdibaynaye	bi	mir	d	(i)ba	yn	aye
bikewtibaytaye	bi	kew	t	(i)ba	yt	aye
(êwe) biçûbanaye	bi	ç	û	ba	n	aye
birijabaye	bi	rij	a	ba	ø	aye
(ewan) birijabanaye	bi	rij	a	ba	n	aye

**d. Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya xwastekî a dema boriya berdest/berdewam de, ji bo lêkerên negerguhêz qertafên (bi-, -ba-, -aye) tên bikaranîn. Di vê raweyê de, di lêkerên negerguhêz ên xwerû de, qertafa (bi-) her tim wek pêşgir di detpêka qedê lêkerê de cih digire. Lê belê di lêkerên negerguhêz ên pêkhatî û hevedudanî de qertafa (bi-) dernakeve.

Her wiha di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafa (-ba-) dikeve di navbera qertafên deman û cînavkên pêvebestî de û qertafa (-aye) jî li piştî cînavkên pêvebestî wek axîr qertaf di dawiya lêkeran de derdikeve.

**Mînak:**

raperîbaynaye: ra + per + î + **ba** + yn + **aye** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbaytaye: têk ç + û + **ba** + yt + **aye** (hevedudanî – negerguhêz)

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bi + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bi</b>	<b>kes</b>
kirîbim	kir	î	bi	m
kêlabiman	kêl	a	bi	man
xwardibit	xwar	d	(i)bi	t
firoştibitan	firoş	t	(i)bi	tan
dirûyetî	dirû	ø	ø	y (etî)* <sup>1</sup>
dirûbiyan	dirû	ø	bi	yan

#### **e. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Gerguhêz**

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bi + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bi</b>	<b>kes</b>
kenîbim	ken	î	bi	m
mirdibîn	mir	d	(i)bi	în
kewtibît	kew	t	(i)bi	ît
(êwe) çûbin	ç	û	bi	n
rijabêt	rij	a	b	Ø (êt)
(ewan) rijabin	rij	a	bi	n

#### **f. Dema Boriya Dûdar Lêkerên Negerguhêz**

Di raweya xwastekî a dema boriya dûdar/tewaw de, ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî her yek qertaf (bi-) bikar tê û her wiha di hemûyan de, di heman cî de derdikeve. Wate li paş morfîmên deman tê nivîsîn. Boye mînak û rawekirina wan di dawiya her du xişteyan de li gel yek hatiye nivîsîn.

#### **Mînak:**

helimkêşabît: hel + (i)m + kêş + a + **b** + ît (pêkhatî - gerguhêz)

\* Di kurmanciya nawerast de qertafên (-at, -êt) di dema boriya dûdar de ji bo raweyên xwastekî bikar tên.

dûritxistibêt: dûr + (i)t + xis + t + (i)**b** + êt (hevedudanî – gerguhêz)

raperîbim: ra + per + î + **b** + (i)m (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbin: têk + ç + û + **b** + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

**Têbînî:** Di zaravayê kurmanciya nawerast, çîrokiya dema boriya têdeyî de du formên cêwaz ên raweyên xwastekî hene, boye me di wir de mijar bi riya çend xişteyên ji hev cuda bedî kirine. Wek:

**Formê Yekem:**

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + ba + kes + aye)</b>						
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>aye</b>
kirîbûbamaye	kir	î	bû	ba	m	aye
kêlabûbamanaye	kêl	a	bû	ba	man	aye
xwardibûbataye	xwar	d	(i)bû	ba	t	aye
firoştibûbatanaye	firoş	t	(i)bû	ba	tan	aye
dirûbûbaye	dirû	ø	bû	ba	ø	aye
dirûbûbayane	dirû	ø	bû	ba	yan	aye

**g. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz**

Di raweya xwastekî, çîrokiya dema boriya têdeyî/dûr de, ji bo lêkerên gerguhêz di formê yekem de qertafên (-ba-, -aye) tên bikaranîn. Di vê raweyê de, di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafa (-ba-) her tim dikeve di navbera lêkera alîkar (bûn) û cînavkên pêvebestî de û qertafa (-aye) jî piştî cînavkên pêvebestî di dawiya lêkeran de derdikeve. Lê di lêkerên gerguhêz ên pêkhatî û hevedudanî de qertafên (-ba-, -aye) li piştî lêkera alîkar (bûn) li pey hev tînin û hîç qertafek nakeve di navbera wan de.

**Mînak:**

helimkêşabûbaye: hel + (i)m + kêş + a + bû + **ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxistibûbaye: dûr + (i)t + xis + t + (i)bû + **ba** + **aye** (hevedudanî – gerguhêz)

**Formê Duyem:**

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + kes + aye)</b>					
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>	<b>aye</b>
kirîbûmaye	kir	î	bû	m	aye
kêlabûmanaye	kêl	a	bû	man	aye
xwardibûtaye	xwar	d	(i)bû	t	aye
firoşîbûtanaye	firoş	t	(i)bû	tan	aye
dirûbûye	dirû	ø	bû	ø	aye
dirûbûyane	dirû	ø	bû	yan	aye

Di raweya xwastekî, çirokiya dema boriya têdeyî/dûr de, ji bo lêkerên gerguhêz di formê duyem de bes qertafa (-aye) tê bikaranîn. Di vir de, di lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafa (-aye) her tim di dawiya lêkeran de derdikeve.

**Mînak:**

helimkêşabûwaye: hel + (i)m + kêş + a + bû + w + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxistibûwaye: dûr + (i)t + xis + t + (i)bû + w + **aye** (hevedudanî - gerguhêz)

**Formê Yekem:**

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + ba + kes + aye)</b>						
<b>lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>aye</b>
kenîbûbamaye	ken	î	bû	ba	m	aye
mirdibûbaynaye	mir	d	(i)bû	ba	yn	aye
kewtibûbaytaye	kew	t	(i)bû	ba	yt	aye
(êwe) çûbûbanaye	ç	û	bû	ba	n	aye
rijabûbaye	rij	a	bû	ba	ø	aye

(ewan) rijabûbanaye	rij	a	bû	ba	n	aye
---------------------	-----	---	----	----	---	-----

### h. Çirokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz

Di raweya xwastekî, çirokiya dema boriya têdeyî/dûr de, ji bo lêkerên negerguhêz di formê yekem de qertafên (-ba-, -aye) tên bikaranîn. Di vê raweyê de, di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafa (-ba-) her tim dikeve di navbera lêkera alîkar (bûn) û cînavkên pêvebestî de, qertafa (-aye) jî her tim di dawiya lêkeran de wek axîr qertaf derdikeve.

#### Mînak:

raperîbûbamaye: ra + per + î + bû + **ba** + m + **aye** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbûbaynaye: têk + ç + û + bû + **ba** + yn + **aye** (hevedudanî – negerguhêz)

#### Formê Duyem:

kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + kes + aye)					
lêker	reg	dem	bû	kes	aye
kenîbûmaye	ken	î	bû	m	aye
mirdibûynaye	mir	d	(i)bû	yn	aye
kewtibûytaye	kew	t	(i)bû	yt	aye
(êwe) çûbûnaye	ç	û	bû	n	aye
rijabûye	rij	a	bû	∅	(y)e
(ewan) rijabûnaye	rij	a	bû	n	aye

Di raweya xwastekî, çirokiya dema boriya têdeyî/dûr de, ji bo lêkerên negerguhêz di formê duyem de bes qertafa (-aye) tê bikaranîn. Di vir de di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafa (-aye) her tim piştî cînavkên pêvebestî di dawiya lêkeran de derdikeve.

#### Mînak:

raperîbûmaye: ra + per + î + bû + m + **aye** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbûynaye: têk + ç + û + bû + yn + **aye** (hevedudanî – negerguhêz )



**Têbînî:** Di kurmanciya nawerast, raweya xwastekî de, formê çîrokiya dema boriya dûdar nîn e.

### 2.2.2.2. Di Raweya Xwastekî Demên Ranebirdû De

Di raweya xwastekî, dema bê de; “ji bo her du lêkerên gerguhêz û negerguhêz qertafa (bi-) wek pêşgir diçe pêşiya rega lêkerê.”<sup>1</sup>

<b>kurmanciya nawerast: (bi + reg + demØ + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
bikirim	bi	kir	ø	(i)m
bikêlîn	bi	kêl	ø	în
bixwoyt	bi	xwar	ø	yt
(êwe) bifiroşin	bi	firoş	ø	(i)n
bidirû	bi	dirû	ø	ø
(ewan) bidirûn	bi	dirû	ø	n

#### a. Dema Bê Lêkerên Gerguhêz

<b>kurmanciya nawerast: (bi + reg + demØ + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
bikenim	bi	ken	ø	(i)m
bimirîn	bi	mir	ø	în
bikewît	bi	kew	ø	ît
(êwe) biçin	bi	ç	ø	(i)n
(ew) birije	bi	rij	ø	e
(ewan) birijin	bi	rij	ø	n

<sup>1</sup> Elî Xurşîd, 82.

### b. Dema Bê Lêkerên Negerguhêz

Di raweya xwastekî a dema bê de, ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz qertafa (bi-) tê bikaranîn. Qertafa (bi-) di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû de, di destpêka lêkeran de derdikeve. Di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên pêkhatî de, dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkeran de. Her wiha di lêkerên hevedudanî de jî dikeve di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingehîn de. Cihê qertafa (bi-) di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her wek yek e, boye mînak û rawekirina wan di dawiya her du xiştayan de li gel yek hatiye nivîsîn.

#### Mînak:

dabixim: da + **bi** + x + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

dûrbixin: dûr + **bi** + x + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

rabiperît: ra + **bi** + per + ît (pêkhatî - negerguhêz)

têkbiçin: têk + bi + ç + (i)n (hevedudanî – negerguhêz )

**Têbînî:** Di kurmanciya nawerast, raweya xwastekî de, ji bo dema niha û dema bê a nêzîk, tu nîşane nîn in. Wate ev demene di asta morfolojî de di formê gerdankirina lêkeran de dernakevin.

### 2.2.3. Qertafên Raweya Daxwazî (Fermanî)

Pêkhateya raweya fermanî, di zaravayê kurmanciya nawerast de bi qertafa (bi-) tê bidestxistin. Di vê raweyê de, “mebest ji fermananê ev e, ku kesê yekem (axêver), ji kesên duyem (yekjimar û pirjimar) wate guhdarî/ê, daxwaz dike karekî, çalakiyekê encam bidin.”<sup>1</sup> Her wiha demê lêkera fermanî her tim ranebirdû/dema bê ye. Wate her tim kar, çalakî, livîn piştî fermananê tê kirin. Ji ber vê yekê lêkerên fermanî wataya dema bê radigihînin.

<sup>1</sup> Ebdûla Xoşnav, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, 104.

<b>Kurmanciya Nawerast: (qertafa (bi) + reg + kes)</b>			
<b>lêker</b>	<b>q. (bi)</b>	<b>reg</b>	<b>kes</b>
bikire	bi	kir	e
bikêlin	bi	kêl	(i)n

**a. Lêkerên Gerguhêz**

<b>Kurmanciya Nawerast: (qertafa (bi) + reg + kes)</b>			
<b>lêker</b>	<b>q. (bi)</b>	<b>reg</b>	<b>kes</b>
biçe	bi	ç	e
biçin	bi	ç	(i)n

**b. Lêkerên Negerguhêz**

Di zaravayê kurmanciya nawerast de, qertafa (bi-) di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû de diçe destpêka lêkeran, di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên pêkhatî de dikeve di navbera pêşgira darêjer û destpêka lêkeran de; her wiha di lêkerên hevedudanî de jî, diçe destpêka lêkera bingehîn û dikeve di navbera bêjeya watadar û lêkera bingehîn de. Di raweya fermanî de jî cihê qertafa (bi-) di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her wek yek e, boye mînak û rawekirina wan di dawiya her du xîştayan de li gel yek hatiye nivîsîn.

**Mînak:**

dabigire: da + **bi** + gir + e (pêkhatî – gerguhêz)

dûr bixe: dûr + **bi** + x + e (hevedudanî – gerguhêz)

dabinişe: da + bi + niş + e (pêkhatî – negerguhêz)

dûr bikevin: dûr **bi** + kev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha eger lêker bi dengê dengdêr/bizvên dawî bibe qertafa kesa/ê duyem a yekjimar dernakeve û tenanet tîpên kelijandinê ên dengdar (n, y) jî rola xwe nalîzin ji bo derkevîna wê. Wate di van forman de kesa/ê duyem ê yekjimar sifir(Ø) e.

Di zaravayê kurmanciya nawerast de formê hin lêkerên gerguhêz dema ku, wek raweya fermanî tên gerdankirin, diguhere. Wate dengê /u/ vediguhere bo dengê

/o/ û dengê /a/ jî vediguher bo dengê /ê/ Ev guherîn an alugorbûnene diyardeyên fonolojîk in.

**Mînak:**

şuştin → bişo: bi + şo + kesø (u ↔ o)

xwardin → bixwo: bi + xw + o (a ↔ o)

xwandin → bixwênin: bi + xw + ên + e (a ↔ ê)

Di zaravayê kurmançiya nawerast de, lêkerên (were, werin) bêyî qertafên raweya fermanî werbigirin, xwediyê wataya fermananê ne.

**Mînak:**

were: wer + e

werin: wer + (i)n

**2.2.4. Qertafên Raweya Çêbiwar**

Di zimanê kurdî kurmançiya nawerast de raweya çêbiwar, an raweya awelnawkiraw, bi riya qertafên (-û-, -w-) tê kirin û gava lêker li gor dema boriya dudar/tewaw tên gerdankirin, derdikeve holê. Ev qertafene, di lêkerên xwerû ên gerguhêz, negerguhêz û lêkerên pêkhatî ên negerguhêz de, dikevin di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de. Eger lêker gerguhêz, pêkhatî û hevedudanî bin, dikevin di navbera qertafên demên borî û qertafên betal, an tîpa kelijandinê de, bi watayek din, di kurmançiya nawerast de lêkerên çêbiwar, awelnawkiraw, qertafên deman û cînavkên pêvebestî werdigirin.

**Mînak:**

kirîwme: kir + î + w + m + e (xwerû – gerguhêz – çêbiwar)

helmangirtûwe: hel + man + gir + t + û + w + e (pêkhatî – gerguhêz – çêbiwar)

dûritxistûwe: dûr + t + x + is + t + û + w + e (hevedudanî – gerguhêz – çêbiwar)

kewtûyne: kew + t + û + yn + e (xwerû – negerguhêz – çêbiwar)

(êwe) daniştûne: da + niş + t + û + n + e (pêkhatî – negerguhêz – çêbiwar)

### 2.2.5. Qertafên Avaniyê

Di zaravayê kurmanciya nawerast de ji bo têgeha (avanî)yê, têgehên wek; gorînî tuwanay kar û hêzî kirdar, bi kar tên. “Mebest ji guhertina şiyana kar, hêz/avaniya lêkerê, wate guhertina lêkerê ji gerguhêz bo negerguhêzê û negerguhêz ji bo gerguhêzê li xwe digre, ku bi riya pêkhateyên rêzimanî encam dide.”<sup>1</sup> Her di warê heman babetê de Ewdirehmanî Hacî Marif jî dibêje: “Lêker, ji aliyê watayê ve dibe du beşên mezin; gerguhêz û negerguhêz, ku ew jî ji aliyê bireserê ve ji hev cûda dibin. Lêkera gerguhêz çalakiya kirdeyê a bo ser bireserê nîşan dide. Lêkera negerguhêz jî amaje bi bûyerekê dide ku tenê bi kirdeyê ve girêdayî be.”<sup>2</sup>

#### 2.2.5.1. Lêkerên Gerguhêz

“Lêkera gerguhêz ew karê kirde dike, derbazî ser kes an tiştêkî din dike û biresera rastewxo werdigire.”<sup>3</sup> Her wiha lêkera gerguhêz di nav xwe de dibe du beş:

##### a. Lêkerên Gerguhêz ên Resen

Lêkera gerguhêz a resen, “Wan lêkeran digire xwe ku di bingeha xwe de her gerguhêz in. Wek; bir, kir, kirîn, şûşt, xwar...hwd.”<sup>4</sup>

##### Mînak:

“Gurg mer dexwat. → (mer) – bireser e.

Zewîm kêla. → (zewî) – bireser e.

Paret dedemê. → (pare) û (t-to) bireser in.”<sup>5</sup>

<sup>1</sup> Umer Qadir, 78.

<sup>2</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 45.- 46.

<sup>3</sup> RIZGAR, Baran, *Uygulamalı Kürtçe Dersleri-Dersên Kurdî*, Stenbol, 2005, 117.

<sup>4</sup> Ebdula Xoşnaw, *Kirmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 109.

<sup>5</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 51.

### b. Lêkerên Gerguhêz ên Naresen

Lêkera gerguhêz a naresen, “Wan lêkerên gerguhêz li xwe digire ku di bingeha xwe de negerguhêz in, lê belê bi riya paşgira (-andin) bûne lêkerên gerguhêz.”<sup>1</sup>

#### Mînak:

şikîn → şik + andin = şikandin

tezîn → tez + andin = tezandin

kenîn → ken + andin = kenandin

meşîn → meş + andin = meşandin...hwd

Her wiha di kurmanciya nawerast de jî, “di demên ranebirdû de eger lêkera negerguhêz bibe gerguhêz, dengê (a) diguhere û dibe (ê). Ev yeke jî wek rewşek fonolojîk tê hesabandin.”<sup>2</sup>

#### Mînak:

spartin → despêrim (dema niha) : a → ê

rijandin → derêje (dema niha) : a → ê

razandin → derazê (dema niha) : a → ê

niwandin → deniwêne (dema niha) : a → ê

Bo nimûne lêkera (dîtin), lêkerek gerguhêz e. Gerguhêziya wê ji wataya wê tê derxistin, yanî bi riya wataya wê tê zanîn ku tiştê (bireser) heye ji aliyê kesek (kirde)ê ve tê dîtin. Di wir de tiştê girîng ew e, her lêkerek xwedî bireser be, gerguhêz e an her lêkerek gerguhêz be xwedî bireser e.

#### Mînak:

Ême êwe **debînin**.

Di vê hevokê de tiştê hatiye dîtin, (êwe) ye û bireser e. Kesê ku karê dîtinê jî dike, kesê yekemîn ê pirjimar (ême) ye û kirde ye. Di vir de (êwe) di bin bandora

<sup>1</sup> Ebdula Xoşnaw, *Kurmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 109.

<sup>2</sup> Berzencî – Umer Qadir, 144.-145.

tewgera dîtînê de maye û ew tewgere jî ji aliyê kesê yekemîn ê pirjimar (ême) ve hatiye kirin.

### 2.2.5.2. Lêkerên Negerguhêz

“Lêkera negerguhêz, ew karê ku kirde dike arasteyî bireserek rastewxo nake, wate ji bo karkirinê pêwîstî bi bireserek rastewxo nîn e.”<sup>1</sup> Bi watayek din di lêkera negerguhêz de kesek yan tiştek ku di bin bandora kirdeyê de bimîne, nîn e. Lêker bê bireser e, tenê xwedî kirde ye. Yanî çalakiya kirdeyê, ber bi kesekê ve an bo ser tiştekê nabe.

#### **Mînak:**

Ême diwênê le şar **hatîn** bo lade.

Di vê hevokê de tişta ku di bin bandora tewgera (hatin)ê de maye nîn e. Wate ev hevoke, xwediyê kirde (kesê yekemîn ê pirjimar (ême)) û têrkeran e û bê bireser e.

Her wiha di zimanê kurdî de lêkerên negerguhêz, ji aliyê hêz ve dibin du beş:

#### **a. Lêkerên Negerguhêz ên Xwazekî**

“Di van cure lêkerane de rola kirdeyê aşkira û îradeyî ye. Wek:

Azad çû.

Zarok vejeriya.”<sup>2</sup>

#### **b. Lêkerên Negerguhêz ên Rûdanê**

“Di van cure lêkerane de kirde xwediyê rolek îradî nîn e, wate ew bûyera rû dide li ser daxwaza kirdeyê nîn e.

#### **Mînak:**

Av rijiya.

<sup>1</sup> RIZGAR, 117.

<sup>2</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 50.

Şûşe şikest.

Serdar kewt.”<sup>1</sup>

Di zaravayê kurmanciya nawerast de, “di demên borî de gava lêkerên negerguhêz bi riya qertafa (-andin) dibin lêkerên gerguhêz, qertafên deman ên lêkeran dikevin. Wek:

**Mînak:**

rûxa – a + and = rûxand

mird – d + and = mirand

xewt – t + and = xewand

bezî – î + and = bezand...”<sup>2</sup>

Her wiha sebarek bi mijara avaniya lêkeran dibe eve jî bê zanîn: “Di zimanê kurdî de, lêkerên gerguhêz nikarin bibin negerguhêz, tenha lêkerên di bingeha xwe de negerguhêz in, dikarin bibin lêkerên gerguhêz.”<sup>3</sup>

Lê belê di vî warî de boçûnên ji hev cihê hene, wate lêkerên gerguhêz dibin negerguhêz û negerguhêz jî dibin gerguhêz, bêyî qertafek rêzimanî werbigirin. Tenha bi riya guhertina formê lêkerê.

Di zaravayê kurmanciya nawerast de, lêkerên (xwardin, xwardinewe, dan) lêkerên gerguhêz in.

**Mînak:**

Ême nanman **xward**.

Mindaleke şîrekey **xwardewe**.

To pirtûkeke be min **da**.

Di van her sê hevokane de lêkerên (xwardin, kewtin, dan) gerguhêz in. Ev yeke bi alîkariya wataya lêkeran a di nav hevokê de tê zanîn. Boye wek me di serî de jî amaje pê kiriye; eger lêkerê di pêşiya xwe de pêwîstî bi du boşayî/walahiyan hebû,

<sup>1</sup> Ebdula Xoşnaw, *Kurmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 113.

<sup>2</sup> Umer Qadir, 79.

<sup>3</sup> Ebdula Xoşnaw, *Kurmanciy Serû (Kurmanciya Jorîn)*, 114.



wate gerguhêz e. Lê belê di heman demê de heman lêkera gerguhêz di nav hevokê de dikare bibe negerguhêz jî. Wek;

**Mînak:**

Mela **bang da**.

Mareke **pêçward**.

Wek di mînakan de jî bedî dibe lêkerên (pêçward û bang da) ji gerguhêziyê vegeeriyane negerguhêziyê. Ev guherîn jî hem bi alîkariya hin guherînên formî û hem bi alîkariya wataya lêkerê a di nav hevokê de berceste dibe. Heman rewş ji bo lêkerên negerguhêz jî rû dide. Wate lêkerên negerguhêz jî dibin gerguhêz.

**Mînak:**

Min dûwa **kewtim**.

Mindaleke le dûway bavkî **kewt**.

Polîseke **be dûway** dizeke **kewt**.

Di van hevokane de, lêkera (kewt) lêkerek negerguhêz e, lê belê li gor bikaranîna wê a di nav hevokê de, bûye lêkerek gerguhêz.

Taybetmendiyeke din jî ev e; bi riya lêkerên yarîdeder/alîkar lêkerên negerguhêz dibin gerguhêz.

**Mînak:**

Mindaleke **giriya**. → negerguhêz

Di hevoka jorê de lêkera (giriya) negerguhêz e. Lê belê heman lêker di hevokên jêrê de bi riya lêkerên alîkar/yarîdeder (xistin, hênan) bûye gerguhêz. Her wiha tenha ev lêkerene hen, ku vê rolê digêrînin.

**Mînak:**

Kureke mindaleke **xiste giryan**. → gerguhêz

Mindaleke **hênane giryan**. → gerguhêz

Di vir de derdikeve, di zimanê kurdî de ji bo lêkerên ku di binyata xwe de gerguhêz û negerguhêz in, tu qertafek, wate daneyek morfolojîk nîn e, belkû bi riya wataya wan a bingehîn tê zanîn gelo gerguhêz in, an negerguhêz in.

### 2.2.5.3. Lêkerên Dançêker

Di zimanê kurdî mijara avaniya lêkeran de bireke din a lêkerê, lêkera dançêker e. Mebest ji lêkera dançêker; “Dema mirov karekî bi yekî din bide kirin, divê mirov avaniya dançêker bi kar bîne. Avaniya dançêker bi alîkariya lêkera (dan) tê pê.”<sup>1</sup>

#### Mînak:

Mamosta pirtûkekey **çap kird**. → gerguhêz

Mamosta pirtûkekey be **çap da**. → gerguhêz – dançêker

Mindaleke dermanekanî **xward**. → gerguhêz

Daykeke dermanekanî be mindaleke **derxward da**. → gerguhêz- dançêker

Di zimanê kurdî, kurmanciya nawerast de, bihêzkirin an berzkirina pileya gerguhêziya lêkera gerguhêz, bi riya guhertina formê lêkerên gerguhêz û bikaranîna lêkera alîkar (dan) û bi riya qertafa (-an) tê kirin. Wate lêkera (dan) û qertafa (-an) rola dubare gerguhêzkirina lêkerên gerguhêz dibînin.

#### Mînak:

Ewan toyan **denasî**. → gerguhêz

Ewan toyan be Azad nas**and**. → gerguhêz – dançêker

Ême birîneket **pêça**. → gerguhêz

Ême be destî xoman birîneket **pêçand**. → gerguhêz – dançêker

Her wiha wek pêştir jî hatiye amajekirin, di demên ranebirdû de qertafa (-an), ji ber reftarek fonolojîk diguhere dibe (-ên). Wate dengê /a/ di demên ranebirdû de wediguhere bo dengê /ê/.

<sup>1</sup> Tan, 218.

**Mînak:**

Ewan toyan be Azad nasand. → gerguhêz – dançêker – dema borî

Min to be Azad denasênim. → gerguhêz – dançêker – dema bê

Her wiha merc nîn e hemû lêkerên negerguhêz bibin gerguhêz, wek lêkerên; here, biro, vere, heyîn, hebûn, çûn, hatin...hwd.

**2.2.5.4. Lêkerên Lebat**

Di kurmanciya nawerast de ji bo lêkera lebat/bikerdiyar hîç qertafek nîn e û lebatîya wê an bikerdiyariya wê bi riya wataya lêkerê tê zanîn. Di vir de kes an tiştê/a çalakiyekê encam dide tê zanîn kê ye an çî ye. Di vî warî de zimanewanê kurd Seîd Sidqî dibêje: “Lêkera lebat ev e; dibe çalakwanê/a çalakiyê bête gotin.”<sup>1</sup> Bi Watayek din; “Ew lêkerên ku tê de kirde diyar in, lêker lebatî ne. Di van lêkeran de, kesê kar kiriye rasterast diyar e.”<sup>2</sup>

**Mînak:**

Ew minî parast.

Min pirtûkeke nexwand.

Şêr xezaleke xward.

To neçûyt.

Çûleke firî.

Kes an tiştên di wir de karê (parastin, nexwandin, xwardin, çûn û firînê) kirine, diyar in. Boye ev lêkerene hemû lebat an bikerdiyar in.

**2.2.5.5. Lêkerên Tebat**

Mebest ji lêkerên tebat; “Bireser dibe kirde û lêkera bingehîn jî dibe çawig.”<sup>3</sup> Boye di vî warî de tê gotin: “Di destûra giştî a hemû zimanekê de guhertina hevokek

<sup>1</sup> Lijneya Ziman, 112.

<sup>2</sup> TAŞ, Çetîn, *Wêneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Stenbol, 2013, 208.

<sup>3</sup> RIZGAR, 266.

lebat ji bo hevokek tebat û jêbirina kirdeyê, erk û rola wê dispêre bireserê (lê belê bireser heman erk û wataya xwe diparêze). Her wiha her zimanek di vî warî de xwedî taybetmendiyek xweser e.”<sup>1</sup>

Bo nimûne; “Nîşaneyê avaniya tebatbûnê di zimanê kurdî, kurmanciya nawerast de (-r) ye. Ev qertafe wek nîşaneyê tebatkirinê diçe ser reg û qedê çawigê û lêkerek tebat dirûst dike.”<sup>2</sup> Bi watayeke din; “Hemû lêkerek gerguhêz dema qertafe (-r) werbigire, dibe lêkera tebat.”<sup>3</sup> Ev rewşê jî nîşan dide, di kurmanciya nawerast de, lêkera tebat/bikernadiyar xwediyê nîşaneyek morfolojîk (-r-) e.

### Mînak:

parêzram: parêz + r + a + m → gerguhêz - tebat

xwênrayt: xwên + r + a + yt → gerguhêz - tebat

bînra: bîn + r + a + ø → gerguhêz - tebat

dozrayn: doz + r + a + yn → gerguhêz - tebat

êwe kujran: êwe kuj + r + a + n → gerguhêz - tebat

ewan kujran: ewan kuj + r + a + n → gerguhêz - tebat

Di zimanê kurdî, di warê mijara lêkerên tebat de; “Zimanevanên kurd li ser wê yekê kok in, di kurmanciya nawerast de tenha lêkerên gerguhêz dikarin hevoka ku lêkera wê tebat e, dirust bikin. Eger lêker negerguhêz be, dibe bê gerguhêzkirin, paşan dikare bibe tebat.”<sup>4</sup> Yanî lêkera negerguhêz di kurmanciya nawerast de nikare bibe tebat.

### Mînak:

sûta + andin: negerguhêz + qertafa gerguhêzîyê = lêkera gerguhêz

şika + andin : negerguhêz + qertafa gerguhêzîyê = lêkera gerguhêz

rûxa + andin: negerguhêz + qertafa gerguhêzîyê = lêkera gerguhêz

xew + andin: negerguhêz + qertafa gerguhêzîyê = lêkera gerguhêz

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 323.

<sup>2</sup> Selam Nawxoş - Nerîman Xoşnaw, *Zimanewani*, I, II, III, Hewlêr, 2009, 110.-111.

<sup>3</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 327.

<sup>4</sup> Nawxoş – Xoşnaw, 112.

mir + andin: negerguhêz + qertafa gerguhêziyê = lêkera gerguhêz

Dema ev qertafe çalak dibe, wek pêştir jî hatiye amajekirin rûdanek fonolojîk peyda dibe û di formê lêkeran de guhertin dirust dibe, ev guherîne jî li gor deman e, wate li pey qertafa (-r), “Di lêkera tebat a dema borî de qertafa (-a), di lêkera dema ranebirdû de jî qertafa (-ê), wek nîşaneya demê derdikeve.”<sup>1</sup>

### **Mînak:**

bînra: bîn + r + a

dozra: doz + r + a

kujra: kujr + a

debînê: debîn + r + ê

dedozê: dedoz + r + ê

dekujê: dekuj + r + ê

Her wiha wek xalek girîng dibe bê zanîn, Di kurmanciya nawerast, avaniya lêkera tebat de, ji bo demên borî tenha qertafa (-a) bikar tê, yanî qertafên din (-î, -û, -d, -t) bikar nayên, an dernakevin.

### **Mînak:**

bînra: bîn + r + a

dozra: doz + r + a

kujra: kuj + r + a

xwênra: xwên + r + a

### **2.2.6. Qertafên Nêyîniyê**

Mirov wek dahênanek şakar xwediyê komelek hest û nest e. Ev hest û nestene jî di asta çalakî û derbirînan de an erênî ne, an neyînî ne. Ji bo jihevcihêkirina van hest û nestane, her zimanekî li gor taybetmendiyên xwe komelek pêkhate û nîşane hen e. Ev pêkhate û nîşanene dibe bêjeyên serbixwe û ferhengî bin, an daneyên

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 331.

rêzimanî bin. Di vir de dê amaje bi wan nîşaneyên rêzimanî ên di pêhateya lêkerê de derdikevin, bê kirin. Di zimanê kurdî, kurmanciya nawerast de, ew nîşaneyên rêzimanî ên ji bo neyînîkirina lêkeran, wek qertaf bikar tên û devr dibînin, ev in: (ne-, na-, nî-, me-).

Di zimanê kurdî kurmanciya nawerast de; “Lêker di formê xwastekî ê ranebirdû û hemû cure lêkerên rabirdû ên ragihandin, xwastekî û tenanet fermanî jî de, bi qertafa (ne-) tên neyînîkirin.”<sup>1</sup> Her wiha ji bo dema niha jî qertafa (na-) bikar tê. Di dema bikaranîna qertafên (ne-, na-) de, lêker çî gerguhêz û negerguhêz be; çî xwerû, pêkhatî û hevedudanî be, qertafên neyîniyê her tim diçin ser destpêka reg an qedê lêkera bingehîn.

### 2.2.6.1. Demên Borî

#### Mînak:

xwardim → **nem**xward (xwerû – gerguhêz – dema borî)

damanxist → daman**n**exist (pêkhatî – gerguhêz – dema borî)

dûryanxist → dûryan**n**exist (hevedudanî – gerguhêz – dema borî)

hatim → **neh**atim (xwerû – negerguhêz- dema borî)

raperît → ran**e**perît (pêkhatî – negerguhêz – dema borî)

têkçûn → têk**n**eçûn (hevedudanî – negerguhêz – dema borî )

#### a. Dema Boriya Berdest

Di mijara neyînîkirina lêkeran a li gor deman de, di dema boriya berdest de, gava lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî tên neyînîkirin qertafa (de-) ji holê ranabe, çûnke eger qertafa (de-), di dema boriya berdest de ji holê rabe, wê demê dê formê neyîniyê ê dema boriya têdeyî/nêzîk û dema boriya berdest/berdewam wek yek lê bên. Boye ji bo ku ciyawazî di navbera van her du demane de bê kirin, di dema boriya berdest de qertafa (de-) ranabe. Ev bûyere, bûyerek awarte ye û her wiha

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 2000.

nîşane û selmandina vê yekê ye, ziman sîstem e û bi sîstem kar dike û nahêle kelênê û boşayî di ziman de dirust bibin.

### **Mînak:**

dezanî → **nedezanî**: **ne** + **de** + zanî: (xwerû – gerguhêz)

heldekêşa → **helnedekêşa**: hel + **ne** + **de** + kêşa (pêkhatî – gerguhêz)

têkdebird → **têknedebird**: têk ne + de + bird (hevedudanî – gerguhêz)

deroştîm → **nederoştîm**: ne + de + roştîm (xwerû – negerguhêz)

dadeniştîn → **danedeniştîn**: da + **ne** + **de** + niştîn : (pêkhatî – negerguhêz)

têk deçû → **têk nedeçû**: têk **ne** + **de** + çû (hevedudanî – negerguhêz)

### **2.2.6.2. Demên Ranebirdû**

Di kurmanciya nawerast, demên ranebirdû de, ji bo gerdankirina lêkeran di asta morfolojîyê de tenha formê dema niha heye û ji bo neynîkirina vî formî jî qertafa (na-) tê bikaranîn. Bi watayak din, di kurmanciya nawerast de formê dema bê û dema bê a nêzîk nîn in. Di vir de dema bê wek dema asayî (time) di asta hevoksaziyê de heye; lê dema bê a nêzîk di vî zaravayî de hîç dernakeve. Her wiha dema niha, lêkerên xwerû û lêkerên bi riya paşgiran hatine darijtin de, qertafa (na-) wek pêşgir di destpêka lêkeran de cî digire; eger lêker bi riya pêşgiran hatibin darijtin, dikeve di navbera morfîma bêjesaz û rega lêkerê de; eger lêker hevedudanî bin, di destpêka lêkerên bingehîn de cî digire û dikeve di navbera bêjeya watadar û lêkera bingehîn de.

#### **a. Dema Niha**

Di kurmanciya nawerast de, ji bo lêkera xwerû, pêkhatî û hevedudanî a gerguhêz û negerguhêz, “Li gel formê ranebirdû ê ragihandinê de qertafa /na-/ bikar tê.”<sup>1</sup> Her wiha di zimanê kurdî de, “Qertafa (de-/-e) a dema ranebirdû (dema niha) di

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 257.

kîderê de derkeve, di dema neyîniyê de qertafa (na-) jî her di heman cihê de derdikeve.”<sup>1</sup> Wate qertafên (de-, -e) dikevin û qertafa (na-) cihê wan digire.

**Mînak:**

dexom → **naxom** (xwerû – gerguhêz- dema niha)

heldebijêrîn → **helnabijêrîn** (pêkhatî – gerguhêz - dema niha)

têk dedeyt → têk **nadeyt** (hevedudanî – gerguhêz - dema niha)

deçêt → **naçêt** → (xwerû – negerguhêz – dema niha)

dadekevim → **danakevim** (pêkhatî – negerguhêz - dema niha)

serdekevêt → **sernakevêt** (hevedudanî – negerguhêz - dema niha)

**2.2.6.3. Raweyên Xwastekî**

Di zaravayê kurmanciya nawerast, di dema neyînîkirina raweyên xwastekî de, “Nîşaneya (bi-) a raweya xwastekî di lêkerên erênî de li kuderê derkeve, di dema neyîniyê de qertafa (ne-) di cihê wê de derdikeve.”<sup>2</sup> û qertafa (bi-) dikeve. Her wiha gerguhêzî û negerguhêziyê; an xwerû, pêkhatî û hevedudanîbûnê di vê rewşê de hîç bandorek nîn e.

**a. Demên Borî**

**Mînak:**

firoştibaye → **nefiroştibaye** (xwerû – gerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

ramkirdiba → **ramnekirdiba** (pêkhatî – gerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

bexêwtankirdiba → **bexêwtannekirdiba** (hevedudanî – gerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

<sup>1</sup> h.ç., 296.

<sup>2</sup> h.ç., 300.



bûbam → **nebûbam** (xwerû – negerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

dakevtibam → **danekevtibam** (pêkhatî – negergugêz - raweya xwastekî – dema borî)

kevtibûba → **nekevtibûba** (hevedudanî – negerguhêz - raweya xwastekî – dema borî)

## **b. Demên Ranebirdû**

### **Mînak:**

bigirim → **negirim** (xwerû – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

rabigirim → **ranegirim** (pêkhatî – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

bexêwî bikim → bexêwî **nekim** (hevedudanî – gerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

bikevim → **nekevim** (xwerû – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

dabikevim → **danekevim** (pêkhatî – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

azadbibim → azad**nebim** (hevedudanî – negerguhêz – raweya xwastekî – ranebirdû)

### **2.2.6.4. Raweya Daxwazî (Fermanî)**

Di zaravayê kurmanciya nawerast raweya fermanî (daxwazî) de, “ji bo neyînîkirina raweya fermanî, qertafa (ne-) wek qertafa (me-) derdikeve.”<sup>1</sup>, tenanet gerguhêzî û negerguhêziyê; an xwerû, pêkhatî û hevedudanîbûnê di vê rewşê de hîç rolek nîn e.

### **Mînak:**

dabigre → **damegre/danegre** (pêkhatî – gerguhêz - raweya fermanî)

---

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 309.

bilind bike → bilind **meke**/bilind **neke** (hevedudanî – gerguhêz - raweya fermanî)

biro → **mero**/**nero** (xwerû – negerguhêz - raweya fermanî)

biçe → **meçe**/**neçe** (xwerû – negerguhêz raweya fermanî)

Di kurmanciya nawerast de, “Qertafa (nî-), li gel lêkera alîkar (hebûn) û (heyîn)ê de bikar tê.”<sup>1</sup> û rola neyîniyê dibîne.

**Mînak:**

heye → **nî** ye (xwerû – gerguhêz - dema fireh)

hemane → **nî**man e (xwerû – gerguhêz - dema fireh)

hebû → **nînbû** (hevedudanî– gerguhêz – dema borî)

Pêştir lêkera (hebûn) bi qertafa (nî-) dihat neyînîkirin û formê (nînbû) werdigirt, lê di nava demê de di encama guhertinek rêzimanî de qertafa (nî-) formê qertafa (ne-) wergirt. Wate dengê /î/ guheriyê bo dengê /e/. Ev yeke jî dîsa rûdanek fonolojîk e.

**Mînak:**

hebû → nînbû → nebû (dema borî)

---

<sup>1</sup> Kurdoyêv, 219.

### 2.2.7. Cînavkên Pêvebestî

Qertafên cinavkên pêvebestî jî poleke din a morfîmên bend e di zimanên likaw de û wan qertafane wek; “Cînavkên pêvebestî di zimanê kurdî de dirûvek wergirtine û jê re qertafên bendî tê gotin. Wate ji peyvê re dizeliqin. Here zêde jî tên dawiya peyvan.”<sup>1</sup> Lê belê di kurmanciya nawerast de wek pêşgir jî devr dibînin. “Di zaravayê kurmanciya nawerast de du deste (desteya yekem: -m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan), (desteya duyem: -m/-în,-yn, -î,-y/-n, Ø/-n) cînavkên pêvebestî hene.”<sup>2</sup> û lêkolerek din ê zimanê kurdî Ebdula Xoşnaw jî di zimanê kurdî de ji bilî her du desteyên li serê hatine nivîsîn desteyek din jî lê zêde dike û dibêje: “Desteya sêyem (-e, -n) ye û ev desteye li gel lêkera daxwazî/fermanî bi kar tê.”<sup>3</sup>

Zimanevanê kurd, Ewrahmanî Hacî Marif cînavkên pêvebestî ji aliyê hêz ve ji hev cihê dike û dibêje: “Cînavkên pêvebestî, di diyalektê kurmanciya nawerast de, ji aliyê hêz ve du cur in:

Cureyê Bihêz: Qertafên (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) nin. Ev qertafene têne ser lêkerên gerguhêz ên demên borî.

Cureyê Bêhêz: Qertafên (-m/-în, -ît/-y, -Ø,-at,-êt/-n) nin. Ev qertafene jî têne ser lêkerên negerguhêz ên demên borî û lêkerên demên ranebirdû ên gerguhêz û neherguhêz.”<sup>4</sup>

Sedema ji hevcihêkirina qertafên cînavkên pêvebestî wek bihêz û bêhêz; çalak û neçalak ev e: “Cînavkên, [-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan] wek desteya yekem, wisa tên zanîn, ku di hevokan de xwediyê rol û cihên curbicur in, cînavkên, [(-m/-în), (-y -ît/-e, -Ø, -n), (-Ø, -at,-êt/-n)] jî wek desteya duyem, wisa tên zanîn ku cihê wan çespîw e, negor e.”<sup>5</sup>

Her wiha desteya yekem ji bilî lêkerên pêkhatî; diçe ser bireser, nav, cînavkên serbixwe û destpêka lêkerên xwerû ên qertafên rêzimanî wek pêşgir wergirtine. Ji bo vê yekê temaşeyî mijara dema boriya berdest, di demên borî de neyîniya lêkerên gerguhêz û raweyên xwastekî bikin.

<sup>1</sup> Hewramî, *Zarî Zimanê Kurdî (Zaravayê Zimanê Kurdî)*, 265.

<sup>2</sup> Ewrehmanî Hacî Marif, *Rêzimanî Kurdî – Cênaw (Rêzimana Kurdî – Cînavk)*, Bexda, 1987, 104.

<sup>3</sup> Ebdula Xoşnaw, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, 43.

<sup>4</sup> Hacî Marif, *Cênaw (Cînavk)*, 104.-106.

<sup>5</sup> Umer Qadir, 78.

**Mînak:**

Xwêndkarekan kitêbekanyan parastûyane. (çûye ser bireserê.)

Kitêbekanman, hawrêkantan (çûye ser navan û wataya xawendariyê pê daye.)

Êweman bînî. (çûye ser cînavka serbixwe.)

Kitêbekanmanyman parastûwe. (cînavka pêvebestî **-yan**, li pey cînavka pêvebestî **-man** ku hevpol in hatiye. Wate du cînavkên pêvebestî li pey hev hatine û **-man** amaje bi xwendariyê dike, **-yan** jî amaje bi kirdeyê dike.)

**Mînak:**

demxward: **de + m + xward** (xwerû – gerguhêz – dema boriya berdest)

deyanbînî: **de + yan + bînî** (xwerû – gerguhêz – dema boriya berdest)

nemxward: **ne + m + xward** (xwerû – gerguhêz – neyînî - dema borî)

nemannûsî: **ne + man + nûsî** (xwerû – gerguhêz – neyînî - dema borî)

bitbînîm: **bi + t + bînîm** (xwerû – gerguhêz – raweya xwastekî)

Di kurmanciya nawerast de, di hemû raweyên lêkeran de cînavkên pêvebestî derdikevin. Wate di derkevîna van qertafane de gerguhêz an negerguhêzbûna lêkeran tu bandorek nîn e, lê belê di wergirtina cureyên cînavkên pêvebestî ên bihêz û bêhêz de bandora gerguhêzê û negerguhêziyê heye. Her wiha di vir de, xalek din jî a balkêş ev e: Avaniya lêkerê, di wergirtina desteya yekem a cînavkên pêvebestî de wek paşgir an pêşgir tu rolek nîn e, belkû ronana lêkerê, (xwerû, pêkhatî, hevedudanî û neyînîbûn) xwedî rol e.

**2.2.7.1. Raweyên Hewalî**

Di zaravayê kurmanciya nawerast de ji bo lêkerên xwedî raweyên hewalî ne, her du desteyên; desteya yekem: (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan), desteya duyem: (-m/-în,-yn, -î,-ît,-y/-n, -Ø,-at,-êt/-n) cînavkên pêvebestî bikar tên. Desteya yekem wek, cureyê bihêz tê binavkirin û di demên borî de, diçe ser lêkerên gerguhêz. Desteya

duyem jî wek cureyê bêhêz tê binavkirin û di demên borî de diçe ser lêkerên negerguhêz û di demên ranebirdû de jî diçe ser lêkerên gerguhêz û neherguhêz

### 2.2.7.1.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz

Di zaravayê kurmanciya nawerast de sê desteyên cînavkên pêvebestî hene û di lêkerên demên borî de; “Her çi lêkerê, gerguhêz be cînavkên pêvebestî ên bihêz werdigire.”<sup>1</sup> Wate desteya yekem (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) werdigirin.

#### 2.2.7.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî

“Eger lêker xwerû be, cînavkên pêvebestî diçin dawiya qedê lêkeran. Eger lêker pêkhatî bin, diçin destpêka qedê lêkeran û dikevin di navbera qertafa bêjesaz û lêkeran de. Eger lêker hevedudanî bin, diçin destpêka qedê lêkerên bîngêhîn û dikevin di navbera bêjeya watadar an lêkerên alîkar û lêkerên bîngêhîn de.”<sup>2</sup>

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

kirîn: kirî + **m**

kêlaman: kêla + **man**

xwardit: xward + (i)**t**

firoştan: firoşt + **tan**

dirûy: dirû + **y**

dirûyan: dirû + **yan**

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Cênaw (Cînavk)*, 200.

<sup>2</sup> h.ç., 200.-201.

## b. Lêkerên Pêkhatî

### Mînak:

helimkêşa: hel + (i)m + kêşa

damanxist: da + **man** + xist

lêtxist: lê + **t** + xist

ratangirt: ra + **tan** + girt

daygirt: da + **y** + girt

## c. Lêkerên Hevedudanî

### Mînak:

Rêgam girt: rêga + **m** + girt

bexêwaman kird: bexêw + **man** + kird

berzit kird: berz + (i)t + kird

yektan girt: yek + **tan** + girt

bilindîkird: bilind + **î** + kird

ziyadyankird: ziyad + **yan** + kird

### 2.2.7.1.1.2. Dema Boriya Berdest

“Eger lêker xwerû be, cînavkên pêvebestî diçin destpêka qedê lêkeran û dikevin di navbera nîşaneyê espêkt (de-) û destpêka lêkeran de. Eger lêker pêkhatî bin, dikevin di navbera qertafa bêjesaz û nîşaneyê espêktê de. Eger lêker hevedudanî bin, dikevin di navbera bêje an lêkerên alîkar û nîşaneyê espêktê de.”<sup>1</sup> Wate di lêkerên pêkhatî û hevedudanî de naçin destpêka qedê lêkerên bingehîn.

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Cênaw (Cînavk)*, 202.-203.

**a. Lêkerên Xwerû****Mînak:**demkirî: de + **m** + kirîdemankêla: de + **man** + kêladetxward: de + **t** + xwarddetanfiroşt: de + **tan** + firoştdeydirû: de + **y** + dirûdeyandirû: de + **yan** + dirû**b. Lêkerên Pêkhatî****Mînak:**helimdekêşa: hel + (i)**m** + dekêşadamandexist: da + **man** + dexistlêtdexist: lê + **t** + dexistratandegirt: ra + **tan** + degirtdaydegirt: da + **y** + degirt**c. Lêkerên Hevedudanî****Mînak:**rêgamdegirt: rêga + **m** + degirtbexêwman dekird: bexêw + **man** + dekirdberzit dekird: berz + (i)**t** + dekirdyektan degirt: yek + **tan** + degirtbilindêdekird: bilind + **î** + dekirdziyadyandekird: ziyad + **yan** + dekird

### 2.2.7.1.1.3. Dema Boriya Dûdar

Eger lêker xwerû bin, cînavkên pêvebestî dikevin di navbera morfîma rengdêrî/awelnawkiraw (-û-, -w-) û morfîma espêkt (-e) de. Eger lêker pêkhatî bin, diçin destpêka lêkeran û dikevin di navbera qertafa bêjesaz û rega lêkeran de. Eger lêker hevedudanî bin, dikevin di navbera bêje an lêkerên alîkar û lêkera bingehîn de. Her wiha di lêkerên pêkhatî û hevedudanî de, li pey qertafên deman, di dawiya lêkeran de qertafa awelnawkiraw (-û-, -w-) û qertafa espêktê (-e) derdikeve.

#### a. Lêkerên Xwerû

kirîwme: kirîw + **m** + e

kêlawmane: kêlaw + **man** + e

xwardûte: xwardû + **t** + e

firoştûtane: firoştû + **tan** + e

dirûyetî: dirû + **y** + etî

dirûyane: dirû + **yan** + e

#### b. Lêkerên Pêkhatî

##### Mînak:

helimkêşawe: hel + (i)**m** + kêşawe

damanxistûwe: da + **man** + xistûwe

lêtxistûwe: lê + **t** + xistûwe

ratangirtûwe: ra + **tan** + girtûwe

daygirtûwe: da + **y** + girtûwe



### c. Lêkerên Hevedudanî

#### Mînak:

rêgamgirtûwe: rêga + **m** + girtûwe

bexêwman kirdûwe: bexêw + **man** + kirdûwe

berzit kirdûwe: berz + (i)**t** + kirdûwe

yektan girtûwe: yek + **tan** + girtûwe

bilindîkirdûwe: bilind + **î** + kirdûwe

ziyadyankirdûwe: ziyad + **yan** + kirdûwe

#### 2.2.7.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Di çîrokiya dema boriya têdeyî de, lêker her tim hevedudanî ne, çunke “Formê lêkera çîrokiya dema boriya têdeyî, pêk tê ji qedê her cure lêkerekê û li gel qedê lêkera alîkar (bûn)ê.”<sup>1</sup> Bi watayek din, di vir de lêkera alîkar (bûn) lêkerek çespîw e, her tim li gel bêjeyek watadar an lêkerek din de derdikeve.

Di çîrokiya dema boriya têdeyî de, ev bêje an lêkera ku li gel lêkera alîkar (bûn) de derdikeve, dikare xwerû, pêkhatî û hevedudanî be, boye di lêkerên gerguhêz de eger li gel lêkera alîkar (bûn) de lêkerên xwerû bîn û formê hevedudaniyê pêk bînin, cînavkên pêvebestî ên desteya yekem di dawiya lêkeran de derdikevin. Lê belê eger di vê demê de, ji bilî lêkerên xwerû û lêkera alîkar (bûn)ê bêjeyek din jî di formê hevedudaniyê de cih bigire wê gavê cînavkên pêvebestî ên desteya yekem, dikevin di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingehîn de. Eger lêker pêkhatî bin, cînavkên pêvebestî diçin destpêka qedê lêkerên bingehîn û dikevin di navbera qertafa bêjesaz û lêkerên bingehîn de.

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Cênaw (Cînavk)*, 208.

**a. Lêkerên Xwerû****Mînak:**kirîbûm: kirîbû + **m**kêlabûman: kêlabû + **man**xwardibût: xwardibû + **t**firoştibûtan: firoştibû + **tan**dirûbûy: dirûbû + **y**dirûbûyan: dirûbû + **yan****b. Lêkerên Pêkhatî****Mînak:**helimkêşabû: hel + (i)**m** + kêşabûdamanxistibû: da + **man** + xistibûlêtxistibû: lê + **t** + xistibûratangirtibû: ra + **tan** + girtibûdaygirtibû: da + **y** + girtibû**c. Lêkerên Hevedudanî****Mînak:**rêgamgirtibû: rêga + **m** + girtibûbexêwman kirdibû: bexêw + **man** + kirdibûberzit kirdibû: berz + (i)**t** + kirdibûyektan girtibû: yek + **tan** + girtibûbilindîkirdibû: bilind + **î** + kirdibûziyadyankirdibû: ziyad + **yan** + kirdibû

**Têbînî:** Di kurmanciya nawerast de formê çîrokiya dema boriya dûdar nîn e.

### 2.2.7.1.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz

Di zaravayê kurmanciya nawerast û demên borî de; “Eger lêker negerguhêz be, cînavkên pêvebestî ên bêhêz werdigire.”<sup>1</sup> Wate qertafên cînavkên pêvebestî ên desteya duyem; (-m/-în, -ît, -y/-n, -Ø, -at, -êt/-n) werdigire û ev cînavkene çespîw in, li gor guherînên formê lêkeran cihê xwe naguherin û cîgir in. Her wiha di lêkerên negerguhêz ên demên borî de cînavka kesê/a sêyem a yekjimar sifir (Ø) e.

#### 2.2.7.1.2.1. Dema Boriya Têdeyî

Di dema boriya têdeyî, lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin dawiya lêkeran.

##### a. Lêkerên Xwerû

###### Mînak:

giriya: giriya + **m**

mirdîn: mird + **în**

kewtî: kewt + **ît**

êwe çûn: êwe çû + **n**

çeqî: çeqî + **Ø**

ewan çeqîn: ewan çeqî + **n**

##### b. Lêkerên Pêkhatî

###### Mînak:

dakewtim: dakewt + (i)**m**

helçûyn: helçû + **yn**

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Cênaw (Cînavk)*, 200.

rakewtî: rakewt + **ît**

êwe helhatin: êwe helhat + (i)**n**

ewan helfirîn: ewan helfirî + **n**

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

serkewtim: serkewt + (i)**m**

sûrbûyn: sûrbû + **yn**

nexoşkewtî: nexoşkewt + **ît**

(êwe) rûreşbûn: êwe rûreşbû + **n**

serxoşe: serxoş + **Ø**

(ewan) gewrebûn: ewan gewrebû + **n**

#### **2.2.7.1.2.2. Dema Boriya Berdest**

Di lêkerên negeruhêz ên dema boriya berdest de, di lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin dawiya lêkeran.

### **a. Lêkerên Xwerû**

#### **Mînak:**

degiriyam: degiriyam + **m**

demirdîn: demird + **în**

dekewtî: dekewt + **ît**

(êwe) deçûn: êwe deçû + **n**

deçeçî: deçeçî + **Ø**

(ewan) deçeçîn: ewan deçeçî + **n**

### **b. Lêkerên Pêkhatî**

#### **Mînak:**

dadekewtim: dadekewt + (i)**m**

heldeçûyn: heldeçû + **yn**

radekewtît: radekewt + **ît**

êwe heldehatin: êwe heldehat + (i)**n**

radekird: radekird + **Ø**

ewan heldefirîn: ewan heldefirî + **n**

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

ser dekewtim: ser dekewt + (i)**m**

sûr debûyn: sûr debû + **yn**

nexoş dekewtît: nexoš dekewt + **ît**

êwe rûreş debûn: êwe rûreş debû + **n**

serxoşdebû: serxoş debû + **Ø**

ewan gewre debûn: ewan gewre debû + **n**

#### **2.2.7.1.2.3. Dema Boriya Dûdar**

Di lêkerên negerguhêz ên dema boriya dûdar de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin, cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin dawîya qedê lêkeran û hin caran dikevin di navbera morfîma betal (-w) û qertafa espêkt (-e)yê de û hin caran jî dikevin di navbera qertafa çêbiwar (-û) û qertafa espêkt (-e)yê de.

**a. Lêkerên Xwerû****Mînak:**giriyawme: giriyaw + **m** + **e**mirdûyne: mirdû + **yn** + **e**kewtûyte: kewtû + **yt** + **e**êwe çûne: êwe çû + **n** + **e**çeqîwe: çeqîw + **Ø** + **e**ewan çeqîwne: ewan çeqîw + **n** + **e****b. Lêkerên Pêkhatî****Mînak:**dakewtûme: dakewtû + **m** + **e**helçûyne: helçû + **yn** + **e**rakewtîte: rakewt + **ît** + **e**êwe helhatûne: êwe helhat + (i)**n** + **e**rakirdûwe: rakirdû + **Ø** + **w** + **e**ewan helfirîne: ewan helfirî + **n** + **e****c. Lêkerên Hevedudanî****Mînak:**serkewtûme: serkewtû + **m** + **e**sûrbûyne: sûrbû + **yn** + **e**nexoşkewtîte: nexoşkewt + **ît** + **e**êwe rûreşbûne: êwe rûreşbû + **n** + **e**serxoşbûwe: serxoşbûw + **Ø** + **e**

ewan gewrebûne: ewan gewrebû + **n** + **e**

#### 2.2.7.1.2.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Di çîrokiya dema boriya têdeyî, lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, cînavkên pêvebestî piştî lêkera alîkar (bûn) tên û diçin dawiya lêkeran.

##### a. Lêkerên Xwerû

###### Mînak:

giriya bûm: giriya bû + **m**

mirdibûyn: mirdibû + **yn**

kewtibûyt: kewtibû + **yt**

êwe çûbûn: êwe çûbû + **n**

çeqîbû: çeqîbû + **Ø**

ewan çeqîbûn: ewan çeqîbû + **n**

##### b. Lêkerên Pêkhatî

###### Mînak:

dakewtibûm: dakewtibû + **m**

helçûbûyn: helçûbû + **yn**

rakewtibûyt: rakewtbû + **yt**

êwe helhatibûn: êwe helhatibû + **n**

rakirdibû: rakirdibû + **Ø**

ewan helfirîbûn: ewan helfirîbû + **n**

### c. Lêkerên Hevedudanî

#### Mînak:

serkewtûbûm: serkewtûbû + **m**

sûrbûbûyn: sûrbûbû + **yn**

nexoşkewtûbûyt: nexoşkewtûbû + **yt**

êwe rûreşbûbûn: êwe rûreşbûbû + **n**

serxoşbûbû: serxoşbûbû + **Ø**

ewan gewrebûbûn: ewan gewrebûbû + **n**

#### 2.2.7.1.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz

Di zimanê kurdî, kurmanciya nawerast de, lêker di demên ranebirdû de tenha li gor dema niha/katî êsta tîrerdankirin. Li gor dema bê/ayînde nayê gerdankirin, çunke di vî zaravayî de ji bo dema bê hîç nîşaneyek rîzimanî nîn e.

Di vir de jî, ji bo lêkerên gerguhêz ên ranebirdû desteya duyem a cînavkên pêvebestî (-m/-în, -yn, -î, -y/-n, Ø, -at, -êt, -e/-n) bikar tî.

##### 2.2.7.1.3.1. Dema Niha

Di lêkerên gerguhêz ên dema niha de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin, cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin dawiya lêkeran.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

dekirim: dekir + (i)**m**

dekêlîn: dekêl + **în**

dexwoyt: dexwo + **yt**

êwe defiroşin: êwe defiroş + (i)**n**



dedirû: dedirû + kes **Ø**

ewan dedirûn: ewan dedirû + **n**

### **b. Lêkerên Pêkhatî**

#### **Mînak:**

heldekêşim: heldekêş + (i)**m**

dadexîn: dadex + **în**

lêdexî: lêdex + **î**

êwe radegirin: êwe radegir + (i)**n**

dadegire: dadegir + **e**

ewan radeken: ewan radek + (e)**n**

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

rêga degirim: rêga degir + (i)**m**

bexêwî dekeyn: bexêwî dek + (e)**yn**

berz dekeyt: berz dek + (e)**yt**

êwe yek degirin: êwe yek degir + (i)**n**

bilind dekat: bilind dek + **at**

ewan ziyad deken: ewan ziyad dek + (e)**n**

#### **2.2.7.1.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz**

Di kurmanciya nawerast de, ji bo lêkerên negerguhêz ên dema niha jî desteya duyem a cînavkên pêvebestî (-m/-în,-yn, -î,-y/-n, Ø/- êt, -at, -n) bikar tê.

### 2.2.7.1.4.1. Dema Niha

Di dema niha, lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin dawiya lêkeran.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

degirîm: degirî + **m**

demirin: demir + (i)**n**

dekewît: dekew + **ît**

êwe deçin: êwe deç + (i)**n**

deçeçêt: deçeç + **êt**

ewan deçeçin: ewan deçeç + (i)**n**

#### b. Lêkerên Pêkhatî

##### Mînak:

dadekewim: dadekew + (i)**m**

heldeçîn: heldeç + **în**

radekey: radeke+ **y**

êwe heldehên: êwe heldehê + **n**

radekat: radek + **at**

ewan heldefirin: ewan heldefir + (i)**n**

#### c. Lêkerên Hevedudanî

##### Mînak:

serdekewim: serdekew + (i)**m**

sûrdebîn: sûrdeb + **în**

nexoşdekewî: nexoşdekew + **î**

êwe rûreşdebin: êwe rûreşdeb + **(i)n**

serxoşdebêt: serxoşdeb + **êt**

ewan gewredebin: ewan gewrede + **(i)n**

**Nîşe:** Di zaravayê kurmanciya nawerast de, formê gerdankirî ê dema bê û dema bê a nêzîk, nîn e û ev her du demene tenha di asta hevoksaziyê de derdikevin.

### **2.2.7.2. Raweyên Xwastekî**

Di zaravayê kurmanciya nawerast, raweyên xwastekî de, di demên borî de eger lêker gerguhêz be, desteya yekem (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) a cînavkên pêvebestî bikar tê. Lê belê di raweyên xwastekî ên demên borî de, ji bo lêkerên negerguhêz û di dema ranebirdû de, ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz desteya duyem (-m, (-în/-yn), (-î /-ît/-y),-n, (-Ø,-at,-êt), -n) acînavkên pêvebestî bi kar tê.

#### **2.2.7.2.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz**

Di zaravayê kurmanciya nawerast, raweyên xwastekî ên demên borî de, ji bo lêkerên gerguhêz desteya yekem a (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) cînavkên pêvebestî bi kar tê.

##### **2.2.7.2.1.1. Dema Boriya Têdeyî**

Di raweya xwastekî, dema boriya têdeyî de, eger lêker xwerû be cînavkên pêvebestî diçin dawiya qedê lêkeran. Eger lêker pêkhatî bin, diçin destpêka qedê lêkeran û dikevin di navbera qertafa bêjesaz û lêkeran de. Eger hevedudanî jî bin, diçin destpêka qedê lêkerên bîngêhîn û dikevin di navbera bêjeya watadar an lêkerên alîkar û lêkerên bîngêhîn de.

**a. Lêkerên Xwerû****Mînak:**kirîbam: kirîba + **m**kêlabaman: kêlaba + **man**xwardibat: xwardiba + **t**firoştibat: firoştiba + **tan**dirûba: dirûba + **Ø**dirûbayan: dirûba + **yan****b. Lêkerên Pêkhatî****Mînak:**helimkêşaba: hel + **im** + kêşabadamanxistiba: da + **man** + xistibalêtxistiba: lê + **t** + xistibaratangirtiba: ra + **tan** + girtibadaygirtiba: da + **y** + girtibarayankirdiba: ra + **yan** + kirdiba**c. Lêkerên Hevedudanî****Mînak:**rêgamgirtiba: rêga + **m** + girtibabexêwman kirdiba: bexêw + **man** + kirdibaberzit kirdiba: berz + **(i)t** + kirdibayektan girtiba: yek + **tan** + girtibabilindîkirdiba: bilind + **î** + kirdiba

ziyadyankirdiba: ziyad + **yan** + kirdiba

### 2.2.7.2.1.2. Dema Boriya Berdest

Di raweya xwastekî a dema boriya berdest de, qertafa espêkt (de-) dikeve û di cihê wê de qertafa (bi-) derdikeve. Di vir de, eger lêker xwerû be cînavkên pêvebestî diçin destpêka qedê lêkeran û dikevin di navbera qertafa (bi-) û qedê lêkeran de. Lê belê eger lêker pêkhatî be cînavkên pêvebestî dikevin di navbera qertafa bêjesaz û qertafa (bi-) de û nikarin biçin ser destpêka qedê lêkeran. Eger hat û lêker hevedudanî bûn; cînavkên pêvebestî, di vir de jî dikevin di navbera bêjeya watadar an lêkera alîkar û qertafa (bi-) de, wate di vir de jî nikare biçe ser destpêka lêkera bingehîn. Her wiha qertafên (-ba-) û (-aye) jî li pey hev diçin dawiya lêkeran.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

bimkirîbaye: bi + **m** + kirîbaye

bimankêlabaye: bi + **man** + kêlabaye

bitxwardibaye: bi + **t** + xwardibaye

bitanfiroştibaye: bi + **tan** + firoshtibaye

biydirûbaye: bi + **y** + dirûbaye

biyandirûbaye: bi + **yan** + dirûbaye

#### b. Lêkerên Pêkhatî

##### Mînak:

helimbikêşabaye: hel + (i)**m** + bikêşabaye

damanbixistibaye: da + **man** + bixistibaye

lêtbixistibaye: lê + **t** + bixistibaye

ratanbigirtibaye: ra + **tan** + bigirtibaye

daybigirtibaye: da + **y** + bigirtibaye

rayanbikirdibaye: ra + **yan** + bikirdibaye

### c. Lêkerên Hevedudanî

#### Mînak:

rêgambigirtibaye: rêga + **m** + bigirtibaye

bexêwman bikirdibaye: bexêw + **man** + bikirdibaye

berzit bikirdibaye: berz + (i)**t** + bikirdibaye

yektan bigirtibaye: yek + **tan** + bigirtibaye

bilindîbikirdibaye: bilind + **î** + bikirdibaye

ziyadyanbikirdibaye: ziyad + **yan** + bikirdibaye

#### 2.2.7.2.1.3. Dema Boriya Dûdar

Di raweya xwastekî a dema boriya dûdar de, eger lêker xwerû be, cînavkên pêvebestî wek paşgir diçin dawiya qedê lêkerê. Eger pêkhatîbin diçin destpêka qedê lêkerê dikevin di navbera qertafa bêjesaz û qedê lêkerê de. Her wiha eger lêker hevedudanî bin, dîsa diçin destpêka qedê lêkerê û dikevin di navbera bêjeya watadar, an lêkera alîkar û lêkera bingehîn de.

#### a. Lêkerên Xwerû

#### Mînak:

kirîbim: kirîbi + **m**

kêlabiman: kêlabi + **man**

xwardibit: xwardibi + **t**

firoştibitan: firoştibi + **tan**

dirûbêtî: dirûbêt + **î**

dirûbiyan: dirûbi + **yan**

### **b. Lêkerên Pêkhatî**

#### **Mînak:**

helimkêşabê: hel + (i)**m** + kêşabê

damanxistibê: da + **man** + xistibê

lêtxistibê: lê + **t** + xistibê

ratangirtibê: ra + **tan** + girtibê

daygirtibê: da + **y** + girtibê

rayankirdibê: ra + **yan** + kirdibê

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

rêgamgirtibê: rêga + **m** + girtibê

bexêwman kirdibê: bexêw + **man** + kirdibê

berzit kirdibê: berz + (i)**t** + kirdibê

yektan girtibê: yek + **tan** + girtibê

bilindîkirdibê: bilind + **î** + kirdibê

ziyadyankirdibê: ziyad + **yan** + kirdibê

#### **2.2.7.2.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî**

Di raweya xwastekî a çîrokiya dema boriya têdeyî de, eger lêker xwerû be cînavkên pêvebestî wek paşgir dikevin di navbera qertafa xwastekî (-ba-) û qertafa xwastekî (-aye) de. Eger lêker pêkhatî bin cînavkên pêvebestî diçin destpêka qedê lêkeran û dikevin di navbera qertafa bêjesaz û lêkeran de û eger lêker hevedudanî

bin, cînavkên pêvebestî diçin destpêka qedê lekera bingehîn û dikevin di navbera bêjeya watadar an lêkera alîkar û lêkera bingehin de.

### a. Lêkerên Xwerû

#### Mînak:

kirîbûbamaye: kirîbûba + **m** + aye

kêlabûbamanaye: kêlabûba + **man** + aye

xwardibûbataye: xwardibûba + **t** + aye

firoştibûbatanaye: firoştibûba + **tan** + aye

dirûbûbayaye: dirûbûba + **y** + aye

dirûbûbayanaye: dirûbûba + **yan** + aye

### b. Lêkerên Pêkhatî

#### Mînak:

helimkêşabûbaye: hel + (i)**m** + kêşabûbaye

damanxistibûbaye: da + **man** + xistibûbaye

lêtxistibûbaye: lê + **t** + xistibûbaye

ratangirtibûbaye: ra + **tan** + girtibûbaye

daygirtibûbaye: da + **y** + girtibûbaye

rayankirdibûbaye: ra + **yan** + kirdibûbaye

### c. Lêkerên Hevedudanî

#### Mînak:

rêgamgirtibûbaye: rêga + **m** + girtibûbaye

bexêwmankirdibûbaye: bexêw + **man** + kirdibûbaye



berzit kirdibûbaye: berz + (i)t + kirdibûbaye

yektan girtibûbaye: yek + **tan** + girtibûbaye

bilindîkirdibûbaye: bilind + **î** + kirdibûbaye

ziyadyankirdibûbaye: ziyad + **yan** + kirdibûbaye

### 2.2.7.2.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz

Di zaravayê kurmanciya nawerast, raweyên xwastekî ên demên borî de, ji bo lêkerên negerguhêz desteya duyem (-m/(-în,-yn), (-î, -ît, -yt)/-n, (-Ø,-at,-êt)/ -n) a cînavkên pêvebestî bi kar tê.

#### 2.2.7.2.2.1. Dema Boriya Têdeyî

Di raweya xwastekî a dema boriya têdeyî de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin cînavkên pêvebestî wek paşgir her tim diçin dawiya qedê lêkerê. Tenanet di lêkerên neyînî de jî.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

kenîbam: kenîba + **m**

mirdibayn: mirdiba + **yn**

kewtibayt: kewtiba + **yt**

êwe çûban: êwe çûba + **n**

rijaba: rijaba + **Ø**

ewan rijaban: ewan rijaba + **n**

### **b. Lêkerên Pêkhatî**

#### **Mînak:**

dakewtibam: dakewtiba + **m**

helçûbayn: helçûba + **yn**

rakewtibayt: rakewtiba + **yt**

êwe helhatiban: êwe helhatiba + **n**

rakirdiba: rakirdiba + **Ø**

ewan helfirîban: ewan helfirîba + **n**

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

serkewtibam: serkewtba + **m**

sûrbûbayn: sûrbûba + **yn**

nexoşkewtibayt: nexoşkewtiba + **yt**

êwe rûreşbûban: êwe rûreşbûba + **n**

serxoşbûba: serxoşbûba + **Ø**

ewan gewrebûban: ewan gewrebûba + **n**

#### **2.2.7.2.2.2. Dema Boriya Berdest**

Di raweya xwastekî a dema boriya berdest de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin cînavkên pêvebestî, her tim dikevin di navbera qertafa (-ba-) û qertafa (-aye) de. Heman rewş di lêkerên neyînî de jî rû dide.

### **a. Lêkerên Xwerû**

#### **Mînak:**

bikenîbamaye: bikenîba + **m** + aye

bimirdibaynaye: bimirdiba + **yn** + aye

bikewtibaytaye: bikewtiba + **yt** + aye

êwe biçûbanaye: êwe biçûba + **n** + aye

birijabaye: birijaba + **Ø** + aye

ewan birijabanaye: ewan birijaba + **n** + aye

### **b. Lêkerên Pêkhatî**

#### **Mînak:**

dakewtibamaye: dakewtiba + **m** + aye

helçûbaynaye: helçûba + **yn** + aye

rakewtibaytaye: rakewtiba + **yt** + aye

êwe helhatibanaye: êwe helhatiba + **n** + aye

rakirdibaye: rakirdib(a) + **Ø** + aye

ewan helfirîbanaye: ewan helfirîba + **n** + aye

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

serkewtibamaye: serkewtiba + **m** + aye

sûrbûbaynaye: sûrbûba + **yn** + aye

nexoşkewtibaytaye: nexoşkewtiba + **yt** + aye

êwe rûreşbûbanaye: êwe rûreşbûba + **n** + aye

serxoşbûbaye: serxoşbûba + **Ø** + aye

ewan gewrebûbanaye: ewan gewrebûba + **n** + aye

### 2.2.7.2.2.3. Dema Boriya Dûdar

Di raweya xwastekî a dema boriya dûdar de, cînavkên pêvebestî her tim wek paşgir diçin dawiya qedê lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî û her wiha lêkerên neyînîkirî.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

kenîbim: kenîbi + **m**

mirdibîn: mirdib + **în**

kewtibît: kewtib + **ît**

êwe çûbin: êwe çûbi + **n**

rijabe: rijabe + **ø**

ewan rijabin: ewan rijabi + **n**

#### b. Lêkerên Pêkhatî

##### Mînak:

dakewtibim: dakewtib + (i)**m**

helçûbîn: helçûb + **în**

rakewtibî: rakewtib + **î**

êwe helhatibin: êwe helhatibi + **n**

rakirdibe: rakirdibe + **ø**

ewan helfirîbin: ewan helfirîbi + **n**

#### c. Lêkerên Hevedudanî

##### Mînak:

serkewtibim: serkewtibi + **m**

sûrbûbîn: sûrbûb + **în**

nexoşkewtibît: nexoşkewtib + **ît**

êwe rûreşbûbin: êwe rûreşbûbi + **n**

serxoşbûbe: serxoşbûbe + **ø**

ewan gewrebûbin: ewan gewrebûbi + **n**

#### 2.2.7.2.2.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Di raweya xwastekî a çîrokiya dema boriya têdeyî de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin cînavkên pêvebestî, her tim dikevin di navbera lêkera alîkar (bûn) û qertafa (-aye) de û her wiha heman rewş di lêkerên neyînî de jî rûdide.

##### a. Lêkerên Xwerû

###### Mînak:

kenîbûmaye: kenîbû + **m** + aye

mirdibûynaye: mirdibû + **yn** + aye

kewtibûytaye: kewtibû + **yt** + aye

êwe çûbûnaye: êwe çûbû + **n** + aye

rijabûyaye: rijabû + **y** + aye

ewan rijabûnaye: ewan rijabû + **n** + aye

##### b. Lêkerên Pêkhatî

###### Mînak:

dakewtibûmaye: dakewtibû + **m** + aye

helçûbûynaye: helçûbû + **yn** + aye

rakewtibûtaye: rakewtibû + **t** + aye

êwe helhatibûnaye: êwe helhatibû + **n** + aye

rakirdibûwaye: rakirdibûw + Ø + aye

ewan helfirîbûnaye: ewan helfirîbû + n + aye

### c. Lêkerên Hevedudanî

#### Mînak:

serkewtibûmaye: serkewtibû + m + aye

sûrbûbûynaye: sûrbûbû + yn + aye

nexoşkewtibûtaye: nexoşkewtibû + t + aye

êwe rûreşbûbûnaye: êwe rûreşbûbû + n + aye

serxoşbûbûwaye: serxoşbûbûw + Ø + aye

ewan gewrebûbûnaye: ewan gewrebûbû + n + aye

#### 2.2.7.2.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz

Di zaravayê kurmanciya nawerast, raweyên xwastekî ên demên ranebirdû de, ji bo lêkerên gerguhêz desteya duyem [(-m/-în,-yn), (-î, -ît, -yt/-n), (-Ø,-e, -at,-êt)/ -n)] a cînavkên pêvebestî tê bikaranîn.

##### 2.2.7.2.3.1. Dema Bê

Di raweya xwastekî a dema bê de lêker çi xwerû, çi pêkhatî û çi hevedudanî bin, cînavkên pêvebestî her tim diçin dawiya qedê lêkerê.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

bikirim: bikir + (i)m

bikêlîn: bikêl + în

bixwoyt: bixwo + yt

êwe bifiroşin: êwe bifiroş + (i)n

bidirû: bidirû + Ø

ewan bidirûn: ewan bidirû + n

### **b. Lêkerên Pêkhatî**

#### **Mînak:**

helbikêşim: helbikêş + (i)m

dabixîn: dabix + în

lêbixît: lêbix + ît

êwe rabigirin: êwe rabigir + (i)n

dabigire dabigir + e

ewan rabikin: rabik + (i)n

### **c. Lêkerên Hevedudanî**

#### **Mînak:**

rêgabigirim: rêgabigir + (i)m

bexêwbikîn: bexêwbik + în

berzbikît: berzbik + ît

êwe yekbigirin: yekbigir + (i)n

bilindbike: bilindbik + e

ziyadbikin: ziyadbik + (i)n

#### **2.2.7.2.4. Demên Ranebirdû Lêkerên Negerguhêz**

Di zaravayê kurmanciya nawerast, demên ranebirdû de jî, ji bo lêkerên negerguhêz her dîsa desteya duyem (-m/(-în,-yn), (-î, -ît, -yt)/-n, (-Ø,-at,-êt)/ -n) a cînavkên pêvebestî tên bikaranîn.

### 2.2.7.2.4.1. Dema Bê

Di raweya xwastekî a dema bê de, lêkerên negerguhêz çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin, cînavkên pêvebestî her tim diçin dawiya qedê lêkerê. Eger hat û lêker neyînî jî bin, her dîsa diçin dawiya lêkerê. Di vir de kesê sêyemê yekjimar her tim sifir (Ø) e.

#### a. Lêkerên Xwerû

##### Mînak:

bikenim: biken + (i)m

bimirîn: bimir + în

bikewî: bikew + î

êwe biçin: êwe biç + (i)n

birije: birij + e

ewan birijin: ewan birij + (i)n

#### b. Lêkerên Pêkhatî

##### Mînak:

dabikewim: dabikew + (i)m

helbiçîn: helbiç + în

rabikewî: rabikew + î

êwe helbihên: êwe helbihê + n

rabike: rabik + e

ewan helbifirin: ewan helbifir + (i)n



### c. Lêkerên Hevedudanî

#### Mînak:

serbikewim: serbikew + (i)m

sûrbibîn: sûrbib + î

nexoşbikewî: nexoşbikew + î

êwe rûreşbibin: êwe rûreşbib + (i)n

serxoşbibe: serxoşbib + e

ewan gewrebibin: ewan gewrebib + (i)n

#### 2.2.7.3. Raweya Daxwazî (Fermanî)

Di zaravayê kurmanciya nawerast de, ji bo raweya fermanî desteya sêyem a cînavkên pêvebestî tên bikaranîn û ew jî pêktên ji qertafên (-e) û (-n). Qertafa (-e) ji bo kesê duyem ê yekjimar; qertafa (-n) jî, ji bo kesê duyem ê pirjimar tê bikaranîn. Raweya fermanî her tim amaje bi ranebirdû dike, wate li gor demên borî nayê gerdankirin. Di raweya fermanî, lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz de, cînavkên pêvebestî (-e) û (-n) her tim di dawîya lêkeran de derdikevin.

#### Mînak:

bîkire: fikir + e (xwerû – gerguhêz)

dabigirin: dabigir + (i)n (pêkhatî – gerguhêz)

dûrbixe: dûrbix + e (hevedudanî – gerguhêz)

biçe: biç + e (xwerû – negerguhêz)

biçin: biç + (i)n (xwerû – negerguhêz)

helbifire: helbifir + e (pêkhatî – negerguhêz)

serbikevin: serbikev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha eger lêker bi dengê dengdêr/bizvên dawî bibe qertafa kesa/ê duyem a/ê yekjimar dernakeve. Wate di van formên de kesa/ê duyem ê yekjimar sifir(Ø) e.

**Mînak:**

bîşo: bi + şo + Ø

biro: biro + Ø



## BEŞA SÊYEM

### 3. DI K. JORÎN Û NAWERAST DE BERAWIRDKIRINA QERTAFÊN LÊKERAN

Wek di beşên yekem û duyem de jî hatiye pênasekirin, ziman pêrew yanî sîstem e û her zimanekê jî pêrewek taybet a xwe heye û her wiha her zimanek komelek ji devok û zaravayan pêk tê. Eger wisa ye, wate zimanê kurdî jî xwediyê sîstem û komelek devok û zaravayan e. Tenanet di vî warî de tê gotin; lewane ye zimanên bingehîn ji zaravayên ji hev nêzîk pêk hatibin. Bi watayak din zimanê bingehîn an rîşeyî zimanek hin pak û paraw nîn e.

Dê di vê xebatê de du zaravayên zimanê kurdî, kurmanciya jorîn û kurmanciya nawerast, bên berawirdkirin û çêweya vê berawirdkirinê jî dê di warê qertafên rêzimanî an keresemorfosîntaksî ên lêkeran de be.

Lêker di hemû zimanan de wek polek serekî xwediyê rolên gelek girîng e û van rolên xwe ên girîng jî bi riya komelek qertafan diniwêne, an pîşan dide. Ev qertafane jî pêk tên ji; qertafên raweyên dem, daxwazî û xwastekî, qertafên cînavkên pêvebestî, qertafên gerguhêzî û negerguhêziyê, qertafên lebat, tebat û dançêkeriyê, qertafên rengdêrî, çêbiwar û neyîniyê û qertafên espêktan.

#### 3.1. QERTAFÊN DEMAN

Wek di serî de jî hatiye amajekirin yek ji qertafên lêkeran, qertafên deman in û wek qertafên bend ên kurt diçin ser lêkeran û dema rûdan û rûnedana bûyerê ji bo me aşkîra dikin.

Di zimanê kurdî de dem wek demên borî û demên ranebirdû tên polînkirin, wate di kurdî de du cure rayên lêkeran hene; raya dema borî û raya dema ranebirdû û her wiha her demek jî ji bo bercestebûnê xwediyê komelek qertaf û nîşaneyên taybet e. Bo nimûne di zimanê kurdî, kurmanciya nawerast û jorîn de; “Qertafên demên borî pêktên ji qertafên (-a, -d, -t, -û, -î).”<sup>1</sup> Lê belê ji bo demên ranebirdû, di kurmanciya nawerast de tu qertaf an nîşaneyek nîn e û di vî warî de tê gotin: “Di zaraveyê kurmanciya nawerast de, ji aliyê form ve di navbera dema niha û dema bê de tu cêwazî nîn in û her du deman her yek qalib heye. Cudakirina wan, an di hevokê de bi

<sup>1</sup> Umer Qadir, 61.

alîkariya barê dewrûber diyar dibe, an jî bi alîkariya bikaranîna bêjeyên taybet diyar dibe.”<sup>1</sup>

Lê di zaravayê kurmanciya jorîn de, ji bo demên ranebirdû qertaf û nîşane hen û di derbarê vê yeke de jî tê gotin: “Di zaravayê kurmanciya jorîn de, ne ji bo bi asanî cudahî di navbera formê dema niha û dema bê de tê kirin, belku ji bo yektir cudakirinê nîşaneyên morfolojîk jî hene.”<sup>2</sup> Bo nimûne ji bo dema niha qertafa (di-) tê bikaranîn, ji bo dema bê jî nîşaneyên (dê, ê, wê) û qertafa raweya fermanî (bi-) tê bikaranîn.

### 3.1.1. Qertafên Demên Borî

Di zimanê kurdî de, qertafên (-a, -d, -t, -û, -î) rola; bûyer di pêş axavtinê de rû dide, dibînin û bi vî awayî raya demên borî bedî dikin. Her wiha qertafên demên borî (-a, -d, -t, -û, -î) ji bo her du zaravayan, di pêkhateya lêkerên gerguhêz û negerguhêz de, diçin dawiya rega lêkeran; lê belê eger lêker bi paşgira rêzimanî a gerguhêzker (-an) hatibin darijtin, ev qertafe, dikeve di navbera rega lêker û qertafa demên borî (-d) de.

#### Mînak:

kelî: kel + **î** (xwerû – negerguhêz)

keland: kel + **an** + **d** (xwerû – gerguhêz)

şewitî: şewit + **î** (xwerû – negerguhêz)

şewitand: şewit + **an** + **d** (xwerû – gerguhêz)

Her wiha di kurmanciya jorîn, lêkerên negerguhêz ên bi paşgiran hatine darijtin de jî qertafên demên borî naçin ser rega lêkeran û qertafên darêjer dikevin di navbera reg û qertafên deman de.

#### Mînak:

repisî: rep + **is** + **î** (pêkhatî – negerguhêz)

kelijî: kel + **ij** + **î** (pêkhatî – negerguhêz)

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 196.-197.

<sup>2</sup> h.ç.

### 3.1.1.1. Dema Boriya Têdeyî

Kurmançiya Nawerast: (reg + dem + kes)				Kurmançiya Jorîn: (reg + dem + kes Ø)			
lêker	reg	dem	kes	lêker	reg	dem	kes
kirîm	kir	î	m	(min) kirî	kir	î	Ø
kêlaman	kêl	a	man	(me) kêla	kêl	a	Ø
xwardit	xwar	d	(i)t	(te) xwar	xwar	Ø	Ø
firoştan	firoş	t	tan	(we) firot	firo	t	Ø
dirû	dirû	Ø	Ø	(wî/ê) dirû	dirû	û	Ø
dirûyan	dirû	Ø	yan	(wan) dirû	dirû	û	Ø

#### a. Lêkerên Gerguhêz

##### Mînak:

helkêşa: hel + kêş + **a** (pêkhatî - gerguhêz)

dûr bird: dûr bir + **d** (hevedudanî – gerguhêz)

hilkêşa: hil + kêş + **a** (pêkhatî - gerguhêz)

kelijand: kel + ij + an + **d** (pêkhatî - gerguhêz)

dûr birØ: dûr bir + **Ø** (hevedudanî – gerguhêz)

Di zimanê kurdî, kumanciya jorîn de, qertafa demên borî (-d) ji holê rabûye û nayê nivîsîn, ev yeke nîşaneyê cihêbûna her du zaravayan e. Lê belê di lêkerên, di bingeha xwe de negerguhêz in, û bi riya qertafa (-an) tîngê gerguhêzkirin de qertafa (-d) derdikeve holê û erka xwe a demê digêrîne. Bi vî awayî her du zarava di vir de jî yeklayî dibin.

##### Mînak:

kelijand: kel + ij + an + **d** (gerguhêz)

rijand: rij + an + **d** (gerguhêz)

keland: kel + an + **d** (gerguhêz)

Kurmançiya Nawerast: (reg + dem + kes)				Kurmançiya Jorîn: (reg + dem + kes)			
lêker	reg	dem	kes	lêker	reg	dem	kes
kenîm	ken	î	m	kenîm	ken	î	m
mirdîn	mir	d	în	em mirin	mir	∅	in
kewtît	kew	t	ît	ke(v)tî	ke(v)	t	î
çûn	ç	û	n	hûn çûn	ç	û	n
rija	rij	a	∅	rija	rij	a	∅
rijan	rij	a	n	ew rijan	rij	a	n

### b. Lêkerên Negerguhêz

#### Mînak:

danişt: da + niş + t (pêkhatî - negerguhêz)

têk çû: têk ç + û (hevedudanî – negerguhêz )

rûnişt: rû + niş + t (pêkhatî - negerguhêz)

repisî: rep + is + î (pêkhatî - negerguhêz)

têk çû: têk ç + û (hevedudanî – negerguhêz )

### 3.1.1.2. Dema Boriya Berdest

Kurmançiya Nawerast: (espêkt + kes + reg + dem)					Kurmançiya Jorîn: (espêkt + reg + dem + kes∅)				
lêker	espêkt	kes	reg	dem	lêker	espêkt	reg	dem	kes
demkirî	de	m	kir	î	(min) dikirî	di	kir	î	∅
demankêla	de	man	kêl	a	(me) dikêla	di	kêl	a	∅
detxward	de	t	xwar	d	(te) dixwar	di	xwar	∅	∅
detanfiroşt	de	tan	firoş	t	(we) difirost	di	firo	t	∅

deydirû	de	y	dirû	ø	(wî/ê) didirû	di	dirû	ø	ø
deyandirû	de	yan	dirû	ø	(wan) didirû	di	dirû	ø	ø

**a. Lêkerên Gerguhêz**

**Mînak**

heldekêşa: hel + de + kêş + **a** (pêkhatî - gerguhêz)

dûr debird: dûr de + bir + **d** (hevedudanî – gerguhêz)

hildikêşa: hil + di + kêş + **a** (pêkhatî - gerguhêz)

dikelijand: di + kel + ij + an + **d** (pêkhatî - gerguhêz)

dûr dibir: dûr di + bir + **Ø** (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Nawerast: (espêkt + reg + dem + kes)</b>					<b>Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + dem + kes)</b>				
<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>	<b>lêker</b>	<b>espêkt</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dekenîm	de	ken	î	m	dikenîm	di	ken	î	m
demirdîn	de	mir	d	în	(em) dimirin	di	mir	ø	(î)n
dekewtît	de	kew	t	ît	ke(v)tî	di	ke(v)	t	î
deçûn	de	ç	û	n	(hûn) diçûn	di	ç	û	n
derija	de	rij	a	Ø	dirija	di	rij	a	ø
derijan	de	rij	a	n	dirijan	di	rij	a	n

**b. Lêkerên Negerguhêz**

**Mînak:**

dadenişt: da + de + niş + **t** (pêkhatî - negerguhêz)

têk deçû: t êk de + ç + û (hevedudanî – negerguhêz )

rûdinişt: rû + di + niş + t (pêkhatî - negerguhêz)

direpisî: di + rep + is + î (pêkhatî - negerguhêz)

têk diçû: t êk di + ç + û (hevedudanî – negerguhêz )

### 3.1.1.3. Dema Boriya Dûdar

Kurmançiya Nawerast: (reg + dem + q. awelnawkiraw + kes + espêkt)						Kurmançiya Jorîn: (reg + dem + (y/n) + kes + espêkt)				
lêker	reg	dem	a.n. kiraw	kes	espêkt	lêker	reg	dem	kes	espêkt
kirîwme	kir	î	w	m	e	(min) kiriye	kir	î	ø	(y)e
kêlawmane	kêl	a	w	ma n	e	(me) kêlaye	kêl	a	ø	(y)e
xwardûte	xwar	d	û	t	e	(te) xwariye	xwar	ø	ø	(y)e
firoştûtane	firoş	t	û	tan	e	(we) firotiye	firo	t	ø	(y)e
dirûye	dirû	ø	ø	y	e	(wî/ê) dirûye	dirû	ø	ø	(y)e
dirûwyane	dirû	ø	w	yan	e	(wan) dirûye	dirû	ø	ø	(y)e

#### a. Lêkerên Gerguhêz

##### Mînak:

helkêşaye: hel + kêş + a + y + e (pêkhatî - gerguhêz)

dûr birdûwe: dûr bir + d + û + w + e (hevedudanî – gerguhêz)



hilkêşaye: hil + kêş + **a** + y + e (pêkhatî - gerguhêz)

kelijandiye: kel + ij + an + **d** + i + y + e (pêkhatî - gerguhêz)

dûr biriye: dûr bir + **Ø** + i + y + e (hevedudanî – gerguhêz)

Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + kes + espêkt)					Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + kes + espêkt)				
lêker	reg	dem	kes	espêkt	lêker	reg	dem	kes	espêkt
kenîme	ken	î	m	e	kenîme	ken	î	m	e
mirdûyne	mir	d	(û)y n	e	(em) mirine	mir	Ø	(i)n	e
kewtûyte	kew	t	(û)yt	e	kevtiyî	kev	t(i)	(y)î	ø
(êwe) çûne	ç	û	n	e	(hûn) çûne	ç	û	n	e
rijawe	rij	a	(w)	e	rijaye	rij	a	(y)	e
(ewan) rijane	rij	a	n	e	(ew) rijane	rij	a	n	e

### b. Lêkerên Negerguhêz

#### Mînak:

daniştûwe: da + niş + **t** + û + w + e (pêkhatî - negerguhêz)

têk çûwe: têk ç + **û** + w + e (hevedudanî – negerguhêz )

rûniştiye: rû + niş + **t** + i + y + e (pêkhatî - negerguhêz)

repisiye: rep + is + **î** + y + e (pêkhatî - negerguhêz)

têk çûye: têk ç + **û** + y + e (hevedudanî – negerguhêz )

## 3.1.1.4. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî

Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + bû + kes)					Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + bû + kes Ø)				
lêker	reg	dem	bû	kes	lêker	reg	dem	bû	kes
kirîbûm	kir	î	bû	m	(min)kirîbû	kir	î	bû	Ø
kêlabûman	kêl	a	bû	man	(me)kêlabû	kêl	a	bû	Ø
xwardibût	xwar	d	bû	t	(te)xwaribû	xwar	Ø	(i)bû	Ø
firoştibûtan	firoş	t	bû	tan	(we)firotib û	firo	t	(i)bû	Ø
dirûbûye	dirû	Ø	bû	y(e)	(wî/ê)dirûb û	dirû	Ø	bû	Ø
Dirûbûyan	dirû	Ø	bû	yan	(wan)dirûb û	dirû	Ø	bû	Ø

## a. Lêkerên Gerguhêz

## Mînak:

helkêşabû: hel + kêş + a + bû (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

dûr birdibû: dûr bir + d + (i)bû (hevedudanî – gerguhêz)

hilkêşabû: hil + kêş + a + bû (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

kelijandibû: kel + ij + an + d + (i)bû (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

dûr biribû: dûr bir + Ø + (i)bû (hevedudanî – gerguhêz)

Kurmanciya Nawerast: (reg + dem + bû + kes)					Kurmanciya Jorîn: (reg + dem + bû + kes)				
Lêker	reg	dem	bû	kes	lêker	reg	dem	bû	kes
Kenîbûm	ken	î	bû	m	kenîbûm	ken	î	bû	m
mirdibûyn	mir	d	bû	(û)y n	(em) miribûn	mir	Ø	bû	(i)n

kewtibûyt	kew	t	bû	(û)yt	ketibûyî	ke	t	bû	(y)î
(êwe) çûbûn	ç	û	bû	n	(hûn)çûbûn	ç	û	bû	n
Rijabû	rij	a	bû	∅	rijabû	rij	a	bû	∅
(ewan) rijabûn	rij	a	bû	n	(ew) rijabûn	rij	a	bû	n

### b. Lêkerên Negerguhêz

#### Mînak:

daniştibû: da + niş + t + (i)bû (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

têk çûbû: têk ç + û + bû (hevedudanî – negerguhêz )

rûniştibû: rû + niş + t + (i)bû (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

repisîbû: rep + is + î + bû (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

têk çûbû: têk ç + û + bû (hevedudanî – negerguhêz)

Ger hat û kurmanciya jorîn û nawerast ji aliye dem û qertafên wan ve hatin berawirdkirin, derdikeve holê; di her du zaravayan de her heman qertaf bikar tên. Her wiha di her du zaravayan de, eger lêkerên pêkhatî bi riya pêşgiran bên darijtin qertafên demên borî her tim diçin dawîya rega lêkeran û eger bi riya paşgiran bên darijtin, qertafên demên borî li pey qertafên bêjesaz tên û nikarin biçin ser rega lêkeran, belkû diçin ser qedê lêkeran.

Taybetmendiyek din a zaravayê kurmanciya jorîn û nawerast ev e; ji bo lêkerên gerguhêz ên bi qertafa dema borî (-û-) dawî bibin, hîç mînakek nîn e. Boye qertafa dema borî (-û-) di van her du zaravayane de her tim wek morfîma sifir (∅) tê nişandan.

Di her du zaravayan de, dema lêker li gor çîrokiya dema boriya têdeyî tê gerdankirin, lêkera alîkar (bûn)ê werdigire. Di vê deme de, ger lêker bi qertafên demên borî (-a, -î, -û) dawî bibin, di navbera wan û lêkera alîkar (bûn) de, hîç morfîmek dernakeve. Lê belê ger bi qertafên demên borî (-d, -t) dawî bibe, di navbera qertafa demê û lêkera alîkar (bûn) de morfîma betal (-i-) peyda dibe. Ev yeke, aliyê her du zaravayan ê lihevçûn û yeklayîbûnê ye.

Her wiha di heman demê de, di navbera her du zaravayan de komelek ciyawazî jî hen e, wek; di kurmanciya jorîn de qertafa demên borî (-d-) dikeve û nayê bilêvkirin û wek qertafa sifir (Ø) tê hesabandin, lê belê di kurmanciya nawerast de derdikeve.

**Mînak:**

kir: kir + Ø (kurmanciya jorîn)

bir: bir + Ø (kurmanciya jorîn)

xwar: xwar + Ø (kurmanciya jorîn)

kird: kir + **d** (kurmanciya nawerast)

bird: bir + **d** (kurmanciya nawerast)

xward: xwar + **d** (kurmanciya nawerast)

Di navbera hin dengên qertafên her du zaravayan de, hin guherînên fonolojîk rû didin û formên qertafan diguherin, lê belê ev guherîne hîç bandorekê li wata, erk û rola qertafan nake.

**Mînak:**

**hil** → **hel**

hilkêşan → helkêşan

hilçûn → helçûn

**di** → **de** → **e**

diçin → deçin → eçin

dikirin → dekirin → ekirin

Di vir de, dengê /i/ wediguhere bo dengê /e/. Ev rewşê jî ciyawaziyek din e, di navbera her du zaravayan de.

Di zaravayê kurmanciya jorîn, dema borî de gava lêkera (firoştin) tê gerdankirin, dengê /-ş/ dikeve. Wek; (firost, difirost, firostiyê, firostibû, firostibûye), lê belê di kurmanciya nawerast de nakeve. Wek; (firoşt, defiroşt, firoştûwe, firoştibû).

Di zaravayê kurmanciya jorîn, dema borî, lêkera (kevtin) de, dengê /-v/ dikeve. Wek; (ket, diket, ketiye, ketibû, ketibûye), lê belê di zaravayê kurmanciya nawerast de nakeve, tenanet derdikeve û her wiha dengê /-v/ jî wedigere bo dengê /-w/. Wek; (kewt, dekewt, kewtûwe, kewtibû).

Di her du zaravayan de, di raweyên demên borî, çîrokiya dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya dûdar de, hemû lêker ji ber lêkera alîkar (bûn)ê hevedudanî ne. Wate formê lêkerên çîrokiya dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya dûdar ên xwerû û pêkhatî nîn in. Di vir de lêkera alîkar (bûn) li gel lêkerên bingehîn ên xwerû û pêkhatî de formê raweya çîrokiya dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya dûdar bedî dike. Di van raweyane de, dema lêker wek xwerû û pêkhatî tên diyarkirin, mebest ew e; ew lêkerên bingehîn ên di vir de li gel lêkera (bûn) de tên gelo xwerû ne, an pêkhatî ne. Dê ev rewşe di raweyên hewalî û xwastekî ên lêkerên gerguhêz û negerguhêz de dubare bibin. Ji bo rê li fêmkirinek çewt bê girtin, dibe ev yeke wek xalek girîng bête zanîn.

**Nîşe:** Çîrokiya dema boriya dûdar, tenha di zaravayê kurmanciya jorîn de heye, boye di vir de her du zarava nayên berawirdkirin.

### 3.1.2. Demên Ranebirdû

Di zimanê kurdî, zaravayê kurmanciya jorîn û nawerast de, demên ranebirdû jî xwediyê komelek qertafên wek; (di-), (bi-) û nîşaneyên wek (dê, ê, wê) ne. Ew qertaf û nîşanene bi riya lêkerên gerguhêz û negerguhêz, tebat û lebat xwe diniwênin.

#### 3.1.2.1. Dema Niha

Kurmanciya Nawerast: (espêkt + reg + demØ + kes)					Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + demØ + kes)				
lêker	espêk	reg	dem	kes	lêker	espêk	reg	dem	kes
	t					t			
dekirim	de	kir	Ø	(i)m	dikirim	di	kir	Ø	(i)m

dekêlîn	de	kêl	Ø	în	(em) dikêlin	di	kêl	Ø	(i)n
dexwoyt	de	xwar	Ø	yt	dixweyî	di	xwar	Ø	(y)î
(êwe) defiroşin	de	firoş	Ø	(i)n	(hûn) difiroşin	di	firo	Ø	(i)n
dedirû	de	dirû	Ø	Ø	didirû	di	dirû	Ø	Ø
(ewan) dedirûn	de	dirû	Ø	n	(ew) didirûn	di	dirû	Ø	n

### a. Lêkerên Gerguhêz

#### Mînak:

daderêjim: da + **de** + rêj + (i)m (pêkhatî – gerguhêz)

(êwe) rêkdexin: rêk **de** + x + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

dadigirim: da + **di** + gir + (i)m (pêkhatî – gerguhêz)

(hûn) rêkdixin: rêk **di** + x + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

Kurmanciya Nawerast: (espêkt + reg + demØ + kes)					Kurmanciya Jorîn: (espêkt + reg + demØ + kes)				
lêker	espêkt	reg	dem	kes	lêker	espêkt	reg	dem	kes
	t								
dekenim	de	ken	Ø	(i)m	dikeni m	di	ken	Ø	(i)m
demirîn	de	mir	Ø	în	(em) dimirin	di	mir	Ø	(i)n
dekewît	de	kew	Ø	ît	dikevî	di	ke	Ø	î
(êwe) deçin	de	ç	Ø	(i)n	(hûn) diçin	di	ç	Ø	(i)n
derije	de	rij	Ø	e	dirije	di	rij	Ø	e

(ewan)	de	rij	Ø	(i)n	(ew)	di	rij	Ø	(i)n
derijin					dirijin				

### b. Lêkerên Negerguhêz

#### Mînak:

dadenişim: da + **de** + niş + (i)m (pêkhatî – negerguhêz)

(ême) têkdeçîn: têk **de** + ç + î (hevedudanî – negerguhêz)

rûdinim: ru + **di** + n + (i)m (pêkhatî – negerguhêz)

(em) direpisin: **di** + rep + is + (i)n (pêkhatî – negerguhêz)

(em) têkdiçin: têk **di** + ç + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

### 3.1.2.2. Dema Bê

Kurmanciya Jorîn: (nîşaneya dê/ê + qertafa bi + reg + demØ + kes)					
lêker	nîşaneya dê/ê	qertafa bi	reg	dem	kes
dê/ê bikirim	dê/ê	bi	kir	Ø	(i)m
(em) dê/ê bikêlin	dê/ê	bi	kêl	Ø	(i)n
dê/ê bixweyî	dê/ê	bi	xwar	Ø	(y)î
(hûn) dê/ê bifiroşin	dê/ê	bi	firo	Ø	(i)n
dê/ê bidirû	dê/ê	bi	dirû	Ø	Ø
(ew) dê/ê bidirûn	dê/ê	bi	dirû	Ø	n

### a. Lêkerên Gerguhêz

#### Mînak:

Emro duway nîwero hawrêm debînim.

**Mangêkîtir** dest be kar dekat.

**Salî dahatû** xwêndinman tewa debêt.

dê dabigirim: **dê** da + **bi** + gir + (i)m (pêkhatî – gerguhêz)

(hûn) dê rêkbixin: **dê** rêk **bi** + x + (i)n (hevedudanî – gerguhêz)

<b>Kurmanciya Jorîn: (nîşaneyê dê/ê + bi + reg + demØ + kes)</b>					
<b>lêker</b>	<b>nîşaneyê dê/ê</b>	<b>qertafa bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>kes</b>
dê/ê bikenim	dê/ê	bi	ken	Ø	(i)m
(em) dê/ê bimirin	dê/ê	bi	mir	Ø	(i)n
dê/ê bikevî	dê/ê	bi	kev	Ø	î
(hûn) dê/ê biçin	dê/ê	bi	ç	Ø	(i)n
dê/ê birije	dê/ê	bi	rij	Ø	e
(ew) dê/ê birijin	dê/ê	bi	rij	Ø	(i)n

### **b. Lêkerên Negerguhêz**

#### **Mînak:**

**Beyanî** deçim bo zanko.

Ême **rojî çarşeme degerêynewe**.

Ewan **heftey dahatû** deron bo seyran.

rûdinim: ru + **di** + n + (i)m (pêkhatî – negerguhêz)

(em) direpisin: **di** + rep + is + (i)n (pêkhatî – negerguhêz)

(em) têkdiçin: têk **di** + ç + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Ger bê û her du zaravayên zimanê kurdî, kurmanciya jorîn û nowerast, di çêweya qertafên demên ranebirdû de bîr berawirdkirin, ev lihevçûn û ciyawazî bi dest dikevin:



Di zaravayê kurmanciya jorîn de, ji bo dema niha qertafa (di-) tê bikaranîn, ji bo dema bê jî nîşaneyên (dê, ê, wê) û qertafa raweya fermanî (bi-) tê bikaranîn. Bes di kurmanciya nawerast de, ji bo demên ranebirdû wate dema niha û bê hîç qertafek an nîşaneyek nîn e, boye di vî warî de tê gotin: “Di zaravayê kurmanciya nawerast de, ji aliyê form ve di navbera dema niha û dema bê de tu cêwazî nîn in û her du deman her yek qalib heye. Cudakirina wan, an di hevokê de bi alîkariya barê dewrûber diyar dibe, an jî bi alîkariya bikaranîna bêjeyên taybet diyar dibe.”<sup>1</sup>

Demên ranebirdû, di zaravayê kurmanciya jorîn, pêkhateya lêkeran de wek demên rêzimanî (tense) derdikevin, lê belê ev demene di zaravayê kurmanciya nawerast, pêkhateya lêkerê de wek demên rêzimanî dernakevin, tenha wek demên asayî (time) bi riya bêjeyên ferhengî (beyanî, êsta, emro, heftey dahatû, hefteyektir, mangêktir, salêktir, baharî dahatû, maweyektir, payîzî salî ayinde...hwd.) di pêkhateya hevokê de derdikevin, wek di mînakên serê de jî bedî bûye.

Di kurmanciya jorîn, pêkhateya lêkerê de demên ranebirdû wek morfîm an nîşane derdikevin, lê belê di kurmanciya nawerast de wek morfîma sifir (Ø) tîn nîşandan.

Di kurmanciya jorîn de, ji bilî dema niha û dema bê, dema bê a nêzîk jî heye û bi alîkariya lêkera alîkar (kirin) û qertafa raweya fermanî (bi-) tê bidestxistin, lê ev deme jî di kurmanciya nawerast de nîn e.

Her wiha di warê qertafa dema niha (di-) de, di navbera zimanêvan û lêkolerên zimanê kurdî de hin gengeşî û nakokî hen e. Hinek ji wan vê qertafê wek qertafa dema niha dibînin û hinek ji wan jî wê wek qertafa espêkt dibînin.

Di her du zaravayan de qertafa (de-/di-), di formê lêkeran de her tim wek yek di heman cihê de derdikeve. Wate di lêkerên xwerû û lêkerên bi riya paşgiran tîn darijtin de, di destpêka lêkeran de derdikeve; di lêkerên pêkhatî ên bi riya pêşgiran tîn darijtin de, di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkerê de derdikeve û di lêkerên hevedudanî de jî di navbera bêjeya ferhengî û an lêkera alîkar û lêkera bingehîn de cî digire.

<sup>1</sup> Hacı Marif, *Kirdar (Lêker)*, 196.-197.

### 3.2. QERTAFÊN RAWEYA XWASTEKÎ

Di zimanê kurdî de, raweyek din jî a lêkeran raweya xwastekî ye. "Di zimanê kurdî de lêker ji aliyê raweya xwastekî ve her wek raweya lêkerên ragihandin/hewalî dabeş dibe ser dema rabirdû/borî û dema ranebirdû de."<sup>1</sup> û ji bo bercestebûna vê raweyê jî komelek qertafên wek (-bi-), (-ba-), (-a), (-aye) û bêjeyên ferhengî ên wek xwazge, xwezî, birya, dibe, debêt, be şert, awat, tika, hîwa, hêvî, divê, bila, ku, heke... hwd. rol dibînin.

#### 3.2.1. Di Raweya Xwastekî Demên Borî de

Di zimanê kurdî, zaravayê kurmanciya jorîn û nawerast de; "Raweya xwastekî, wek raweya hevalî/îxbarî çar cureyên demên borî; dema boriya têdeyî/sade, dema boriya berdest/berdewam, dema boriya dûdar/tewaw, çîrokiya dema boriya têdeyî/dûr, hene."<sup>2</sup> û ji bo wan deman, qertafên (-bi-, -ba-, -aye, -a) tên bikaranîn.

kurmanciya nawerast: (reg + dem + ba + kes)					kurmanciya jorîn: (reg + dem + ba + kesØ)				
lêker	reg	dem	ba	kes	lêker	reg	dem	ba	kes
kirîbam	kir	î	ba	m	min kirîba	kir	î	ba	Ø
kêlabaman	kêl	a	ba	man	me kêlaba	kêl	a	ba	Ø
xwardibat	xwar	d	ba	t	te xwariba	xwar	Ø(i)	ba	Ø
firoştibat	firoş	t	ba	tan	we firoşiba	firoş	t(i)	ba	Ø
dirûba	dirû	û	ba	Ø	wî/ê	dirû	û	ba	Ø

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 216.

<sup>2</sup> h.ç., 220.

					dirûba				
dirûbayan	dirû	û	ba	yan	wan dirûba	dirû	û	ba	ø

**a. Di Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz de**

**Mînak:**

helmankêşaba: hel + man + kêş + a + **ba** (pêkhatî - gerguhêz)

dûritxistiba: dûr + (i)t + xis + t + (i)**ba** (hevedudanî – gerguhêz)

(min) kelijandiba: kel + ij + an + d + (i)**ba** (pêkhatî - gerguhêz)

(me) hilkêşaba: me hil + kêş + a + **ba** (pêkhatî - gerguhêz)

dûr xistiba: dûr xis + t + (i)**ba** (hevedudanî – gerguhêz)

kurmanciya nawerast: (reg + dem + ba + kes)					kurmanciya jorîn: (reg + dem + ba + kesØ)				
lêker	reg	dem	ba	kes	lêker	reg	dem	ba	kes
kenîbam	ken	î	ba	m	kenîbam	ken	î	ba	m
mirdibayn	mir	d	ba	yn	(em) miriban	mir	ø	ba	n
kewtibayt	kew	t	ba	yt	ketibayî	ke	t	ba	(y)î
(êwe) çûban	ç	û	ba	n	(hûn) çûban	ç	û	ba	n
rijaba	rij	a	ba	ø	rijaba	rij	a	ba	ø
(ewan) rijaban	rij	a	ba	n	(ew) rijaban	rij	a	ba	n

**b. Di Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz de**

**Mînak:**

(êwe) raperîban: ra + per + î + **ba** + n (pêkhatî - negerguhêz)

(ewan) têk çûban: têk ç + û + **ba** + n (hevedudanî – negerguhêz)

kelijîbam: kel + ij + î + **ba** + m (pêkhatî - negerguhêz)

(hûn) raperîban: hûn ra + per + î + **ba** + n (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têkçûban: ew têk ç + û + **ba** + n (hevedudanî – negerguhêz)

Di kurmanciya nawerast û jorîn, dema boriya têdeyî/nêzîk de, ji bo raweya xwastekî qertafa (-ba-) bikar tê. Ev qertafe di zaravayê kurmanciya nawerast de, di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû de, di kurmanciya jorîn de jî di lêkerên negerguhêz ên xwerû de dikeve di navbera qertafên deman û cînavkên pêvebestî de, lê di kurmanciya jorîn de di lêkerên gerguhêz ên xwerû de piştî qertafên deman tê û wek axîr qertaf di dawiya lêkeran de derdikeve. Çünke di wir de cînavkên pêvebestî ji holê radibin, wate sifir in.

Her wiha eger hat lêker, lêkera gerguhêz be û bi paşgiran hatibe darijtin di kurmanciya nawerast de, qertafa (-ba-) dikeve di navbera qertafên deman û cînavkên pêvebestî de û qertafa darijtinê di dawiya lêkerê de derdikeve. Di kurmanciya jorîn de jî qertafa (-ba-) wek axîr qertaf derdikeve û paşgira darijtinê jî diçe ser rega lêkerê. Bes di her du zaravayan de, di lêkerên gerguhêz ên bi pêşgiran tên darijtin û lêkerên hevedudanî de qertafa (-ba-) her tim wek qertafa dawî derdikeve. Lê belê di lêkerên negerguhêz ên hevedudanî û pêkhatî ên bi pêşgir û paşgiran hatine darijtin de qertafa (-ba-) her tim dikeve di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de.

<b>kurmanciya nawerast: (bi + kes + reg + dem + ba + aye)</b>						
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>kes</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>aye</b>
bimkirîbaye	bi	m	kir	î	ba	aye
bimankêlabaye	bi	man	kêl	a	ba	aye
bitxwardibaye	bi	t	xwar	d	ba	aye
bitanfiroştibaye	bi	tan	firoş	t	ba	aye
bidirûbaye	bi	ø	dirû	û	ba	aye
biyandirûbaye	bi	yan	dirû	û	ba	aye

### c. Di Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz de

**Têbînî:** Di dema boriya berdest de ji ber zêdebûna pêkhatayên lêkeran û cihnebûn wan di yek xişteyê de, bi du xişteyên ji hev cuda hatin nîşandan.

#### Mînak:

helimbikêşabaye: hel + (i)m + **bi** + kêş + a + **ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

dûrtbixistibaye: dûr + t + **bi** + xis + t + (i)**ba** + **aye** (hevedudanî – gerguhêz)

kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + ba + aye + kesØ)						
lêker	bi	reg	dem	ba	aye	kes
(min) bikirîbaye	bi	kir	î	ba	aye	Ø
(me) bikêlabaye	bi	kêl	a	ba	aye	Ø
(te) bixwaribaye	bi	xwar	d	ba	aye	Ø
(we) bifirotibaye	bi	firoş	t	ba	aye	Ø
(wî/ê) bidirûbaye	bi	dirû	û	ba	aye	Ø
(wan) bidirûbaye	bi	dirû	û	ba	aye	Ø

### Di Dema Boriya Berdest Lêkerên Gerguhêz de

#### Mînak:

(min) bikelijandibaye: **bi** + kel + ij + an + d + i + **ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

(me) hilkêşabaye: me hil + kêş + a + **ba** + **aye** (pêkhatî - gerguhêz)

(we) dûr xistibaye: dûr xis + t + i + **ba** + **aye** (hevedudanî – gerguhêz)

kurmanciya nawerast: (bi + reg + dem + ba + kes + aye)						
lêker	bi	reg	dem	ba	kes	aye
bikenîbamaye	bi	ken	î	ba	m	aye
bimirdibaynaye	bi	mir	a	ba	yn	aye

bikewtibaytaye	bi	kew	d	ba	yt	aye
(êwe) biçûbanaye	bi	ç	t	ba	n	aye
bi rijabaye	bi	rij	û	ba	Ø	aye
(ewan) birijabanaye	bi	rij	û	ba	n	aye

**d. Di Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz de**

Ji ber zêdebûna pêkhatayên lêkeran û cihênebûna wan di yek xişteyê de, bi du xişteyên ji hev cuda hatin nîşandan. Her wiha di kurmanciya nawerast, dema boriya berdest de, ji bo raweya lêkerên xwastekî, qertafên (bi-, -ba-, -aye-), ji bo kurmanciya jorîn jî qertafên (bi-, -ba-, -aye, -a) bikar tên.

**Mînak:**

daniştibamaye: da + niş + t + (i)ba + m + aye (pêkhatî - negerguhêz)

(êwe) raperîbanaye: ra + per + î + ba + n + aye (pêkhatî - negerguhêz)

(ewan) têk çûbanaye: têk ç + û + ba + n + aye (hevedudanî – negerguhêz)

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + ba + kes + a)</b>						
<b>lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>a</b>
bikenîbama	bi	ken	î	ba	m	a
(em) bimiribana	bi	mir	a	ba	n	a
bikevtibayî	bi	kew	d	ba	(y)î	ø
(hûn) biçûbana	bi	ç	t	ba	n	a
birijabaya	bi	rij	û	ba	ø	(y)a
(ew) birijabana	bi	rij	û	ba	n	a

**Di Dema Boriya Berdest Lêkerên Negerguhêz de**

**Mînak:**

(ez) raperîbama: ra + per + î + ba + m + a (pêkhatî - negerguhêz)

(tu) repisîbayî: rep + is + î + ba + y + î + Ø (pêkhatî – negerguhêz)

(ew) repisîbaya: rep + is + î + ba + (y)Ø + a (pêkhatî – negerguhêz)

(hûn) birepisîbana: **bi** + rep + is + **î** + **ba** + n + **a** (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têkbiçûbana: ew têk **bi** + ç + û + **ba** + n + **a** (hevedudanî – negerguhêz)

Di her du zaravayan de, qertafa (bi-), di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû de wek pêşgir diçe destpêka qedê lêkeran. Lê belê eger lêker gerguhêz be û bi qertafên pêşgir bête darijtin, di kurmanciya nawerast de diçe destpêka qedê lêkerê û dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û destpêka lêkerê de. Di kurmanciya jorîn de jî ji holê radibe yanî dikeve û nayê nivîsîn. Her wiha di kurmanciya jorîn de eger lêkera gerguhêz bi riya paşgiran bête darijtin qertafa (bi-), diçe destpêka lêkeran.

Eger lêker gerguhêz û hevedudanî be qertafa (bi-), di her du zaravayan de diçe destpêka lêkera bingehîn û di kurmanciya nawerast de dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û lêkera bingehîn de; di kurmanciya jorîn de jî dikeve di navbera bêjeya watadar û destpêka lêkera bingehîn de.

Di lêkerên negerguhêz ên pêkhatî de, qertafa (bi-) di kurmanciya nawerast de ji holê radibe. Di kurmanciya jorîn de jî, eger lêkera negerguhêz bi paşgiran bête darijtin, her wek kurmanciya nawerast, di vir de jî qertafa (bi-) dernakeve, lê eger bi paşgiran bête darijtin qertafa (bi-) di destpêka lêkeran de derdikeve.

Eger lêker negerguhêz û hevedudanî be, qertafa (bi-) di kurmanciya nawerast de dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û destpêka lêkera bingehîn de. Di kurmanciya jorîn de jî dikeve di navbera bêjeya watadar û destpêka lêkera bingehîn de.

Qertafên raweya xwastekî (-ba- û -aye), di her du zaravayan de, eger lêker xwerû û gerguhêz bin piştî qertafên demên borî tên û qertafa (-ba-) li piştî qertafên deman, qertafa (-aye) jî li piştî qertafa (-ba-) derdikeve.

Lêker gerguhêz be û bi riya paşgiran hatibe darijtin, qertafa (-ba-) di kurmanciya nawerast û jorîn de piştî qertafên demên borî tê nivîsîn û dikeve di navbera qertafên deman û qertafa (-aye) de. Her wiha di kurmanciya jorîn de eger lêker bi paşgiran hatibe darijtin qertafa (-ba-), di kurmanciya jorîn de dikeve di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de.

Di lêkera gerguhêz a hevedudanî de qertafa (-ba-), di kurmanciya nawerast de dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û destpêka lêkera bingehîn de, di kurmanciya jorîn de jî dikeve di navbera qertafên deman û qertafa (-aye) de.

Di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de qertafa (-ba-), di her du zaravayan de dikeve di navbera qertafên deman û cînavkên pêvebestî de.

Qertafa (-aye) di kurmanciya nawerast û jorîn, lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim li piştî qertafa (-ba-) tê û wek qertafa dawî di dawiya lêkeran de derdikeve. Heman qertaf di kurmanciya nawerast de di lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de wek qertafa dawî li piştî cînavkên pêvebestî derdikeve. Lê di kurmanciya jorîn de di lêkerên negerguhêz de, ev qertafe jî holê radibe û li şûna wê, qertafa (-a) derdikeve. Qertafa (-a) jî, di lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de piştî cînavkên pêvebestî di dawiya lêkeran de derdikeve.

kurmanciya nawerast: (reg + dem + bi + kes)					kurmanciya jorîn: (reg + dem + be + kesØ)				
lêker	reg	dem	bi	kes	lêker	reg	dem	be	kes
kirîbim	kir	î	bi	m	min kirîbe	kir	î	be	Ø
kêlabiman	kêl	a	bi	man	me kêlabe	kêl	a	be	Ø
xwardibit	xwar	d(i)	bi	t	te xwaribe	xwar	Ø	(i)be	Ø
firoştibitan	firoş	t(i)	bi	tan	we firotibe	firo	t(i)	be	Ø
dirûbi	dirû	û	bi	Ø	wî/ê dirûbe	dirû	û	be	Ø
dirûbiyan	dirû	û	bi	yan	wan dirûbe	dirû	û	be	Ø

#### e. Di Dema Boriya Dûdar Lêkerên Gerguhêz de

##### Mînak:

helimkêşabin: hel + i + m + kêş + a + **bi** + n (pêkhatî - gerguhêz)

dûrtxistibêt: dûr + t + x + is + t + i + **b** + êt (hevedudanî – gerguhêz)

(min) kelijandibe: kel + ij + an + d + i + **be** (pêkhatî - gerguhêz)

(me) hilkêşabe: me hil + kêş + a + **be** (pêkhatî - gerguhêz)



(we) dûr xistibaye: dûr x + is + t + i + **be** (hevedudanî – gerguhêz)

kurmanciya nawerast: (reg + dem + bi + kes)					kurmanciya jorîn: (reg + dem + bi + kesØ)				
lêker	reg	dem	bi	kes	lêker	reg	dem	bi	kes
kenîbim	ken	î	bi	m	kenîbim	ken	î	bi	m
mirdibîn	mir	d(i)	bi	în	(em) miribin	mir	Ø	bi	n
kewtibît	kew	t(i)	bi	ît	ketibî	ke	t	b(i)	î
(êwe) çûbin	ç	û	bi	n	(hûn) çûbin	ç	û	bi	n
rijabe	rij	a	b(i)	e	rijabe	rij	a	b(i)	e
(ewan)rijabin	rij	a	bi	n	(ew) rijabin	rij	a	bi	n

#### f. Di Dema Boriya Dûdar Lêkerên Negerguhêz de

##### Mînak:

daniştibim: da + niş + t + (i)**bi** + m (pêkhatî - negerguhêz)

raperîbe: ra + per + î + **b(i)** + e (pêkhatî - negerguhêz)

(ewan) têk çûbin: têk ç + û + **bi** + n (hevedudanî – negerguhêz)

raperîbim: ra + per + î + **bi** + m (pêkhatî - negerguhêz)

repisîbî: rep + is + î + **b(i)** + î (pêkhatî – negerguhêz)

repisîbe: rep + is + î + **b(i)** + e (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têkçûbin: têk ç + û + **bi** + n (hevedudanî – negerguhêz)

Di kurmanciya nawerast û jorîn, dema boriya dûdar de, ji bo raweya lêkerên xwastekî qertafên (-bi-, -be) bikar tên. Di kurmanciya nawerast, lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz de û di kurmanciya jorîn de jî ji bo lêkerên xwerû ên negerguhêz qertafa (-bi-) tê bikaranîn û ev qertafe her tim dikeve di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de. Lê di kurmanciya jorîn de ji bo lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz qertafa (-be-) bikar tê. Di lêkerên gerguhêz ên demên borî de çunke cînavkên pêvebestî nîn in, piştî qertafa (-be-) hîç qertafek din nayê. Wate ev qertafe wek axîr qertaf di dawiya lêkeran de derdikeve.

**Formê Yekem:**

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + ba + kes + aye)</b>						
<b>Lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>aye</b>
kirîbûbamaye	kir	î	bû	ba	m	aye
kêlabûbaman	kêl	a	bû	ba	man	aye
xwardibûbataye	xwar	d(i)	bû	ba	t	aye
firoştibûbatanaye	firoş	t(i)	bû	ba	tan	aye
dirûbûbaye	dirû	û	bû	ba	Ø	aye
dirûbûbayane	dirû	û	bû	ba	yan	aye

<b>kurmanciya jorîn: (bi + reg + dem + bû + a + kesØ)</b>						
<b>Lêker</b>	<b>bi</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>(y/n)a</b>	<b>kesØ</b>
min bikirîbûya	bi	kir	î	bû	(y)a	Ø
me bikêlabûna	bi	kêl	a	bû	(n)a	Ø
te bixwaribûya	bi	xwar	Ø(i)	bû	(y)a	Ø
we bifirotibûna	bi	firo	t(i)	bû	(n)a	Ø
wî/ê bidirûbûya	bi	dirû	û	bû	(y)a	Ø
wan bidirûbûna	bi	dirû	û	bû	(n)a	Ø

**g. Di Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Gerguhêz de**

Di her du zaravayên kurdî kurmanciya nawerast û jorîn de, ji bo raweya xwastekî a çîrokiya dema boriya têdeyî du formên jihev cihê hene û ev formene jî ji gelek pêkhatayan pêk tên, boye dê her formek bi xiştetek cuda bête nîşandan.

- Di kurmanciya nawerast, çîrokiya dema boriya têdeyî de, ji bo raweya lêkerên xwastekî, qertafên (-ba-, -aye); di kurmanciya jorîn de jî, qertafên (-bi-, -a-, -a) bikar tên.

Di formê yekem de, di kurmanciya nawerast, lêkerên gerguhêz ên xwerû de, qertafa (bi-) nîn e û di vir de qertafa (-ba-) her tim dikeve di navbera lêkera alîkar (bûn) û cînavkên pêvebestî de û qertafa (-aye) jî diçe dawiya lêkeran; di kurmanciya jorîn de jî, di lêkerên gerguhêz ên xwerû û ên bi paşgiran hatine darijtin de, qertafa (bi-) diçe destpêka lêkeran û qertafa (-a) jî diçe dawiya lêkeran.

Di heman formê yekem de, di lêkerên gerguhêz ên bi riya pêşgiran hatine darijtin û ên hevedudanî de, di kurmanciya nawerast de qertafên (-ba-) û (-aye) li pey hev di dawiya lêkeran de derdikevin, lê di kurmanciya jorîn de qertafa (bi-) ji holê radibe û tenha qertafa (-a) di dawiya lêkeran de derdikeve.

### Mînak:

damgirtibûbaye: da + m + gir + t + (i)bû + **ba** + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

helimkêşabûbaye: hel + i + m + kêş + a + bû + **ba** + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

dûritxistibûbaye: dûr + (i)t + x + is + t + (i)bû + **ba** + **aye** (hevedudanî – gerguhêz)

(min) hilkêşabûya: hil + kêş + a + bû + y + **a** (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

(me) bikelijandibûya: **bi** + kel + ij + an + d + (i)bû + y + **a** (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

(we) dûr bixistibûya: dûr **bi** + x + is + t + (i)bû + y + **a** (hevedudanî - gerguhêz)

### Formê Duyem:

kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + kes + aye)					
Lêker	reg	dem	bû	kes	aye
kirîbûmaye	kir	î	bû	m	aye
kêlabûmanaye	kêl	a	bû	man	aye

xwardibûtaye	xwar	d(i)	bû	t	aye
firoştibûtanaye	firoş	t(i)	bû	tan	aye
dirûbûye	dirû	û	bû	Ø	aye
dirûbûyane	dirû	û	bû	yan	aye

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + bû + a + kesØ )</b>					
<b>Lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>(y/n)a</b>	<b>kes</b>
min kirîbûya	kir	î	bû	(y)a	Ø
me kêlabûna	kêl	a	bû	(n)a	Ø
te xwaribûya	xwar	Ø(i)	bû	(y)a	Ø
we firotibûna	firo	t(i)	bû	(n)a	Ø
wî/ê dirûbûya	dirû	û	bû	(y)a	Ø
wan dirûbûna	dirû	û	bû	(n)a	Ø

Di formê duyem de, di kurmanciya nawerast, lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, qertafa (-ba-) ji holê radibe û (-aye) jî di dawiya lêkeran de derdikeve; di kurmanciya jorîn de jî, di lêkerên xwerû û lêkerên bi pêşgiran hatine darijtin de qertafa (bi-) ji holê radibe û tenha qertafa (-a) dimîne û ew jî diçe dawiya lêkeran û di lêkerên bi paşgiran hatine darijtin de jî diçe destpêka qedê lêkeran û di lêkerên hevedudanî de jî ev qertafe diçe destpêka qedê lêkerên bingehîn û di navbera bêjeya watadar û destpêka lêkera bingehîn de derdikeve. Qertafa (-a) jî her dîsa di dawiya lêkeran de derdikeve.

### **Mînak:**

damgirtibûwaye: da + m + gir + t + (i)bû + w + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

helimkêşabûwaye: hel + (i)m + kêş + a + bû + w + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - gerguhêz)

dûritxistibûwaye: dûr + (i)t + x + is + t + (i)bû + w + **aye** (hevedudanî – gerguhêz)

(min) hilkêşabûya: hil + kêş + a + bû + y + **a** (pêkhatî – hevedudanî – gerguhêz)

(me) bikelijandibûna: **bi** + kel + ij + an + d + (i)bû + n + **a** (pêkhatî – hevedudanî – gerguhêz)

(we) dûr bixistibûya: dûr **bi** + x + is + t + (i)bû + y + **a** (hevedudanî – gerguhêz)

### Formê Yekem:

<b>kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + ba + kes + aye)</b>						
<b>Lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>ba</b>	<b>kes</b>	<b>aye</b>
kenîbûbamaye	ken	î	bû	ba	m	aye
mirdîbûbaynaye	mir	d(i)	bû	ba	yn	aye
kewtibûbaytaye	kew	t(i)	bû	ba	yt	aye
(êwe) çûbûbanaye	ç	û	bû	ba	n	aye
rijabûbaye	rij	a	bû	ba	e	aye
(ewan) rijabûbanaye	rij	a	bû	ba	n	aye

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + bû + a + kes + a)</b>						
<b>Lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>a</b>	<b>kes</b>	<b>a</b>
kenîbûyama	ken	î	bû	(y)a	m	a
mirîbûyana	mir	d(i)	bû	(y)a	n	a
ketîbûyayî	kew	t(i)	bû	(y)a	(y)î	ø
(êwe) çûbûyana	ç	û	bû	(y)a	n	a
rijabûya	rij	a	bû	(y)a	ø	ø

(ewan) rijabûyana	rij	a	bû	(y)a	n	a
-------------------	-----	---	----	------	---	---

### h. Di Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî Lêkerên Negerguhêz de

Di formê yekem ê lêkerên negerguhêz de, di kurmanciya nawerast de, qertafa (-ba-) di lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de dikeve di navbera lêkera alîkar (bûn) û cînavkên pêvebestî de û qertafa (-aye) jî di lêkerên bi pêşgiran hatine darijtin û hevedudanî de, her tim diçe dawiya lêkeran.

Di kurmanciya jorîn de jî, di lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de yek ji qertafên (-a-) dikeve di navbera tîpa kelijandinê û cînavkên pêvebestî de, a din jî diçe dawiya lêkeran. Her wiha di kesê duyem ê yekjimar de qertafa (-a) ya dawiyê ji holê radibe.

#### Mînak:

raperîbûbamaye: ra + per + î + bû + **ba** + m + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - egerguhêz)

têk çûbûbaynaye: têk ç + û + bû + **ba** + yn + **aye** (hevedudanî – negerguhêz)

rûniştibûyama: rû + niş + t + (i)bû + (y)a + m + **a** (pêkhatî – hevedudanî - egerguhêz)

kelijîbûyayî: kel + ij + î + bû + (y)a + (y)î + Ø (pêkhatî – hevedudanî - egerguhêz)

têkçûbûyana: têk + ç + û + bû + (y)a + n + **a** (hevedudanî – negerguhêz)

#### Formê Duyem:

kurmanciya nawerast: (reg + dem + bû + kes + aye)					
Lêker	reg	dem	bû	kes	aye
kenîbûmaye	ken	î	bû	m	aye
mirdîbûynaye	mir	d(i)	bû	yn	aye
kewtîbûytaye	kew	t(i)	bû	yt	aye
(êwe) çûbûnaye	ç	û	bû	n	aye

rijabûye	rij	a	bû	ø	(y)e
(ewan) rijabûnaye	rij	a	bû	n	aye

<b>kurmanciya jorîn: (reg + dem + bû + kes + a)</b>					
<b>Lêker</b>	<b>reg</b>	<b>dem</b>	<b>bû</b>	<b>kes</b>	<b>a</b>
kenîbûma	ken	î	bû	m	a
miribûna	mir	d(i)	bû	n	a
ketibûyî	ke(w)	t(i)	bû	(y)î	ø
(êwe) çûbûna	ç	û	bû	n	a
rijabûya	rij	a	bû	(y)ø	a
(ewan) rijabûna	rij	a	bû	n	a

Di formê duyem ê lêkerên negerguhêz de, di kurmanciya nawerast de, qertafa (-ba-) ji holê radibe û qertafa (-aye) jî di lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de her tim diçe dawiya lêkeran.

Di kurmanciya jorîn de jî, yek ji qertafên (-a-) ji holê radibe û yek jî her tim diçe dawiya lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî. Her wiha di formê duyem de di kesê duyem ê yekjimar de hîç qertafek ji bo raweya xwastekî dernakeve, wate her du qertafên (-a) ji holê radibin.

### **Mînak:**

raperîbûmaye: ra + per + î + bû + m + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

daniştibûtaye: da + niş + t + (i)bû + t + **aye** (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

têk çûbûynaye: têk ç + û + bû + yn + **aye** (hevedudanî - negerguhêz)

rûniştibûma: rû + niş + t + (i)bû + m + **a** (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

kelijbûyî: kel + ij + î + bû + (y)î + Ø (pêkhatî – hevedudanî - negerguhêz)

têkçûbûna: têk + ç + û + bû + n + a (hevedudanî – negerguhêz)

### 3.2.2. Raweya Xwastekî Demên Ranebirdû

Di zimanê kurdî, zaravayê kurmanciya jorîn û naverast de; ji bo raweya xwastekî di demên ranebirdû de qertafa (-bi-) tê bikaranîn. Di vê raweyê de wate; “Formê dema ranebirdû a raweya xwastekî, dikare ji bo mebesta derbirîna hêvî/awat, mebest, şîyan/tuwana, rica/tika, di’ a, lahî/peranewe, razîbûn, rik/cext, handan, êrîş, pesendkirin, guman, dudilî, tirs, pirs, merc...hwd. bête bikaranîn.”<sup>1</sup> Her wiha ji bo raweya xwastekî, formên demên ranebirdû, dema niha û dema bê a nêzîk nîn in, wate tenê ji bo dema bê hen e.

kurmanciya naverast: (bi + reg + demØ + kes)					kurmanciya jorîn: (bi + reg + demØ + kes)				
lêker	bi	reg	dem	kes	lêker	bi	reg	dem	kes
bikirim	bi	kir	ø	(i)m	bikirim	bi	kir	ø	(i)m
bikêlîn	bi	kêl	ø	în	(em) bikêlin	bi	kêl	ø	(i)n
bixwoyt	bi	xwar	ø	yt	bixweyî	bi	xwe	ø	(y)î
(êwe) bifiroşin	bi	firoş	ø	(i)n	(hûn) bifiroşin	bi	firo	ø	(i)n
bidirû	bi	dirû	ø	ø	bidirû	bi	dirû	ø	Ø
(ewan) bidirûn	bi	dirû	ø	n	(ew) bidirûn	bi	dirû	ø	n

#### a. Dema Bê Lêkerên Gerguhêz

##### Mînak:

dabigirim: da + **bi** + gir + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

helbikêşim: hel + **bi** + kêş + (i)m (pêkhatî - gerguhêz)

dûrbixî: dûr **bi** + x + ît (hevedudanî – gerguhêz)

<sup>1</sup> Hacî Marif, *Kirdar (Lêker)*, 217.



bikelijînim: **bi** + kel + ij + î + n + m (pêkhatî - gerguhêz)

(em) hilkêşin: hil + kêş + i + n (pêkhatî - gerguhêz)

dûr bixî: dûr **bi** + x + î (hevedudanî – gerguhêz)

kurmanciya nowerast: ( <b>bi</b> + reg + demØ + kes)					kurmanciya jorîn: ( <b>bi</b> + reg + demØ + kes)				
lêker	bi	reg	dem	kes	lêker	bi	reg	dem	kes
bikenim	bi	ken	ø	(i)m	bikenim	bi	ken	ø	(i)m
bimirîn	bi	mir	ø	î + n	(em) bimirin	bi	mir	ø	(i)n
bikewît	bi	kew	ø	ît	bikevî	bi	kev	ø	î
(êwe) biçin	bi	ç	ø	(i)n	(hûn) biçin	bi	ç	ø	(i)n
biêşe	bi	êş	ø	e	biêşe	bi	êş	ø	e
(ewan) biêşin	bi	êş	ø	n	(ew) biêşin	bi	êş	ø	n

## b. Dema Bê Lêkerên Negerguhêz

### Mînak:

dabinişî: da + **bi** + niş + î (pêkhatî - negerguhêz)

(êwe) rabiperin: ra + **bi** + per + i + n (pêkhatî - negerguhêz)

(ewan) têk biçin: têk **bi** + ç + i + n (hevedudanî – negerguhêz)

(ez) raperim: ra + per + i + m (pêkhatî - negerguhêz)

(tu) birepisî: **bi** + rep + is + î (pêkhatî – negerguhêz)

(ew) birepise: **bi** + rep + is + e (pêkhatî - negerguhêz)

(ew) têk biçin: têk **bi** + ç + i + n (hevedudanî – negerguhêz)

Di zaravayê kurmanciya nowerast û jorîn, raweya xwastekî a dema bê de, eger lêker, lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû bin qertafa (bi-) her tim diçe destpêka lêkeran. Her wiha di kurmanciya jorîn de eger lêker bi riya paşgiran hatibin darijtin dîsa qertafa (bi-) diçe destpêka lêkeran. Lê belê eger lêker bi pêşgiran hatibine darijtin, çî gerguhêz, çî negerguhêz di kurmanciya nowerast de qertafa (-bi-)

dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkerê de. Di kurmanciya jorîn de jî, ji holê radibe.

Eger lêker hevedudanî bin, çi gerguhêz, çi negerguhêz, qertafa (bi-) di her du zaravayan de diçe destpêka lêkera bingehîn û dikeve di navbera bêjeya watadar û lêkera bingehîn de.

### 3.3. QERTAFÊN RAWEYA DAXWAZÎ (FERMANÎ)

Raweya fermanî, di zimanê kurdî, zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de her bi heman formê pêk tên û ji bo vê formê jî qertafa (bi-) tê bikaranîn.

Kurmanciya Nawerast: (qertafa (bi) + reg + kes)				Kurmanciya Jorîn: (qertaga (bi) + reg + kes)			
lêker	q. (bi)	reg	kes	lêker	q. (bi)	reg	kes
bikire	bi	kir	e	bikire	bi	kir	e
bikêlin	bi	kêl	(i)n	bikêlin	bi	kêl	(i)n

#### a. Lêkerên Gerguhêz

Kurmanciya Nawerast: (qertafa (bi) + reg + kes)				Kurmanciya Jorîn: (qertaga (bi) + reg + kes)			
lêker	q. (bi)	reg	kes	lêker	q. (bi)	reg	kes
biçe	bi	ç	e	biçe	bi	ç	e
biçin	bi	ç	(i)n	biçin	bi	ç	(i)n

#### b. Lêkerên Negerguhêz

Di her du zaravayan de, qertafa (bi-) di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû de diçe destpêka lêkeran. Di zaravayê kurmanciya nawerast de di lêkerên bi pêşgiran tene darijtin de qertafa (-bi-) dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkeran de, lê di kurmanciya jorîn de ev qertafe ji holê radibe.

**Mînak:**

dabigire: da + **bi** + gir + e (pêkhatî – gerguhêz)

vekêşe: ve + kêş + e (pêkhatî – gerguhêz)

hilkêşin: hil + kêş + (i)n (pêkhatî – gerguhêz)

dûr bixe: dûr + **bi** + x + e (hevedudanî – gerguhêz)

dabinişe: da + **bi** + niş + e (pêkhatî – negerguhêz)

rûne: rû + n + e (pêkhatî – negerguhêz)

vegerin: ve + ger + (i)n (pêkhatî – negerguhêz)

dûr bikevin: dûr **bi** + kev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha di kurmanciya jorîn de ew lêkerên bi paşgiran hatine darijtin de, qertafa (bi-) diçe destpêka lêkeran.

**Mînak:**

bikelijîne: **bi** + kel + ij + î + e (pêkhatî – gerguhêz)

bikelijînin: **bi** + kel + ij + î + (i)n (pêkhatî – gerguhêz)

birepise: **bi** + rep + is + e (pêkhatî – negerguhêz)

birepisin: **bi** + rep + is + (i)n (pêkhatî – negerguhêz)

Ger lêker hevedudanî bin, vê carê jî qertafa (bi-) diçe destpêka lêkerên bingehîn û dikeve di navbera bêjeya watar û lêkerên bingehîn de.

**Mînak:**

dûr bikevin: dûr **bi** + kev + i + n (hevedudanî – negerguhêz)

dûr bixe: dûr + **bi** + x + e (hevedudanî – gerguhêz)

Her wiha di her du zaraveyan de hin guhertinên fonolojîk berpa dibin û formê hin lêkerên gerguhêz, di raweya fermanî de diguhere.

**Mînak:**

xwandin → bixwêne: bi + xwên + e (a ↔ ê)

xwandin → bixwênin: bi + xwên + i + n (a ↔ ê)

xwardin → bîxwo: bî + xw + o + kesØ (a ↔ o)

xwardin → bîxwon: bî + xw + o + n (a ↔ o)

şuştin → bişo: bi + şo + kesØ (u ↔ o)

şuştin → bişo: bi + şo + n (u ↔ o)

xwandin → bixwîne: bi + xwîn + e (a ↔ î)

xwandin → bixwînin: bi + xwîn + i + n (a ↔ î)

Di kurdî de hin lêkerên xwerû hen, bêyî ku qertafên raweya fermanî werbigirin wataya fermananê radigihînin, wek lêkerên (here, were/vere...).

**Mînak:**

here: her + e

vere: ver + e

herin: her + (i) + n

verin: ver + (i) + n

Her wiha di her du zaravayan de, eger di raweya fermanî de, lêker bi dengê dengdêr/bizvên dawî bibe qertafa kesa/ê duyem a yekjimar dernakeve, wate ji bo derkevtina wê, tîpên kelijandinê ên dengdar (n, y, h) devr nabînin û kesa/ê duyem ê yekjimar sifir(Ø) e.

**Mînak:**

şuştin → bîşo: bî + şo + kes Ø

şuştin → bîşon: bî + şo + n

cûn → bicû: bi + cû + kes Ø

bidirû: bi + dirû + kes Ø

girîn → bigirî: bi + girî + kes Ø

### 3.4. QERTAFÊN RAWEYA ÇÊBIWAR

Di zimanê kurdî de yek ji raweyên lêkeran, raweya çêbiwar/awelnavkiraw e. Ev raweye di kurmanciya nawerast de bi riya qertafên (-û-, -w-), di kurmanciya jorîn de jî, bi riya qertafa (-î) berpa dibe. Ev qertafene, di her du zaravayan de lêkeran dikin rengdêr, wate dibin sedema guherîna pola lêkeran. Ev rewşe, di vir de aliyê li yekçûna her du zaravayan e. Lê belê di rol û erka lêkeran de ji hev cihê dibin, çunke di kurmanciya nawerast de lêkerên çêbiwar an aweknakiraw dikarin li gor dema boriya dudar bên gerdankirin û qertafên dem û kesan werbigirin. Lê di kurmanciya jorîn de ger lêkeran qertafa çêbiwar wergirt taybetmendiyên lêkeran ji dest didin, wate nikarin qertafên dem û kesan werbigirin û bên gerdankirin.

#### Mînak:

kirîwme: kir + î + w + n + e (xwerû – gerguhêz – çêbiwar)

kewtûyne: kew + t + û + yn + e (xwerû – negerguhêz – çêbiwar)

(êwe) daniştûne: da + niş + t + û + n + e (pêkhatî – negerguhêz – çêbiwar)

helmangirtûwe: hel + man + gir + t + û + w + e (pêkhatî – gerguhêz – çêbiwar)

dûritxistûwe: dûr + t + x + is + t + û + w + e (hevedudanî – gerguhêz – çêbiwar)

kolayî: kol + a + y + î (pêkhatî – çêbiwar)

girtî: gir + t + î (pêkhatî – çêbiwar)

hilweşandî: hil + weş + an + d + î (pêkhatî – çêbiwar)

belavbûyî: belav + b + û + y + î (hevedudanî – pêkhatî – çêbiwar)

kunkirî: kun + k + ir + î (hevedudanî – pêkhatî – çêbiwar)

çûyî: ç + û + y + î (pêkhatî – çêbiwar)

gotî: go + t + î (pêkhatî – çêbiwar)

### 3.5. QERTAFÊN AVANIYÊ

Di her du zaravayan de ji bo avaniya lêkeran têgehên wek avanî, gorînî tuwanay kar û hêzî kirdar tîn bikaranîn. Di zimanê kurdî de, mebest ji avaniya lêkerê ev e; ev çalakî, hevî, tewger û guhertinên bedî dibin, gelo arasteya wan ber bi kê/kî û çî ve ye.

#### 3.5.1. Lêkerên Gerguhêz û Negerguhêz

Di her du zaravayan de, lêkerên gerguhêz hem daxwaza kirdeyê dikin, hem daxwaza bireserê dikin û di vir de bireser di bin bandor an encama rûdan û bûyeran de dimîne. Lê eger lêker negerguhêz be, tenê daxwaza kirdeyê dike û ya/yê ku di bin bandor an encama rûdan û bûyeran de dimîne kirde ye. Di zimanê kurdî zaravayê kurmanciya nawerast û jorîn de, ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên resen hîç pêkhateyek morfolojîk nîn e. Gerguhêzî an negerguhêziya lêkeran, bi riya wataya wan tê zanîn.

#### Mînak:

min ew dît. → dît: (kirde – bireser → gerguhêz)

ez wî dibînim. → dibînim: (kirde – bireser → gerguhêz)

min ewanim bînîm. → bînîm: (kirde – bireser → gerguhêz)

min ew debînim. → debînim: (kirde – bireser → gerguhêz)

ez diçûm. → diçûm: (kirde → negerguhêz)

ez diçim. → diçim: (kirde → negerguhêz)

min deçûm. → deçûm: (kirde → negerguhêz)

min deçim. → deçim: (kirde → negerguhêz)

Di her du zaravayan de ji bilî wan lêkerên di bingeha xwe de gerguhêz in, hin lêker jî hen di rastî de negerguhêz in, lê bi riya pêkhateyên morfolojîk (-andin, -ên, -în) dibin gerguhêz. Her wiha di vir de qertafa (-andin) ji qertafa gerguhêzkirina

lêkerên negerguhêz (-an-), ji qertafa dema borî (-d-) û ji qertafa çawigê (-in) pêk tê. Ev cure lêkerene wek lêkerên gerguhêz ên naresen tên binavkirin.

**Mînak:**

mirin → mir + **andin** = mirandin

livîn → liv + **andin** = livandin

nivistin → niv + **andin** = nivandin

şikîn → şik + **andin** = şikandin

tezîn → tez + **andin** = tezandin

kenîn → ken + **andin** = kenandin

meşîn → meş + **andin** = meşandin

Her wiha di kurmanciya nawerast û jorîn de, eger lêkerên negerguhêz di demên ranebirdû de bên gerguhêzkin, di qertafa gerguhêzkinina lêkerên negerguhêz (-an-) de, guhertinek fonolojîk rû dide û dengê /a/ wediguhere bo dengê /ê/ û formê (-ên) dête kaya.

**Mînak:**

spartin → dispêrim (dema niha) : a → ê

rijandin → dê birêje (dema bê) : a → ê

razandin → dê birazê (dema bê) : a → ê

niwandin → deniwêne (dema niha): a → ê

Di her du zaravayan de, taybetmendiyek din a hevbeş ev e; dema lêkerên negerguhêz bi riya qertafa (-andin) tên gerguhêzkin, hemû qertafên demên borî dikevin tenha qertafa demên borî (-d-) dimîne, lê ew jî cihê xwe diguhere, wate ji rega lêkeran dûr dikeve û diçe ser qedê lêkeran.

**Mînak:**

rûxa – a + and = rûxand

mird – d + and = mirand

xewt – t + and = xewand

bezî – î + and = bezand

Di warê gerguhêzîbûn û negerguhêzîbûnê de, di zimanê kurdî de boçûnek heye dibêje; lêkerên gerguhêz nikarin bibin negerguhêz, lêkerên negerguhêz jî tenha bi riya pêkhatayên morfolojîk an nişaneyên watadar dikarin bibin gerguhêz. Lê di hember vê boçûnê de, boçûnek din heye û diselmêne di zimanê kurdî de bê alîkariya daneyên morfolojîk, tenha bi alîkariya şiwên û wataya lêkerê a di nav hevokê de lêkera gerguhêz dibe negerguhêz û lêkera negerguhêz jî dibe gerguhêz. Lêkerên (dan, xwardin, xwardinewe, ketin/kewtin, bangdan, pêçxwardin) bi vî awayî kar dikin.

### Mînak:

Te pirtûk **da** min./ To pirtûkeke be min **da**. → da: (gerguhêz)

Mela bang **da**./ → bang da: (negerguhêz)

Ez dereng **ketim**./ Min dûwa **kewtim**. → ket/kewt: (negerguhêz)

Zarok li pey bavê xwe **ket**./Mindaleke le dûway bavkî **kewt**. → ket/kewt: (gerguhêz)

Mindaleke le dûway bavkî **kewt**. → kewt: (gerguhêz)

Polîseke **be dûway** dizeke **kewt**. → kewt: (gerguhêz)

Ême nanman **xward**. → xward: (gerguhêz)

Mareke **pêçxward**. → xward: (negerguhêz)

Di zimanê kurdî zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de, taybetmendiyek din jî a wekhev ev e; bi riya lêkerên yarîdeder/alîkar (xistin, hênan) lêkerên negerguhêz dibin gerguhêz.

### Mînak:

Zarok **giriya**. → giriya: (negerguhêz)

Mindaleke **giriya**. → negerguhêz

Wî kurî zarok **girî xist**. → girî xist (gerguhêz)

Kureke mindaleke **xiste giryan**. → gerguhêz

Ewan mindaleke **hênaye giryan**. → gerguhêz



Di hevokên yekem û duyem de lêkera (**giriya**) negeruhêz e. Lê belê heman lêker di hevokên sêyem, çarem û pêncem de, bi riya lêkerên alîkar/yarîdeder (xistin û hênan) bûne gerguhêz.

### 3.5.2. Lêkerên Dançêker

Di her du zaravayên kurdî, kurmanciya nawerast û jorîn de, avaniya lêkerên dançêker bi alîkariya lêkerên gerguhêz û lêkera (**dan**) berpa dibe. Wate ji bo dançêkeriyê pêwîste lêker gerguhêz be, eger gerguhêz jî nebe, dibe bê gerguhêzkin.

#### Mînak:

Mamoste pirtûka xwe **çap kir**. → gerguhêz

Mamoste pirtûka xwe **da** çapkirin. → gerguhêz – dançêker

Mamosta pirtûkekey **çap kird**. → gerguhêz

Mamosta pirtûkekey be **çap da**. → gerguhêz – dançêker

Zarokî/ê derman xwarin. → gerguhêz

Dayîkê derman bi zarokî/ê **dan** xwarin. → gerguhêz – dançêker

Mindaleke dermanekanî **xward**. → gerguhêz

Daykeke dermanekanî be mindaleke **dexward da**. → gerguhêz- dançêker

Di her du zaravayan de ji bilî alîkariya lêkera (dan), ji bo dançêkeriya lêkeran qertafa (-an) jî tê bikaranîn. Di vir de tişta girîng ev e; di her du zaravayan de bi alîkariya vê qertafê pile an hêza lêkera gerguhêz tê zêdekirin an qewîkirin.

#### Mînak:

Min tu bi Azadî dayî nas**andin**. → gerguhêz - dançêker

Wan birîna te da pêç**andin**. → gerguhêz - dançêker

Ewan toyan be Azad nas**and**. → gerguhêz – dançêker

Ême be destî xoman birîneket pêç**and**. → gerguhêz – dançêker

Her wiha wek pêştir jî hatiye amajekirin, ji bo demên ranebirdû qertafa (-an), ji ber reftarek fonolojîk diguhere dibe (-ên). Wate dengê /a/ di demên ranebirdû de

wediguhere bo dengê /ê/. Lê belê di lêkerên dançêker de, ev yeke tenê di zaravayê kurmanciya nawerast de rû dide. Wate di kurmanciya jorîn de ji bo lêkerên dançêker qertafa (-an) naguhere qertafa (-ên) û her wek xwe dimîne. Boye di vir de, her du zarava ji hev cihê dibin.

**Mînak:**

Ewan toyan be Azad nasand. → gerguhêz – dançêker – dema borî

Min to be Azad denasênim. → gerguhêz – dançêker – dema bê

Her wiha di her du zaravayan de hin lêkerên negerguhêz hen, nikarin bibin gerguhêz, wek lêkerên; here, biro, vere, heyîn, hebûn, çûn, hatin... hwd.

### 3.5.3. Qertafên Lêkerên Lebat û Tebat

Di zimanê kurdî de lebatî, wate kes an tiştê çalakiyekê encam dide tê zanîn, lê belê ji bo vê yekê di her du zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de, hîç pêkhateyek morfolojîk an bêjeyek ferhengî nîn e. Boye lebatbûna lêkerê bi riya watayê wê tê zanîn.

**Mînak:**

Ew minî parast.

Min pirtûkeke nedexwand.

Şêr xezaleke xwardûwe.

To neçûbûyt.

Çûleke difire.

Min beyanî deçim zanko.

Wî ez parastim.

Hûn hatibûn.

Min ji te hez dikir.

Çûk difirin.

Ew dê pirtûkê nexwîne.

Ez naçim

Kes an tiştên di wir de karê ‘parastin, nexwandin, xwardin, neçûn û firîn’ê dikin, diyar in. Boye ev lêkerene hemû lebat an bikerdiyar in. Her wiha di lebatbûna lêkeran de gerguhêzî an negerguhêzî girîng nîn e.

Lê belê ger hat û lêker tebat bin, kes an tiştên ku çalakî û tewgerekê diniwênin diyar nîn in û ev yeke jî, di kurmanciya nawerast de, bi alîkariya qertafa (-r); di kurmanciya jorîn de jî bi alîkariya lêkerên (hat, tê, bê) dête bercestekirin. Bi vî awayî lêkerên tebat hem ji aliyê form ve, hem ji aliyê watayê ve ji lêkerên lebat cihê dibin. Her wiha her du zarava jî, di vir de ji hev cihê dibin, çunke di kurmanciya nawerast de ji bo niwandina vê rewşê pêkhatyek morfolojîk (-r), di kurmanciya jorîn de jî lêkerên (hat, tê, bê) dewr dibînin.

### Mînak:

<b>hatim</b> dîtîn.	→ gerguhêz – tebat
<b>tête</b> girtin.	→ gerguhêz – tebat
<b>hate</b> kuştin.	→ gerguhêz – tebat
em <b>tên</b> spartin.	→ gerguhêz – tebat
hûn <b>hatibûne</b> pirsikirin.	→ gerguhêz – tebat
ew dê <b>bên</b> peydakirin.	→ gerguhêz – tebat
parêzram: parêz + <b>r</b> + a + m	→ gerguhêz - tebat
dexwênrayt: de + xwên + <b>r</b> + a + yt	→ gerguhêz - tebat
bînrawe: bîn + <b>r</b> + a + w + e	→ gerguhêz - tebat
dozrabûyn: doz + <b>r</b> + a + bû + yn	→ gerguhêz - tebat
êwe kujran: êwe kuj + <b>r</b> + a + n	→ gerguhêz - tebat
ewan kujrabûn: ewan kuj + <b>r</b> + a + bû + n	→ gerguhêz - tebat

Her wiha di mînakên serê de derdikeve, di zimanê kurdî de dema lêkerên tebatkirin, di formê gerdankirina wan de guhertin dirust dibe. Bo nimûne di kurmanciya nawerast de lêkerên tebat tenê qertafa demên borî (-a) yê dikarin werbigirin, wate nikarin qertafên (-î, -û, -d, -t) yê werbigirin, her wiha tenê dikarin cînavkên pêvebestî ên desteya duyem [(-m/-în,-yn), (-î, -ît, -yt/-n), (-Ø,-e, -at,-êt)/ -

n)] bistînin. Di kurmanciya jorîn de jî, lêkera (hatin)ê li gor dem û kesan tê gerdankirin, lê belê lêkerên bingehîn nayên gerdankirin û her tim di formê çawigê de ne.

Her wiha di her du zaravayan de eger lêker di demên ranebirdû de bête tebatkirin, di formê lêkeran de guhertin dirust dibe. Di kurmanciya nawerast de piştî gertafa (-r) dengê /a/ diguhere bo dengê /ê/; di kurmanciya jorîn de jî lêkera (hatin), di dema niha de formê (tê) û di dema bê de jî formê (bê) werdigire. Wate di demên borî û ranebirdû de, di warê formê lêkerên tebat de guhertin rû dide. Ev yeke jî xalek din a cihêbûna lêkerên tebat ên demên borî û ranebirdûye.

### Mînak:

deparêzrêm: parêz + r + ê + m → gerguhêz – tebat – dema niha

beyanî bang dekrêm: bang de + k + r + ê + m → gerguhêz – tebat – dema bê

Şorbe **tê** lihevexistin. → gerguhêz – tebat

Ez **têm** dîtin. → gerguhêz – tebat

Tu **têyî** zanîn. → gerguhêz – tebat

Genim **wê bê** hêrandin. → gerguhêz – tebat

Ez **dê bêm** wergirtin. → gerguhêz – tebat

Hûn **ê bên** rêkirin. → gerguhêz – tebat

Di vir de tiştek din a balkêş ew e; her çend e di kurmanciya jorîn de eger lêker gerguhêz bin û xwediyê raweka demên borî bin, her tim cînavkên kesan ên tewandî werbigirin jî, lê di lêkerên tebat ên gerguhêz û xwedî raweka demên borî de ev yasaya zimanê kurdî tê binpêkirin û lêker cînavkên kesane ên xwerû werdigirin. Çünke di vir de cînavkên kesan li gor lêkera negerguhêz (hatin)ê tên wergirtin. Di navbera kurmanciya jorîn û nawerast de, di vî warî de ji hevcihêbûn berpa dibe. Sedema rûnedana vê rewşê di kurmanciya nawerast de, hebûna desteya yekem a cînavkên pêvebestî (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) ye.

### Mînak:

Ez hatim dîtin. → gerguhêz – tebat – dema borî

**Tu** dihatî girtin. → gerguhêz – tebat – dema borî

**Ew** hate kuştin. → gerguhêz – tebat – dema borî

**Em** hatibûn spartin. → gerguhêz – tebat – dema borî

**Hûn** hatibûne pirsikin. → gerguhêz – tebat – dema borî

**Ew** hatiye peydakin. → gerguhêz – tebat – dema borî

Her wiha ji bo ku lêker bibe tebat dibe gerguhêz be, wate lêkerê negerguhêz nikare bibe tebat.

### 3.6. QERTAFÊN NEYÎNIYÊ

Di zimanê kurdî, zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de, qertafên (ne-, na-, nî-, ni-, me-) ji bo neyînîkirina lêkeran tîk bikaranîn. Van qertafane her yekê li gor dem, cih û raweya lêkeran rol û erkên ji hev cihê hen e. Tenanet ji zaravayekê ji bo zaravayek din jî, ji hev cihê dibin. Her wiha di her du zaravayan de aliyên wan ên hevbeş jî hen e.

#### 3.6.1. Demên Borî

##### 3.6.1.1. Qertafa (ne-)

Di zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de, ji bo neyînîkirina demên borî qertafa (ne-) tîk bikaranîn û xwediyê komelek taybetmendiyan e.

Bo nimûne, di her du zaravayan de, di lêkerên negerguhêz ên xwerû de, qertafa (ne-) diçe destpêka lêkeran û di vir de her du zaravayên yeklayî dibin.

##### Mînak:

nehatim: **ne** + hatim (xwerû – negerguhêz – dema borî)

neçûm: **ne** + çûm (xwerû – negerguhêz – dema borî)

Di her du zaravayan de, di lêkerên negerguhêz ên bi pêşgiran hatine darijtin de, qertafa (ne-) dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkeran de û yeklayîbûn berpa dibe.

**Mînak:**

(em) rûneniştin: rû + **ne** + niştin (pêkhatî – negerguhêz – dema borî)

daneniştîn: da + **ne** + niştîn (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

Di kurmanciya jorîn de, eger lêker negerguhêz bin û bi paşgiran hatibin darijtin, dîsa qertafa (ne-) diçe destpêka lêkeran.

**Mînak:**

nekelişî: **ne** + kel + ij + î

nerepise: **ne** + rep + is + e

Ger hat û lêker negerguhêz û hevedudanî bin, qertafa (ne-) di her du zaravayan de dikeve di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingeşîn de.

**Mînak:**

(ew) têkneçûn: têk + **ne** + çûn (hevedudanî – negerguhêz – dema borî )

Her wiha eger lêker gerguhêz û xwerû bin, di kurmanciya nawerast de, qertafên cînavkên pêvebestî dikevin di navbera qertafa neyînî (ne-) û destpêka lêkeran de. Lê belê di kurmanciya jorîn de qertafa (ne-) rastewxo diçe ser destpêka lêkerê û bi vî awayî, di vir de ji aliyê formê lêkerên neyînî ve her du zarava ji hev cihê dibin.

**Mînak:**

nemxward: **ne** + m + xward (xwerû - gerguhêz – dema borî)

netanbînî: **ne** + tan + bînî: (xwerû - gerguhêz – dema borî)

(min) nexwar: **ne** + xwar (xwerû - gerguhêz – dema borî)

(me) nedît: **ne** + dît (xwerû - gerguhêz – dema borî)

Lê belê gava lêker gerguhêz bin û bi riya pêşgiran hatibin darijtin, qertafa (ne-) di kurmanciya nawerast de dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û destpêka lêkeran de. Lê di kurmanciya jorîn de dikeve di navbera qertafên darêjer û destpêka lêkeran de. Di vir de jî dîsa her du zarava ji hev cihê dibin.

**Mînak:**

helyannekêşa: hel + yan + **ne** + kêşa (pêkhatî - gerguhêz – dema borî)

(wan) hilnekêşa: hil + **ne** + kêşa (pêkhatî - gerguhêz – dema borî)

Di lêkerên gerguhêz ên hevedudanî de jî, qertafa (ne-) di kurmanciya nawerast de diçe destpêka lêkera bingehîn û dikeve di navbera cînavkên pêvebestî û lêkera bingehîn de, di kurmanciya jorîn de jî dikeve di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingehîn de.

**Mînak:**

dûryannexist: dûr + yan + **ne** + xist (hevedudanî – gerguhêz – dema borî)

(wan) dûrnexist: dûr + **ne** + xist (hevedudanî – gerguhêz - dema borî)

**a. Dema Boriya Berdest**

Her wiha di vir de xalek serincrakêş heye; gava lêker li gor dema boriya berdest an berdewam tê gerdankirin, di lêkera gerguhêz û negerguhêz a xwerû de, qertafa (ne-) wek pêşgir diçe destpêka qedê lêkeran û di navbera wê û destpêka lêkeran de qertafa espêkt (de-, di-) cî digire.

**Mînak:**

nedixist: **ne** + **di** + xist (xwerû – gerguhêz - dema boriya berdest)

nedihat: **ne** + **di** + hat (xwerû – negerguhêz - dema boriya berdest)

Eger lêker negerguhêz bin û bi paşgiran hatibin darijtin, di kurmanciya jorîn de qertafa (ne-) diçe destpêka lêkeran. Bi wateyek din qertafa (-di-) dikeve di navbera qertafa neyîniyê (ne-) û destpêka lêkeran de.

**Mînak:**

nedikelijîm: **ne** + **di** + kel + ij + m (pêkhatî – negerguhêz - dema boriya berdest)

nedirepisî: **ne** + **di** + rep + is + î (pêkhatî – negerguhêz - dema boriya berdest)

Eger lêker negerguhêz bin û bi pêşgiran hatibin dariştin, qertafa (ne-) dikeve di navbera qertafa darêjer û qertafa espêkt (de-, di-) yê de.

**Mînak:**

danedenişt: da + **ne** + de + nişt (pêkhatî – negerguhêz – dema boriya berdest)

rûnedinişt: rû + **ne** + di + nişt (pêkhatî – negerguhêz – dema boriya berdest)

Eger lêker negerguhêz û hevedudanî bin, qertafa (ne-) dikeve di navbera bêjeya ferhengî û qertafa espêkt (de-, di-) yê de.

**Mînak:**

têk nedeçû: têk **ne** + **de** + çû: (hevedudanî – dema boriya berdest)

têk nediçû: têk **ne** + **di** + çû: (hevedudanî – dema boriya berdest)

**3.6.1.2. Qertafa (nî-)**

Qertafa (nî-), di her du zaravayan de, ji bo demên borî di lêkera (hebûn)ê de derdikeve. Her wiha piştî guhertinek fonolojîk di qertafa (nî-) de, dengê /î/ weguhezî bo dengê /e/. Boye niha ji bo neyînîkirina lêkera (hebûnê), di demên borî de qertafa (ne-) jî tê bikaranîn.

**Mînak:**

hemanbû → nîmanbû: **nî** + man + bû (hevedudanî – dema borî)

hebû → nîbû: **nî** + bû (hevedudanî – dema borî)

hemanbû → nemanbû: **ne** + man + bû (hevedudanî – dema borî)

hebû → nebû: **ne** + bû (hevedudanî – dema borî)

Di vir de gava lêkerên (heyîn, hebûn) tên neyînîkirin, lêkera (hen) ji holê radibe û tenha qetafên neyîniyê (ne-, nî-) dimînin.



### 3.6.2. Demên Ranebirdû

Di zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de, ji bo neyînîkirina demên ranebirdû qertafên (na-, ni-, nî-) tên bikaranîn û her yekê jî komelek taybetmendî hene.

#### 3.6.2.1. Qertafa (-na-)

##### a. Dema Niha

Di her du zaravayan de, eger lêker negerguhêz û xwerû bin, qertafa (na-) diçe destpêka lêkeran.

##### Mînak:

nahêm → nayêm : **na** + yêm (xwerû – negerguhêz – dema niha)

naçim: **na** + çim (xwerû – negerguhêz – dema niha)

Di her du zaravayan de, eger lêker negerguhêz bin û bi pêşgiran hatibine darijtin, qertafa (na-) dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkeran de.

##### Mînak:

rûnanêm: rû + **na** + nêm (pêkhatî – negerguhêz – dema niha)

dananişim: da + **na** + nişim (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

Eger lêker negerguhêz bin û bi paşgiran hatibin dariştin, di kurmanciya jorîn de dîsa qertafa (na-) diçe destpêka lêkeran.

##### Mînak:

narepîsin: **na** + rep + is + (i)n (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

nakeliye: **na** + kel + ij + e (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

Ger hat û lêker negerguhêz û hevedudanî bin, qertafa (na-) di her du zaravayan de dikeve di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingehîn de.

##### Mînak:

(ême) têknaçîn: têk + **na** + çîn (hevedudanî – negerguhêz – dema niha )

(em) têknaçin: têk + **na** + çin (hevedudanî – negerguhêz – dema niha )

Her wiha eger lêker gerguhêz û xwerû bin, di kurmanciya nawerast û jorîn de, qertafa (na-) rastewxo diçe ser destpêka lêkeran, wate di her du zaravayan de wek yek derdikevin.

**Mînak:**

nakirim: **na** + kirim (xwerû - gerguhêz – dema niha)

nabînî: **na** + bînî: (xwerû - gerguhêz – dema niha)

Di her du zaravayan de, di lêkerên gerguhêz ên bi riya pêşgiran hatine darijtin de, qertafa (na-) dikeve di navbera qertafên darêjer û destpêka lêkeran de.

**Mînak:**

helnakêşim: hel + **na** + kêşim (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)

hilnakêşim: hil + **na** + kêşim (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)

Lê eger lêker gerguhêz bin û bi riya paşgiran hatibin darijtin, di kurmanciya jorîn de qertafa (na-) diçe destpêka lêkeran.

**Mînak:**

nakelijînin: **na** + kel + ij + î + (i)m (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)

narepisînin: **na** + rep + is + î + (i)n (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)

Di lêkerên gerguhêz ên hevedudanî de jî, qertafa (na-) dîsa di her du zaravayan de dikeve di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingehîn de.

**Mînak:**

dûrnaxîn: dûr + **na** + xîn (hevedudanî – gerguhêz – dema niha)

(em) dûrnaxin: dûr + **na** + xin (hevedudanî – gerguhêz - dema niha)

### 3.6.2.2. Qertafa (ni-)

#### a. Dema Niha

Qertafa (ni-) tenê di kurmanciya jorîn de berpa dibe û her wiha tenê di her du lêkerên (zanîn û karîn)ê de derdikeve.

nizanim: ni + zanim (xwerû - gerguhêz – dema niha)

nikare: ni + kare (xwerû - gerguhêz – dema niha)

Her wiha di kurmanciya nawerast de formê qertafa neyîniyê (ni-) nîn e û ji bo lêkera (zanîn)ê jî qertafa neyîniyê (na-) bikar tê û lêkera (karîn) jî di vî zaravayî de nayê bikaranîn.

#### Mînak:

dezanim → nazanim: **na** + zan + (i)m

### 3.6.2.3. Qertafa (nî-)

#### a. Dema Niha

Qertafa (nî-), di her du zaravayan de, ji bo dema niha di lêkera (heyîn)ê de derdikeve. Her wiha di kurmanciya jorîn de, dema lêkera (heye) tê neyînîkirin, tîpa (y) wediguhere tîpa (n)yê; lê di kurmanciya nawerast de wek xwe dimîne.

#### Mînak:

heye → nîye: **nî** + ye (xwerû - gerguhêz – dema niha)

heye → nîne: **nî** + ne (xwerû - gerguhêz – dema niha)

### 3.6.2.4. Qertafa (ne-)

#### a. Dema Bê

Di zimanê kurdî de, dema bê û dema bê a nêzîk bi alikariya qertafa (ne-) tên neyînîkirin. Di vir de, ji aliyê qertafa neyîniyê ve di navbera demên borî û demên bê de hevbeşî dirust dibe û di her du cure deman de her heman qertaf bikar tê. Lê belê, ji ber di kurmanciya nawerast de formê demên bê nîn e, dê her du zarava di vî warî de

neyên berawirdkirin. Di demên bê de, ji bo bi destxistina zanyariyan di warê neyînîyê de, temaşeyî mijara “Di kurmanciya Jorîn de Qertafên Neyînîyê” bikin.

### 3.6.3. Raweya Xwastekî

#### 3.6.3.1. Demên Borî

Di her du zaravayên kurdî, kurmanciya nawerast û jorîn de, dema lêker li gor raweya xwastekî a demên borî tîn neyînîkirin, hin cêwazî û liyekçûn tîna ara. Boye gava lêker di demên borî de qertafên neyînîyê werdigirin, çî gerguhêz û negerguhêz bin; çî xwerû, pêkhatî û hevedudanî bin, her wek lêkerên hewalî ên demên borî van qertafane werdigirin. Wate qertafên raweyên xwastekî (bi-, ba-, -aye-, -a) hîç bandorek li ser cih û formê qertafên neyînîyê nîn in. Ji ber vê yekê dê di vir de bi şêweyek berfireh amaje bi neyîniya raweyên xwastekî ên demên borî neyê kirin.

#### Mînak:

nemxwardibaye: **ne** + m + xwardibaye (xwerû - gerguhêz – dema borî)

helyannekêşaba: hel + yan + **ne** + kêşaba (pêkhatî - gerguhêz – dema borî)

dûryannexistibûbaye: dûr + yan + **ne** + xistibûbaye (hevedudanî – gerguhêz – dema borî)

(min) nexwar: **ne** + xwaribûya (xwerû - gerguhêz – dema borî)

(wan) hilnekêşaba: hil + **ne** + kêşaba (pêkhatî - gerguhêz – dema borî)

(wan) dûrnexistbûba: dûr + **ne** + xistibûba (hevedudanî – gerguhêz - dema borî)

nehatibama: **ne** + hatibama (xwerû – negerguhêz – dema borî)

daneniştibanaye: da + **ne** + niştibanaye (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

(ew) têkneçûban: têk + **ne** + çûban (hevedudanî – negerguhêz – dema borî )

nehatibama: **ne** + hatibama (xwerû – negerguhêz – dema borî)

nekelişiba: **ne** + kelişibana (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

(ew) têkneçûban: têk + **ne** + çûban (hevedudanî – negerguhêz – dema borî )

### 3.6.3.2. Demên Ranebirdû

Di her du zaravayên kurdî, kurmanciya nawerast û jorîn de, raweya xwastekî a dema bê wek yek tê neyînîkirin.

#### a. Dema Bê

Di zimanê kurdî de, ji bo neyînîkirina raweya xwastekî a dema bê, qertafa (ne-) tê bikaranîn û ev qertafe her tim cihê qertafa raweya xwastekî a dema bê (bi-) digire. Boye gava raweya xwastekî a dema bê tê neyînîkirin, qertafa (bi-) her tim dikeve.

Di kurmanciya nawerast û jorîn de, eger lêker di raweya xwastekî a dema bê de bin, di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû û lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên bi paşgiran hatine darijtin de, qertafa neyîniyê (ne-) diçe destpêka lêkeran.

#### Mînak:

bikirim → nekirim: **ne** + kirim (xwerû – gerguhêz – raweya xwastekî)

bikelijînim → nekelijînim: **ne** + kelijînim (pêkhatî – gerguhêz – raweya xwastekî)

bikenim → nekenim: **ne** + kenim (xwerû – negerguhêz – raweya xwastekî)

bikelijîn → nekelijîn: **ne** + kelijîn (pêkhatî – negerguhêz – raweya xwastekî)

Lê eger lêker, lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên bi pêşgiran hatine darijtin bin, qertafa neyîniyê (-ne-) dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkerê de. Her wiha pêştir jî hatibû amajekirin, di kurmanciya jorîn, lêkerên bi pêşgiran tîn darijtin de, qertafa (bi-) ji holê radibe, lê qertafa neyîniyê (-ne-) dîsa jî di cihê wê de derdikeve.

#### Mînak:

helbikêşim → helnekêşim: hel + **ne** + kêşim (pêkhatî – gerguhêz – raweya xwastekî)

hilkêşim → hilnekêşim: hil + **ne** + kêşim (pêkhatî – gerguhêz – raweya xwastekî)

dabinişim → danenişim: da + **ne** + nişim (pêkhatî – negerguhêz – raweya xwastekî)

rûnê m → rûnenê m: rû + **ne** + nê m (pêkhatî – negerguhêz – raweya xwastekî))

Her wiha di lêkerên hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz de jî dikeve di navbera bêjeya watar û destpêka lêkera binge hîn de.

### **Mînak:**

têkbiçîn → têkneçîn: têk **ne** + çîn (hevedudanî – negerguhêz – raweya xwastekî)

dûrbixim → dûrnexim: dûr **ne** + xim (hevedudanî – negerguhêz – raweya xwastekî)

### **b. Dema Niha û Dema Bê a Nêzîk**

Dibe bê zanîn di kurmançiya nawerast û jorîn de, ji bo raweyên xwastekî ên, dema niha û dema bê a nêzîk, formê lêkeran ê gerdankirî nîn e. Wate di pêkhateya lêkerê de dernakevin; lê di asta hevoksaziyê de bi alîkariya bêjeyên ferhengî di raweya xwastekî de, dema niha berceste dibe.

Her wiha bi alîkariya qertafa neyîniyê a dema niha (na-)yê, di raweyên xwastekî de lêker nayên neyînîkirin.

#### **3.6.4. Raweya Daxwazî (Fermanî)**

Di zimanê kurdî, kurmançiya nawerast û jorîn de, ji bo neyîniya raweya fermanî qertafên (me-, ne-) tî n bikar anîn. Di rastî de qertafa neyîniya raweya fermanî tenê qertafa (me-) ye, lê niha êdî qertafa (ne-)yê jî di vê raweyê de ji bo neyîniyê bi kar tê. Ev rewşe, di her du zaravayan de wek yek rû dide.

Di raweya daxwazî (fermanî) de, qertafên neyîniyê (me-, ne-), di lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû; lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên bi paşgiran hatine darijtin de, her tim di destpêka lêkeran, cihê qertafa raweya fermanî (bi-) de derdikevin. Lê eger lêker gerguhêz bin û bi pêşgiran hatibine darijtin, qertafa neyîniyê dikeve di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkerê de, her wiha di lêkerên

gerguhêz û negerguhêz ên hevedudanî de jî dikevin di navbera bêjeya watadar û destpêka lêkera bingehîn de.

**Mînak:**

bikire → nekire: ne/me + kire (xwerû – gerguhêz – raweya fermanî)

bikelijîne → mekelijîne/nekeliyîne: ne/me + kelijîne (pêkhatî – gerguhêz – raweya fermanî)

dabigire → damegre/danegre: da + ne/me + gire (pêkhatî – gerguhêz – raweya fermanî)

dagirin → damegirin/danegirin: da + ne/me e + girin (pêkhatî – gerguhêz – raweya fermanî)

dûr bixin → dûrmexin/dûrnexin: dûr ne/me + xin (hevedudanî – gerguhêz – raweya fermanî)

bikenin → nekenin: ne/me + kenin (xwerû – negerguhêz – raweya fermanî)

bikelijîne → mekelijîne/nekeliyîne: ne/me + kelijîne (pêkhatî – negerguhêz – raweya fermanî)

firyabike → firyameke/firyaneke: firyâ + ne/me + ke (hevedudanî – negerguhêz – raweya xwastekî)

zûbikin → zûnekin/zûmekin: zû + ne/me + kin (hevedudanî – negerguhêz – raweya fermanî)

### 3.7. CÎNAVKÊN PÊVEBESTÎ

Zimanê kurdî, yek ji zimanên likaw ê çîqa zimanê Hîndû-Êranî ê ser bi malbata Hîndû-Ewrûpî ye. Di zimanê kurdî de, ji ber taybetmendiya wê a likawbûnê, gava lêker tên gerdankirin, ji bilî qertafên deman, qertafên cînavkên pêvebestî jî wek polek serekî a qertafên rêzimanî, erk û rolek girîng digêrînin.

Ji aliyê zimanewanên zimanê kurdî ve, qertafên cînavkên pêvebestî di zaravayê kurmanciya nawerast de wek sê deste; di kurmanciya jorîn de jî wek du deste hatine destnîşankirin. Di kurmanciya nawerast de ji aliyê form ve, desteya yekem pêk tê ji; (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan), desteya duyem pêk tê ji; (-m, (-în/-yn), (-î /-ît/-y),-n, (-Ø,-at,-êt), -n) û desteya sêyem pêk tê ji; (-e, -n); di kurmanciya jorîn de jî desteya yekem pêk tê ji; (-m/-n, -î/-n, -e,-Ø/-n) û desteya duyem jî pêk tê ji; (-e, -n) yê.

Di zimanê kurdî de, qertafên cînavkên pêvebestî, bi gelemperî wek paşgir devr dibînin, lê belê di zaravayê kurmanciya nawerast de, desteya yekem (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan), wek rewşek awarte hin caran diçe destpêka lêkeran û dikeve di navbera qertafên rêzimanî an darêjer û destpêka lêkerê de. Her wiha, her çend e di warê form û cihê cînavkên pêvebestî de, di navbera her du zaravayan de hin ciyawazî hebin jî, ew ciyawaziyene rêjeyî ne.

Her wiha di vir de her du zarava, dê li gor dema bê û dema bê a nêzîk neyên berawirdkirin. Çûnke wek pêştir jî hatiye amajekirin, di kurmanciya nawerast de dema bê û dema bê a nêzîk di pêkhateya lêkerê de wek demên rêzimanî (tense) nîn in, tenha wek demên asayî (time) hene. Tenanet dema bê a nêzîk wek dema asayî jî di kurmanciya nawerast de nîn e.

#### 3.7.1. Raweyên Hewalî

Di zimanê kurdî, raweyên hewalî de, cînavkên pêvebestî li gor dem (demên borî, demên ranebirdû), li gor avanî (gerguhêzî û negerguhêzî) û li gor ronan (xwerû, pêkhatî û hevedudanî)a lêkeran, bi formên ciyawaz di pêkhateya lêkeran de, di cihên ciya ciya de derdikevin û dibin sedema bidestxistina kes û mêjera lêkeran.



### 3.7.1.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz

Di kurmanciya nawerast de, desteya yekem (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) a cînavkên pêvebestî tenha di lêkerên gerguhêz ên demên borî de dête kaya û xwediye cihekî cîgir nîn e, çunke ev cînavkene hem diçin dawiya lêkeran hem diçin destpêka lêkeran, boye wek cînavkên bihêz jî tên binavkirin.

Di kurmanciya nawerast, lêkerên gerguhêz ên demên borî de, eger lêker xwerû bin, desteya cînavkên pêvebestî a yekem (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan), di dema boriya têdeyî de, di dawiya lêkeran de; di dema boriya dûdar de, di navbera qertafên deman û espêkta (-e) de; di dema boriya berdest de, di navbera espêkta (de-) û destpêka lêkeran de derdikeve. Lê di kurmanciya jorîn, demên borî de, ji bo lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî wek qertaf hîç pêkhateyek nîn e, boye erk û rola cînavkên pêvebestî; ji aliyê cînavkên kesî ên tewandî (min, te, wî/wê, me, we, wan) ve tê cêbecêkirin û cînavkên pêvebestî jî wek sifir (Ø) tên nîşandan. Ev rewşe wek ciyawaziyek serekî di navbera her du zaravayan de berpa dibe.

#### Mînak:

kirîm: kirî + **m** (xwerû - gerguhêz – dema borî têdeyî)

kêlamane: kêla + **man** + e (xwerû - gerguhêz – dema borî dûdar)

deybînî: de + **y** + bînî (xwerû - gerguhêz – dema borî berdest)

(min) kirî: kirî + Ø (xwerû - gerguhêz – dema borî têdeyî)

(me) kêlaye: kêlaye + Ø (xwerû - gerguhêz – dema borî dûdar)

(te) dixwar: dixwar + Ø (xwerû - gerguhêz – dema borî berdest)

Lê eger lêker gerguhêz bin û bi qertafên pêşgir hatibin darijtin, di kurmanciya nawerast de cînavkên pêvebestî ên desteya yekem di dema boriya têdeyî û dûdar de diçin destpêka lêkeran û dikevin di navbera qertafa darêjer û destpêka lêkeran de. Di dema boriya berdest de jî dikevin di navbera qertafa darêjer û qertafa espêkt (-de-)yê de.

#### Mînak:

helitkêşa: hel + (i)**t** + kêşa (pêkhatî - gerguhêz – dema boriya têdeyî)

datandexist: da + **tan** + de + xist (pêkhatî - gerguhêz – dema boriya berdest)

raygirtûwe: ra + y + girtûwe (pêkhatî - gerguhêz – dema boriya dûdar)

(te) hilkêşa: hil + kêşa + Ø (pêkhatî - gerguhêz – dema boriya têdeyî)

(wî/ê) dadixist: da + xist + Ø (pêkhatî - gerguhêz – dema boriya berdest)

(we) ragirtiye: ra + girt + Ø (pêkhatî - gerguhêz – dema boriya dûdar)

Di lêkerên gerguhêz ên hevedudanî de eger di çîrokiya dema boriya têdeyî de li gel lêkera alîkar (bûn) de lêkerên xwerû bîn û formê hevedudaniyê pêk bînin, cînavkên pêvebestî ên desteya yekem di dawiya lêkeran de derdikevin. Lê belê eger di çîrokiya dema boriya têdeyî de, ji bilî lêkerên xwerû û lêkera alîkar (bûn)ê bêjeyek din jî di formê hevedudaniya vî demî de cih bigire wê gavê cînavkên pêvebestî ên desteya yekem, wek dema boriya têdeyî û dema boriya dûdar dikevin di navbera bêjeya ferhengî û destpêka lêkera bingehîn de. Her wiha di dema boriya berdest de jî, dikevin di navbera bêjeya watadar û qertafa espêkt (de-) de. Lê di kurmanciya jorîn de, wek di serî de jî hatiye amajekirin; di demên borî, lêkerên gerguhêz ên hevedudanî de cînavkên pêvebestî sifir (Ø) in.

### **Mînak:**

xwardibûm: xwardibû + **m** (xwerû - hevedudanî - gerguhêz – çîrokiya dema borî têdeyî)

firoştibûtan: firoştibû + **tan** (xwerû - hevedudanî - gerguhêz – çîrokiya dema borî têdeyî)

berzitkirdibû: berz + (i)t + kird (hevedudanî - gerguhêz – çîrokiya dema boriya têdeyî)

ziyadîkird: ziyad + î + kird (hevedudanî - gerguhêz – dema boriya têdeyî)

yektangirtûwe: yek + **tan** + girtûwe (hevedudanî - gerguhêz – dema boriya dûdar)

berzitdekird: berz + **t** + de + kird (hevedudanî - gerguhêz – dema boriya berdest)

(te) bilindikir: (te) bilindikir + Ø (hevedudanî - gerguhêz – dema borî)

(we) yekgirtiye: (we) yekgirtiye + Ø (hevedudanî - gerguhêz – dema borî)

(wî/ê) zêdekiribû: (wî/ê) zêde dikir + Ø (hevedudanî - negerguhêz – dema borî)

(wan) zêdekiribûye: (wî/ê) zêde dikir + Ø (hevedudanî - negerguhêz – dema borî)

### 3.7.1.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz

Di kurmanciya nawerast û jorîn, lêkerên negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de, cînavkên pêvebestî wek daneyên rêzimanî di pêkhateya lêkeran de, wek paşgir dîne ara. Ji bo lêkerên negerguhêz, di kurmanciya nawerast de, desteya duyem a cînavkên pêvebestî (-m, (-în/-yn), (-î /-ît/-y),-n, (-Ø,-at,-êt), -n); di kurmanciya jorîn de jî, desteya yekem a cînavkên pêvebestî (-m/-n, -î/-n, -e,-Ø/-n) tê bikaranîn. Ev cureyên cînavkên pêvebestî wek cureyên bêhêz tîn pejirandin, çunke wek paşgir di dawiya lêkeran de derdikevin, wate cîgir in. Di vir de her du zarava yeklayî dibin. Ew destê cînavkane, di dema boriya têdeyî û berdest de, di dawiya lêkeran de; di dema boriya dudar de jî di navbera qertafên deman û espêkta (-e) de derdikevin.

#### Mînak:

kenîm: kenî + **m** (xwerû - negerguhêz – dema borî)

degiriyayt: degirîya + **yt** (xwerû - negerguhêz – dema borî)

(ew) westan: (ew) westa + **n** (xwerû - negerguhêz – dema borî)

hafîne: hat + **în** + e (xwerû - negerguhêz – dema borî)

(hûn) hatine: (hûn) hat + **(i)n** + e (xwerû - negerguhêz – dema borî)

Ev destê cînavkane di her du zaravayan de, di lêkerên negerguhêz ên bi pêşgir û paşgiran hatine darijtin de, wek qertaf di dema boriya têdeyî û berdest de, di dawiya lêkeran de; di dema boriya dudar de jî di navbera qertafên deman û espêkta (-e) de derdikevin.

#### Mînak:

helçûyn: helçû + **yn** (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

rûniştim: rûnişt + **(i)m** (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

kelijîm: kelijî + **m** (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

(hûn) dikelijîn: dikelijî + **n** (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

helfirîne: helfirî + **n** + e (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

rakevtiye: rakevt + **î** + (y)e (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

kelijîme: kelijî + **m** + e (pêkhatî - negerguhêz – dema borî)

Ger hat, lêker negerguhêz û hevedudanî bin, ev destê cînavkane di her du zaravayan de, di dema boriya têdeyî û berdest de, di dawiya lêkeran de; di dema boriya dudar de di navbera qertafên deman û espêkta (-e) de; di çîrokiya dema boriya têdeyî de jî, dikeve di navbera lêkera alîkar (bû) û qertafa espêkt (-e) de.

#### **Mînak:**

sûrbûyn: sûrbû + **yn** (hevedudani - negerguhêz – dema borî)

gewredebûyt: gewredebû + **yt** (hevedudani - negerguhêz – dema borî)

mezindibûn: mezindibû + **n** (hevedudani - negerguhêz – dema borî)

serkewtûme: serkewtû + **m** + e (hevedudani - negerguhêz – dema borî)

serxweşbûne: serxweşbû + **n** + e (hevedudani - negerguhêz – dema borî)

### **3.7.1.3. Demên Ranebirdû**

Di kurmanciya nawerast, demên ranebirdû de, ji bo gerdankirina lêkeran desteya cînavkên pêvebestî a (-m, (-în/-yn), (-î /-ît/-y),-n, (-Ø,-at,-êt), -n) û di kurmanciya jorîn de jî, desteya cînavkên pêvebestî a (-m/-n, -î/-n, -e,-Ø/-n) tê bikaranîn. Ev destê cînavkane di her du zaravayan de, wek cînavkên bêhêz tên binavkirin, cîgir in û her tim wek paşgir di dawiya lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî de derdikevin.

#### **a. Dema Niha Lêkerên Gerguhêz**

##### **Mînak:**

dekirim: dekir + (i)**m** (xwerû - gerguhêz – dema niha)

dekêlîn: dekêl + **în** (xwerû - gerguhêz – dema niha)  
 (ew) dexwat: (ew) dexw + **at** (xwerû - gerguhêz – dema niha)  
 dikirim: dikir + **(i)m** (xwerû - gerguhêz – dema niha)  
 (em) dikêlin: (em) dikêl + **(i)n** (xwerû - gerguhêz – dema niha)  
 (ew) dixwe: (ew) dixwe + **e** (xwerû - gerguhêz – dema niha)  
 heldekêşim: heldekêş + **(i)m** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 dadexît: dadex + **ît** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 radegirêt: radegir + **êt** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 deşkênîn: deşikên + **în** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 hildikêşim: hildikêş + **im** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 dadixe: dadix + **e** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 (em) dişkênin: (em) dişikên + **(i)n** (pêkhatî - gerguhêz – dema niha)  
 berzdekeyt: berzdeke + **yt** (hevedudanî - gerguhêz – dema niha)  
 yekdegirîn: yekdegir + **în** (hevedudanî - gerguhêz – dema niha)  
 ziyaddek: ziyaddek + **at** (hevedudanî - gerguhêz – dema niha)  
 bilinddikî: bilinddik + **î** (hevedudanî - gerguhêz – dema niha)  
 (em) yekdigirin: (em) yekdigir + **(i)n** (hevedudanî - gerguhêz – dema niha)  
 (ew) zêde dike: (ew) zêde dik+ **e** (hevedudanî - gerguhêz – dema niha)

## **b. Dema Niha Lêkerên Negerguhêz**

### **Mînak:**

dekenim: deken + **(i)m** (xwerû - negerguhêz – dema niha)  
 degirîn: degir + **în** (xwerû - negerguhêz – dema niha)  
 deroyt: dero + **yt** (xwerû - negerguhêz – dema niha)  
 (ew) diwestin: (ew) diwest + **(i)n** (xwerû - negerguhêz – dema niha)

têm: tê + m (xwerû - negerguhêz – dema niha)

(hûn) tîn: (hûn) tê + n (xwerû - negerguhêz – dema niha)

heldeçîn: heldeç + îm (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

dadenişim: dadeniş + (i)m (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

radegîre: radegîr + e (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

dikelijim: dikelij + (i)m (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

(hûn) hildifirin: (hûn) hildifir + (i)n (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

radikevî: radikev + î (pêkhatî - negerguhêz – dema niha)

(êwe) sûrdebin: sûrdeb + (i)n (hevedudani - negerguhêz – dema niha)

gewredebi: gewrede + ît (hevedudani - negerguhêz – dema biha)

mezindibî: mezindib + î (hevedudani - negerguhêz – dema niha)

(ew) serdikevin: serdikev + (i)n (hevedudani - negerguhêz – dema niha)

(ew) serxweşdibe: (ew) serxweşdib + e (hevedudani - negerguhêz – dema niha)

Her wiha di her du zaravayan de, ji bilî berawirdkirina cureyên deste û cihên cînavkên pêvebestî û bercestekirina ciyawazî û lihevçûnên wan, ji aliyê form ve jî di navbera cînavkên pêvebestî ên her du zaravayan de, hinek ciyawazî û lihevçûn bedî dibin.

Bo nimûne, eger lêker gerguhêz be û di raweya demên borî de be, di kurmanciya nawerast de wek qertaf hêmayên (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) tîn bikaranîn, lê di kurmanciya jorîn de ji bo vê yekê hîç nîşaneyek nîn e. Boye wek morfîma sifir (Ø) tê hesabandin. Di kurmanciya jorîn de, erk û rola van qertafan cînavkên serbixwe ên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan) cêbecê dikin. Her wiha di desteya qertafên (-m/-man, -t/-tan, -î,-y/-yan) de, her sê kesên yekem, duyem û sêyem ên pirjimar ji pêkhateyên; (m + an), (t + an), (y + an) pêk tîn. Wate qertafa pirjimar (-an) li gel her sê qertafên kesên yekem (m-), duyem (t-) û sêyem (y-) ên yekjimar tê nivîsîn û bi awayî her sê kesên yekem (-man), duyem (-tan) û sêyem (-yan) ên pirjimar tîn bidestxistin.

Di lêkerên negerguhêz ên raweya demên borî û lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên raweya demên ranebirdû de, di kurmanciya naverast de qertafên (-m, (-în/-yn), (-î /-ît/-y), -n, (-Ø, -at, -êt), -n), di kurmanciya jorîn de jî qertafên (-m/-n, -î/-n, -e, -Ø/-n) wek hêma tên bikaranîn.

Di vir de, di her du zaravayan de, ji bo kesê yekem ê yekjimar, qertafa (-m) tê bikaranîn, boye yeklayîbûn heye. Ji bo kesê duyem ê yekjimar, di her du zaravayan de qertafa (-î) tê bikaranîn, wate yeklayîbûn heye, lê di zaravayê kurmanciya nawerast de ji bilî qertafa (-î) qertafên (-ît, -y) jî tên bikaranîn, ev yeke jî nîşaneyê ciyawaziyê ye, wate lihevçûn û ciyawaziyek rêjeyî heye. Ji bo kesê sêyem ê yekjimar, di her du zaravayan de, di hin cihan de hêmaya sifir (Ø) derdikeve, lê di hin cihan de jî di kurmanciya nawerast de qertafên (-at, -êt) û di kurmanciya jorîn de jî qertafa (-e) derdikeve. Di vir de jî lihevçûn û ciyawaziyek rêjeyî heye. Ji bo kesê yekem ê pirjimar, di kurmanciya nawerast de qertafa (-în, -yn) bikar tê, tenanet ev qertafe di hin devokên zaravayê kurmanciya jorîn de jî heye, lê di nivîsê de dernakeve. Di kurmanciya jorîn de jî, ji bo kesê yekem ê pirjimar qertafa (-n) tê bikar anîn, wate di vir de lihev çihêbûn heye. Di her du zaravayan de ji bo kesên duyem û sêyem ên pirjimar jî qertafa (-n) bikar tê, di vir de dîsa her du zarava yeklayî dibin.

### 3.7.2. Raweyên Xwastekî

Di her du zaravayan de, ji bo raweyên xwastekî, desteyên cînavkên pêvebestî [(-m/-man, -t/-tan, -î, -y/-yan)], [(-m, (-în/-yn), (-î /-ît/-y), -n, (-Ø, -at, -êt), -n)], [(-m/-n, -î/-n, -e, -Ø/-n)] her bi heman şert û mercên raweyên hewalî derdikevin.

#### 3.7.2.1. Demên Borî Lêkerên Gerguhêz

Di raweyên xwastekî ên demên borî de, gava ji bo lêkerên gerguhêz ên xwerû, pêkhatî û hevedudanî, kurmanciya nawerst û jorîn li gor taybetmendiyan cînavkên pêvebestî tên berawirdkirin, di kurmanciya nawerast de cînavkên pêvebestî ên desteya yekem (-m/-man, -t/-tan, -î, -y/-yan) tên bikaranîn; di kurmanciya jorîn de jî, ji bo van erk û rolan, cînavkên serbixwe ên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan)

tên bikaranîn. Wate di kurmanciya jorîn de, qertafên cînavkên pêvebestî wek morfîma sifir (Ø) tên nîşandan. Ev yeke jî, di vir de wek xalek girîng dibe nîşana ciyawaziya di navbera her du zaravayan de. (bnr. 2.2.1.2.1.)

### 3.7.2.2. Demên Borî Lêkerên Negerguhêz

Di raweya xwastekî a demên borî de, ji bo lêkerên negerguhêz, di kurmanciya nawerast de cînavkên desteya [(-m/(-în,-yn), (-î, -ît, -yt)/-n, (-Ø,-at,-êt)/ -n)], di kurmanciya jorîn de jî desteya (-m/-n, -î/-n, -e,-Ø/-n) tê bikaranîn.

#### a. Dema Boriya Têdeyî

Di raweya xwastekî, dema boriya têdeyî de, di her du zaravayan de lêker çi xwerû, çi pêkhatî û çi hevedudanî bin qertafên cînavkên pêvebestî her tim piştî qertafa (-ba-) tên û di dawiya lêkeran de derdikevin, bi vî awayî her du zarava li hev diçin. Ciyawaziya di vir de berpa dibe, tenha formê hin qertafên cînavkên pêvebestî ne.

#### Mînak:

bikenîbam: bikenîba + **m** (xwerû - negerguhêz)

daniştibayn: daniştba + **yn** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbayt: têkçûba + **yt** (hevedudanî – negerguhêz )

bihatibam: bihatiba + **m** (xwerû - negerguhêz)

(em) raperîban: raperîba + **n** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbayî: têkçûba + (y)î (hevedudanî – negerguhêz )

#### b. Dema Boriya Berdest

Di raweya xwastekî, dema boriya berdest de, lêker çi xwerû, çi pêkhatî û çi hevedudanî bin, di zaravayê kurmanciya nawerast de cînavkên pêvebestî dikevin di navbera qertafên (-ba-) û (-aye) de; di kurmanciya jorîn de jî, dikevin di navbera



qertafên (-ba-) û (-a) de. Wate di her du zaravayan wek yek dikevin di navbera komelek qertafan de û wek qertafên dawî di dawiya lêkeran de dernakevin.

**Mînak:**

(êwe) giriyabanaye: giriyaba + **n** + aye (xwerû – negerguhêz)

(ewan) daniştibanaye: daniştiba + **n** + aye (pêkhatî– negerguhêz)

(ew) çeqîbûbaye: biçeçîbûba + **Ø** + aye (hevedudanî- negerguhêz)

(hûn) bigiriyabana: bigiriyaba + **n** + a (xwerû – negerguhêz)

(ew) raketibana: raketiba + **n** + a (pêkhatî – negerguhêz)

(ew) têkbiçûbaya: têkbiçûba + **Ø** + (y)a (hevedudanî - negerguhêz)

**c. Dema Boriya Dûdar**

Di raweya xwastekî, dema boriya dûdar de jî, her wek dema boriya têdeyî di her du zaravayan de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin, qertafên cînavkên pêvebestî her tim di dawiya lêkeran de derdikevin. Di vir de jî cînavkên pêvebestî di her du zaravayan de wek yek piştî qertafa (-bi-) derdikevin.

**Mînak:**

kenîbim: kenîbi + **m** (xwerû - negerguhêz)

daniştibîn: daniştib + **în** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbît: têkçûb + **ît** (hevedudanî – negerguhêz )

hatibim: hatibi + **m** (xwerû - negerguhêz)

(em) raperîbin: raperîbi + **n** (pêkhatî - negerguhêz)

têkçûbî: têkçûb + **î** (hevedudanî – negerguhêz )

**d. Çîrokiya Dema Boriya Têdeyî**

Di raweya xwastekî, çîrokiya dema boriya têdeyî de, lêker çî xwerû, çî pêkhatî û çî hevedudanî bin, di zaravayê kurmanciya nawerast de cînavkên pêvebestî

dikevin di navbera lêkera alîkar (bûn) û qertafa (-aye) de; di kurmanciya jorîn de jî, dikevin di navbera her du qertafên (-a) û (-a) de. Di vir de ew ciyawazî û lihevçûnên berpa dibin ev in: Di kurmanciya jorîn, kesê duyem ê yekjimar de, qertafa raweya xwastekî (-a) ya dawiyê, ji holê radibe û cînavka pêvebestî (-î) wek qertafa axîr di dawiya lêkeran de derdikeve; lê di kurmanciya nawerast de tiştek wiha rû nade. Di her du zaravayan de hin caran bo kesê sêyem ê yekjimar cînavka pêvebestî wek sifir (Ø) tê nîşandan, wate cînavka pêvebestî nîn e.

### **Mînak:**

kenîbûbamaye: kenîbû + ba + **m** + aye

dakewtibûytaye: dakewtibû + **yt** + aye

serkewtibûynaye: serkewtibû + **yn** + aye

kenîbûyama: kenîbûya + **m** + a

dakevtibûyayî: dakevtibûya + (y)**î**

serkevtibûyana: serkevtibûya + **n** + a

### **3.7.2.3. Demên Ranebirdû Lêkerên Gerguhêz û Negerguhêz**

#### **a. Dema Niha**

Di her du zaravayan de, di raweya xwastekî de ji bo gerdankirinê, formê lêkeran ê dema niha nîn e. Di vê raweyê de, dema niha di pêkhateya hevokan de, bi alîkariya bêjeya ferhengî (xwazî)yê tê bidestxistin. Wate di raweya xwastekî de, dema niha di asta morfolojiyê de nîn e, lê di asta hevoksaziyê de heye. Di vir de, çunke ev xebate di asta morfoalojiyê de li ser pêkhateyên lêkeran in, dê cînavkên pêvebestî li gor destê û cihê derkevtina wan neyên berawirdkirin

#### **b. Dema Bê**

Di her du zaravayan de, gava lêker di raweya xwastekî de ji bo dema bê tîn gerdankirin, cînavkên pêvebestî di lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz de her tim diçin dawiya lêkeran. Wate di raweya xwastekî dema bê de,

di her du zaravayan de cînavkên pêvebestî wek yek di heman cihê de derdikevin, tenha di formê qertafên cînavkên pêvebestî de her du zarava ji hev cihê dibin.

### **Mînak:**

bikirim: bikir + (i)**m** (xwerû – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

bixoyt: bixo + **yt** (xwerû – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

bixweyî: bixwe + (y)**î** (xwerû – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

helbikêşîn: helbikêş + **în** (pêkhatî – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

(em) hilkêşin: helkêş + (i)**n** (pêkhatî – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

bilindbike: bilindbik + **e** (hevedudanî – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

(ew) bilindbikin: bilindbik + (i)**n** (hevedudanî – gerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

bikenîn: biken + **în** (xwerû – negerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

(em) bikenin: biken + (i)**n** (xwerû – negerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

dabinişît: dabiniş + **ît** (pêkhatî – negerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

rakevî: rakev + **î** (pêkhatî – negerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

(êwe) têkbiçin: têkbiç + (i)**n** (hevedudanî – negerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

(hûn) nexweşbikevin: nexweşbikev + (i)**n** (hevedudanî – negerguhêz - raweya xwastekî dema bê)

### **3.7.3. Raweya Daxwazî (Fermanî)**

Di her du zaravayan de, di raweya fermanî de, qertafên (-e) û (-n) wek cînavkên pêvebestî tên bikaranîn. Di her du zaravayan de, ji bo kesê duyem ê yekjimar (-e), ji bo kesê duyem ê pirjimar (-n) jî tê bikaranîn. Raweya fermanî her tim amaje bi ranebirdû dike, wate li gor demên borî nayê gerdankirin. Di raweya fermanî, lêkerên xwerû, pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz û negerguhêz de,

cînavkên pêvebestî (-e) û (-n) her tim di dawiya lêkeran de derdikevin, di vir de her du zarava yeklayî dibin.

**Mînak:**

bikire: biker + e (xwerû – gerguhêz)

bidirûn: bidirû + n (xwerû – gerguhêz)

dabigire: dabigir + e (pêkhatî – gerguhêz)

dabigirin: dabigir + (i)n (pêkhatî – gerguhêz)

dûrbikevin: dûrbikev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

dûrbixe: dûrbix + e (hevedudanî – gerguhêz)

biçe: biç + e (xwerû – negerguhêz)

biçin: biç + (i)n (xwerû – negerguhêz)

helbifire: helbifir + e (pêkhatî – negerguhêz)

hilfirin: hilfir + (i)n (pêkhatî – negerguhêz)

serbikeve: serbikev + e (hevedudanî – negerguhêz)

serbikevin: serbikev + (i)n (hevedudanî – negerguhêz)

Her wiha eger lêker bi dengê dengdêr/bizvên dawî bibe qertafa kesa/ê duyem a/ê yekjimar dernakeve. Wate di van forman de kesa/ê duyem ê yekjimar sifir(Ø) e.

**Mînak:**

bişo: bi + şo + Ø

biro: biro + Ø

**3.7.4. Raweya Çêbiwar**

Di zimanê kurdî, kurmanciya nawerast de qertafên (-û-, -w-) û di kurmanciya jorîn de jî qertafa (-î) ji bo raweya çêbiwar, an raweya awelnawkiraw tê bikaranîn. Di kurmanciya nawerast de qertafên raweya çêbiwar di dema boriya dûdar/tewaw de derdikevin holê. Ev qertafene, di lêkerên xwerû ên gerguhêz, negerguhêz û lêkerên

pêkhatî ên negerguhêz de, dikevin di navbera qertafên demên borî û cînavkên pêvebestî de. Lê belê di lêkerên pêkhatî û hevedudanî ên gerguhêz de, dikevin di navbera qertafên demên borî û qertafên betal, an tîpên kelijandinê de. Lê di kurmanciya jorîn, raweya çêbiwar de, cînavkên pêvebestî ji holê radibin û lêker gava qertafa (-î) werdigirin, ji pola lêkeran derbazî pola rengdêran dibin û di nav ferhengê de cî digirin. Her wiha di kurmanciya jorîn de, hemû lêkerên raweya çêbiwar ji aliyên ronan ve pêkhatî ne û tewger û livîn ji holê radibe.

### **Mînak:**

kirîwme: kir + î + w + m + e (xwerû – gerguhêz – çêbiwar)

kewtûyne: kew + t + û + yn + e (xwerû – negerguhêz – çêbiwar)

(êwe) daniştûne: da + niş + t + û + n + e (pêkhatî – negerguhêz – çêbiwar)

helmangirtûwe: hel + man + gir + t + û + w + e (pêkhatî – gerguhêz – çêbiwar)

dûritxistûwe: dûr + t + x + is + t + û + w + e (hevedudanî – gerguhêz – çêbiwar)

kolayî: kol + a + y + î (pêkhatî – çêbiwar)

girtî: gir + t + î (pêkhatî – çêbiwar)

hilweşandî: hil + weş + an + d + î (pêkhatî – çêbiwar)

kelandî: kel + an + d + î (pêkhatî – çêbiwar)

belavbûyî: belav + b + û + y + î (hevedudanî – pêkhatî – çêbiwar)

kunkirî: kun + k + ir + î (hevedudanî – pêkhatî – çêbiwar)

çûyî: ç + û + y + î (pêkhatî – çêbiwar)

gotî: go + t + î (pêkhatî – çêbiwar)

## ENCAM

Di vê xebatê de bi şêweyek giştgîr amaje bi zanista zimanewanî û berawirdkariyê hatiye kirin û her wiha destpêka wan zanistane hatiye arastekirin û şêwazê polînbûna zimanên cîhanê û cihê zimanê kurdî di nav van zanist û polînane de hatiye diyarkirin.

Di vir de sedemên standartnebûna zimanê kurdî û ji aliyê lêkoler û zimanewanên zimanê kurdî ve şêwazê polînkirina zaravayên zimanê kurdî hatine destnîşankirin û her wiha di kurmanciya jorîn û nawerast de, qertafên rêzimanî ên diçine ser lêkeran, di asta morfolojiyê de hatine berawirdkirin.

Di zimanê kurdî zaravayên kurmanciya nawerast û jorîn de qertafên (-a, -d, -t, -û, -î) wek qertafên demên borî hatine destnîşankirin û her tim wek paşgir di dawiya lêkeran de derdikevin. Di vir de yek ciyawazî heye, di kurmanciya jorîn de qertafa demên borî (-d) ji holê rabûye, nayê nivîsîn û wek morfîma sifir (Ø) tê hesabandin. Lê belê dema lêkerên negeruhêz di demên borî de bi riya qertafa (-andin) tên gerguhêzkerin, qertafa (-d) di kurmanciya jorîn de jî derdikeve û bi vî awayî di navbera her du zaravayan de yeklayîbûn berceste dibe.

Di her du zaravayan de ji bo demên ranebirdû (dema niha, dema bê, dema bê a nêzîk) ji hev ciyabûn heye. Lêkoler û zanayên kurmanciya nawerast dibêjin di vî zaravayî de dema niha û dema bê yek formê wan heye û ew bi riya hevok, an dewrûber ji hev tên ciyakirin. Ji bo dema bê, di kurmanciya nawerast de bêjeyên ferhengî ên wataya dema bê didin û qertafa raweya fermanî (bi-) tên bikaranîn; di kurmanciya jorîn de jî ji bo heman demê nîşaneyên (dê, ê, wê) û qertafa raweya fermanî (bi-) tên bikaranîn; lê di kurmanciya nawerast de formê dema bê a nêzîk nîn e. Ji bo dema niha di kurmanciya jorîn de qertafa (di-) tê bikaranîn, lê ev qertafe (de-) di kurmanciya nawerast de wek espêkt tê hesabandin û tenha ji bo sereta û destpêkirina kar û çalakiyan tê bikaranîn. Boye di warê vê qertafê de, di navbera zimanewanên kurd de bîr û boçûnên ciyawaz hen e. Her wiha qertaf û nîşaneyên demên ranebirdû jî her tim wek pêşgir diçin destpêka lêkeran û bi vî awayî hem ji aliyê form ve, hem jî ji aliyê cihê jê derdikevin ve ji qertafên demên borî cihê dibin.

Di zimanê kurdî kurmanciya nawerast û jorîn de, lêkerên gerguhêz ên bi qertafa demên borî (-û) dawî dibin nîn in. Lê belê di lêkerên negerguhêz de ew qertafe derdikeve. Her wiha di kurmanciya nawerast demên borî de formê çîrokiya dema boriya dudar û di demên ranebirdû de jî formê dema bê a nêzîk nîn e.

Di zimanê kurdî kurmanciya nawerast û jorîn de lêkerên; kird/kir, xward/xwar, bird/bir, rûnişt û xist di raweya demên borî de ne, gava ji demên borî ji bo demên ranebirdû û raweya fermanî tên veguhestin, qertafên; (-ar, -ir, -iş, -es, -is) ji holê radibin û lêker formê; dike/dekat, dixwe/dexot, dibe/debat, dirûne/derûnê, dixwe/dexat û bibe, dê bibe, bike, birûne, dê birûnê, dike birûne... hwd. werdigirin û ev qertafene jî wek qertafên betal tên hesabandin.

Di her du zaravayan de ji raweyên xwastekî, qertafên wek (-bi-), (-ba-), (-a), (-aye) û bêjeyên ferhengî ên wek xwazge, xwezî, birya, dibe, debêt, be şert, awat, tika, hîwa, hêvî, divê, bila, ku, heke... hwd. tên bikaranîn û her tim wek paşgir dewr dibînin. Her wiha di kurmanciya jorîn, lêkerên pêkhatî de, qertafa (bi-) dernakeve, lê di kurmanciya nawerast de derdikeve.

Di zimanê kurdî kurmanciya nawerast û jorîn, raweya xwastekî dema bê de, kesê sêyem ê yekjimar û kesê duyem ê pirjimar nîn in, çunke ev formene di raweya lêkerên fermanî de ne. Tenanet eger di kurmanciya jorîn de ji bo kesê yekem û sêyem ên pirjimar, di kurmanciya nawerast de jî ji bo kesê sêyem ê pirjimar cînavkên serbixwe (ew, em, ew) neyên bikaranîn, wî wextî dê ew lêker jî bikevin formê raweya fermanî de. Her wiha di van her du zaravayane de, di raweya xwastekî de ji bo dema niha û dema bê a nêzîk formê lêkeran ê gerdankirî nîn e.

Di kurmanciya nawerast û jorîn, dema boriya dudar de, gava lêker di raweya xwastekî de tên gerdankirin, qertafa espêkt (-e) ji holê radibe.

Di zimanê kurdî de raweya fermanî her tim amaje bi dema bê dike û lêkerên vê raweyê tenha ji bo kesên duyem ên yekjimar û pirjimar tên gerdankirin.

Di her du zaravayan de qertafên raweya çêbiwar/awelnavkiraw hen e. Di kurmanciya nawerast de qertafên (-û, -w) tên bikaranîn û lêker di heman demê de qertafên deman û cînavkên pêvebestî werdigirin; lê di kurmanciya jorîn de ji bo vê yekê qertafa (-î) tê bikaranîn û lêker ji pola lêkeran derbazî pola rengdêran dibe, wate ji lêkerbûnê dikeve.

Di zimanê kurdî, avaniya lêkeran de, bi riya qertafa (-andin) lêkerên negerguhêz ên demên borî dibin lêkerên gerguhêz. Ev qertafe jî pêk tê ji qertafa avanîgor (-an), qertafa demên borî (-d) û qertafa çawigê (-in). Di demên ranebirdû de jî dema lêkera negerguhêz dibe gerguhêz, di formê qertafa (-an) de guhertinek fonolojîk berpa dibe û dengê /a/ diguhere bo dengê /ê/ û bi vî awayî di demên ranebirdû de jî lêkerên negerguhêz dibin gerguhêz.

Her wiha ji bo tebatkirina lêkerên lebat jî, di kurmanciya jorîn de ji bo demên borî lêkera alîkar (hatin) û di kurmanciya nawerast de jî qertafa (-r) tê bikaranîn. Di demên ranebirdû de jî ji bo tebatkirina lêkerên lebat, di kurmanciya jorîn de formê lêkera alîkar a demên borî (hatin), di dema niha de ji bo formê (tê) û di dema bê de jî ji bo formê (bê) tê guhertin. Lê di kurmanciya nawerast de her heman qertaf (-r) tê bikaranîn.

Di her du zaravayan de bi giştî qertafên ji bo neyîniyê tên bikaranîn qertafên (ne-, me-, na-, nî-, ni-) ne. Ji bo demên borî, dema bê û dema bê a nêzîk qertafa (ne-), ji bo dema niha qertafa (na-) û ji bo raweya fermanî jî qertafên (ne-, me-) tên bikaranîn. Di zimanê kurdî de qertafên neyîniyê her tim wek pêşgir dewr dibînin.

Di zimanê kurdî de gava dema niha, dema bê, dema bê a nêzîk û raweya fermanî tên neyînîkirin; di dema niha de qertafên (di-, de-), di dema bê, dema bê a nêzîk û raweya fermanî de jî qertafa (bi-) ji holê radibe û qertafa (na-) diçe cihê qertafên (di-, de-) û qertafa (ne-) jî diçe cihê qertafa (bi-). Lê belê di zimanê kurdî dema boriya berdest de gava lêker tên neyînîkirin, qertafa (di-, de-) ji holê ranabe û dikeve di navbera qertafa neyînî (ne-) û destpêka lêkeran de.

Di kurmanciya nawerast de wek qertaf sê destê, (-m/-man, -t/-tan, -y/-yan), (-m, -ît/-yt, -Ø/-at/-êt, -în, -n, -n), (-e, -n); di kurmanciya jorîn de jî du destê (-m, -î, -Ø, -n, n, -n), (-e, -n) cînavkên pêvebestî tên bikaranîn. Her wiha di kurmanciya nawerast de yek destê cînavkên serbixwe (min, to, ew, ême, êwe, ewan) heye, di kurmanciya jorîn de jî du destê (cînavkên xwerû: ez, tu, ew, em, hûn, ew), (cînavkên tewandî: min, te, wî/wê, me, we, wan) cînavkên serbixwe hen e.

Di kurmanciya nawerast de ji bo lêkerên gerguhêz ên demên borî desteya yekem (-m, -t, -y, -man, -tan, -yan); ji bo lêkerên negerguhêz ên demên borî û ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên demên ranebirdû (dema niha û dema bê) desteya



duyem (-m, -ît/-yt, -Ø/-at/-êt, î/n/-yn -n, -n) û ji bo lêkerên raweya fermanî jî desteya sêyem (-e, -n) tê bikaranîn. Di kurmanciya jorîn de jî di lêkerên gerguhêz ên demên borî de wek qertaf cînavkên pêvebestî nîn in, wate sifir (Ø) e û erk û rolên cînavkên pêvebestî ji aliyê cînavkên kesî ên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan) ve tîn cêbecêkirin. Lê ji lêkerên negerguhêz ên demên borî û ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên demên ranebirdû desteya yekem (-m/-n, -î/-n -Ø/-n), ji bo lêkerên raweya fermanî jî desteya duyem (-e, -n) tê bikaranîn.

Di kurmanciya nawerast, demên borî, lêkerên gerguhêz ên pêkhatî, hevedudanî û ên qertafên rêzimanî wek pêşgir werdigirin de, desteya cînavkên pêvebestî a (-m, -t, -y, -man, -tan, -yan) wek pêşgir diçe destpêka lêkeran. Lê belê di kurmanciya jorîn de tiştek wiha rû nade û cînavkên pêvebestî her tim di rola paşgir de ne.

Di kurmanciya jorîn, formê lêkerên negerguhêz ên demên borî û lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên demên ranebirdû de, ji bo her sê kesên pirjimar qertafa (-n) tê bikaranîn. Lê belê di kurmanciya nawerast de ji bo heman lêkeran di kesê yekem ê pirjimar de qertafên (-în, -yn), di kesên duyem û sêyem ên pirjimar de jî qertafa (-n) tê bikaranîn. Her wiha di kurmanciya jorîn, kesê duyem ê yekjimar de ji bo heman lêkeran qertafa (-î) tê bikaranîn; di kurmanciya nawerast de jî ji bo kesê duyem ê yekjimar di hemû formên lêkeran de qertafên (-ît, -yt) tîn bikaranîn. Tenanet di kurmanciya jorîn de jî qertafa (-ît) dihate bikaranîn lê belê niha bi gelemperî ji kar ketiye û di nivîsê de bi hîç şêweyekê nayê bikaranîn, lê di dewerên botan, Colemêrg û Cizîrê di axavtina rojane de hêj tê bikaranîn. Wate di kurmanciya jorîn de dengê /t/ ketîye û dengê /î/ maye.

Di kurmanciya jorîn de, cînavkên pêvebestî her tim li gor desteya xwerû a cînavkên serbixwe derdikeve. Wate li gor desteya tewandî a cînavkên serbixwe dernakevin û di vir de cînavkên pêvebestî sifir (Ø) in. Lê di kurmanciya nawerast de, di vî warî de cînavkên serbixwe xwediyê tu rol û bandorekê nîn in. Her wiha di kurmanciya jorîn de ji ber ku ji bo her sê kesên pirjimar heman qertaf tê bikaranîn, ji bo ku tevlihevî an lêlî di ziman de peyda nebe û wataya hevokê rûn û aşkira be, dibe her sê cînavkên pirjimar ên serbixwe û xwerû bîn bikaranîn.

**ÇAVKANÎ**

AKKUM, Musa, “Etnik Kümeler Küreselleşmeden Nasıl Etkilenecekler? (Goganîbûn dê Çawa Bandorê li Grubên Etnîkî Bike)”, *Modernleşme ve Çok Kültürlülük (Modernîte û Pirçandî)*, Çapxaneyaya ....., Stenbol, 2001.

BAŞKAN, Özcan, *Bildirişim, İnsan-Dili ve Ötesi (Parvekirin, Mirov – Zimanê Wî û Wêdetir)*, Weşanên Multilingual, Stenbol, 2003.

BAŞKAN, Özcan, *Dilbilim – Linguistik Metodu (Zimanevanî – Mîtoda Lînguîstîkî)*, Weşanên Multilingual, Stenbol, 2003.

Be Pêy Lêkolînewey Lîjney Ziman û Zanistekanî le Korî Zanyariy Kurd, *Rêzimanî Axawtinî Kurdî (Rêzimana Axawtinê a Kurdî)*, Çapa 2., Weşanên Aras, Hewlêr, 2011.

BEDIR-XAN, Mîr Celadet – LESCOT, Roger, *Kürtçe Dilbilgisi-Kurmançî (Rêzimana Kurdî-Kurmançî)*, Çapa 3., Weşanên Doz, Stenbol, 1991.

BILBIL Mikaîl – BARAN Bahoz, *Rêzimana Kurmançî*, Çapxaneyaya Gun, Stenbol, 2008.

Ebdûla Hisên, *Morfîme Rêzimanîyekanî Kar (Qertafên Rêzimanî ên Lêkeran)*, (Teza Doktorayê a Zanîngeha Silêmaniyê, Nehatiya Weşandin), Hewlêr, 1990.

Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî, *Zare Kurdiyekan (Zaravayên Kurdî)*, Çapxaneyaya Pak, Hewlêr, 2011.

Ebûbekir Umer Qadir, *Berawirdêkî Morfosîntaksî le Zimanî Kurdî û Farişî (Berawirdek Qertafên Rêzimanî Di Zimanê Kurdî û Farişî de)*, (Teza Doktorayê a Zanîngeha Silêmaniyê, Nehatiya Weşandin), Silêmanî, 2003.

Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî (Dîroka Wêjeya Kurdî)*, Çapa 2., Bexda, 1971.

ERGÎN, Muharem, *Türk Dil Bilgisi (Rêzimana Zimanê Tirkî)*, Çapxaneyaya Bayrak, Stenbol, 1999.

Evrehmanê Hacî Marif, *Wuşe Ronan le Zimanî Kurdî da (Pêkhateya Bêjeyê di Zimanê Kurdî de)*, Çapa 2., Weşanên Kora Zanyariyên Kurd, Hewlêr, 1987.

Ewrehmanî Hacî Marif, *Rêzimanî Kurdî – Cênaw (Rêzimana Kurdî – Cînavk)*, Weşanên Kora Zanyariyên Êraqê – Lijneya Kurdî, Bexda, 1987.

Ewrehmanî Hacî Marif, *Rêzimanî Kurdî – Kirdar (Rêzimana Kurdî – Lêker)*, I, Çapxaneya Serdem, Silêmanî, 2000.

Fereydûn Ebdûl Berzencî - Ebûbekir Umer Qadir, “Kerese Morfosîntaksiyekan le Kurmanciy Nawerast û Kurmanciy Jorîn da (Qertafên Rêzimanî Di Kurmanciya Nawerast û Kurmanciya Jorîn de)”, (*Kovara Zanîngeha Silêmaniyê*), Beşa B, hejmara 67, Silêmanî, 2010.

Fuad Heme Xurşîd, *Zimanî Kurdî û Diyalektekanî – Şikirdineweyek Cografyayî (Zimanê Kurdî û Zaravayên Wê – Dahûrandina Erdnîgarî)*, Çapxaneya Serdem, Silêmanî, 2008.

GÜNAY, V. Doğan, *Dil ve İletişim (Ziman û Peywendî)*, Stenbol, 2004.

Hogir Mehmûd Ferec, “Netewey Kurd û Hêle Terîbeka Ziman û Hikumet”, (*Kovara Zanîngeha Raperîn*), Çapxaneya Bînayî, Silêmanî, 2014.

K. K. Kurdoyêv, *Rêzimanî Kurdî be Kerestey Diyalêktî Kirmancî û Soranî (Rêzimana Kurdî bi Pêkhatayên Zaravayên Kurmancî û Soranî)*, (Wer.:Kurdistan Mukiryani), Weşanên Saziya Giştî a Rewşenbîr û Lavan li Navçeya Kurdistanê, Hewlêr, 1982.

Kamîl Hesên Besîr – Kurdistan Mukiryani – Sadiq Bihaeddin Amêdî – Heme Emîn Hewramî, *Zare Kurdiyekan (Zaravayên Kurdî)*, Weşanên Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 1987.

Kurdistan Mukiryani, *Sîntaksî Ristey Sade le Zimanî Kurdî de (Hevoksaziya Hevoka Sade di Zimanê Kurdî de)*, Weşanxaneya Saziya Rewşenbîr û Weşanên Kurdî, Bexda, 1989.

MACKENZIE, Luhon, *Bineçeyey Kurdan û Binçîney Zimanî Kurdî (Bingeha Kurdan û Bingeha Zimanê Kurdî)*, (Amd.: Tewfîq Wehbî – W.:Taha Feyzî Zade), 19..?

Mihemed Emîn Hewramanî, *Seretayek le Fîlolojiy Zimanê Kurdî (Destpêkek di Fîlolojiya Zimanê Kurdî de)*, Çapxaneyê Mearif, Bexda, 1973.

Mihemed Emîn Hewramanî, *Zarî Zimanê Kurdî le Terazûy Berawird de (Zaravayê Zimanê Kurdî di Terazûya Berawirdkariyê de)*, Çapxaneyê El-Wataniye, Bexda, 1981.

Mihemed Merûf Fetah, *Zimanewanî*, Çapxaneyê Dar El-Heme, Hewlêr, 1990.

Mihemedî Mehwî, *Binemakanî Sîntaksî Kurdî (Binemayên Hevoksaziya Kurdî)*, Weşanên Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2011.

Mihemedî Mehwî, *Morfolojî û be Yekdaçûnî Pêkhatekanî Morfolojîy Kurdî (Morfolojî û bi Yekdaçûna Pêkhateyên Zimanê Kurdî)*, Weşanên Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2010.

Nerîman Ebdula Xoşnaw, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, Çapxaneyê Rojhelat, Çapa 3., Hewlêr, 2011.

Nerîman Ebdula Xoşnaw, *Rêzimanî Kurdî-Kirmanciy Serû (Rêzimana Kurdî – Kurmanciya Jorîn)*, Çapxaneyê Rojhelat, Hewlêr, 2015.

NORDENSTAM, Christine, (W. Xazî Elî Xurşîd), *Ziman le Ruwangey Regezewe (Ziman ji Aliyê Regezê ve)*, Çapxaneyê Renc, 2009.

Nûrî Elî Emîn, *Qewaîdî Zimanê Kurdî le Serf û Nihû da (Rêzimana Kurdî)*, Çapxaneyê Mearif, Bexda, 1956.

Nûrî Elî Emîn, *Rêzimanî Kurdî (Rêzimana Kurdî)*, Çapxaneyê Kamyaran, Silêmanî, 1960.

OCEK, Nezîr, *Edebiyata Kurdî*, Enqere, Weşanên Sîtav, Enqere, 2016.

OCEK, Nezîr, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Sîtav, Stenbol, 2014.

PORZIG, Wolter, *Dil Denen Mucize (Ziman Wek Mûcîze)*, II, (Wer.:Vural Ülkü), Weşanxaneyê Serokwezîriyê, Enqere, 1986.

RIZGAR, Baran, *Uygulamalı Kürtçe Dersleri – Dersên Kurdî*, Weşanên Doz, Stenbol, 2005.

SAGŊNÎÇ, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Çapxaneya Berdan, Stenbol, 2002.

SAUSSURE, Ferdinand, *Genel Dilbilim Dersleri (Waneyên Giştî ên Zimanewaniyê)*, (Wer.: Berke Vardar), Weşanên Multilingual, Stenbol, 2001.

Selam Nawxoş - Nerîman Xoşnaw, *Zimanewanî, I, II, III*, Çapxaneya Minare, Hewlêr, 2009.

Selam Nawxoş, – Nerîman Xoşnaw, *Zimanewanî, IV, V, VI, VII*, Çapxaneya Minare, Hewlêr, 2010.

Selam Nawxoş-Nerîman Xoşnaw, *Zimanewanî, VIII*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2011.

SEVGEN, Nazmî, *Doğu'da Kürt Sorunu (Di Rojhelat de Pirsgirêka Kurd)*, (Amd.:Mesut Özcan), Enqere, 2003.

Şeref Xanê Bedlîsî, *Şerefname – Kürt Tarihi (Şerefname – Dîroka Kurdan)* (Wer.: Mehmet Emin Bozarlan), Çapa 3., Weşanên Deng, Stenbol, 2006.

Şêrko Heme Emîn Qadir, *Morfîme Bende Lêksîkî û Rêzimanîyekan û Erkyan le Diyalektî Goran da (Morfîmên Bend ên Ferhengî û Rêzimanî û Peywira Wan di Zaravayên Goran de)*, (Teza Lîsansa Bilind a Zanîngeha Silêmaniyê, Nehatiye Weşandin), Silêmanî, 2002.

TAN, Samî, *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, Çapxaneya Îmaj, Stenbol, 2005.

TAŞ, Çetîn, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Çapxaneya Berdan, Stenbol, 2013.

Umêd Berzan Birzo, *Ristesazî – Dirustey Firêz û Riste le Zimanî Kurdî da (Hevoksazî – Pêkhatiya Firêz û Hevokê di Zimanê Kurdî de)*, Çapxaneya Genc, Silêmanî, 2011.

Wirya Umer Emîn, *Asoyekî tirî Zimanewanî (Asoyek din a Zimanevaniyê)*, I, Çapa 2., Weşanên Aras, Hewlêr, 2009.

Xazî Elî Xurşîd, *Rêzimana Fermî*, Çapxaneya Serdem, Silêmanî, 2013.

YILDIRIM, Kadrî, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi Kurmanci Lehçesi (Bi Hîndarên Bingehîn û Nivîsaran Rêzimana Kurdî Kurmanciya Jorîn)*, Çapa 3., Weşanên Avesta, Stenbol, 2013.

Yusif Şerîf Seîd, *Zimanewanî*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2011.



## JIYANNAME

Di saala 1979'an de li bajarê Colemêrgê, navçeya Geverê li dayîk bûme. Piştî min xwandina xwe a seretayî, nawendî û amadeyî di sala 2000'an de dawî kir, di navbera salên 2000-2002'yan de li zanîngeha Mersînê beşa Dîrokê xwand û paşan min dest jê wê beşê kêşa û di sala 2003'yan de li zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê dest bi beşa Wêje û Zimanê Turkî kir û di sala 2007'an de ez ji vê beşê perwende bûm û paşan derbazî Êraqê bûm û di navbera salên 2009-2013'yan de li Herêma Kurdistanê, li zanîngeha Silêmaniyê beşa Wêje û Zimanê Kurdî xwand û di sala 2013'yan de wegeriyame Turkiyê û di navbera salên 2013-2014'yan de li zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê li Enstîtûya Zimanên Zindê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Lîsansa Bilind a Bêtez xwand û li ser "Di Kurmanciya Nawerast û Kurmanciya Jorîn De Berawirdkirina Qertafên Navî" teza xwe amade kir û radestî enstîtûyê kir û di sala 2014'an de derbazî Lîsansa Bilin a Bitez bûm û di wir de jî li ser "Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Nawerast de Qertafên Lêkeran" teza xwe amade kir û pêşkeşî enstîtûyê kir û sala 2018'an de perwende bûm.